

**KT**

**Zanîngeha Mardîn Artukluyê  
Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê  
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî**

**Teza Lîsansa Bilind**

**JI BO ZAROKAN  
DI FÊRKIRINA KURDÎ DE ROLA MAMIKAN  
(Vekolîn-Senifandin)**

**Kenan SUBAŞI**

**11711006**

**Şêwirmendê Tezê**

**Öğr. Gör. Ramazan PERTEV**

**Mêrdîn 2014**

## TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

...../...../..... Tarihinde savunması yapılan “Çocuğa Kürtçe Öğretiminde Bilmecelerin Rolü (İnceleme-Sınıflandırma)” başlıklı bu çalışma jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında YÜKSEK LİSANS TEZİ olarak kabul edilmiştir.

Danışman

: Öğr. Gör. Ramazan PERTEV




Üye

: Prof. Dr. Kadri YILDIRIM




Üye

: Doç. Dr. Tahirhan AYDIN



Üye

: Öğr. Gör. Mikail BÜLBÜL



Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylarım.



Prof. Dr. Kadri YILDIRIM

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürü

## **KURTEBÊJE**

amd.	: Amadekar
B.	: Berg
Bnr.	: Binêre
ç.	: Çap
çap.	: Çapxane
H.b.	: Heman berhem
H.c.	: Heman cih
H.g.	: Heman gotar
H.r.	: Heman rûpel
Hwd.	: Her wekî din
j.	: Jimare
KT	: Komara Tirkiyeyê
nd.	: Nivîskarên din
r.	: Rûpel
vgz.	: Veguhêz
wer.	: Wergêr
weş.	: Weşanxane

## **KURTE**

### **JI BO ZAROKAN DI FÊRKIRINA KURDÎ DE ROLA MAMIKAN**

#### **(Vekolîn-Senifandin)**

Di vê tezê de rola mamikan a di fêrkirina ziman a ji bo zarokan de hatiye vekolîn û nêzikî 2500 mamikên kurdî ji aliyê naverokê ve hatine senifandin. Mebest ji vê ew e ku dewlemendiya mamikên kurdî ji aliyê ziman ve bê zanîn û ji bo zarokan di fêrkirina ziman de awayên bikaranîna wan bîn tespîtîkin. Li gor vê mebestê analîza ziman a mamikan hatiye kirin û li gor mamikên kurdî di fêrkariyê de kîjan rêbazên pedagojîk guncav bin, hatine danîn û ev rêbaz li ser mamikan hatine tetbîqîkin.

Tez ji destpêk, sê beş û encamê pêk tê. Di destpêkê de armanc û çarçoveya tezê tê ravekirin û her wiha rêbaza ku hatiye şopandin tê vegotin û çavkaniyên ku hatine bikaranîn jî tên nasandin.

Di beşa yekem de derbarê zarok, ziman, fêrkarî û mamikan de agahiyên teorîk hatine dayîn û geşedana ziman a zarokan bi awayekî berfireh tê vegotin. Fêrkarî û rêbazên fêrkariyê yên ji bo ziman di çarçoveya mamikên kurdî de tên ravekirin û li gor her rêbazê ji mamikên kurdî mînak tên dayîn. Her wiha pênase û binyada mamikan û têkiliya wê ya bi ziman û zarokan re jî di vê beşê de cih digirin.

Di beşa duyem de mamikên kurdî ji aliyê naverokê ve hatine senifandin. Di vê senifandinê de mamikên kurdî bi 19 sernav û 16 binsernavan ve bi giştî di bin 35 sernavan de hatine senifandin. Di bin her sernavê de mamikên ku hatine senifandin bi kurtî dê çî zanyariyan bide zarokan û ji hêla ziman ve dê çî li wan zê de bike, hatiye ravekirin. Rêbaza çavkaniyên ku di vê beşê de hatine bikaranîn jî bi kurtî hatine ravekirin.

Di beşa sêyem de mamikên ku hatine senifandin ji aliyê taybetmendiyan ziman ve hatine analîzkirin. Di vê analîzê de mamikên kurdî ji aliyê şiyana xwe ya bêje û têgehan, taybetmendiyan zimanê devkî û ji aliyê rêziman û hêmayên sereke ve yên ku di zimanê rojane de tên bikaranîn, hatine veçîrîn. Her wiha di encama lêgerîneke elektronîk de piştî ku hemû mamikên kurdî di ber çavan re hatin derbaskirin, sê tabloyên li ser bikaranîna navên rengan, bikaranîna lêkeran û bikaranîna hêmayên di şayesadina heyînan de hatin amadekirin.

**Bêjeyên Sereke: Zarok, ziman, fêrkarî, mamik**

# ÖZET

## ÇOCUKLARA KÜRTÇE ÖĞRETİMİNDE BİLMECELERİN ROLÜ

### (Tahlil-Tasnif)

Bu tezde çocuklara dil öğretiminde bilmecelerin rolü incelenmiş ve yaklaşık 2500 Kürtçe bilmece içerik açısından sınıflandırılmıştır. Bundaki amaç Kürtçe bilmecelerin dil açısından zenginliğinin araştırılması ve çocuklara dil öğretiminde bu bilmecelerin nasıl kullanılacağına gösterilmesidir. Bu amaç doğrultusunda bilmeceler üstünde dil analizi gerçekleştirilmiştir. Kürtçe bilmecelerin öğretimine uygun pedagojik yöntemler sıralanmış ve bu yöntemler bilmecelere uygulanmıştır.

Tez giriş, üç ana bölüm ve sonuçtan meydana gelmektedir. Giriş bölümünde tezin amacı ve çerçevesi açıklandıktan sonra tezde kullanılan yöntemler anlatılmış ve kullanılan ana kaynaklar tanıtılmıştır.

Birinci bölümde çocuk, dil, öğretim ve bilmece hakkında teorik bilgiler yer almaktadır. Çocuğun dil gelişimi üzerinde ayrıntılı bir şekilde durulmuştur. Dil öğretimi yöntemleri Kürtçe bilmeceler çerçevesinde açıklanarak bu yöntemlere uygun Kürtçe bilmecelerden örnekler verilmiştir. Ayrıca bilmecenin tanımları, içerik ve şekil açısından bilmecelerin yapısı ve bilmecenin dil ve çocuk ile olan ilişkisi de bu bölümde yer almıştır.

İkinci bölümde Kürtçe bilmeceler içerik açısından sınıflandırılmıştır. Bu sınıflandırma 19 başlık ve 16 alt başlık olmak üzere toplam 35 ayrı başlıktan meydana gelmektedir. Her başlığın altında sınıflandırılan bilmecelerin çocuklara ne tür bilgiler katacağı ve dil açısından onları ne şekilde geliştireceği kısaca açıklanmıştır. Ayrıca bu bölümde istifade edilen kaynakların kullanma yöntemi de kısaca açıklanmıştır.

Üçüncü bölümde sınıflandırılan bilmeceler dil özellikleri açısından analiz edilmiştir. Burada Kürtçe bilmeceler kelime ve kavram kapasitesi bakımından, bilmece dilinin taşıdığı ağız özellikleri bakımından, gramer açısından ve günlük konuşmada kullanılan terimlerin tanımlanması bakımından tetkik edilmiştir. Ayrıca elektronik ortamda tarama yapılarak sınıflandırılan tüm Kürtçe bilmeceler içerisinden renk adları, fiil kullanımları ve varlıkların tanımlanmasında kullanılan terimler olarak üç ayrı tablo hazırlanmıştır.

**Anahtar Kelimeler: Çocuk, dil, öğretim, bilmece**

**ABSTRACT**  
**THE ROLE OF RIDDLES IN THE EDUCATION OF CHILDREN**  
**( Research-Classification )**

In this thesis, the role of riddles in the education of children is researched and about 2500 Kurdish riddles are classified in accordance with content. The objective of the thesis is to identify the richness of the language of Kurdish riddles and to show how this will be used in teaching language to children. Accordingly, language analysis is applied on the riddles. Suitable pedagogical methods for teaching Kurdish riddles are given and they are applied to the riddles.

The thesis consists of an introduction, three main parts and a conclusion. The objective of the thesis is mentioned in the introduction part and then the methods which are applied are explained. Furthermore, the main resources that are used for the thesis are introduced.

There are theoretical information about children, language, teaching and riddles in the first part. Besides, language development in children is told in details. Language teaching methods for riddles are explained and there are examples of Kurdish riddles applied to every methods which are mentioned. Moreover, the definitions of the riddle, its construction according to content and form; and the relation of language and child with riddles is also in this part.

Kurdish riddles are classified according to the content in the second part. The classification is of 35 titles and subtitles in total; 19 titles and 16 subtitles. The questions of "What will the children learn from the riddles which are classified in titles and how will they improve them? " is answered in this part.

In the third part, the riddles are analysed according to the characteristics of language. They are classified according to the capacity of word and concept, the characteristics of dialect, and the grammar and terms that are used in daily life. In addition, there is an internet research on Kurdish riddles and a table prepared on this research classifying kurdish riddles according to the names of colour, usage of verbs and the terms used for identifying objects.

**Key words: Child, language, teaching, riddle**

## NAVEROK

<b>KURTE</b> .....	<b>I</b>
<b>ÖZET</b> .....	<b>II</b>
<b>ABSTRACT</b> .....	<b>III</b>
<b>NAVEROK</b> .....	<b>IV</b>
<b>PÊŞGOTIN</b> .....	<b>VIII</b>
<b>DESTPÊK</b> .....	<b>1</b>
1. Armanç û Çarçove.....	1
2. Çavkanî û Rêbaz.....	2

## BEŞA YEKEM

### ZAROK, ZIMAN, FÊRKARÎ Û MAMIK

1. Zarok .....	5
1.1. Geşedan.....	6
1.2. Rêgezên Bingehîn ên Geşedanê.....	8
2. Ziman.....	12
2.1. Xîmê Ziman .....	13
2.2. Rola Ziman di Jiyana Mirovan de.....	14
2.3. Nêrînên li Ser Ziman û Geşedana Wî .....	15
2.4. Serdemên Geşedana Ziman (0-6 salî).....	17
3. Fêrkarî .....	22
3.1. Rêbazên Pedagojîk ên Fêrkariyê.....	22
3.2. Pêkarên Tesîrdar ên li Ser Fêrbûna Ziman .....	26
4. Mamik .....	28
4.1. Mamik Çi Ye? .....	28
4.1.1. Pênaseyeke Strukturel.....	31
4.2. Binavkirinên Mamikan di Zimanê Kurdî de .....	33
4.3. Li Cîhanê Xebatên li Ser Mamikan .....	35
4.4. Di Edebiyata Kurdî de Mamik û Xebatên Kurdî yên li Ser Mamikan .....	37
4.5. Mamik ji Aliyê Sûdeweriyê ve.....	41
4.6. Egerên li Ser Çêbûn û Teşegirtina Mamikan .....	43
4.6.1. Meyla Mirovan a li Ser Tiştên Nepen/Hesta Meraqê, Hewcedariya Perwerdekirin û Kêfîkirinê .....	43
4.6.2. Jiyana û Şertên Derdorê.....	43

4.6.3. Mamikbêj û Dêdora ku Mamik Tê de Tê Pirsîn.....	44
4.6.4. Devokî û Çanda Devkî.....	44
4.7. Mamik ji Hêla Teşeyê ve.....	46
4.8. Mamik ji Hêla Vegotinê ve .....	48
4.9. Metafor û Metonîmî di Mamikan de .....	49
4.10. Mamik û Zarok.....	53
4.11. Mamik di Çarçoveya Geşedana Hizrê de .....	56
4.11.1. Fikirîna Afirîner.....	57
4.11.2. Fikirîna Rexneyî .....	57
4.11.3. Qabiliyetên Çareserkirina Probleman.....	58

## **BEŞA DUYEM**

### **LI GORÎ MIJARÊN CUDA SENIFANDINA MAMIKÊN KURDÎ**

1. Mamikên li Ser Mirovan .....	60
1.1. Mirov û Xwezaya Wî.....	60
1.2. Laşê Mirov .....	67
2. Mamikên li Ser Cureyên Ajelan .....	77
2.1. Cureyên Kêzikan.....	77
2.2. Ajelên Kojer.....	82
2.3. Ajelên Xijende .....	84
2.4. Ajelên Kedî û Kovî.....	87
2.5. Ajelên Avê .....	88
2.6. Çûk û Cureyên Wan.....	89
2.7. Ajelên Av û Bejayî .....	93
2.8. Laş û Xwezaya Ajelan .....	94
2.9. Ajelên ji bo Siwarbûn û Barkêşanê.....	98
2.10. Ajelên Kovî.....	98
3. Mamikên li Ser Fêkiyan .....	99
4. Mamikên li Ser Sebzeyan.....	103
5. Mamikên li Ser Qût û Nebatan.....	106
6. Mamikên li Ser Çerezan .....	113
7. Mamikên Bûyerekê yan Meseleyekê Vedibêjin.....	115
8. Mamikên li Ser Xwarinên Navmalê.....	119



9. Mamikên li Ser Amûr û Alavan .....	122
9.1. Amûrên Şer û Çandiniyê.....	122
9.2. Amûrên Hûr ên Kar û Barên Malê.....	127
9.3. Amûrên Gir ên Kar û Barên Malê .....	137
9.4. Amûrên li Ser Cil û Bergan .....	146
9.5. Amûrên ji bo Xwendin û Nivîsînê.....	149
9.6. Amûrên Raxistinê yên Nav Malê.....	150
10. Mamikên li Ser Têgehên Dînî .....	150
11. Mamikên li Ser Cih û Waran.....	153
12. Mamikên li Ser Xwezayê .....	159
13. Mamikên li Ser Wesayîtan .....	163
14. Mamikên li Ser Mûzîk û Enstrûmanan.....	164
15. Mamikên li Ser Demê.....	165
16. Mamikên li Ser Esmannasiyê .....	166
17. Mamikên li Ser Rewşa Hewayê .....	171
18. Mamikên li Ser Mantiq û Matematîkê.....	173
19. Mamikên ku Bersivên Wan di Nav de ne.....	176

## **BEŞA SÊYEM**

### **MAMIKÊN KURDÎ JI HÊLA TAYBETMENDIYÊN ZIMAN VE**

1. Nêrîneke Giştî li Ser Peyv û Têgehan .....	179
1.1. Bikaranîna Navên Taybet .....	180
1.1.1. Navên Şexsan.....	180
1.1.2. Navên War û Welatan.....	180
1.1.3. Navên Netewe û Zimanan.....	181
1.1.4. Navên Dînî.....	181
1.2. Navên Rengan.....	181
1.3. Taybetmendiya Devokan .....	184
1.3.1. Peyvên Devokî.....	184
1.3.2. Bikaranîna Devokê di Ravek û Pirjimariyê de .....	185
1.3.3. Bikaranîna Devokê di Kîşandina Lêkeran de .....	185
1.3.4. Daqurtandina Daçekan.....	186
1.3.5- Di Devokan de Guherîna Dengan.....	186

1.4. Bikaranîna Peyvên ku ji Dengan Têd Dariştin .....	187
1.5. Dijûn û Bikaranîna Gotinên Mustehcen .....	188
1.6. Peyvên Dubarekirî .....	190
1.7. Peyvên Hemwate .....	192
1.8. Peyvên Dijwate .....	193
1.9. Lêker .....	194
1.10. Gihanek .....	208
1.11. Daçek .....	210
1.12. Bikaranîna Peyvên Sereke di Sêwirandin û Danasîna Têgehên de .....	213
<b>ENCAM.....</b>	<b>219</b>
<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>222</b>

## PÊŞGOTIN

Mirov bi gelek taybetiyên xwe ve ji zindiyên din cuda dibin. Bêguman yek ji van taybetiyên sereke jî ziman e. Heta di nav pênaseyên mirov de tê gotin ku ew candarek e ku dikare bi axive. Tabî her ku aqilê mirovayetiye bi pêş ket û zanyarî bû hakimê lêkolîn û vekolînan, bi vî awayî mirov jî wek mexlûqatek baştir hat nasîn. Piştî gelek zanyar li ser perwerdeya mirovan xebitîn. Perwerdeya laşî, exlaqî, zêhnî, dînî, zimanî û hwd. Lêbelê heya çaxa navîn û qirna 17. ferqek di navbera zarok û mirovên gihiştî de nehatibû danîn û zarok wek mirovên lawaz dihatin nirxandin. Li Ewropayê piştî Ronesanê qîmeta mirovan di nav civakê de zêdetir bû, azadiya şexsan bêtir derket pêş û êdî zarok jî hêdî hêdî hatin fêhmkirin. Piştî ku zarokatî wek serdemeke geşedana mirovbûnê hat dîtin, perwerde û geşedana mirovan li gorî vê yekê hate saz kirin.

Bi pêşketina zanistên wek psîkolojî û pedagojiyê mirov ji aliyê derûnî û zêhnî ve jî bû mijara lêkolînan. Bi vê munasebetê gelek zanayên wek Bloom, Dewey, Montessori, Piaget, Erikson, Vygostky li ser geşedana mirovan rawestiyane. Piştî ku hat fêhmkirin serdema zarokatiyê di bingeha çêbûna kesayetiya mirovan de serdemeke serbixwe û girîng e, li ser zarokan zêdetir xebat hatin kirin. Çimkî di heyama zarokatiyê de zarok çî fêr bibûna, bidîtana, bibihîstana û çawa bihatana xwedîkirin dê di jiyana wan a mayî de jî tesîra vê bingeha zarokatiyê jî hebûya. Bi vê munasebetê di perwerdeya zarokan a laşî, exlaqî, zêhnî, dînî, zimanî û hwd. de hin rê û rêbaz hatin danîn. Ji bo afirandina kesayetiyan xurt zarok li gorî van hatine perwerdekirin.

Di perwerdekirina zarokan de ji bilî rê û rêbazan helbet materyal û pratîka jiyane jî lazim bûn. Yanî mirov dê çawa li wan miqatebûna, çî bi wan bidana xwendin, guhdarîkirin û dê bi çî awayî şîretên xwe bigihandana wan da ku ew bûbûna xwedî kesayetên xurt. Bi vî awayî ji bo zarokan gelek qadên fêrbûnê ava bûn. Di nav edebiyata gelêrî de çîrok, helbest, stran, zûgotinok, destan, efsane û gelek cureyên din ji bo perwerdekirina zarokan bûn amûrên xurt. Mamik jî yek ji van cureyan bû ku bi rehetî ji bo perwerdeya zarokan a zimanî û zêhnî dikaribû bihata bikaranîn.

Me di xebata xwe de mînakên xebatên ku li cîhanê û li derdorên me hatine kirin vekolan û li gor wê, tesîra mamikên kurdî li ser pêşketina ziman analîz kir. Me di vê

xebatê de sê beşên sereke danîn û di wan de gelo tesîra mamikan di fêrkariya ziman ji bo zarokan de ka çawa çê dibe, nivîsîn.

Me di beşa yekem de derbarê zarok, ziman, fêrkarî û mamikan de agahiyên teorîk dan. Geşedana ziman a zarokan bi awayekî berfireh vegot. Fêrkarî û rêbazên fêrkariyê yên ji bo ziman di çarçoveya mamikên kurdî de rave kirin û li gor her rêbazê ji mamikên kurdî mînak dan. Her wiha me di vê beşê de cih da pênase û binyada mamikê û têkiliya wê ya bi ziman û zarokan re jî.

Me di beşa duyem de mamikên kurdî ji aliyê naverokê ve senifandin. Di vê senifandinê de me mamikên kurdî bi 19 sernav û 16 binsernavan ve bi giştî di bin 35 sernavan de senifandin. Me di bin her sernavê de mamikên ku hatine senifandin bi kurtî dê çi zanyariyan bide zarokan û ji hêla ziman ve dê çi li wan zê de bike, rave kirin.

Me di beşa sêyem de mamikên ku hatine senifandin ji aliyê taybetmendiyan ziman ve analîz kirin. Di vê analîzê de mamikên kurdî ji aliyê şiyana xwe ya bêje û têgehyan, taybetmendiyan zimanê devkî û ji aliyê rêziman û hêmayên sereke ve yên ku di zimanê rojane de tînan bikaranîn, hatine veçîrîn. Her wiha di encama lêgerîneke elektronîk de piştî ku me hemû mamikên kurdî di ber çavan re derbas kirin, sê tabloyên li ser bikaranîna navên rengan, bikaranîna lêkeran û bikaranîna hêmayên di şayesandina heyînan de amade kirin.

Di vê xebatê de helbet kesê kedkar ne ez tenê bûm. Di serî de ji bo ku di avakirin û pêşxistina Beşa Kurdolojiyê ya Zanîngeha Mardîn Artûklûyê de kedeke wî yê bêhempa heye û bûye sebeb ku ez jî di vê beşê de din av karên akademîk de bim, spasiyên bêhed li Mamoste Kadri Yıldırım dikim. Di eşkerekirina mijara tezê, parvekirina çavkaniyan xwe yên taybet de û di proseya amadekirina tezê de ji ber alîkariyan camêrane yên şewirmendê min Mamoste Ramazan Pertev ez spasdar im. Ji bo her du mamosteyên hêja Tahirhan Aydın û Mikail Bülbul ez çiqas spas jî bikim li ber keda wan dernayê ku teza min pir baş xwendin û fikrên xwe bi min re parve kirin. Ji bo ku ji karên xwe dem veqetandin û hin pirsên min bersivandin ez spasiya Mamoste Abdurrahman Adak, Perwîz Cîhanî û Zülküf Ergün dikim. Ji ber ku hin çavkaniyan bi min re parve kirin divê keda Mamoste Süleyman Şanlı û Emîn Akbaş jî neyê jibîrkirin. Her wiha ji ber rola wî ya veşartî ku bû sebeb ez bikevim nav qada xebatên kurdî û

akademîk ji birayê hêja Remzî Pêşeng û ji ber ku bala min zêdetir da li ser edebiyata zarokan û xebatên li ser zarokan, ji hevala xwe ya dilsoz Sewîm Qoserî re spasîyên ji dil dikim. Wekî din spasdar im ji bo her hevalên ku bûne wêrekiya dilê min û min navê wan li vir nenivîsîne. Herî dawî minetdar im ku sebaba hebûna zimanê min dayîka min a delal e.

## DESTPÊK

### 1. Armanç û Çarçove

Di vê tezê de mebest ew e ku di fêrkariya ziman de tesîra mamikan bê nîşandan, bi taybetî di fêrbûna ziman a zarokan de. Çimkî fêrkariya zarokan ji mêj ve ye dibe babeta axaftin û serêşiyê, bi taybetî piştî ku zarok wek şexsên serbixwe derketin rojevê, gelek zanyar û lêkolîner li ser geşedan û perwerdeya wan rawestiyar. Di perwerde û fêrkariyê de ji bilî fêrkariya laşî, exlaqî, hizrî, ayînî perwerde û fêrkariya ziman jî ji bo temambûna şexsiyeta zarokan bû mijara sereke. Di vê babetê de ji berê ve ye ku zanyarên wek Platon (347-429), Erasmûs (1466 -1546), Francis Bacon (1561-1626), John Lock (1632-1704), Jean Jacques Rousseau (1712-1778) nêrîn û nezerên xwe li ser vê yekê vegotine.<sup>1</sup> Bêguman di fêrkariya ziman de jî rola mamikan nehatiye jîbîrkirin. Wek pêkareke xwedî tesîr, xebatên curbicur li ser hatine kirin. Di vê tezê de me çarçoveya xwe li ser çar têgehên bingehîn ava kir:

- a) **Ziman:** Qesd ji vê yekê geşedana ziman çi ye? Û di geşedana wî de pêkarên ku rol digirin çi ne? Di avabûna şexsiyeta zarokan de çi girîngiya ziman heye? Bi giştî ziman hebûnekî çawa ye? Rola herî muhîm a ziman axaftin û sazkirina têkiliyê ye ku ev çawa derdikeve holê. Di avabûna vê kontekstê de rê û rêbazêke çawa tê şopandin? Li gor lêkolînên hatine kirin, ziman çawa geş dibe û dirûvekî bi vî rengî digire ku em îro gelek kar û barên xwe bi wî diqedînin. Xala herî girîng jî têkiliya wî û mamikan bi çi şiklî çê dibe.
- b) **Zarok:** Di vê xebatê de çarçovedanîna ji zarok qesd ew e ku geşedana ziman pîranî di navbera salên 0-6an de pêk tê. Di rastiye de ne tenê geşedana ziman be jî armanca herî sereke li vir tesîra mamikan li ser geşedana ziman a zarokan e. Çimkî mijara me ya sereke mamik exlebî hunereke vegotinê ye ku herî zêde berî xwendîgehê zarok pê re mûxatab dibin û piştî ku diçin dibistanê jî bi awayekî nivîskî rûbirû dimînin. Ji ber vê jî têkiliya zarok û mamikan têkiliyeke xwezayî û civakî ye ku em pê re muxatab dibin.
- c) **Fêrkarî:** Di tezê de beşa teknîkê ye. Ango teslîsa ziman, zarok û mamikê koordîne dike û dixê nav rêbazekê. Dê zimanê zarokan bi pêş bikeve û bi rêya mamikan fêrkariya ziman bê sazkin. Lê belê çawa? Fêrkarî û rêbazên wê ji bo vê pîrsê di nav vê xebata me de bersivek in.

---

<sup>1</sup> Nîhad Sedewallah, *Dê Çewa Serekerî li Gel Zarokê Xo Key...??*, Zana, Duhok, 2010, r. 24-36.

d) **Mamik:** Di vê tezê de mijara me ya sereke mamik in. Hem bi kurtî danasîn û tehlîla wan a ji aliyê şewaz û binyadê hem jî rol û erka wan a di ziman de. Di vê sernavê de fonksiyonên ziman ên mamikên kurdî tên tehlîlkin. Lêgerîna qalib, mantiq, bêje û sîstema zimanê kurdî di mamikan de tê kirin. Qesda peyva kurdî zaravayê kurmançî ye ku hemû mamikên me yên di vê xebatê de kurmançî ne. Mamik wek hunereke devkî hat pejirandin, lê belê hin mamikên ku piştî hatine çêkirin (zahf kêr in) û hin pirsên mantiqî ku wek mamikan tên qebûlkin jî di nav de ne.

## 2. Çavkanî û Rêbaz

Teza me ji du qismên sereke pêk tê, qismê yekem, beşa teoriyê ya ku bi pedagojiyê re eleqedar e. Ya duyem jî pênase, tehlîl, senifandin û analîz e ku li ser mamikên kurdî hatine kirin. Li gor van her du beşan jî çavkaniyên tezê hene ku jê re bûne bingeh. Bi gotineke din vê tezê piştî xwe daye van çavkaniyan. Ji bilî çavkaniyên tirkî, çavkaniyên bi zimanê farisî, kurmançî û soranî jî hatine bikaranîn. Lê ji ber kêmasiya xebatên bi zimanê kurdî di hin analîz û tehlîlan de çavkaniyên tirkî wek teorîk esas hatine girtin û li ser mamikên kurdî, bêyî ku rastiya mamikên kurdî bînin binçavkin, hatine tetbîqkin. Rêbaza ku min şopandiye xwe sipartiye hin xebatên akademîk ên ku hatine kirin. Heke em li vir bi kurtî qala rêbazê bikin em ê di bin du beşên sereke yên tezê de li gor çavkaniyên ku me ji xwe re bingeh qebûl kirine, wiha rave bikin:

Di beşa teorîk de çavkaniyên sereke xebatên pedagojîk ên li ser zarokan bûn. Ji van xebatan ên ku min herî zêde sûd wergirtin di kurmançî de xebata bi navê *Zarok û Çîrok* ya Ramazan Pertev bû. Di vê çavkaniyê de pênaseyên li ser zarokan, geşedana zarokan û bi taybetî geşedana ziman a zarokan deriyekî fireh vekir. Xebata İlhan Kızıllan a bi navê *Fêrbûn – Pirtûkek ji bo zarok û ciwanan* jî ji aliyê navên hin têgeh û taksonomiya geşedanê bûne alîkar. Di soranî de xebata Newzad Kelhor *Geşekirdinî Mindal* sêdeke mezin di warê geşedana zarokan de da min. Xebatên Nîhad Sedewallah *Perwerde û Zarok û Dayîk û Bab û Dê Çewa Serederî li Gel Zarokê Xo Key..??* ên li ser fêrkarî, zarok û ziman teza me piçek jî ji aliyê nasîna zarokan ve xurt kir. Xebatên tirkî yên Haluk Yavuzer *Çocuk Psikolojisi û Çocuğunun İlk 6 Yılı* û xebata Pınar San Bayhan – İsmihan Artan *Çocuk Gelişimi ve Eğitimi* jî ji aliyê zanyariyê ve çarçoveya ku min vekiribû gelek baş dagirtin. Xebata ku ji bo zimanê farisî hatibû wergerandin a bi navê *Ruşdê Kudek* a Sheridan û Dorothy jî zanyariyên zahf giranbiha li ser heyamên

geşedanê ya zarokan dane min. Ya herî girîng jî hin tezên akademîk ên li zanîngehên tirkîyê bûn ku bûne alîkar ez rêbaza beşa yekem bi vî awayî daynim. Ev xebatên ku pîranî li ser geşedana ziman a zarokan radiwestiyan exlebî min beşa xwe ya teorîk li gor xebatên wan saz kir. Xala duyem a herî muhîm a van xebatan jî ew bûn ku ez gihandime fikrên ekol ên wek Vygotsky, Chomsky û Piaget. Di famkirina ziman de pirtûka L.S. Vygotsky *Düşünce ve Dil* jî pacyeke paqij derbarê ziman de vekir ku ez bi vê mantiqê li ziman binêrim.

Beşa din jî bi temamî li ser mamikan e. Ev jî di nav xwe de dibe sê sernav ku ya yekem pênase û tehlîla mamikan e. Di vê sernavê de jî ez exleb li ser hêla teorîk a mamikan rawestiyan ku ez zêdetir li dûv peydakirina bersivên van pirsan ketim; “Mamik çi ne? Çawa peyda bûne? Çawa hatine heya îro? Taybetiyên wan çi ne? Têkiliya mamikan bi zarok û ziman re çi ye? Di kurdî de mamik çi ye?” û hwd. Di amadekirina vê beşê de jî du xebatên kurdî yên ku lêkolîn û senifandina mamikan xebitîbûn, bi taybetî di danasîna mamikên kurdî û xisûsiyetên wan de bûne alîkar ku yek ji wan a Sedreddîn Nûreddîn Ebûbekr, a din jî xebata Mahir Berwarî bû. Wekî din çavkaniyên ku ji aliyê teorîk ve mamik û xisûsiyetên mamikan di hişê min de xistine çarçoveyekê, gotarên akademîk bûn ku li Tirkîyê hatine amadekirin. Ji van gotaran ên herî girîng gotarên Fevzi Karademir, P. Naili Boratav, Altan Alperen, İlhan Başgöz, Robert A. Georges, Alan Dundes, Şahin Köktürk, Ayhan Karakaş, Hülya Çevirme û hwd. bûn.

Sernava duyem li ser senifandina mamikan bû ku cara yekem di kurdî de xebateke ewqas berfireh di vî warî de hatiye kirin. Min di vê tezê de mamikên kurdî di bin 19 sernav û 16 binsernavan de bi temamî di bin 35 sernavan de dabeş kirine. Di dabeşkirinê de min wek rêbaz sê çavkanî ji xwe re bingeh qebûl kirin, lê min bixwe jî çend sernav lê bar kirin. Yek ji van çavkaniyan xebata Mahir Berwarî<sup>2</sup> ye ku nêzî 750 mamikan di bin 9 sernavan de disenifîne. Xebata duyem jî ya Ebûbekr<sup>3</sup> e ku ew jî hin mamikên soranî di bin 10 sernavan de disenifîne. Xebateke din jî ya Altan Alperen<sup>4</sup> e ku hin mamikên tirkî di bin 6 sernavan de dabeş dike. Di vê tezê de min senifandinê li gorî mijar, babet an jî naverokê kiriye. Mamikên ku hatine senifandin, nêzî 2500

---

<sup>2</sup> Mahir Berwarî, *Metelokanê [Berhevkarî]*, Elmanya-Dortmund, 2009, r. 33.

<sup>3</sup> Sedreddîn Nûreddîn Ebûbekr, *Berkotêkî Metellî Folklorî Kurdî*, Wezaretê Rewşenbîrî Hikûmetî Herêmi Kurdistan, Hewlêr, 2005, r. 93-245.

<sup>4</sup> Altan Alperen, *Folklor ve Edebiyatın Unutulan Unsuru: Bilmeceler*, Millî Folklor Dergisi, j. 31-32, r. 123-125.



mamikên kurdî ne ku ji 11 xebatên berhevkarîyê hatine girtin. Yek bi yek analîza mamikan hatiye kirin û heman mamikên ku di xebatên cuda de hatine dîtin, tenê carekê hatine nivîsîn. Xebatên ku min jê sûd wergirtine ku piraniya mamikan di van xebatan de derbas bûne; xebata Mahir Berwarî *Metelokanê*, xebata Kenan Güneş *Mamikên Me*, xebata Xalid Sadinî *Mamikên Kurmancî* xebata Mustafa Gazî *Gurzek Ji Zargotina Zarokan -Dîsko Dîsko Danîno* ye. Xaleke balkêş a ku ez lê rast hatim jî di senifandinê de min dît ku mamikên Mahir Berwarî berhev kirine û yên ku Xalid Sadinî berhev kirine piraniya wan dişibin hev.

Sernava sêyem jî ji aliyê ziman ve analîza mamikan e. Min ev sernav di tezê de wek beşeke serbixwe bi cih kir û ji aliyê taybetiyên zimanê kurdî ve analîza mamikên kurdî kirin. Di vê beşê de jî min wek çavkanî xebata teza doktorayê ya Fevzi Karademir<sup>5</sup> referans girt. Karademir di teza xwe de mamikên tirkî hem ji aliyê şêwaz û binyadê ve hem jî ji aliyê ziman ve analîz dike. Min jî kêma û zêde rêbaza wî wek bingeh jî xwe re danî. Lê belê li gor hin xisûsiyetên mamikên kurdî hin qaîde û sernav min lê bar kirin û jê derxistin. Ji bilî çavkaniya rêbazê, min wek çavkaniyên ziman ên analîza ziman a mamikên kurdî li gor xebata Kadri Yıldırım a bi navê *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi; Kurmancî Lehçesi*,<sup>6</sup> xebata Çetîn Taş ya bi navê *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*,<sup>7</sup> û xebata Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ya bi navê *Hînkêr/Asta Duyemîn*<sup>8</sup> analîz kirin û ji xwe re wek çavkaniyên sereke pejirandin.

---

<sup>5</sup> Fevzi Karademir, *Türk Halk Bilmecelerinin Yapı, Dil ve Üslup Özellikleri*, Teza Doktorayê ya Çapnebûyî, Dicle Üniversitesi, Diyarbakir, 2007, r. 308.

<sup>6</sup> Kadri Yıldırım, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi; Kurmancî Lehçesi*, Mardin Artuklu Üniversitesi, Mardin, 2012.

<sup>7</sup> Çetîn Taş, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, Dîwan, Stenbol, 2013.

<sup>8</sup> Ronayî Onen, Samî Tan, *Hînkêr/Asta Duyemîn*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, 2009, r. 104-107.

## BEŞA YEKEM

### ZAROK, ZIMAN, FÊRKARÎ Û MAMIK

#### 1. Zarok

Ev têgeh li gor civakên cuda di nav sînoreke fireh de li gor erdnîgarî, tore, hewa û demê maneyên cuda digirin. Her çiqas zarokatî qala heyamekê bike jî ev heyam li gor van şert û mercên jorîn guherbar in. Lê dîsa jî gelek zanayan, pênase li ser zarokan gotine û qala geşedana wan a sîstematîk kirine. Vê yekê li gor pênaseya zarokatiya cîhanê ya standart kirine. Ramazan Pertev ji bo nasîna zarokan di civaka kurdî de wiha dibêje: “Di zimanê kurdî bo salên heta dozdeh û sêzdeh navên wekî zarok, zaro, zarî, gede, gedek, sêlek, sêwlek, doman, qeçek, sebî, mindal, eyal, tîfal, biçûk, piçûk, weled û wd. têne bikaranîn.”<sup>9</sup> Kesên ku ji hêla temenê xwe ve ji aliyê peymana mafên mirovan a navneteweyî jî heya hijdeh saliya xwe wek zarok tên pejirandin.<sup>10</sup> Ji aliyê geşedanê ve jî her çiqas li gor hin zanyaran biguhere jî, qinyata hevpar a ku li ser hatiye lihevkirin di navbera salên 0 û 11-13an de ye. Helbet di nav vê temenê dûv dirêj de jî zarok ji aliyê geşedana xwe ve dîsa wek heyamên zarokatiyê tê dabêşkirin wek çaxa pitikayî (0-2), çaxa zarokatiya pêşî an jî beriya dibistanê (3-6), çaxa zarokatiya dawî an jî çaxa dibistanê (6-13) tê binavkirin.<sup>11</sup>

Di nav temen û heyamên diyarkirî de hin pêzanînên li ser zarokan ku em haydar bin ka zarok çawa tên cîhanê û çawa mezin dibin û di vê navberê de çi geşedan pêk tên, Nîhad Sedewallah<sup>12</sup> di xebateke xwe de bi kurtî wiha rêz kiriye:<sup>13</sup>

- a) Di hefteya 4-8an de zarok di zikê dayîka xwe de diyar dibe.
- b) Di hefteya 8an de dirêjahiya zarokê di zikê dayîkê de dibe 2,5 cm.
- c) Di hefteya 12an de giraniya zarokê di zikê dayîkê de dibe (14) gram û dirêjahiya wê dibe 7,5 cm.
- d) Di heyva 3yan de di zikê dayîkê de diyar dibe ka keç e yan kur e.
- e) Li dûmahiya heyva 6ê giraniya wê dibe 1 kîlo û dirêjahiya wê 35 cm.
- f) Zarokê jinûyî ji dayîk dibe giraniya wê ya siruştî 2,5-3,5 kîlo û dirêjahiya wê 35 cm ye.
- g) Bênhilkişana wê 35-50 caran di yek çirkê de yan kêm e.

<sup>9</sup> Ramazan Pertev, *Zarok û Çîrok – Destpêka Pedagojiya Kurdî*, Doz, Stenbol, 2009, r. 21.

<sup>10</sup> “Birleşmiş Milletler Çocuk Haklarına Dair Sözleşme” r. 15

[http://www.kdkocuk.gov.tr/contents/files/YasalDuzenlemeler/BM\\_cocuk\\_Haklari\\_Sozlesmesi-Turkiye\\_Ilerleme\\_Raporu\\_\[2. ve 3. Donem\].pdf](http://www.kdkocuk.gov.tr/contents/files/YasalDuzenlemeler/BM_cocuk_Haklari_Sozlesmesi-Turkiye_Ilerleme_Raporu_[2. ve 3. Donem].pdf) 25.09.2014 / 09: 24

<sup>11</sup> Pertev, *Zarok û Çîrok*, r. 21.

<sup>12</sup> Nîhad Sedewallah, *Perwerde û Zarok û Dayîk û Bab*, Zana, Duhok, 2010, r. 22-23.

<sup>13</sup> Ji ber ku li ser zarokatiya siruştî rawestayê, geşedan û çêbûna berî zayînê jî xistiye nav vê rêz û kategoriyê.

- h) Lêdana dilê zarokê jinûyîbûyî ji 120-125 caran e di çirkê de yan kê e.
- i) Di heyva pêncê de giraniya wî du caran bi qasî xwe lê tê û di heyva 12ê de sê caran bi qasî xwe lê tê.
- j) Di heyva 5-9an de diranên wî yên xwarê derdikevin.
- k) Di heyva yekê de zarok dikarin bigirîjin û li meha 4ê dikarin bikenin.
- l) Ji heyva 10ê dikare xwe ji rûniştî bigire, hinek peyvan bibêje û li ser destan xwe bibexşîne.
- m) Di 1 saliyê de dikare xwe li pêya ve bigire.
- n) Di du salî de zarok zeîf dibe, çimkî bezê xwe dihelîne û dê zevlek bo peyda bin an çê bin.
- o) Dema ku dibe 2 salî diranên wî dibine 8 diran û dikare bi arîkarî bi rê ve biçe.
- p) Di heyva 18an de dikare bi lez biçe ango qareka hêdî û dikare 10 peyvan bibêje we û xwarinê bi destê xwe bixwe.
- q) Di du sal û nivê de diranên zarokî digehine 20 diranan û navê xwe dizane û hinek bizav û livînan bike.
- r) Di 5 salî de zarok dikare cilan bike ber xwe û ji ber xwe bike.

Di kurdî de ji zarokên nûçêbûyî re pitik tê gotin. Pitik piştî neh mehên di malzaroka dêya xwe de cara ewil çavê xwe li ronahiya dinê vedikin û ji wê pê ve êdî ew mirovên temam in û pitika nûçêbûyî li gor İlhan Kızıllan bi 30 000 gen, 200 hestî, 600 masûlk, 100 milyar şaneyên mejî û bi gelek organên din ve çê bûye.<sup>14</sup> Geşedana zarokan li gor hin zanyaran berî zayînê dest pê dike.<sup>15</sup> Piştî ku hate cîhanê û pê ve geşedan bi leztir dibe û heya şeş saliya xwe rêyeke dirêj diborîne.

### 1.1. Geşedan

Geşedan sîstemeke têkel e yanî ne bi tenê fizîkî an rûhî an jî zêhnî ye. Ji ber wê dema ku pênasayên geşedanê tên kirin, pêşî ew pêkarên ku geşedanê temam dikin tên vegotin û piştre bi temamî geşedan. Di vî warî de Pertev dibêje ku gelek caran geşedan, bi têngînen mezinbûn û kamilbûnê ve tê tevlihev kirin. Lewma pêşî pênaseya wan her du têngînan dike û piştre geşedanê vedibêje. Li gor wî mezinbûn û kamilbûn wiha ne:

“Mezinbûn: Ji layê qam û giraniyê ve zêdebûna laşê mirov e, yanî girbûn (growth) e. Ji ber vê yekê bo taybetiyên fizîkî (qilafet) ve tete bikaranîn.

<sup>14</sup> İlhan Kızıllan, *Fêrbûn – Pirtûkek ji bo zarok û ciwanan*, wer. Hüseyin Kartal, Rûpel, Stenbol, 2014, r. 9.

<sup>15</sup> Sefa Saygılı, *Çocuk Psikolojisi [0-7 yaş]*, Nesil Yayınları, ç. 25, İstanbul, 2011, r. 11.

Kamilbûn ew e ku bêyî mirov hewl bide û bixebite, taybetiyên ku ji zayînê ve bi xwe re tîne bi dor û rêzekê ve derdikevin holê û dikemilin (maturation). Ev mekanîzma bi pergaleke bixweber dixebite.<sup>16</sup>

Piştî ku van têgînan pênase dike ji me re pênaseyeke geşedanê ji Özaydın wiha neqil dike: “Herçî geşedan e, ev her du têgînan jî werdigire. Qabiliyetên ku ji zayînê ve hene bi hevbandoriya (interaction) viyana zarok û têkiliyên derve re di nav aheng û sistematîkek de pêşve diçin, geş dibin.”<sup>17</sup>

Newzad Kelhor jî li ser geşedanê radiweste û pênaseyeke wiha dike: “Geşedan ew tişt e ku hemû guherînên di ser laşê mirov de tîne, ew reaksiyona kîmyewî ye ku dibe sedema zêdebûna giranî, dirêjbûn û qebareya laş, di vê rêyê de ew armanc tê cî bo temambûna proseya gehiştinê (kamilbûnê); gehiştin ew tişt e ku guherînên geşedanê di laşê mirov de pêk werin da ku bigihêje wê astê êdî mirov bikare bixwe karê xwe pêk bîne. Proseya gehiştinê cudahî heye ji endamên laş ên wekî pişikê, tevgera xwînê, endamê tenasulê... hwd.”<sup>18</sup> Piştî vê pênaseyê Kelhor qala cudahiyên geşedanê dike. Ango hin geşedan dereng pê dikin hinek ji wan zû geşedana xwe tamam dikin. Qesta geşedanê ya ku bi rêzê çê dibe, dike û paşê jî pênaseya geşedanê ya ku ji Cemal Huseyn Elalosî girtiye wiha neqil dike: “Geşedan ew tişt e ku guherîna çendinî an jî pêkhateyî ye. Lê gehiştin, maneya guherîna li jorî, bihevrebûna wan herduyan pîrker û tamamkirina yek û dû ne an jî bi manayeke din dikarin bêjin her yek ji wan piştî yê din qewî dike.”<sup>19</sup>

Haluk Yavuzer di pênaseya geşedanê de mîna lêkolînerên din balê dikişîne li ser tevilhevbûna mezinbûn (growth) û geşedanê (development). Lê di rastiya xwe de van her du têgînan ji hev diqetîne û wiha dibêje: “Mezinbûn, zêdehiyeke şiklî derdixîne holê yanî guherînên di laşê mirovî de yê ji aliyê çendaniyê ve wek zêdebûna kîloyê, dirêjbûna bejnê û wd. Her wiha zarok tenê ji aliyê şiklî ve mezin nabe, ji hundur ve jî mejî û endamên din ên laş jî mezin dibin. Li berevajiyê vê geşedan li ber çendaniya laş bi çawaniya wê re jî eleqedar dibe. Geşedan pêşketineke herdemî, birist û ahengdar e. Yanî têkiliyeke di navbera guherînên ku pêk tîne jî dikeve nav qada geşedanê. Çimkî ew sistematîkeke têkelhev a pîralî ye.”<sup>20</sup>

---

<sup>16</sup> Pertev, *Zarok û Çîrok*, r. 22.

<sup>17</sup> Selim Özaydın, *Psikiyatri* İstanbul: İÜ, İstanbul Tıp Fakültesi, 1984, r.496 -527, vgz. Ramazan Pertev, *Zarok û Çîrok*, r. 22.

<sup>18</sup> Newzad Kelhor, *Geşekirdinî Mindal*, Dezgehê Mukriyan, Hewlêr, 2010, r. 11.

<sup>19</sup> Kelhor, h.b, r. 12.

<sup>20</sup> Haluk Yavuzer, *Çocuk Psikolojisi*, ç. 34, Remzi Kitabevi, İstanbul, 2012, r. 27.

Ji bilî van her du têtînan qala têtîna kamilbûnê jî dike ku li gorî wî kamilbûn ew potansiyela mirovî ye ku êdî têra bicihanîna erkekê dike. Yanî amadebûyîna wê endamê laşî ye ku bi rahatî bikaribe peywira xwe bîne cih.<sup>21</sup>

Pınar San Bayhan û İsmihan Artan qala geşedana zarokan kirine û ji aliyê guherbariyê ve kirine du beş. Pêşî di pênaseya xwe de anîne ziman ku geşedan bi demê re guherînên ku bi tesîra pêkarên biyolojîk û derdor, di şikil, fikr û tevgerên mirovî de pêk tên û herdemî ne. Piştî jî du beşên geşedanê wiha dabeş kirine. Beşa yekem wek guherîna ji hêla çendaniyê ve ku ew jî bejn, kîlo, xurcika peyvan û hwd. ên ku dikarin bên pîvandî in ku jê re “mezînbûn” gotine. Beşa duyem jî guherîna ji hêla çawaniyê ve ye ku ew jî di çareserkirina problemekê de amadebûn e. Ango guherînên nexuyayî yên ji hêla fizîkî, ruhî û derûnî û hwd. in ku jê re “kamilbûn” gotine. Bi kurtî geşedan bi hevkarî û temankariya van herdu têtînan vegotine.<sup>22</sup>

Geşedan bi awayeke gelemperî li ser sê qadan ava dibe ku ya yekê *qada fizîkî* ye ku bi dîmena laş ji aliyê derve ve eleqedar dibe, guherînên di masûlkeyan de û qabiliyetên motor dikevin nav vê qadê. Ya duyem *qada zêhnî* ye ku ev jî bi proseyan zêhnî yên bi çareserkirina probleman û fikirîna re eleqedar dibe. Guherînên di îdraq, hafiza, egerî, afirînerî û ziman de pêk tên dikevin vê qadê. Qada sêyem jî *psîkososyal* e ku ev jî geşedanên di kesayetî û tîkiliyên kesan de pêk tên, di hewîne. Li beramberî şert û mercên sosyal bertek, tevger û hestên zarokan ên xweser di xwe de di hewîne.<sup>23</sup>

Newzad Kelhor<sup>24</sup> jî geşedanê di sê qadan de dinirxîne û wiha diseniffîne:

- a) Ji hêla **eqîlî û zanyariyê** wek (fikirîna-îdraq), ponijîn û têtîhiştin, çareserkirina probleman.
- b) Ji hêla **komaleyê-sosyal** ku mirov di peywendîya komaletiyê de xwe binase û xwe di cihê rast de bi cih bike.
- c) Ji hêla **fizîkî** wek zêdebûna giraniya laş û dirêjîya bejn e.

## 1.2. Rêgezên Bingehîn ên Geşedanê

Di geşedanê de du pêkarên sereke hene ku yek irsiyet û ya din jî derdor e. Di geşedanê de seyreke bi rêk û pêk heye, yanî heya zarokek gixikan neke peyvan ji ziman dernaxîne û heya peyvan jî hîn nebe nikare hevokan saz bike. Ji vê tertîbê re *seyra geşedanê* tê gotin û ev rêz ne mimkûn e biguhere. Lê belê di geşedana zarokan de ji ber xisûsiyetên xwemalî yên zarokan bixwe, dibe ku bi lez an jî hêdî be. Dibe ku hin zarok

<sup>21</sup> Yavuzer, h.b, r. 28.

<sup>22</sup> Pınar San Bayhan – İsmihan Artan, *Çocuk Gelişimi ve Eğitimi*, Morpa, İstanbul, r. 9.

<sup>23</sup> Bayhan – Artan, h.b, r. 10.

<sup>24</sup> Kelhor, *Geşekirdinî Mindal*, r. 21.

di yek saliya xwe de diranan derxînin, hin ji wan di sal û nivê de an jî wd.<sup>25</sup> Wekî din di geşedanê de hin rêgez hene ku di piraniya kesan de li gor wan rêgezan pêk tên. Ji van rêgezan ên bingeîn wiha tên senifandin:<sup>26</sup>

- a) Geşedan hem di bin tesîra irsiyetê hem jî di bin tesîra derdorê de ye.
- b) Ji ber ku di geşedanê de taybetiyên irsî û yên derdora ku jiyan tê de pêk tê cuda ne, cudahiyên şexsî derdikevin holê. Ango di heman salî de di heman heyamên geşedanê de dibe ku di du zarokên cuda de heman geşedan pêk neyên.
- c) Geşedan di qadên cuda de bi lezên cuda pêk tên. Di qadên wek ziman, zêhn û fizîkî de lez û bezên cuda mewzûbahîs in.
- d) Di geşedanê de tesîra derdorê dema ku geşedan bi lez be zêde ye gava ku hêdî be kêma e.
- e) Di geşedanê de rêzek heye:
  - 1) Geşedan ji serî ber bi lingan ve ye.
  - 2) Geşedan ji hundur ber bi derve ve ye.
  - 3) Geşedan ji xwerû ber bi têkel ve ye.<sup>27</sup>
- f) Di geşedanê de berdewamî heye.
- g) Leza geşedanê di her temenî de wek hev nîne.
- h) Geşedan bi hemû qadên xwe ve yekpare ye. Kêmasî û astengiya di qadeke din de tesîrê li qada din dike.

Geşedaneke tam û li rê, li gor van prensîban pêk tê. Lê dîsa jî her gav tesîra irsiyetê û nexasim a derdorê di ciyawazî û guherînan de rolên sereke digirin.

Di geşedanê de li gor pêşketin û mezinbûna mirovan heyamên wê hene. Her heyam kêma û zêde ango hin zarokên awarte ne tê de li gor xwe geşedaneke sistematîk û standart heye û ev yek jî ne halê awarte bin, di hemû zarokan de wisa ye. Geşedan gelek caran piştî jidayikbûnê dihat hesibandin û dabeşkirin jî wisa çê dibû, lê êdî em dibînin ku bi taybetî van salên dawîn heyama berî zayînê jî dixin nav heyamên geşedanê.<sup>28</sup>

Geşedana dema pitikayî û zarokatiyê di jiyana mirovî de sefheyên herî girîng in bo tekamula wan. Çimkî ev heyam dê tesîrên xwe heya mirina mirovan bidomînin. Yanî di heyama geşedana ziman de heger mirov tûşî neçarî û qelsiyekê were, ew ê tesîra xwe heya heyayê bidomîne. Ji ber vê jî ev çax wek çaxên zêrîn tên qebûlkirin û di van heyaman de serdemên krîtîk jî çê dibin ku di vî warî de Pertev wiha dibêje: “Di geşedan û mezinbûna mirovan de hin sefhe gelek girîng in. Ev “sefheyên hesas (krîtîk)” in. Dewra pitikayî û zarokatiya pêşî yanî salên heta 5an dewrên hesas in. Eger di van

<sup>25</sup> Yavuzer, *Çocuk Psikolojisi*, r. 28.

<sup>26</sup> Bayhan – Artan, *Çocuk Gelişimi ve Eğitimi*, r. 13-14.

<sup>27</sup> Ramazan Pertev rêza geşedanê bi vî şiklî vedibêje: Bnr. Pertev, *Zarok û Çîrok*, r. 23.

<sup>28</sup> Yavuzer, *Çocuk Psikolojisi*, r. 28.

deman de kêmasî û mehrûmiyet hebin dê bibin sedema paşdemayînên mayînde û bêtelaflî.”<sup>29</sup>

Senifandina heyamên geşedanê kême û zêde di çavkaniyan de wek hev in. Me jî di vê xebata xwe de li gor sê-çar çavkaniyên li ber destên xwe tesnîfeke wiha derxist holê:

**Tablo 1: Tabloya Heyamên Geşedanê**<sup>30</sup>

Temen	Heyam	Geşedanên Bingehîn			
	<b>Heyama Prenatal/Berî Zayînê</b>	-Çêbûna dirûvê laşê sereke û endamên laşî. -Heyama leztirîn mezinbûna fizîkî ye. -Li dij pêkarên derdorê hasasiyet pir zêde ye.			
		Aqil/mane	Pêwendî	Ziman	Motorîk
<b>1 Mehî</b>	<b>Z</b>	-Deng û bêhna dêya xwe nas dike.	-Ji hemezkirinê hez dike. -Hewl dide ku bibîne.	-Qêrîn û dengên bêhest derdikevin.	-Refleksên livane dest pê dike. -Tiliyên xwe dimije.
	<b>A</b>				
<b>2 Mehî</b>	<b>R</b>	-Rûyê dêya xwe nas dike.	-Dibişire. -Reaksiyonan şanî dangan dide. -Bi deng bersivan dide.	-Dest bi miremirê dike. -Guh dide muzîkê.	-Dest û lingên xwe dilivîne. -Serê xwe heta 20-30° ber bi zîkê xwe ve radike.
	<b>O</b>				
	<b>K</b>				
<b>4 Mehî</b>	<b>A</b>	-Tişt û kesan nas dike. -Tiştan bi destan diceribîne.	-Bi kêf reaksiyonê şanî lîstokan dide.	-Hewl dide ku ziman lalote-lasayî (texlît) bike. -Li ser dengê xweş û dengê bihêrs reaksiyonê şanî dide.	-Dikare serê xwe bilind bigire. -Tiştên ku meriv dide destê wî dikare bigire. -Serê xwe ber bi kesên ku dipeyivin dizivirîne.
	<b>N</b>				
	<b>Û</b>				
	<b>Z</b>				
	<b>A</b>				
	<b>Y</b>				

<sup>29</sup> Pertev, *Zarok û Çîrok*, r. 30.

<sup>30</sup> Heyamên di vê tabloyê de jî nûzabûnê bigire heya sê saliya zarokê jî xebata Kızılhan hatiye girtin, bnr. İlhan Kızılhan, *Fêrbûn*, r. 12-13. Heyamên berî zayînê û heyama zarokatiya pêşî jî ji xebata hevpar a Bayhan û Artan hatiye girtin, bnr. Pınar San Bayhan – İsmihan Artan, *Çocuk Gelişimi ve Eğitimi*, r. 15. Me di vê tabloyê de cih neda heyama dibistanê û heyama balıxbûnê. Lewra heyamên ku xebata me zêdetir eleqedar dikin ên di tabloyê de ne. Ji bo ku hûn jî wan her du heyaman jî agahdar bibin hûn dikarin serî li vê çavkaniyê bidin. Bnr. Pınar San Bayhan – İsmihan Artan, *Çocuk Gelişimi ve Eğitimi*, r. 15.

6 Mehî	Î	-Ji bo naskirina tiştan her du destan bi kar tîne. -Bi kevçî û tasê dilîze.	-Gava bixwaze bê hilgirtin, nîşane pê dide. -Bi mimîkan dikare rewşa xwe nîşan bide. -Bi livgerî silav dide kesên ku li wî dinêrin. mînak: dayik	-Hewl dide ku deng, kîte û awazên cuda derxe.	-Hîn dibe ku bê alîkarî rûne. -Tiştan bi her du destan digire.
	Û				
	Z				
	A				
9 Mehî	R	-Reaksiyon li ser sûretê xwe yê di neynikê de şanî dide. -Tiştên ku meriv ji ber çavên wî vedişêre, dibîne.	-Dikare dilovanî, lêbelê tirsê jî şanî bide. -Çav li kesên nas digerîne da ku xwe li hawirdora nenas bi hestên xwe bi cih bike.	-Mirinî dike. -Reaksiyonê li ser banga navê xwe şanî dide. -Dibêje “dayê” û “bavo”.	-Destpêka şêweyên livandinê: rûniştin, xijbûn û kaşbûn.
	O				
	K				
	A				
12 Mehî	T	-Ji listina veşartokê hez dike. -Bikêrhatina tiştan têdigihîje; carinan tiştan bi zanebûn ji destê xwe berdide. -Dikare bibîne û nas bike.	-Hereketên kesên din, lasayî dike. -Dikare çepikan lê bide.	-Dest bi axaftina peyvên zelal dike.	-Dikare rabe ser pêyan, dest bi meşê dike. -Ji du sandoqan bircan ava dike. -Dest pê dike ku bi pênuşê xêzikan çê bike.
	I				
	Y				
	A				
18 Mehî	L	-Xwe di neynikê de nas dike. -Tiştan wek figurên listikê bi kar tîne.	-Silav dide kesên nêzîk û wan nas dike. -Destpêka helwestên rikoyîbûnê ye.	-Gencîneya bêjeyan digihîje 20 peyvan.	-Ji xwe ewle dimeşe. -Alîkariya jixwekirin û lixwekirina kincan dike.
	Î				
	K				
24 Mehî	Ê	-Dest bi lihevanîna	-Bi zarokên din re dilîze.	-Gencîneya bêjeyan bi lez	-Dikare xwe biçemîne, li



	<b>0-3</b> <b>S</b> <b>A</b>	xaçerêzê dike. -Fantaziyan şanî dide. -Şekil û rengan dixê rêzê.	-Destpêka serxwebûna ji dê û bav.	zêde dibe. -Hewl dide ku bûyeran vebêje. -Hevokên bi 3 peyvên bi kar tîne.	ser pêçiyên raweste, berepaş bimeşe, hilkişe ser pêpelûkan. -Hildikişe, baz dide, li gogê dixê.
<b>3 Salî</b>	<b>L</b> <b>Î</b>	-Lîstokên mekanîk bala wî dikişînin. -Bi peydakirina lîstokên xeyalî afirîner e.	-Ger şaşitiyekê bike, hestên tawanbariyê şanî dide. -Dihêle ku kesên din tevil lîstokên wî bibin.	-Stranan dibêje, qafiyeyan çê dike. -Hevokên rast tîne ziman. -Gencîneya Bêjeyan nêzîkî 300 peyv in.	-Bisiklêtê dajo. -Dipengize ser lingekî. -Dikare rûpelan bizîvirîne.
<b>3-6 Salî</b>	<b>Heyama Zaroktiya Pêşî</b>	-Her çiqas bala wî çûbe ser zarokên din jî dîsa malbat di navenda têkiliyên wî de ye. -Qabiliyetên motor ên stûr û zirav bi pêş dikevin û hêz zêde dibe. -Serxwebûn, kontrola şexsî û lixwemiqatebûn zêde dibe. -Lîstik, afirînerî û xeyalkirin berfirehtir û kûrtir dibe. -Kamilbûna zêhnî dibe sedema peydabûna fikrên derî mantiqê. -Tevger zêdetir egosantrîk(xwebîn) in, lê têkiliyên bi mirovên din re zêde dibin.			

## 2. Ziman

Ziman ji berê de ye ku bûye mijara gelek zanyar û lêkolîneran. Piştî ku têkiliya ziman û hebûnê di qada netewetiyê de hatiye fêhmkirin, xebat zêdetir li ser ziman çê bûne. Xebat, her çûne ketine nav qadeke zanistî û di wan xebatan de têkiliya ziman, fikir û qadên din ên geşedana zarokan hatine vekolan.

Ji pirsê ziman re Sedewallah pênaseyêke wiha kiriye: “Ziman ew arîkar e ku rêyêke têgehiştinê di navbera hemî civakan de peyda dike. Ziman diyardeyêke civakî ye, zarok bi çavlêkirinê fêrî zimanê dayîk û bavên dibe.”<sup>31</sup> Ji vê pênaseyê re Pertev di xebata xwe de dibêje ku pênaseyêke betal e.<sup>32</sup> Pênaseya çawaniya fêrbûna ziman a Fuller dide û li ser vê yekê raya xwe tîne ziman. Li gor wî zarok ne mîna mezinan e û

<sup>31</sup> Nihad Sedewallah, *Dê Çewa Zimanê Zarokî Pêş Êxîn?*, r. 21.

<sup>32</sup> Bnr. Pertev, *Zarok û Çirok*, r. 55.

wek teybekê nînin. Bawerî bi mekanîzmeyeke xurt û li rê tîne û ji ber vê jî ji Montessorî wiha neqil dike:

“Zarok bi awayê mezinan hînê ziman nabin. Mirovekî gihaştî dema bixwaze zimanekî dî hîn bibe, bi tevahî zanyarî û agahîyên xwe hewl dide û gelek zehmetiyan dikişîne. Lê di zarokan de jixwe ev zanyarî û agahî nînin ku arîkariya wan bigrin. Yanî mekenîzmaya wan a qezenckirina ziman bêhemdê xwe digere û rastî zehmetî û diwariyan nayête...”<sup>33</sup>

Li gor Brunerî ziman amûreke ji bo avakirina tîkiliyan e û ji hêleke din ve jî amûreke bandorhiştin, birêvebirin û rênîşandana kesên li derveyê xwe ye.<sup>34</sup> Corballis jî di pênaseya ziman de bal kişandiye ser amûrbûna ziman a şayesandinê û gotiye: “Ziman amûreke taybet e ku ji bo şayesandina cih û war, mirov, obje, bûyer û hetta fikr û hestan hatiye afirandin.”<sup>35</sup> Ziman piranî wek amûreke sazker a tîkiliyê hatiye dîtin û ji ber wê jî pişporan di pênaseyan de ev aliyê ziman derxistine pêş. Ji bilî vê yekê yên ku di rêxistin û afirandina fikran de roleke mezin dane ziman jî hene. Her wiha ziman xwenasîn û derdornasînê de jî tesîreke xwe ya girîng hebûye ku ji ber vê ye dibêjin ziman bingeha hebûnê ye.<sup>36</sup>

## 2.1. Xîmê Ziman

Ziman sîstemeke tevlihev û pîralî ye û her ziman xwedî hin taybetiyên xweser û xwedî dengên ciyawaz in. Wek sîstematîkekê ziman ji hêla Bloom û Lahey ve li ser sê qadan hatiye dabeşkirin:<sup>37</sup>

Qada yekem ji aliyê **şiklî** ye ku ev jî aliyê rêzimanî yê ziman dide nîşanê me ango gotin ji aliyê şiklî ve li gor deng, bêje û hevokan dikarin bîn pênasekirin. Qada duyem jî **naverok** e. Yanî manebarkirina bêje û hevokan e ku ew ji me re qala obje, bûyer û tîkiliyên di navbera wan de dikin an jî bi awayekî din naveroka ziman, zanîna mirovî ya derbarê alemê de nîşan dide. Qada sêyem **bikaranîna** ziman e. Di nav civakê de bikaranîna ziman ji bo ragihandinê.

<sup>33</sup> Pertev, h.b, r. 56.

<sup>34</sup> Ebru Kerem, *Okul Öncesi Dönemde Fonolojik Duyarlılık ve Gelişimi, Okul Öncesi Eğitimde Güncel Konular*, Morpa Kültür Yayınları, İstanbul, 2005, r. 229–245. Vgz. Arife Çat Şahin, *Okul Öncesi Eğitim Kurumuna Devam Eden 5-6 Yaş Grubu Çocukların Dil Gelişimi İle Annelerin Okuma İlgisi ve Alışkanlıkları Arasındaki İlişkinin Çeşitli Değişkenler Açısından İncelenmesi*, Abant İzzet Baysal Üniversitesi- Sosyal Bilimler Enstitüsü, Teza Mastira Bilind a Çapnebûyî, 2009, r.8.

<sup>35</sup> Corballis Michael C, *İsaretten Konusmaya. Dilin Kökeni ve Gelişimi*, Kitap Yayınevi, İstanbul, 2003, r. 12. Vgz. Arife Çat Şahin, h.c.

<sup>36</sup> Emine Kızıldaş, *Okul Öncesi Eğitimde Uygulanan Aile Katılım Çalışmalarının 5-6 Yaş Grubu Çocukların Dil Becerilerinin Gelişimine Etkisi*, Atatürk Üniversitesi-Sosyal Bilimler Enstitüsü, Teza Mastira Bilind a Çapnebûyî, 2009, r. 10.

<sup>37</sup> Bayhan –Artan, *Çocuk Gelişimi ve Eğitimi*, r. 126-127.

Her wiha ziman ji aliyê şikl û vegotinê ve li ser pênc xîman ava dibe:

*Fonoloji (dengnasî)*, deng û taybetiyên dengên wî zimanî rave dike. Qaîdeyên hevahengiya dengên didamezirîne ango sîstema ku kîjan deng dikarin bên li bal hev, ava dike.

*Morfoloji (teşenasî)*, rayek û pêvekên di ziman de li gor vê tînê durustkirin. Bi çawanî û kişandina wan re eleqedar e.

*Sentaks (hevoksazî)*, ji aliyê bêjeyan ve sîstema qaîdeyên avakirina hevokê ye. Ev qaîdeyên li ser rêza bêjeyan, cureyên hevokan û tîkiliya bêjeyan radiwestin. Pertev ji bo vê beşê mînakê daye û gotiye: “ne ku ‘mase li ser qelem e.’, ‘qelem li ser maseyê ye.’”<sup>38</sup>

*Semantîk (watenasî)*, bêje an jî tîkiliyên di navbera bêjeyan de zanyarî û peyama ziman dide. Li gor Pertev: “yanî tîgiştin, fehmkirin. Tîştên gilover û şêrîn ‘şekir’ in.”<sup>39</sup>

*Pragmatîk (Bikaranîna ziman)*: Bikaranîna ziman a ji bo ragihandinê û qaîdeyên wê di vê binbeşê de ne. Wek “xwestin, pirsîn, dijderketin, henekkirin, guhdarîkirin, qedandina axaftinê û hwd.”<sup>40</sup>

## 2.2. Rola Ziman di Jiyana Mirovan de

Li gor zanyaran di pêşketina mirovahiyê de peywirên girîng ên ziman hene. Li gor Aral hin rolên girîng ên ziman ji hêla Şahin ve wiha hatine neqilîkirin:<sup>41</sup>

- a) Ziman arezû û xwestekan vedibêje.
- b) Ziman hest û kelecana mirovî jî eşkere dike.
- c) Ziman rewşa objeyan û bûyeran rave dike.
- d) Ziman îşaretek e bo domandina axaftinê.
- e) Amûrê herî muhîm ê ziman axaftin e û ziman materyalên xwe bixwe çê dike.

Ji bilî Aral di xebateke xwe ya li ser ziman de Sedewallah jî li ser rola ziman radiweste. Li gor wî, ziman roleke girîng heye di jiyana her kesekî de û di nav her civakê de. Egerên xwe jî wiha rêz dike:<sup>42</sup>

- a) Amûrê sereke yê durustkirinê û pêkanîna mirovî ye. Bi rêya zimanî mirov dikare werarê bixwe di kesayetiyê xwe de.

<sup>38</sup> Pertev, *Zarok û Çîrok*, r. 55.

<sup>39</sup> Bnr. Pertev, h.c.

<sup>40</sup> Bnr. Pertev, h.c.

<sup>41</sup> Neriman Aral, Baran Gülen, Senay Bulut, Serap Çimen, *Çocuk Gelisimi I*, YA-PA Yayınları, İstanbul, 2000, r. 129–137. Vgz. Arife Çat Şahin, *Okul Öncesi Eğitim Kurumuna Devam Eden 5-6 Yaş Gurubu Çocukların Dil Gelişimi İle Annelerin Okuma İlgisi ve Alışkanlıkları Arasındaki İlişkinin Çeşitli Değişkenler Açısından İncelenmesi*, r. 9-10.

<sup>42</sup> Sedewallah, *Dê Çewa Zimanê Zarokî Pêş Êxîn?*, r. 21-22.

- b) Bi zimanî mirov dikare t kel  di gel j ngeh   civak  xwe bike, bi ziman  mirov d  bibe kesek  civak .
- c) Bi ziman  mirov dikare p zan nan wergire   bi dest  xwe ve j  bixe.
- d) Bi ziman  mirov dikare rew  n   t talan werbigire.
- e) Ziman wek navpijvanek  gir dana civak  bi  aristaniyeta w  ve t  hesibandin ku berztir n am reya yekgirtina civak  ye.
- f) Ziman yek ji bingeh n sereke ye di yekgirtina netewey    parastina  and   rew  nb riya civak  de.
- g) Ziman ew kereste ye ku mirov dizane kan   i li gel xelk  heye   d   i bide xelk .

### 2.3. N r n n li Ser Ziman   Ge edana W 

 end n r n   ekol n sereke y n ku ziman p nase kirine   li ser binyad   ge edana w  ser  xwe   andine hene. Teor syen n her  navdar  n van ekolan wek  Noam Chomsky, Jean Piaget   L.S. Vygostky ne. Ji bil  van kesan  n wek Skinner, Brunner   Hill j  n r n n xwe y n li ser ge edana ziman vegotine.

N r na ps kol ngu st k ku z detir bi Chomsky t  zan n di heb n   ge edana ziman de p kara b yolojik bingeh dib ne. Li gor  v  n r n , zarok dema ku t  din  di ber qabiliyet n xwe y n din re programeke hey  ya ziman j  di xwe de dihew ne. L  tes ra derdor  ya ziman j   nkar nakin. Li gor wan derdor, tes r  li ser zarokan wiha dike; d  k jan ziman    k jan peyv n bi kar b ne.<sup>43</sup> Li gor Chomsky, zarok li k jan derdor  bin, di bin k jan  ert   mercan de bin, gava ku kesek  ax ver li derdor  zarokan hebe, ew zarok d  f r  axaftin  bibin.<sup>44</sup> Ji bil  v  qabiliyeta ziman a ku di zarokan de heye Chomsky di ib ne qabiliyeta z hn    mej  ya ku bir ve un  f r  zarokan dike. Ji ber w  dib je, heke pirsgir keke zarok a mej  tunebe ew d  f r  ziman j  bibe.<sup>45</sup> Yan  dema ku zarok t  din , mejiy  w  wek r peleke paqij   sp  n ne. Zarok  ku ziman  xwe y  dayik  bikaribe baxive, h   erwerde nebe j  ziman  xwe li gor qa dey n deng, mane   sentaksa hevok , dikare bi kar b ne. L  bel  dibe ku haya w  ji van qa deyan tunebe.<sup>46</sup> Chomsky mejiy  meym nan   mirovan dat ne ber hev   di mejiy  meym nan de heb na qada

<sup>43</sup> DoĖan C celoĖlu, * imizdeki  ocuk*, Remzi Kitapevi, İstanbul,  . 44, 2012, r. 211- 212.

<sup>44</sup> Arife  at  ahin, *Okul  ncesi EĖitim Kurumuna Devam Eden 5-6 Ya  Gurubu  ocukların Dil Geli imi  le Annelerin Okuma İlgi ve Alı kanlıkları Arasındaki İli kinin  e itli DeĖi kenler A ısından İncelenmesi*, r. 18.

<sup>45</sup> Song l Damarlı O ak, *Dil Geli imi ile Okuma ve Yazma Arasındaki İli ki*, Teza Mastira Bilind a  apneb y , 2007, r.16.

<sup>46</sup> Kızılda , *Okul  ncesi EĖitimde Uygulanan Aile Katılım  alı malarının 5-6 Ya  Grubu  ocukların Dil Becerilerinin Geli imine Etkisi*, r. 10.

hîsê û tevgerê dîtiye û di yê mirovan de jî ji bilî van her du qadan, qada axaftinê, binavkirina şiklan û têgihiştina ziman, xwendin û nivîsandinê kifş kiriye.<sup>47</sup>

Nêrîna sosyolingûstîk an jî pragmatîk ku zêdetir bi Vygotsky tê zanîn tesîra civak û komaleyetiye ya li ser ziman vedikole. Li gor vê nêrînê zarok ji bo ku bikeve nav civakê û bibe perçeyek ji civakê, ziman fêr dibe. Li gor Vygotsky jî çavkaniya pêkarên ziman ên wek têgeh, fikir, qabiliyet û helwest derdor e.<sup>48</sup> Îdiayeke din a vê nêrînê ew e ku zarok bi rêya texlît û çavdêriyê fêrî axaftinê dibin. Yanî kesên li derdora zarokan ji wan re dibin model û zarok jî wan modelan texlît dikin. Her wiha cudahiyên devokî yên di nav ziman de jî bi vê rêyê rave dikin.<sup>49</sup> Li gor Vygotsky ‘fikir’ bi peyvan çê dibe. Çawa ku peyvek ji fikirê dûr be, ew mirî tê hesibandin wisa jî fikreke ku bi peyvan şênber nebe jî, ji sîbereke derewîn pêştir tiştêk nîne.<sup>50</sup> Ji ber wî jî ew dîsa dibêje ne kifş e ka bi tenê serê xwe xwezaya maneyê çî ye? Lê cihê ku fikir û axaftin wek “fikra devkî” tèn bal hev, maneya peyvan bixwe ye.<sup>51</sup> Peyv bi tenê ji bo pêşketina fikran nînin. Di firehbûn û mezinbûna hişmendiyê de jî roleke sereke digirin û peyvek, mîkrokozmosêke hişmediya mirovî ye.<sup>52</sup> Yek ji gotinên Vygotsky jî “hundurîn” e. Li gor vê, zarok ji mezinan gotinan dibihîzin û vê yekê dubare dikin, piştî bi alîkariya qabiliyetên zêhnî, ziman fêr dibin. Ji bo ku ev pêvajoyê bêtir ku bilikume û wisa bidome divê zarok hetmen bi derdora xwe re di têkiliyê de be.<sup>53</sup> Vygotsky têgeh û bêjeyê ji hev cuda dike û dibêje zarok pêşî têgehê bi dest dixê. Piştî bi alîkariya kesên ku ziman baş diaxivin, ji bo wan têgehê, di nav civakê de nav û etîketên herî guncav dibîne û bi dest dixê.<sup>54</sup> Di nêrîna Vygotsky a li ser ziman de xaleke girîng jî zimanê vegotinê ‘zimanê represîf’<sup>55</sup> e. Ji bo bikaranîna zimanê represîf zarok bi derdora xwe re dikeve têkiliyê. Zarok di lîstikên xwe de xwebixwe dipeyivin û xwe bi rê ve dibin û qala lîstika

<sup>47</sup> Gülten Ülgen, *Eğitim Psikolojisi Birey ve Öğrenme*, Bilim Yayınları, Ankara, 1995, vgz. Gülay Temiz, *Okul Öncesi Eğitimin Çocuğun Dil Gelişimine Olan Etkisi*, Selçuk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Teza Mastira Bilind a Çapnebûyî, 2002, r. 16.

<sup>48</sup> Aysegül Turan, *Sevgi Dili Konusan Çocuklar*, Sistem Yayınları, İstanbul, r.10. Vgz. Arife Çat Şahin, *Okul Öncesi Eğitim Kurumuna Devam Eden 5-6 Yaş Gurubu Çocukların Dil Gelişimi İle Annelerin Okuma İlgisi ve Alışkanlıkları Arasındaki İlişkinin Çeşitli Değişkenler Açısından İncelenmesi*, r. 18.

<sup>49</sup> Şahin, h.b, r. 19.

<sup>50</sup> L.S. Vygotsky, *Düşünce ve Dil*, wer. S. Koray, Toplumsal Dönüşüm Yayınları, İstanbul, 1998, r. 216.

<sup>51</sup> Vygotsky, h.b, r. 22.

<sup>52</sup> H.b, r. 216.

<sup>53</sup> Oçak, *Dil Gelişimi ile Okuma ve Yazma Arasındaki İlişki*, r. 13.

<sup>54</sup> Kızıldaş, *Okul Öncesi Eğitimde Uygulanan Aile Katılım Çalışmalarının 5-6 Yaş Grubu Çocukların Dil Becerilerinin Gelişimine Etkisi*, r. 12.

<sup>55</sup> Zimanê represîf ew e ku mirov îfadeyên xwe bîne der. Bi awayekî din em dikarin bibêjin axaftin e.

xwe dikin.<sup>56</sup> Zarok piştî ku xwebixwe diaxive ew tesîrê li zimanê wî yê represîf jî dike û bi vê yekê re têkiliyên wî bi derdorên wî re hêsantir dibe.

Nêrîna din jî ya Piaget ye ku li gor wî ziman bi hevkarîgeriya irsiyet û derdorê pêk tê. Zarok dema ku tê dinê qabiliyeta ziman di xwe de dihewîne û piştî wî hewcedariya bikaranîna ziman dike.<sup>57</sup> Li gor Piaget ziman asta zanîna mirovan dide nîşan ango mirov ji aliyê zêhna xwe çiqas pêşketî û amade be, ziman jî hew qas bi pêş dikeve.<sup>58</sup> Piaget dibêje ku di navbera ziman û fikrê de têkiliyeke muhîm heye. Ew her du tesîrê li hev dikin. Geşedana ziman encameke xwezayî ya geşedana zêhnî ye ku êdî hatiye gihiştîye wê astê.<sup>59</sup>

#### **2.4. Serdemên Geşedana Ziman (0-6 salî)**

Geşedana ziman a zarokan li gor gelek zanyaran ji dema ku zarok tê dinyayê heya şeş saliya wan kêr û zêde digihije merheleyeke mezin. Ango ziman heya wê demê îskeleta xwe ava dike û piştê her ku diçe li gor temen, geşedana zêhnî û pêkarên din dewlemend dibe, lê binyada xwe di nav wan salên diyarkirî de ava dike.<sup>60</sup> Di navbera van salan de dabeşkirineke standart ya li gor her kesî tune. Hin kes wek heyama beriya bidestxistina ziman (prelîngûstîk) û heyama pêşdibistanê dikin du beş û geşedana ziman a zarokan didine nîşan.<sup>61</sup> Hin kes jî “heyama berî axaftinê”, “heyama yek peyvî”, “heyama dupeyvî” û “heyama axaftina li gor qaîdeyên rêzimanê”, dikin çar beş.<sup>62</sup> Em ê di vê xebatê de van her du dabeşkirinan jî referans bigirin. Lêbelê em ê dazanîn û agahiyên geşedana ziman a zarokan a di navbera (0-6) saliyê de li gor çend berheman têkilhev û zêdetir kîjan li gor zarokên kurd guncavtir be wê referans nîşan bidin û ji destpêkê heya dawiyê ka zarok ji hêla ziman ve çawa pêş dikeve, bi awayekî berfireh vebêjin.

**0-2 Mehî (Nûzayî):** Pitika nûzayî dema ku digirî û dike nirenir pratîkeke axaftinê ya ziman dike. Bêhngirtinên kurt û kûr, bêhndayînen dirêj bingeha axaftinê amade dike. Di wextê girînê de derfeta hereketkirina lêv, çene û ziman di zarokan de çê dibe û ev jî dibe sebeb ku sîstema deng û bêhvedanê durust bibe.<sup>63</sup> Girînên eşkere û yên xef di vê heyamê de ji hev cuda dibin. Ango girînên refleksîf an jî girînên ji bo daxwaza

<sup>56</sup> Bayhan – Artan, *Çocuk Gelişimi ve Eğitimi*, r. 124.

<sup>57</sup> H.b, r. 123.

<sup>58</sup> Temiz, *Okul Öncesi Eğitiminin Çocuğun Dil Gelişimine Olan Etkisi*, r.18.

<sup>59</sup> Kızıldaş, *Okul Öncesi Eğitimde Uygulanan Aile Katılım Çalışmalarının 5-6 Yaş Grubu Çocukların Dil Becerilerinin Gelişimine Etkisi*, r. 11.

<sup>60</sup> Ji bo vê nêrînê bnr. Pertev, *Zarok û Çirok*, r. 53 û bnr. Kelhor, *Geşekirdinî Mindal*, r.129-134.

<sup>61</sup> Bnr. Pertev, *Zarok û Çirok*, r. 53.

<sup>62</sup> Bnr. Bayhan – Artan, *Çocuk Gelişimi ve Eğitimi*, r. 128-138.

<sup>63</sup> Haluk Yavuzer, *Çocuğunuzun İlk 6 Yılı*, Remzi Kitabevi, ç. 28, İstanbul, 2012, r. 23.

tişteki weki (birçiti û eş).<sup>64</sup> Dema ku dengê aram ê nêzîki zarokan biçe wan an jî dengê dirêj ê wek gêziya ceyranê bibihîze, girîna wan tê birîn. Lê bi şertê ku wextê xwarinê nebe. Weki din zarok bala xwe didin dengê cimaata di nav de ne û guhê xwe didin dengê dayîk û pîra xwe û dikin bixebix ku ev jî amedehiya ji bo axaftinê ye. Heke nerehet bin an jî birçî bin bi tundî digirîn.<sup>65</sup> Pitik ji zayîna xwe heya du mehan dengên wek girî, qulpik, kuxik, bawîşk û hwd. derdixînin. Ev yek pratîkên refleksiîf ên yekem in ji bo ziman. Hindî ku pitik mezin dibe ser û stûyê wî diguhere û bawêşneka deng berfireh dibe.<sup>66</sup>

**2-4 Mehî (Heyama Gixikan/Cooing):** Dengên tîpên bideng ên wek *a, o, u* tîpên dirêjkirin. Piştê di dawiya van dangan de dengên wek *h, k, g* tîpên gotin. Wextê derxistina dengên qirikê ne.<sup>67</sup> Girîna her diçe hindiktir û siviktir dibe. Zarok wek qumriyan deng derdixîne û dike wîrewîr. Ev deng, ne ew dengên fêrbûyî ne û di bin tesîra tişteki de jî namînin. Bi awayekî xwezayî van dangan derdixîne.<sup>68</sup> Dema ku dê xwarinê bixwe, gelek caran lêva xwe wek ‘mêtin û alastin’ê bi kar tîne. Bi dengên ku nêzîki wî dibe wek dengê pê, ava rewan a di serşokê de û hwd. kelecane digire.<sup>69</sup>

**4-6 Mehî (Heyama Gixikan/Babbling):** Bi zêdebûna kontrola ziman re dengên bideng û yê bîdeng zêde derdixin û dubare dikin. Ev deng bi wan xweş tê. Dengên ku bi alîkariya lêvan çê dibin wek *p, b, m* jî hêdî hêdî ji zimanê zarokan derdikevin.<sup>70</sup> Zarokên vê heyamê dest bi kêtekirina dangan dikin. Ev deng di hemû zarokan de, yê kerr jî tê de heman deng in. Ji vê yekê re mekanîzmaya vokal tê gotin. Dê û bav çiqas zêde bi zarokên xwe re bipeyivin, zarok dê hewqas zêde dangan derxînin ev yek jî dê qabiliyeta kêtekirinê bi pêş bixe ku ew jî dibe bingeha axaftinê.<sup>71</sup> Dengên ahengîn ji bo xwe û yê derdorê xwe derdixin. Carinan kêteyên bêmane yê wek *ba, ma, ga, ad* ji dev derdixin. Di lîstikê de bi dengê bilind dikenin û diqîrin an jî bi tundî diqîjin dema ku hêrs dibin.<sup>72</sup> Heta şeş mehan pitik qabiliyeta wan heye ku dikarin ferqa di navbera zimanan de bibînin. Di vê merheleyê de bo axaftin û ragihandinê du helwestên girîng rê

<sup>64</sup> Bayhan – Artan, *Çocuk Gelişimi ve Eğitimi*, r. 130.

<sup>65</sup> Sheridan - Mary Dorothy, *Ruşdê Kudek*, wer. Tîbe Refîû-Efsane Selmanî Gîvî, Kîtabî Çetr, Qûm, H. 1388, M. 2009, r. 24-25.

<sup>66</sup> Perteve, *Zarok û Çîrok*, r. 53.

<sup>67</sup> Bayhan – Artan, *Çocuk Gelişimi ve Eğitimi*, r. 130-131.

<sup>68</sup> Yavuzer, *Çocuğunuzun İlk 6 Yılı*, r. 50.

<sup>69</sup> Sheridan - Dorothy, *Ruşdê Kudek*, r. 30-31.

<sup>70</sup> Bayhan – Artan, *Çocuk Gelişimi ve Eğitimi*, r. 131.

<sup>71</sup> Yavuzer, *Çocuğunuzun İlk 6 Yılı*, r. 63-64.

<sup>72</sup> Sheridan - Dorothy, *Ruşdê Kudek*, r. 37.

dide. Yek jê dengên kêfxweşiyê ne ku wek diqdiqîn û bişîrînê ye. Dengê din jî guxîn û êgixkirin e.<sup>73</sup>

**7-11 Mehî (Dubareya gixikan û texlîta dengên derdorê):** Dubarekirinên gixikan dîsa tê dîtîn û zarok êdî hem dengê ku derdixîne û yên ku dibihîze, bi hev têkildar dike. Zarok di vê heyamê de bi zanetî dengên mezinan teqlît dikan. Di vê heyamê de repertûara dengên kêm û zêde amade ye û êdî zarok bi dûv maneyan dikevin û ji bo fêrbûna zimanê xwe jî hazir in.<sup>74</sup> Di vê heyamê de fêhmkirin bi lez bi pêş dikeve û zarok bersiva ‘nexêr’ baş fêhm dikan. Di nav lîstikan de stran wan kelecânî dike. Dengên ajelan ên wek ‘mo, mîyew, hew’ dikarin texlît bikin.<sup>75</sup> Wextê ku navên xwe dibihîzin bertekê nîşan didin. Bêjeyên wek ‘na û belê’ fêhm dikan. Dema ku pirsên wek ‘Dêya te li ku derê ye? Bavê te li ku derê ye?’ tê pirsîn bertekê nîşan didin.<sup>76</sup> Di dora meha 11an de jî êdî bazarî devê mezinan dikan, her wiha texlîta peyvên wan dikan. Hin peyvên ku her gav liqayî wan tên, bertekê nîşan didin, çepikan lê didin û serê xwe dihejînin.<sup>77</sup>

**11-14 Mehî (Heyama Peyvên Nediya):** Di vê heyamê de kêteyên ku naşibin hev tên gotin. Peyvên nayên fêhmkirin. Ji vê axaftina ku nayê fêhmkirin re *jargon\** tê gotin.<sup>78</sup> Di vê heyamê de zarok bi mirovan re diaxifin û peyvên wan fêhm dikan. Lê mirov peyvên wan û daxwazên wan tam tênagihêje. Mirov dibêje qey zimanekî wan ê xisûsî heye. Piştî meha 12an yekemîn peyvên watedar ji zimanê zarokan derdikevin. Mesela carinan bi peyvekê qesta wan hevokek e. Dema ku dilê wan şîr xwest, di şûna “ez şîr dixwazim.” de tenê peyva “şîr” tê gotin û hwd.<sup>79</sup> Hin peyvên ku zêde pê re muxatab dibin, dizanin. Hin dîrektîfên ku bav û dayik didinê, fêhm dike. Bertekan nîşan dide hin helbest û stranên ku aşînayê wan in.<sup>80</sup> Zarok di vê heyamê de têdigehe. Têgihîştina zimanê ji bikaranîna wî re jî vedike. Gelek pitik ber bi dawiya yek saliya xwe peyvên bi kar tînin. Helbet ev ne wek bikaranîna peyvên mezinan e.<sup>81</sup>

<sup>73</sup> Pertev, *Zarok û Çîrok*, r. 53.

<sup>74</sup> Bayhan – Artan, *Çocuk Gelişimi ve Eğitimi*, r. 131.

<sup>75</sup> Yavuzer, *Çocuğunuzun İlk 6 Yılı*, r. 80.

<sup>76</sup> Sheridan - Dorothy, *Ruşdê Kudek*, r. 43-44.

<sup>77</sup> Pertev, *Zarok û Çîrok*, r. 54.

\* Di eslê xwe de jargon zimanekî hevpar ê kesên ku ji îdeolojiyekê, pişeyekê û hwd. in. Ev ziman dibe ku carinan ji derveyê wê komê ve neyê fêhmkirin jî. Bnr. <http://tr.wikipedia.org/wiki/Jargon> 30.09.2014. Îcar di vir de pênasekirina jargonê jî ji ber zimanekî hevpar ên hemû zarokên wê serdemê ne. Ev çiqas dê bê pejirandin jî mijara pişporên di vî warî de ye.

<sup>78</sup> Bayhan – Artan, *Çocuk Gelişimi ve Eğitimi*, r. 131.

<sup>79</sup> Yavuzer, *Çocuğunuzun İlk 6 Yılı*, r. 98-99.

<sup>80</sup> Sheridan - Dorothy, *Ruşdê Kudek*, r. 43-44.

<sup>81</sup> Pertev, *Zarok û Çîrok*, r. 54.



**12-18 Mehî (Hevokên Yekpeyvî):** Piraniya zarokan peyvên xwe yên yekem di van mehan de bi kar tînin. Lê belê ev wisa di carekê de peyda nabin û hêdî hêdî bi guhdarîkirinê heya ji aliyê fizîkî û hişî ve jî digihêjin wê astê, êdî peyv çê dibin. Yekem peyvên zarokan ew in ku ji derdora xwe bihîstine. Pêyvên yekem ên zarokan zêdetir ew peyvên ku nêzîkî wan in. Di tesîra çêbûna peyvan de hem amadebûna hişî hem jî amadebûna hestiyarî ya zarokan girîng e. Di vê heyamê de zarok peyvekê dikarin di şûna gelek heyînan de bi kar bînin. Mesela exlebî zarok pêşî fêrî peyva ‘kûçik-se’ dibin piştî ‘gur’ jî bibînin, ‘rovî’ jî bibînin di kategoriya ‘kûçik-se’ de dinirxînin. Heya ku zarok derdora xwe dinase û alema wan berfireh dibe, ev yek jî ji holê radibe.<sup>82</sup> Zarok di vê heyamê de di şûna hevokekê de peyvekê bi kar tîne. Lê di bikaranîna peyvan de dibe ku dîsa zarok zehmetiyan bikêşe. Çimkî di hin tîpan de hêj ew masûlkeyên ku wan tîpan derxîne, amade nebûne. Mesela herfên wek ‘r, ş’ di vê kategoriyê de ne. Di zarokên 15 mehî de xurcîkên peyvan piranî bi 10 peyvan dagirtî ne. Di 18 mehiya zarokan de peyvên di vê xurcîkê de dibin 30 an jî zêdetir.<sup>83</sup> Hin dengên derdixînin ku dişibe axaftinê. Tê dîtî ku her hefte peyvên nû fêr dibin. Hin dîrektîfên basît fêhm dikin.<sup>84</sup> Di axaftinê de peyvên ku zêdetir tê de ahengekê dibîhîzin, dubare dikin û her wiha di nav hevokekê de peyvên dawiyê û yên muhîm dubare dikin. Ji helbestên zarokan tahmê distînin û dixwazin beşdarê xwendina wan bibin. Dema ku mirov qala por, pê, poz û pêlavên wan bike, ew jî îşaret dikin.<sup>85</sup>

**18-30 Mehî (Hevokên Dupeyvî):** Di vê heyamê de zarok bi lez û bez fêrî peyvan dibin. Mîmkûn e ku di hefteyekê de nêzî 10-20 peyvan fêr bibin. Di dawiya vê heyamê de xurcîka peyvan ji 200 peyvê zêdetir tê dagirtin û êdî zarok dest bi axaftina du peyvî dike ku ji vê axaftinê re “*axaftina telgrafîk*” jî tê gotin. Piranî ev axaftin ji navekî û lêkerekê pêk tê û zarok hay ji qaîdeyên ziman nînin.<sup>86</sup> Di nav axaftina zarokan de hê jî rengê zimanê zarokane dixuye. Dibe ku carinan hin peyvên muhîm bo hevokekê ji bîr bikin û nebêjin. Carinan wextê ku zêde bi kelecana bin, lalbûn di zimanê wan de çê dibe. Lê ev rewş demborî ye.<sup>87</sup> Her dem pirsên wek “Çi, kî?” dipirsin û êdî di du sal û nîvê de cînavkên wek “ez, min” û hwd. rast bi kar tînin.<sup>88</sup> Hewl didin ku helbest û stranên zarokan bixwînin. Piştî vî temenî mamîkpirsîn dê mifayeke mezin bide zarokan

<sup>82</sup> Bayhan – Artan, *Çocuk Gelişimi ve Eğitimi*, r. 133-135.

<sup>83</sup> Yavuzer, *Çocuğunuzun İlk 6 Yılı*, r. 115-117.

<sup>84</sup> Sheridan - Dorothy, *Ruşdê Kudek*, r. 57.

<sup>85</sup> H.b, r. 64.

<sup>86</sup> Bayhan – Artan, *Çocuk Gelişimi ve Eğitimi*, r. 136.

<sup>87</sup> Yavuzer, *Çocuğunuzun İlk 6 Yılı*, r. 145.

<sup>88</sup> H.b, r. 159.

hem ji bo fonetîka ziman hem jî ji bo dewlemendkirina xurcika peyvan. Tahmê ji sohbetê digirin. Peyvên ku fêhm dikin ji yên ku bi kar tînin pirtir in. Her gav navê eşya û mirovan dipirsin. Hin wêneyên ku dinasin, bi nav dikin.<sup>89</sup> Navê xwe yê tam dizane. Endamên malbatê wek ên nûzayî, kal û pîr, xwişk û birayan dinasin. Bihîstina çîrokan û temaşekirina kitêbên bi wêne tahmê didin zarokan.<sup>90</sup> Berê navan dû re fiêl, sifet û zerfan bi kar tînin. Yanî zarok di nav nîzamekê de zimanê xwe fêr dibin.<sup>91</sup>

**3-5 Salî (Axaftina Li Gor Qaîdeyên Rêzimanê):** Di sê salî de zarok ji bo bikaranîna ziman kêm û zêde amade ne. Di xurcika wan a peyvan de nêzî 900 bêje hene. Di zarokan de hêdî hêdî mantiqa ‘dem’ê bi cih dibe. Êdî zarok dikare hevalnav, hoker û baneşanên pirsiyarî yên wî zimanî bi kar bînin, bi awayekî jî be sînorkirî ye. Di çar saliya xwe de zarok hevokên ku di nav wan de rewşên wek sedem-encam hebin dikarin saz bikin. Zarok dema ku di ragihandinê de hay ji valahiyekê çê bûn, hewl didin ku wê valahiyê dagirin, ji ber wê jî li dûv bêjeyan dikevin û bi vî awayî xurcika wan a bêjeyan firehtir dibe.<sup>92</sup> Di vê serdemê de axaftina zarokan zêdetir “egosentrîk” e. Ango di vê cureaxaftinê de bêyî ku kesekî derdora xwe hesab bike, xwebixwe daxive. Zarok êdî gihaneka “û”yê bi kar tîne. Dema borî, niha û bê fêhm dike û bi kar tîne.<sup>93</sup> Carinan di telafûzkirina hin bêjeyan de dibe ku zehmetî bikişînin. Navê xwe, zayenda xwe û carinan jî temenê xwe bi awayekî rast dikare bibêje. Heta dikare kar û barên borî, terîf bike. Pirsên wan ên ji meraqa wan hatine der zêde dibin. Ji çîrokan gelek hez dikin dixwazin dubare guhdarî bikin û helbestên zarokan ji ber dizanin û carinan dixwînin. Heya hejmara dehan dikarin bijmêrin lê hêj pîvanan ji hev dernaxînin.<sup>94</sup> Geşedana ziman di navbera salên 2 û 5an de zor bi lezûbez e. Gelek zimanzan û pedagog di wê baweriyê de ne ku zarok heya 4-5 saliya xwe museîdê fêrbûna zimanan in. Di 3-4,5 saliya xwe de nêzî 3500-5000 peyv dizanin û axaftina wan jî %90 tê fêhmkirin. Di 4,5-5 salî de jî êdî zarok bi rehetî û li gor qaîdeyên gramerê dikarin hevokan saz bikin û baxivin.<sup>95</sup>

Piştî van serdeman ziman êdî bi perwerdeya dibistanê û bi rola derdora zarokan rêya xwe ya geşedan û pêşketinê dibîne. Lê esas, bingeş û serdemên krîtîk ji bo hebûn

<sup>89</sup> Sheridan - Dorothy, *Ruşdê Kudek*, r. 70.

<sup>90</sup> H.b, r. 76-77.

<sup>91</sup> Pertev, *Zarok û Çîrok*, r. 54.

<sup>92</sup> Bayhan – Artan, *Çocuk Gelişimi ve Eğitimi*, r. 137-138.

<sup>93</sup> Yavuzer, *Çocuğunuzun İlk 6 Yılı*, r. 194.

<sup>94</sup> Sheridan - Dorothy, *Ruşdê Kudek*, r. 74-75.

<sup>95</sup> Pertev, *Zarok û Çîrok*, r. 54.

an nebûna ziman ev serdem in. Çimkî ev serdem, çi biyolîk û irsî çi jî tesîra pêkarên derdorê bin, amadekirina zarokan a ji bo ziman e.

### 3. Fêrkarî

Temamê jiyana mirovan di nav fêrkariyê de derbas dibe. Yanî fêrkarî pêvajoyeke herdemî ye. Ji ber vê jî Sedewallah dibêjê her ji peydabûna mirovî li ser rûyê erdê, bi perwerdeya mirovan re eleqedar bûne. Ji vê perwerdeyê mebest ew e ku mirov di nav civaka xwe de, bi xweşî jiyane bidomîne.<sup>96</sup> Di encama fêrkariyê de mirov hînî tevger, rabûn û rûniştinên nû dibe. Dibe ku hal û tewrên wî yên berê biguherin. Lê belê fêrkarî di her mirovî de jî cuda ye. Çimkî di fêrkariyê de pêkarên wek derdor, taybetiyên şexsî rolên girîng dilîzin. Ji ber wê jî her şexs li gor derdor, taybetiyên xwe yên şexsî û pêkarên hwd. fêrî hîn tiştên nû dibe an jî diguhere.<sup>97</sup> Wekî din di fêrkarî û perwerdeyê de du şaxên sereke hene, yek jê fêrbûn a din jî fêrkin e. Di eslê xwe de ev du rolên perwerdeyê ne ku li ser kesan ava dibin ango kesên ku fêr dibe û kesên ku fêr dike. Lê belê di vê pêvajoya fêrkariyê de hin rêbazên pedagojîk hene ku fêrkariyê hêsantir û sûdewertir dikin.<sup>98</sup>

#### 3.1. Rêbazên Pedagojîk ên Fêrkariyê

Di fêrkariyê de ji bo rê û rêçikên cuda rêbazên cuda derketine holê. Yanî naveroka tiştên ku mirov fêr bike standard be jî, rêyên ku mirov fêr bike pir in. Rêbazên fêrkariyê ji vê hêlê ve xwedî dewlemendiyeke mezin in. Rêbazên ku di mamikên kurdî de hatine bikaranîn bi awayekî giştî ev in:

**Divê Zarok di Navendê de be:** Di fêrkariyê de navend zarok e. Yanî di fêrkinê de divê esasên wek xwestek, eleqe, hevî, hewcedarî, temen, geşedana zêhnî û pêkarên din ên ku ji bo her zarokê cuda ne, bingeh bin.<sup>99</sup> Di mamikên kurdî de jî mamikên ku dê bi zarokan re bî parvekirin divê li gor vê qaîdeyê bin. Mesela ji bo zarokên sê-çar salî mînakdana mamikeke wiha dê ne di cih de be:

Li mam heye, li xal tune, li mal heye, li bal tune? [**tîpa “m”yê**], (Güneş. K, r. 92)

<sup>96</sup> Nihad Sedewallah, *Dê Çewa Serederî Li Gel Zarokê Xo Key..??*, Zana, Duhok, 2010, r. 10.

<sup>97</sup> Ali Murat Sünbül, *Öğretim İlke Ve Yöntemleri*, ç.5, Eğitim Akademi Yayınları, Konya, 2011, r. 20.

<sup>98</sup> H.c.

<sup>99</sup> <http://it.libu.edu.ba/assets/userfiles/tll/undergraduate/EDU%20440%20%20C3%96%20%20C4%9ERET%20%20C4%90M%20Y%20%20C3%96NTEM%20VE%20TEKN%20%20C4%B0KLER%20%20C4%B0%20WWW.pdf> *Öğretim İlkeleri, Kuram-Model ve Yaklaşımları*, 01.10.2014, 16: 57.

Çimkî ev mamik pîvana zanîna alfabayê dike ku zarok di wan salan de hêj nehatine wê heyamê ku alfabayê binasin. An jî hêj zarokên ku geşedana xwe ya zêhnî tamam nekiribin û mirov rabe ji wan mamikên mantiqî bipirse şaş e. Mînak:

Mamikê mino, mela bi jina xwe ve, keşe bi keça xwe ve, çûne bi dêrê ve, hatin sê ji wê ve. Çi ye? [**Jina mela keça keşe ye**], (Sadinî. M.X , r. 211)

Ji bo ku bersiva vê mamikê bê dayîn divê herî kêr zarok gihiştibe heyama kiryarên razber. Nexwe wekî din ne mimkun e ku hişê xwe bi tamamî bide ser vê. An jî zarokek ku li bajar mezin bûye û zarokek ku li gund mezin bûye ji hin hêlan ve ne wek hev in. Mesela ji hêla hin amûran ve cudahiyên wan hebe ango amûrên ku bajarî muxatab be û amûrên ku zarokên gundî muxatab bin, carinan ji hev nagirin. Wek mînak ji yekî bajarî pirsîna vê mamikê dibe ku ne di cih de be:

Çûme şikefteka tijî pêlav, êka wesa nebû bikime pê xo. [**Simên bizina**], (Berwarî. M, r. 42)

Ji zarokek gundî jî pirsîna vê mamikê dibe ku ne li gor alema wî be:

Hor hor e bor bor e, heba pûrtê lê tune. Ew çi ye? [**Trên**], (Baskın. M.Ş, r. 20)

**Ji Nêzîk Ber bi Dûr ve:** Di fêrkariyê de çi ji hêla civakî çi ji hêla xwezayî be divê mirov mînanan ji derdora zarok a nêzîk ber bi dûr ve bide. Li derdora zarokan derdora herî nêzîk malbat, dibistan, gund, navçe û her diçe ev rêz firehtir dibe.<sup>100</sup> Ji ber wê jî mirov divê pêşî ji malbatê dest pê bike. Di mamikan de jî mesela mirov di fêrkirina ajelan de dikare rêzeke wiha bi kar bîne. Pêşî ajelên nêzîkî zarokan mesela wek pisîk/kitikê:

Mamikê mino, helhelê, mîrê kelê, rih heye simbêl belê. Çi ye? [**Pişîk**], (Sadinî. M.X , r. 179)

Piştîre piçek jî dûr kevin û ajeleke wek kêvrîşkê bîne bîra zarokan:

Helheloko melmeloko, terîsorko guhbelko? [**Kîroşk**], (Güneş. K, r. 68)

**Ji Şênber Ber bi Razber ve:** Di zarokan de geşedana zêhnê ji şênber ber bi razber ve pêş dikeve. Yanî zarok di demên xwe yên serî de berî ku biçe dibistanê ji bo fêrbûna tiştekî divê wê bibîne, bêhn bike, bibihîze û hwd. Mirov dema ku bi çavên xwe

---

<sup>100</sup> Sünbül, *Öğretim İlke Ve Yöntemleri*, r. 23

şahidê tiştêkî dibe û wî tiştî bêtir dinase û hîn dibe.<sup>101</sup> Di mamikên kurdî de jî ev rêbaz serdanpê wisa ye yanî mamik jixwe exlebî, ji bilî mamikên mantiqî li ser heyberên şênber hatine gotin. Mînak dev, poz, çav, mirîşk, hêk, stêrk, ewr, av, agir û hwd. Ev yek jî bi me dide zanîn ku mamik ji bo fêrkariya zarokên berî dibistanê berhemên gelekî di cih de ne.

**Têkiliya Parçe û Bitûnê:** Dema ku qala tiştêkî hate kirin rêbaz ew e ku mirov ji parçeyên wî tiştî dest bi pênaseya wî tiştî bike. Di mamikan de ev yek bi rêya hunera ‘metonomî’ yê pêk tê ku em ê di wê sernavê de bi berfirehî li ser rawestin. Di mamikan de di metna esil de dema ku şayesandina heyînekê hat kirin ev rêbaz tê bikaranîn. Mesela di şayesandina dîkilê de pirseke wiha hatiye kirin:

Ser e mişarû, pê xeparû. [**Dîkil**], (Berwarî. M, r. 38)

Di vê mamikê de dîkilê bi pê û serên wî şayesandiye da ku kê û zêde ew dîmena dîkilê ya bi tamamî bê li ber çavên mirovan. Ser:mişar/birek, pê: xepar/çape.

**Rêbaza Bibîrxistinê:** Di mamikan de ev rêbaz gelek caran hatiye bikaranîn. Zêdetir bi bêjeyên hemwate û diywate îşaretê heyîneke veşartî dikin. Di vê rêbazê de dema ku mirov bêjeyekê an zanyariyekê hîn dibe, bi zanyariyên xwe yên berê re pêwendiyên çê dike. Bêjeyên hemwate, diywate û nêzwate yên ku bi wê bêjeyê re têkildar in mirov tîne bîra xwe. Yanî eger bêje di nav kontekstekê de werin nîşan dan û bi vî awayî werin hîn kirin, ew zû ji bîra mirov naçin.<sup>102</sup> Ji bo vê rêbazê em mamika;

Bi roj raza ye, bi şev şiyar e? [**Şevşevok**], (Güneş. K, r. 33)

dikarin wekî mînak bidin nîşan. Lewra her du taybetiyên li dij hev ango heyîneke bi rojê razayî û bi şevê jî şiyar îşaretê şevşevokê dikin.

Mamikê mino, pîra qirmîçî, darik di qûnê da. Çi ye? [**Mewîj**], (Sadinî. M.X , r. 100)

di vê mamikê de jî mewîj hatiye bibîrxistin lê bi şêwazeke mecazî û metaforîk.

Di mamikan de hunera veşartinê heye û dema ku mamikbêj mamika xwe dipirse guhdarvanê xwe jî bi bibîrxistin û sembolan sewqî lêgerîn û peydakirina tiştê veşartî dike. Ji ber vê jî bêjeyên ku bi wê heyîne re eleqedar in bi awayekî şayesandinî û mateforîk pêşkeşê guhdêre xwe dike. Ev yek jî di pêşxistina têgehên de alîkariya mirovan dike. Li ser vê rêbaza bibîrxistinê Paul Foulquie wiha dibêje:

<sup>101</sup> Sünbül, r.22

<sup>102</sup> Ramazan Pertev, *Mîrsadu'l-Ûfal [Şahrahê Kûdekan] Ferhenga Menzûm a Kurdî-Farisî*, Zanîngeha Mardin Artuklu Enstituya Zimanên Zindî, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, 2012, r. 63.

“Di her zimanî de, komên bêjeyan hene ku bi bêjeyên din re têkildar in. Yanî dema yek jê tê bikaranîn, ên din jî tîn hişê mirov. Nemaze, bêjeyên ku bi ramanan ve têkildar in bêtir bi hev ve girêdayî ne. Lewma di sîstema perwerdeyê de perwerdekar hewl didin ku zarokan arasteyî bibîrxistinên qenc bikin.”<sup>103</sup>

**Rêbaza Beşdarbûnê:** Kesê ku tiştêkî fêr dibe ji tiştê ku fêr dibe berpirsiyar e. Çimkî di navenda fêrbûnê de ew bixwe cih digire. Di pirsîn û bersivdana mamikan de dîsa yê ku hişê xwe pê re mijûl dike du aktor in. Yek mamikbêj yek jî guhdar e ku li dû peydakirina bersivê dikeve. Yanî kesê ku serê xwe ji bo peydakirina heyîna veşartî diêşîne, di heman demê de ji aliyê ziman û zêhnê ve bi pêş dikeve. Yanî yê ku lêgerînê dike bixwe ye û di navenda temrînê de ye.

Mejiyê mirovî mîna sîngerê nahilçîne yanî tu çî bidî wî ew nagire. Di fêrkariyê de ji zarokan tê hêvîkirin ku li ser îşaret û remzên heyî yên ku dane pêş wan û yên di hişê wan de bînin bal hev û şîroveyeke nû bikin. Kesê ku fêr dibe û yê ku maneyê kifş dike, çî veşartî an jî eşkere, heman kes e. Kesê ku fêr dibe divê îşaretên ku dane nîşanê wî bi kar bîne û bixwe di nav pêvajoya fêrbûnê de rolê bigire heya ku fêr bibe.<sup>104</sup>

**Rêbaza Mûsikî/Rîtmîk:** Di vê rêbazê de mirov ji şêwaz û zimanê mamikê mînanan bide dê bigunce. Çimkî rîtmêke mûsikî di fêrbûnê de bi taybetî, di jiberkirin û bîranînê de rêbazeke qenc e. Ev zêdetir xîtabî wan kesan dike ku mejiyê wan ê mûsikî bi pêş ketiye. Di vê babetê de fikrên Gardner teorîsyenê “firejîrayî” xwediyê xebata *Çarçoveyên Zihnî* (Frames of Mind)<sup>105</sup> ê girîng in. Li gor vê teoriyê heşt cure jîrayî hene, yek ji wan jî jîrahiya mûsikî/rîtmîk e.<sup>106</sup>

Amûr, huner û xebatên rîtmîk, helbestî û mûsikî zêdetir bala van kesan dikişînin û ev kes di fêrbûna van tiştan de serkeftîtir in. Li ser vê yekê Aydın wiha dibêje: “Li gorî teoriya firejîrayiyê di hînbûna zimanên biyanî de awayê mûsikî/rîtmîkê gelek rêxweşker e. Nemaze zarokên ku jîrayiya wan a mûsikî û rîtmîk xurt in, ew pêkhatina bûyeran, çawaniya wan bi zimanekî mûsikîyê difikirin, şîrove dikin û vedibêjin.”<sup>107</sup>

<sup>103</sup> Paul Foulqie, *Pedagojî Sözlüğü*, Sosyal Yayınları, İstanbul, 1994, r.71.

<sup>104</sup> Bloom, B. [1981]. *İnsan Nitelikleri ve Okulda Öğrenme*, Milli Eğitim Bakanlığı Yayınları, İstanbul. Vgz. Ali Murat Sünbül, *Öğretim İlke Ve Yöntemleri*, r. 28.

<sup>105</sup> Howard Gardner, *Zihin Çerçeveleri Çoklu Zeka Kuramı* [Frames of Mind The Theory of Multiple Intelligences 1983], wer. Ebru Kılıç, Alfa Yayınları, İstanbul, 2004.

<sup>106</sup> Perteve, *Mîrsadu'l-Etfal [Şahrahê Kûdekan] Ferhenga Menzûm a Kurdî-Farisî*, r. 64.

<sup>107</sup> Tahirhan Aydın, *Çoklu Zeka Kuramı ve Yabancılar Arapça Öğretimi*, Gazi Ü, Eğitim Bilimleri Enstitüsü, Teza Lîsansa Bilind a Neçapkirî, Ankara, 2005, r.29.

Mamikên kurdî bi du awayan hatine nîvîsîn; pexşankî an jî helbestkî ne. Dema ku mirov bala xwe dide piraniya mamikan mirov mînakên cureyên helbestkî zêdetir dibîne. Ji ber wê jî qafiye û hunerên dengî yên wek alîterasyon û dubarekirin di mamikan de zêde xuya dibin. Di vê rêbazê de mînakên ji mamikên kurdî dê vê erka xwe bisepînin:

Tişt in mişt in,  
sernivîşt in,  
baran barî xwe guviştin? [Çûçik-çûk], (Güneş. K, r. 126)

Di vê mînakê de hem bi dengê “ş”yê alîterasyon hatiye kirin hem jî “işt” wek qafiye hatiye bikaranîn. An jî ev mînaka ku zûgotinok-mamik tevlihev in dê vê yekê xurt bike:

Çil derzî,  
çil û çar derzî,  
qula derziyê de bezî? [Ta], (Güneş. K, r. 37)


### 3.2. Pêkarên Tesîrdar ên li Ser Fêrbûna Ziman

Di fêrbûna ziman de gelek pêkar hene ku xwedî tesîrên giranbiha ne. Mamik jî yek ji wan hunerên edebî ne ku em dikarin di nav pêkarên wek “Bihîstin û guhdarîkirin”, “Gotin û vajenasiya ilmê erûzê/helbestê” û “ilmê ravek û rêziman û teşenasiyê”<sup>108</sup> de biguncînin. Yanî dema me qala geşedan û fêrbûna ziman kir, em bi tenê bi nîşandana du sê pêkaran nikarin vê babetê zelal bikin. Ji bo ku zelalî çê bibe, em ê şemaya ku di xebata Sheridan û Dorothy de hatiye xêzkirin li vir bidin nîşan.<sup>109</sup>

<sup>108</sup> Ev pêkar li gor taksonomiya Sheridan û Mary Dorothy hatine danîn.

<sup>109</sup> Sheridan - Dorothy, *Ruşdê Kudek*, r. 126.

**Tablo 2: Pêkarên Tesîrdar ên li Ser Fêrbûna Ziman**





## 4. Mamik

### 4.1. Mamik Çi Ye?

Vê pirsê bi dehan salan e hişê lêkolîneran mijûl dike. Ji ber vê yekê jî gelek lêkolîneran pênaseyên ji hev cuda û curbicur kirine. Ji aliyê naverok û teşeyê ve taybetiyên mamikan rêz kirine û pênaseyên xwe li ser wan taybetiyan ava kirine. Lê di hemû pênaseyan de jî gotina hevpar ew e ku mamik berhemên edebiyata gelêrî yên gelekî qedîm in. Di nav xebatên ku li ser mamikan hatî çêkirin de zêde pênase hatine kirin. Em jî ji bo ku “bi giştî mamik çi ye?”, “taybetiyên wê çi ne?” bikarin bibînin, em ê pênaseyên ku hatine kirin di vê beşê de nîşan bidin.

İlhan Başgöz di xebateke xwe de li ser fonksiyonên mamikan rawestiyaye û çend pênaseyên kurt neqil kirine ku dibêje: “Berî her tiştî mamik xwediyê rengêkî lîstik û kêfê ne... Mamik ji ber ku bi ziman tên afirandin, di nav lîstikên ziman de cî digirin.”<sup>110</sup> an jî ji çibûna mamikan zêdetir derbarê çawaniya vegotin û bikaranîna di nav gel de wiha dibêje: “Mamik amûreke kêfê ye ku xisûsî di şevên dirêj ên zivistanê de zêdetir zarok, keç û jin pê dema xwe dibuhurînin.”<sup>111</sup> Di vê pênaseyê de mirov fêhm dike ku ji bo gotina mamikan jî dem, war û kesên taybet lazim in. Ango li her derê di her şertî de ev yek pêk nayê. Lê herî zêde tiştê ku li ber çavan ev e; mamik amûreke ji bo lîstik, kêf û şahiyê hatiye dîtin.

Dîsa di pênaseyêke P. N. Boratav de mamik ji lîstikê zêdetir wek berhemeke edebî tê dîtin: “Mamik dema ku mirov cara ewil dibîne, mirov dibêje qey ‘lîstikek’ e. Bi rastî lîstikên ku mamikan di xwe de dihewînin hene, lê belê mamik bi hin xisûsiyetên xwe yên wek ‘pirs’ û bi vê yekê re ‘qalibên vegotinê’ xweseriyek bi dest xistiye.”<sup>112</sup>

Biröl Azar di xebateke xwe de, derbarê mamikan de wiha dibêje: “Mamik ew cure berhem e ku di xwe de tiştêkî veşartî dihewîne û vê yekê bi rêya pirsê ji xwîner û guhdêr dipirse û li benda bersivekê dimîne.”<sup>113</sup> Ev taybetiya mamikan zêdetir ji bo zarokan afirandina alemeke fantastîk bi kêr tê. Çimkî tiştên veşartî her gav kelecana zêde dikin û meroqê zinde digirin ku ev yek jî bala zarokan zêdetir dibe ser xwe. Yek jî tiştê herî muhîm ew e ku maneyê di nav gotinê de vedişêre. Ev yek jî ji bo pêşxistin û hînbûna hûrgiliyên ziman rêbazeke girîng e.

<sup>110</sup> İlhan Başgöz, “Türk Bilmecelerinin Fonksiyonları”, *Folklor Doğru*, j. 37, İstanbul, 1974, r.29.

<sup>111</sup> Başgöz, h.c.

<sup>112</sup> Pertev Naili Boratav, *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*, Bilgesu Yayınları, Ankara, 2013, r. 125.

<sup>113</sup> Biröl Azar, “Çocuk Eğitiminde Folklor/Halkbilimden Yararlanma Üzerine”, *Türk Xalkarı Edebiyatı [III]: Beynelxalq Uşaq Edebiyatı Kongresi*, Qafqaz Üniversitesi, 2008, r. 823.

Fevzi Karademir jî li ser mamikan rawestayê û zêdetir dewlemendiya mamikan ji hêla hunerên vegotinê ve derxistiye pêş û wiha pênase kiriye: “Mamik berhemên anonîm in ku heyîn û bûyerên şenber û razber, hedîse û şexsiyetên tarîxî û hwd. bi rêya vegotinên wek îstîfîre, neasayî, dijayetî, texlîtên dangan, sêwirandinên fantastîk û bi awayekî pirsîna pirsên bikêf derçûne.”<sup>114</sup>

Di xebateke xwe de Altan Alperen li ser çend aliyên mamikan pênase neqil kirine. Di van pênaseyan de jî hem wek lîstikek dîtiye hem jî wek berhemên ku ji mecaz û dijayetiyan pêk hatibin, nirxandiye. Di Ansîklopediya Brockhausê de pênaseyeke wiha cî digire: “Mamik wesifandinên bi awayeke nerasterê ne ku têgehên veşartî yên di wan de divê ji hêla xwîner û guhdêr ve bînin.”<sup>115</sup>

Yê ku zêdetir li ser pêşxistina mûhakeme, fikirîn, baldariyên mamikan rawestayê, Salahaddin Bekki ye ku ji du kesan pênaseyên mamikan neqil kirine. Li gor Bekki mamik ji bo ku mirov wextekî xweşik biborîne, zanîna hev û du biceribîne û li hemberî hev rêz û hurmetê bigire, hunereke pirsîyarî ye. Ji ber vê yekê jî mamik ew vegotin in ku li ser xweza, mirov, ajel û amûran û hemû heyînen din bi awayekî razber û veşartî tînin gotin da ku mirov bifikire û pê derxîne ka ev heyîn çi ne.<sup>116</sup>

Ayhan Karakaş li ser tîkiliya di navbera mamik û edebiyata zarokan sekiniye û piştî çend pênaseyên neqil kirî bixwe jî wiha fikra xwe bi me re parve kiriye: “Em dikarin bibêjin ku mamik di hemû neteweyan de tînin dîtin ku berhemên anonîm ên herî qedîm in. Wekî din mamik vegotinên qalibgirtî yên ku wek lîstikên jîrahî û gotinê ne ku ji bo buhurandina demê di nav kêfxweşiyê de tînin gotin. Di mamikan de gelek caran pirs li ser daneyan tînin bersivandin. Ji ber wê jî tîkiliyeke xurt di navbera naveroka mamikê û bersiva wê de heye.”<sup>117</sup>

Erman Artun rola mamikan a di edebiyata zarokan de xebitiye û di vê xebata xwe de bal kişandiye ser rola mamikan ku nirxên civakê çawa bi me dide zanîn? Her wiha ji ber ku mamik ji deverên cuda cuda derdikevin, nêrîna li cîhanê ya mirovên wê deverê û modelên estetîkê yên wê deverê bi saya mamikan em fêr dibin.<sup>118</sup>

<sup>114</sup> Fevzi Karademir, “Halk Bilmecelerinin Oluşum ve Biçimlenmesindeki Etkenler Üzerine”, *Akdaemik Bakış*, j. 14, Nisan 2008, r. 2.

<sup>115</sup> Altan Alperen, *Folklor ve Edebiyatın Unutulan Unsuru: Bilmeceler*, r.120.

<sup>116</sup> Salahaddin Bekki, *Bilmeceler, Tabu ve Gizli Diller Üzerine*, Muzaffer Akkuş Armağanı, amd. Mücahit Akkuş ve Fatih Dinçer, Kömen Yayınları, Konya, 2013, r. 337.

<sup>117</sup> Ayhan Karakaş, “Ortak Anonim Türk Halk Edebiyatı Ürünlerinden Bilmecenin Çocuk Edebiyatına Katkıları”, *Türk Xalkarı Edebiyatı [II]: Beynelxalq Uşaq Edebiyatı Kongresi*, Qafqaz Üniversitesi, 2008, r. 813.

<sup>118</sup> Erman Artun, *Ortak Türk Kültürü Ürünlerinin Çocuk Edebiyatına Katkıları*, [http://turkoloji.cu.edu.tr/HALKBILIM/erman\\_artun\\_ortak\\_turk\\_kulturu\\_cocuk\\_edebiyatina\\_katkilari.pdf](http://turkoloji.cu.edu.tr/HALKBILIM/erman_artun_ortak_turk_kulturu_cocuk_edebiyatina_katkilari.pdf) r.4, (15.09.2014).

Di nivîsa xwe ya bi navê *Çivanok û Tiştonek* de Mihemed Elî li ser rola mamikan ji aliyê ramangerî û pîvana zîrekî û şarezayîya mirovan û bi taybetî jî ya zarokan çend tişt gotine û wiha qala fonksiyona mamikan kiriye: “Tiştonek (mamik) cureyekî lîstik û pirsên devkî ye ku zîrekî û şarezayîya mirov pê tê pîvan. Ew bi piranî di nav zarok û ciwanên negihîştî de tîk bikaranîn, lê kesên gihiştî jî ji bikaranîna wan ne dûr in. Hîma mamikan ji pirs û bersivan pêk tê û bi rêya tiştine hemşewaz mebesta tiştine din tê kirin, ango dihêlin hişê mirov bi giştî û zarokan bi taybetî tevbigere û asoyên ramangeriya xwe fireh bike.”<sup>119</sup>

Di fêrkirina ziman de li ser rola mamikan Aysun Önür di xebateke xwe de mamik bi kurtî wiha pênase kirine: “Mamik pirsên ku bi şewazeke veşartî tîk vegotin û her wiha mamik ji bo ku heyînên veşartî yê di wan de bîk dîtin, wek ew pirsên ku zêhna mirov dişuxulînin tîk qebûlînin.”<sup>120</sup> Di vê pênaseyê de zêdetir tesîra mamikan a li ser geşedana zêhnî û zimanî ya zarokan rawestayê. Mamik wekî amûreke koordînatî a di navbera hiş û ziman de tê nixandî.

Li ser mijara di perwerdeya zarokan de û di fêrkariyê de mamik bi kîjan rêbazên fikirînê mirovan pêş dixin, di xebateke E. Emine Balta de wiha hatiye vegotin:

“Mamik di fêrkirina ziman û têgehên de, di perwerdeya fikirînê de ku bi ziman û têgehên re gelek eleqedar e, ji bo serkeftinê amûreke xwediyê taybetiyên zêde û kêrhatî ye mezîn e. Di pêvajoya hîndekarî û perwerdeyê de sîdemendiya mamikan ji bo fêrkirina zimanê dayikê gelek muhîm e. Em dikarin di pêşxistina dewlemendiya peyvan de û di hînkirina têgehên de mamikan wek amûreke alîkar bipejirînin. Di mamikê de lêgerîna bersivê dînamîk e. Mirov hemû têgehên di hişê xwe de bi xisûsiyetên wê mamikê re dide ber hev. Bi gotîneke din mamik ji aliyê fikirbariya tekûz ango fikirîna afirîner, rexneyî û jêhatîbûna çareserkirina pirsgerêkan ve berhemên serkeftî ne.”<sup>121</sup>

Dîsa Balta li ser egera heyîna mamikan a ji bo mirovan kolayê û zêdetir li ser şiklê pirsîyarîbûna mamikan sekiniyê û gotiyê ku mirovan di jîyanê de her gav ji hev pirs kirine. Hesta meraqê û xwesteka kifşkirinê ya di mirovan de heya heya dê bidome. Ji ber vê ye ku mamik li gor zêhn û ruhê mirovan berhemên herî hêja yê folklorîk in. Li ser vê yekê Balta tehlîleke Abrahams û Dundes neqil dîke ku pirsîyarî normal û yê

<sup>119</sup> Mihemed Elî, “Çivanok û Tiştonek”, *Kovara Tûrik*, <http://www.dengemamoste.com/modules.php?name=News&file=article&sid=29>, (15.09.2014).

<sup>120</sup> Aysun Önür, “Türkçe Öğretiminde Bilmecenin Yeri ve Önemi”, *Gazi Üniversitesi Türkçe Araştırmaları Akademik Öğrenci Dergisi*, j.2, 2012.

<sup>121</sup> Elif Emine Balta, “Bilmecelerin Dil-Düşünme Bağlamında Eğitimdeki Yeri ve Önemi”, *Turkish Studies- International Periodical For The Languages, Literature and History of Turkish or Turkic Volume 8/1 Winter, 2013*, r. 891.

ku di mamikan de derdikevin holê ji hev cuda ne. Cudabûna wan ew e ku pirsiyarên mamikan hişê mirovî zêde têkilhev dike û dibe sebep ku hiş zêdetir bixebite. Ev pirs ji bo ku tiştên nayên zanîn, bên zanîn û heyînên veşartî, bên peydakirin, wek pîvana qabiliyeta hazircewabî û bilez fikirînê ye.<sup>122</sup>

Li ser taybetiyên bi vî şiklî yên mamikan, nav û nûçikên ku bi mamikan ve hatine kirin Balta ji me re wiha neqil dike: “Mamik ji ber van taybetiyên xwe ne ku nav û nûçikên cihê girtine wek ‘bihûştâ helbestê’, ‘pêşbaziya zanîne’, ‘lîstikeke kêf û hîndekariyê’, ‘werzişa zîhnî ya edebî’.”<sup>123</sup>

#### 4.1.1. Pênaseyeke Struktural

Di vê beşê de ji pênaseyên klasîk zêdetir em ê li ser pênaseya struktural hûr bibin. Di gotara R.A.Gorges û Alan Dundes de, li ser vê babetê hatiye gotin ku heya îro her lêkolîner û zanyar gihiştîye wê qenaatê ku divê li ser mamikan xebat bîn kirin, lêbelê heya îro kes ji pênaseyên klasîk wîrdetir neçûye ku ev yek jî ji bo nasîna mamikan kêr dimîne.<sup>124</sup> Dîsa di heman xebatê de li ser pênaseyên klasîk hatiye gotin ku pênaseya yekem ji hêla Arîsto ve hatiye kirin. Pênaseya ku Arîsto kiriye wiha hatiye neqilkirin: “Mamikên serkeftî, bi piranî mecazên zêde dide xwîner û vebêjên xwe. Çimkî mecaz mamikan divê û ji ber wê jî mamikeke serkeftî mecazên têr û tijî derdixîne holê.”<sup>125</sup> Di pênaseyên klasîk de zêdetir li ser macazan sekinîne ku Gaston Parîs bixwe jî ev yek aniye ziman: “Ew mecaz û komemecazên ku wateya wan ne eşkere ne û di nav jiyana rojane de zêde nehatine bikaranîn, mamik in.”<sup>126</sup> Ji bilî van pênaseyan hin lêkolîneran jî mamik dabeş kirine û gotine ku mamik li ser çend beşên cuda ava dibin ango mamikek di nav xwe de ji çend perçeyan pêk tê. Gorges û Dundes ji R. Petsch ev yek wiha neqilkirine: “Petsch li gor gotina xwe cara ewil mamikên rasteqîn wiha dabeş kirine; 1) Hêmana (îskelet) destpêkê 2) Hêmana esil a hevpar 3) Hêmana esil a teswîrkirî 4) Hêmana kutle 5) Hêmana (îskelet) keyskirinê. Lê Petsch bixwe jî îtîrafê dike ku ev pênc hêman bi hev re piçek zehmet e ku di mamikekê de werin dîtin.”<sup>127</sup>

Li beramberî van pênaseyan hin folklorîstên tê gihiştîne ku hin mamik bêyî mecaz û beşên curbicur jî çê dibin ango ne şert e di mamikekê de mecaz an jî çend beş hebin. Ji

---

<sup>122</sup> H.b, r.892.

<sup>123</sup> H.b, r.893.

<sup>124</sup> Robert A. Gorges, Alan Dundes, “Bilmecenin Yapısal Bir Tanımına Doğru”, *Folklorla Doğru*, j. 37, 1974, İstanbul, r.87.

<sup>125</sup> Gorges - Dundes, h.c.

<sup>126</sup> H.c.

<sup>127</sup> H.b, r.88.

ber ku ev pênaseyên klasîk bi giştî qels mane û nekarîne di vê babetê de zelaliyekê çê bikin, hin kesan jî gotine ku divê pênaseyên strukturel bên kirin.

Gorges û Dundes anîne ziman ku ji bo pênaseyêke strukturel hewcedariya diyarkirina herî kêr hêmanekê heye ku li gorî Petsch û Taylor ji vê hêmanê re gotine “hêmana teswîrkirî” (descriptive element). Dîsa ev hêman di nav xwe de bûye du beş ku yek jê mijar a din jî şîroveya wê ye.<sup>128</sup>

Gayê sur ê di gelî da girêday. [**Ezman**], (Berwarî. M, r. 45)

Di vir de ‘gayê sur’ mijar e. ‘di gelî da girêday’ jî şîroveya mamikê ye. Bi vî şiklî di vê mamikê de hêmaneke teswîrkirî tenê heye.

Serî şêrîn e, binî tehl e. [**Şerr**], (Berwarî. M, r. 49)

Ev mamik jî ji du hêmanên teswîrkirî pêk tîne, yek jê ‘serî şêrîn e’ ya din jî ‘binî tehl e’. Piştî eşkerekirina hêmanekê pênaseyêke strukturel wiha danîne: “Mamik ew berhemên devkî ne ku di nav civakê de bi awayekî anonîm li ser hêmanekê an jî çend hêmanên teswîrkirî hatine avakirin û her wiha carinan di nav du hêmanên wê de dijayetiyeke derdikeve holê. Tê xwestin ku li ser van hêmanan texmînek bê kirin.”<sup>129</sup> Ji bilî vê pênaseyê ji ber ku ev babet zêdetir bê zelalkirin, mamik li ser du beşan senifandine û ev senifandin jî li gorî hebûn an nebûna rewşa dijayetiyeke ya di nav hêmanên teswîrkirî de çê kirine. Ew hêmanên ku dijayetiyeke nahewînin wek **mamikên bêdijayetî** yên ku di xwe de dihewînin jî wek **mamikên bidijayetî** hatine veqetandin.

Mamikên bêdijayetî dibe ku di nav xwe de mecazê jî bihewînin an jî rasterast wateya yekem jî, lê belê hêmanên li dijî hev tê de tunene.

Pênc bira ne her yekî salekî ser e? [**Tilî**], (Güneş. K, r. 103)

Di vir de mijarên hêmana teswîrkirî an jî mijar bixwe yek in.

Girek di pêş de, du qul tê de? [**Poz**], (Güneş. K, r. 65)

Di vir de mijar û bersiv dibe ku ne wek hev bin û tê de mecaz hebe lê ya muhîm ku tê de dijayetiyeke tune ye.

Mamikên bidijayetî jî xisûsiyeta wan a sereke ew e ku di nav du hêmanên wê de dijayetî hebe.

Ser textik e, bin textik e, giya dixwe ne karik e. [**Kîsel/Kusî**], (Berwarî. M, r. 36)

Di vê mamikê de jî ‘giya dixwe ne karik e’ du hêmanên li dijî hev in.

---

<sup>128</sup> H.b, r.91.

<sup>129</sup> H.b, r.92.

#### 4.2. Binavkirinên Mamikan di Zimanê Kurdî de

Li ser navê mamikan li gor dever û dîyalektên kurdî cudahî çê bûne. Ji ber vê ye ku qest her çiqas mamik be jî nav û nûçikên wê pircure ne. Tabî ev cudatî tenê xisûsiyeteke kurdî nîne, di zimanên din de jî rewş bi heman şiklî ye. Mînak di tirkî de “bilmece”, “tapmaca” û hwd. navên cuda hene. Boratav û Başgöz derbarê vê de wiha dibêjin: “Ji bo mamikan (bilmece) li Tirkiyê têgehên wek “mesel, metel, masal, tapmaca, bulmaca” tên bikaranîn. Li derveyî Tirkiyê jî li ser koka lêkera **tap-** nav hatine dariştin.”<sup>130</sup>

Di kurdî de jî rewş dişibe ya tirkî. Derbarê navên kurdî de Sedreddîn Nûreddîn Ebûbekr di xebateke xwe de wiha dibêje: “Le zimanî kurdî da gelek zarawe bi maneya metel bi kar dên wek: metel, hetele, meyl, helêne, çewçe, mamik, têderxistinok, tiştanok...”<sup>131</sup> Ebûbekr di berdewama vê de navên ku di zimanê erebî û îngilîzî de jî ji bo mamikan hatine bikaranîn, ji me re rêz kirine: “Di zimanê erebî de zaraweyê: lugez, muemma, hezûre, el-ehciye, el-ewîs bi kar tên. Di îngilîzî de: secr, riddle, mystery, enigma, conundrum, puzzle tê gotin”.<sup>132</sup>

Mamoste Hacî Xalid Akreyî di pirtûka xwe ya bi navê *Hezar Metelok bo Mirovên Jir û Kok* de bi kurtî li ser navê vê cureyê tiştê wiha dibêje: “...êk li van genc û samanê kurdî **mamik** in an **tiştê** min tişt e yan dişên bibêjin **metelok**,...”<sup>133</sup> di vir de jî sê navên ku herî zêde tên bikaranîn mamik, tiştanok û metelok in.

Îsmâil Taha Şahîn jî qala mamikan dike û dibêje: “Digotin van cure gotinan ‘**mamik**’ yan ‘**tiştik**’...”<sup>134</sup>

Di berhevokeke zargotina zarokan de Mustafa Gazî jî ji bo navê mamikan, jêrenoteke wiha dibêje: “Ji mamikan re her wiha li hin deveran jî dibêjin; tiştanok, tiştik, têderxistinok, qinik, kelemamik.”<sup>135</sup>

Mahir Berwarî di xebata xwe ya *Metelokanê* de bi berfirehî li ser vê babetê rawestayê û ji bo standartbûna navê vê curehunerê jî çend referans nîşan dane:

“Çi gel bê folklor nînin û çî folklorên gelan jî bê metelok nabin. Her gelekî çend navên cuda cuda bo (beramberî) peyva metelok hene bo mînak:

Îngilîzî: puzzle, enigma, mystery, riddle, secr...

<sup>130</sup> Pertev N. Boratav – İlhan Başgöz, “Türk Halk Bilmeceleleri”, *Folklor Dođru*, j. 37, 1974, İstanbul, r.2.

<sup>131</sup> Ebûbekr, *Berkotêkî Metellî Folklorî Kurdî*, r. 33.

<sup>132</sup> Ebûbekr, h.c.

<sup>133</sup> Mamoste Hacî Xalid Akreyî, *Hezar Metelok bo Mirovên Jir û Kok*, Çapa Dûyê, Çapxaneyê Şehab, Hewlêr, 2012, r. 5.

<sup>134</sup> Îsmâil Taha Şahîn, *Mamikê Mino Mamanî*, Spîrêz, Duhok, 2011, r. 7.

<sup>135</sup> Mustafa Gazî, *Gurzek Ji Zargotina Zarokan; Dîsko Dîsko Danîno*, Enstîtûya Kelepura Kurdî, Weşanxaneyê Aras, Silêmanî, 2006, r. 11.

Elmanî: puzzle, sage, sinnspruch, spirichtword, ratzel...

Tirkî: mesele, bilmece...

Erebî: lugez, muemma, hezûre, el-ehciye, el-ewîs...

Kurdî/Kurmancî: metelok, mamikê mino/mamik, malîkî mino/malîkanê, tiştîkê mino/tiştonek-tiştî, têderxistinok...

Kurdî/Soranî: metell, hetelle, meyl, hellêne, çewçe...<sup>136</sup>

Piştî ku Berwarî van navan rêz dike, raya xwe li ser navê ‘metelok’ê bi kar tîne û dibêje ku li gorî min a herî kêrhatî ev nav e ku bi çend egerên bi vî şiklî ji me re rêz dike:

- a) Di zimanê kurdî de gelek caran, paşkoya (ok) bi nav ve, biçûkirina wî navî ye mîna mencil-mencilok, ehmed-ehmedok ûwd. Li devera Behdînan peyva metel bo metelên mezinan (pendî pêşînan) tê bikaranîn û metelok ji bo metelên zarokan tê bikaranîn. Bi hizra min metelok peyva herî binecih û rast e.
- b) Ji bo piştrastkirin û rastiya vê bûçîna min li vê malika helbesta helbestvanê mezin ê Kurd Ehmedê Moxlis binêrin ka çawa metel/mesel li şûna metelên mezinan/pendî pêşînan aniye û metelok li şûna metelên zarokan aniye.  
Ez çî bêjim çî beyan kim metelok û mesela?  
Şûl ew e ya te kirî hîn û dema qal û bela...
- c) Her wisa profesor û pişporên kultura kurdî Ordîxan û Celîlê Celîl peyvên mesel/metel û metelok wekî Ehmedê Moxlis bi kar anîne. Binêrin navê pirtûka wan: “Mesele û metelokên kurdî”, Ordîxan û Celîlê Celîl 1972.\*
- d) Gelek caran di destpêka gelek metelokan de çend peyv tînan bikaranîn mîna: “malîkî mino, mamikê mino, tiştîkê mino tiştî” kurtkirina wan bûne şûngir/cihgir bo navên metelokan mîna: “mamik, malîk, tiştonek”. Bi hizra min ev cihê metelokan sedan sed nagirin.
- e) Di zaravê soranî de, peyva metel beramberî peyva metelok/metelên zarokan bi kar aniye û peyva pendî pêşînan beramberî peyva metel (metelên mezinan) bi kar aniye, bi hizra min ne gelek di cihê xwe de ye.<sup>137</sup>

Piştî van nirxandinan mirov bi hêsanî digihêje wê qinyatê ku mamik li gor diyalekt û deverên cuda navên cuda distîne. Format her çiqas wek hev be jî di navan de guherîn pêk tê. Lêbelê yeksankirina navekî bo ku pêşî li tevliheviyê bigire, girîng e. Ev kar bixwe jî karê zimanzanan e û em vî karî ji wan re dihêlin.

<sup>136</sup> Berwarî, *Metelokanê*, r. 27.

\*“Peyva tiştonek li Bakûr û Rojavayê Kurdistanê bo meteloka dihêt gutin, li gor baweriya min, egera wê jî vedigerit bo hindê çimkî meteloka girêdaneka mukom bi tiştumîştên durên mirovî ve hene û li ser wan hatine vehandin.” Bnr. Berwarî, h.b, r. 27.

<sup>137</sup> Berwarî, h.b, r. 27.

Di vê xebatê de me tercîha xwe li ser navê **mamikê** da. Ji ber sedema ku ev nav li bakurê Kurdistanê zêdetir tê bikaranîn. Mîna folklorîya miletên din, di folklorîya kurdî de jî mamik li gor dever û diyalektan bûne pirnavî, lê ev nav hemû jî ji mantiqa navdanîna vê hunerê ne dûr in. Ango her navek li gor mantiq û sedemekê hatine danîn.

### 4.3. Li Cîhanê Xebatên li Ser Mamikan

Mamik di eslê xwe de vegotîneke alema rojhilatê ye. Lêkolînerên rojavayî jî ev yek anîne ziman.<sup>138</sup> Hin lêkolîner jî qala kana mamikan dikin mesela folklorzanê Rûs Victor Anikin dibêje kana mamikan ji sêhrê derdikeve. Xwediyê teoriya “kultûr ji lîstikê diafire” Johann Huizinga jî lîstikê wek kana mamikan dihesibîne. Andre Jolles jî dibêje ku mamik di merasimên pîroz de ji wan pirsên ku ji talibê tiştêkî tên pirsîn çê bûne.<sup>139</sup>

Ji bilî van îdia û teoriyan hin mînakên qedîm ên ku di kitêbên pîroz û efsaneyên qedîm de derbas dibin hene. Hin mînakên berê yên ku ji hêla gelek lêkolîneran ve tên pejirandin ev in; yek ji ewilîn mînakên mamikan di kitêba pîroz a Vedayan *Rig Vedayê* de derbas dibe ku wekî bingeha Brahmanîzmê tê pejirandin. Van mamikan tesîr li alema rojavayê jî kirine.

Yek ji mînakên yekem jî di kitêba *Qral a Ahîta Kevin/Tewratê* de derbas dibe. Li wir qala pêşbaziya mamikan a di navbera Melîkeya Saba ya Ereb, Belqîs û Pêxemberê Yahûdî Suleyman tê kirin. Ev yek jî nîşana hebûna mamikan a di kultûra Ereb û Yahûdîyan de ye.

Di Yewnana kevin de jî zanyarên wek Homereos, Hesiod, Pindar, Heraklît, Eflatûn û Heredot jî mamik nivîsîne. Di nav mamikên qedîm de mamika navdar a fîgura mîtolojîk a Yewnanan Sfenks ku ji qral Odîpûs pirsîye tê hesibandin:

“Kîjan mexlûqat dema ku welidî xwediyê çar, dema mezin bû du, dema pîr bû xwediyê sê pêyan e?”

Di Romaya Kevin de jî Symphosius mamikên ku li ser jiyana rojane hatine gotin, senifandine. Îro jî li her derê cîhanê mamikên gelêrî ji hêla gelek neteweyan ve tên senifandin.

Li Elmanyayê jî mamik wek berhemeke gelêrî herî zêde di sedsalên 18. û 19. de derketiye pêş. Bêguman tesîra feylesofên wek F. Schiller, C. Brentano, J.P. Hebel, W. Hauff, F.E.D. Schleiernacher, A. Schopenhauer jî li ser vê çê bûye.

<sup>138</sup> Alperen, *Folklor ve Edebiyatın Unutulan Unsuru: Bilmeceler*, r. 117.

<sup>139</sup> Bekki, *Bilmeceler, Tabu ve Gizli Diller Üzerine*, r. 3.



Di nav tirkên de jî mînaka herî kevin ji hêla tirkên Qipçax ve hatiye nivîsîn di berhemeke bi navê *Codex Cumanicus* de.<sup>140</sup>

Mahir Şaul jî hin xebatên akademîk ên li ser mamikan ku li cîhanê hatine kirin bi me dide nasîn. Pêşî xebatên ku li ser mamikan hatine kirin, ji kîjan hêlan ve mamik vekolane, ji me re vedibêje, piştê jî mînakên xebatan bi me dide nasîn. Şaul senifandina xebatên li ser mamikan wiha çê kiriye; hin kes li ser **fonksiyona mamikan** rawestane ango mamik bi kêrî çî tîn; hin kesan ji aliyê **rûxsarî** ve mamik vekolane û li bersiva **mamik çî ye?** Geriyane; hin kes wek cureyeke edebî **taybetiyên şiklî yên mamikan û şêwaza wan** xebitîne; hin kesan jî derbarê **dîrokçe, geşedan û belavbûna** mamikan de lêkolîn kirine.<sup>141</sup>

Şaul pênc xebatên akademîk ên li ser mamikan bi me re parve dîke.<sup>142</sup> Eger em kurte bikin; yek jê xebata lêkolînerê Alman, Robert Petsch e, di warê pênase û teşeyê de mamik nirxandine û di sala 1899an de teza xwe çap kiriye û Petsch di mamikan de li ser pênc hêmanan radiweste. **1)** Formûla destpêkê **2)** Navê mijara teswîrkirî **3)** Hevokê ku mijarê teswîr bike **4)** Dîsa hevokê ku mijarê teswîr dîke lê yê ku bersivê digere dixapîne **5)** Formûla xelaskirinê.

Xebata duyem jî ya zanyar Archer Taylor e. Taylor di mamikan de qaîdeyeke dijayeti û hêvînekirinê dibîne. Di mamikan de exlebî tiştê ku tê şayesandin tiştêkî din e, bersiva ku mirov li bendê ye tiştêkî din e. Bersiv dişibe wî tiştê ku di pirsê de tê şayesandin. Taylor li ser vê bingehê qaîdeyeke senifandinê afirandiye. Di senifandina mamikan a Taylor de ya muhîm ew e ku bersiv bi çî tiştî re tê ‘şibandin’.

Xebateke din a Elli Köngas Maranda ye. Li gor Maranda bersivandina mamikan wek jêveçirîna sentaksê çê dibe. Mamik her gav ji du perçeyan pêk tê, yek jê pirs ya din jî bersiv e. Di nav pirsê de jî têgeheke ku şibandine bersivê heye. Maranda vê xebata xwe li ser nêrîna Noam Chomsky ava kiriye.

Xebata çarem jî gotareke Robert Georges û Alan Dundes e ku navê wê *Ber Bi Pênaseyeke Strukturel a Mamikan* ve ye. Di vê gotarê de ji pênaseyên klîşe û klasîk wêdetir li ser pênaseyeke strukturel a mamikan rawestiyane.

Xebata din jî ya Anttî Aarne ye ku li gor rêveberiya ekola Fîn, di hin varyantên mamikan de berawirdiyek çê kiriye û bi vî şiklî xwestiye ku ew mamik pêşî li ku derê peyda bûne û rêya belavbûna wan çawa bûye, bide zanîn.

<sup>140</sup> Alperen, *Folklor ve Edebiyatın Unutulan Unsuru: Bilmeceler*, r. 117-118.

<sup>141</sup> Mahir Şaul, “Dünyada Bilmeceler Araştırmaları”, *Folklorla Doğru*, j. 37, İstanbul, 1974, r.80.

<sup>142</sup> H.b, r. 80-84.

#### 4.4. Di Edebiyata Kurdî de Mamik û Xebatên Kurdî yên li Ser Mamikan

Di kurdî de ji hêla akademîk ve kêr xebat li ser mamikan çê bûne. Xebatên ku çê bûne jî exlebî li başûrê Kurdistanê ne. Xebatên li ser mamikan pîranî li ser berhevkerin, ango senifandina mamikan e. Di nav van de jî herî zêde xebatên berhevkerinê çê bûne.

Di edebiyata klasîk de mamik, tiştonek an jî metel bi navê “muemmma” derbas dibe. Bi rastî ev huner ne tam mamik in. Lê belê di şêwaza mamikan de hunereke edebiyata klasîk e, heta cureyeke helbesta klasîk e. Di edebiyata kurdî de em di *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî de û di *Dîwana Mela Huseynê Bateyî* de mînakên vê hunerê dibînin. Herwiha di berhemên klasîk de tehereke vegotinê an jî nîşandana sala nivîsandina wê berhemê an jî rojbûna nivîskarê berhemê bi awayekî muemmayî tê kirin. Mîrov dikare van beşan jî beşek ji hunera muemmayê bihesibîne ku di *Nûbihara Biçûkan* a Ehmedê Xanî de di dawiya berhemê de ji bo sala nivîsîna berhemê hunereke bi vî şiklî hatiye bikaranîn.

Helbesta Melayê Bateyî ya bi navê *Mestê Şepalê* ku bi şêwaza muemmayê nivîsandiye ji bo mînaka vê cureyê gelekî girîng e. Mînak:

Mestê şepalê teftêş  
Kir ji me go: Dê bizan  
Sed mislê ayîne pêş  
Sohtime go: El eman

Got eme ya xûbrû  
Tiştêkê min mislê mû  
Çapuk û çust hem çû  
Ew çi ye çî dê bizan?

Min gote ya dêmmelek  
Vêketim ez bê felek  
Qamet û bejna çelek  
Sohtî<sup>143</sup> me ez el eman

Gote min şahê çikil

---

<sup>143</sup> Cudahiya vê peyvê ji çarîna yekem û pêncem di berhema ku min jê girtiye de derbas dibe. Bnr. M. Xalid Sadîni, *Mela Huseynê Bateyî - Jîyan, Berhem û Helbestên Wî*, ç. 2., Nûbihar, İstanbul, 2011, r. 127-130.

Tiştêkê min li ser mil  
Pê ve kirin du sed dil  
Ew çi ye çî dê bizan?

Min gotê bawer bike  
Fikrê ji dawer bike  
Zulfan tu satir bike  
Sohtime ez el eman

Gote min ya dêmnucûm  
Lewhekê min bê ruqûm  
Lê heye danzde ‘ulûm  
Ew çi ye çî dê bizan?<sup>144</sup>

...

Helbest bi vê şêwazê didome bi tevahî ji 17 qiteyan pêk tê. Cudahiya vê helbestê ji mamikan bi tenê kêşa helbestê û nivîsîna wê ji destê kesekî ye.

Di *Mem û Zînê* de jî mînakên muemmayê hene yek ji wan di beşa heştem de wiha derbas dibe:

...

Yek serwê riyaz ê rasitî bû  
Wê navi bi rasitî Sitî bû

Ya dî ji dil û hinavê Mîr bû  
Wê navi ji nisfê navê Mîr bû<sup>145</sup>

Xanî di vir de rasterast navê *Zînê* nade. Dixwaze di vir de hunera muemmayê nîşan bide. Çimkî di malika yekem de navê *Sitî* eşkere dide lê di mamika duyem de îşaretê li bal navê *Zînê* dike ku ew jî “nisfê navê Mîr” e. Ji ber ku navê mîr Zeyneddîn e, kêteya yekem a navê mîr ‘zeyn’ û navê ‘Zîn’ dişibin hev ango nisfê hev in. Jixwe Xanî bixwe jî piştê dewam dike û bersiva muemmayê wiha dide:

Rawî wehe gote min mu’emma  
Ew hori bi navê Zîn musemma

<sup>144</sup> Sadîni, *Mela Huseynê Bateyi/Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, r. 127-130.

<sup>145</sup> Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, amd. Huseyn Şemrexî, ç.2., Nûbihar, İstanbul, 2011, r. 57.

Yek zêde şîrîn ziyade mehbûb  
Yek rûhê qulûb û hûrê meqlûb

Yek esmer û ya duwê zerî bû  
Yek hûrî û ya duwê perî bû<sup>146</sup>

...

Di malika yekem de em dibînin ku Xanî bersivê dide û dibêje “*Ew hori bi navê Zîn musemma.*” Dîsa di beşa çil û yekem de bi şêwaza muemmayê Xanî wiha dibêje:

...

Emma bi îşaret û mu’emma  
Pirsî, û Memê bi remz û îma

Destê xwe ji hûçikê ‘ebayê  
Kêşa û ‘ecayibek numayê

Dîtin du kezî ji mişkê Tatar  
Manendê du serbimohre şehmar

Gerdayî di paşila Memê da  
Mem mayî di heybet û xemê da<sup>147</sup>

...

Di vir de jî Xanî bi şêwaza muemmayê dibêje: “*Pirsî, û Memê bi remz û îma*” piştire ecayîbî û meraqê dixê dewrê. Di malika sêyem de jî îşaret û remzên ku nîşan dide wek “*mişkê Tatar*” ka tîna çî maneyê di nav muemmayê xwe de bi cih dike.

Dîsa li gor ku Ebûbekr neqil dike Pîremêrdê nemir di gelek deran de pend û metel tevilhev bi yek awayî nivîsîne. Wek nimûne ev metel:

“Em lay dîwar ew lay dîwar, nawerestekey segêkî (Gurgêkî) har?”<sup>148</sup>

Pîremêrd vê mamika li jor di nav helbestekê xwe de wiha bi kar aniye:

Xowa xoy ezanê ziban nawestê ... Hênay hepsîkird hawêşte bestê,  
Le pûk le dan kirdiye du dîwar ... Du lêw be serya dîwar bû be çîwar,  
Bem çîwar dîware hêştta bend nabê ... Ebê lewewe gerduş berpabê,  
Metelî kurdî bo rêkxirawe ... Be gurgêkî har nawî birawe,

<sup>146</sup> H.b, r. 58.

<sup>147</sup> H.b, r. 195.

<sup>148</sup> Ebûbekr, *Berkotêkî Metellî Folklorî Kurdî*, r. 36

Em lay dîware ew laşî dîwar ... Hepisxane ye bo gurgêkî har,  
 Legel ewîsa eger derfet bê ... Nayelê serî xêwî reh'et bê,  
 Xo eger bête ser barî çak e ... Le hemû uzwî bende da take.<sup>149</sup>

Di vê helbestê de Pîremêrd di malika 4. û 5. de helbesta xwe bi mamikekê xurt kiriye. Her wiha qala ziman dike. Ji bo ku helbestê ji aliyê hunerê ve xurt bike ev mamik di nav vê konseptê de bi kar aniye.

Di berhemên klasîk de ji bo eşkerekirina nivîsîna sala berhemê û rojbûna nivîskar şêwazeke vegotinê heye. Ev jî li gorî alfebeya erebî hesabê ebcêdê ye. Wekheviya vê cureyê û mamikan yek jê pirs e, ya duyem veşartî ye, ya sêyem bi şiklekî edebî ye. Her wiha di mamikan de cureyeke bi navê pirsên mantiqî hene û di wir de jî hesabekî ku dişibe vê hesabê heye. Ev vegotin jî bi gelek aliyan dişibe mamikan. Di *Nûbihara Biçûkan* de Ehmedê Xanî sala nivîsîna wê wiha daniye:

Evrengehe dibêjit Xanî: Eger tu biîz'an î  
 Bifikire li kitêba sanî di cildê ewwel de  
 Ji cuz'ê aşir di wereqa çarê da  
 Ji sehîfa destê rastê, di setra salis da  
 Ji kelîma sanî, bigre tu herfa çarê  
 Ew e tarîxa Nûbiharê<sup>150</sup>

Di vir de Xanî ji bo peydakirina sala nivîsandina berhemê gelek îşaret û hesaban nîşan dide. Heger xwîner baş bifikire û hesab bike dê bikare bersiva rast bibîne. Çimkî “*kitêba sanî, cildê ewwel, cuz'ê aşir, wereqa çarê, sehîfa destê rastê, setra salis, kelîma sanî, herfa çarê*” hemû sembola in ji bo bersiva vê muemmayê.

Ji bilî van mînakên li jor hin xebatên ku li ser mamikên kurdî hene. Ji van xebatan ên ku wek lêkolîn in yek jê ya bi navê *Berkotêkî Metellî Folklorî Kurdî* ya Sedreddîn Nûreddîn Ebûbekr e. Ev xebat hem lêkolîn û rexneyek e hem jî komkirin û senifandineke mamikên soranî ye. Ji bilî vê xabatê her çiqas di çarçoveyeke akademîk de nebe jî dîsa wek xebateke lêkolînî ya Mahir Berwarî a bi navê *Metelokanê* jî heye. Ev xebat jî ji bilî danasîn, pênase û hwd. giraniya xwe zêdetir daye ser berhevkirin û senifandina mamikan. Xebateke din jî ya Kenan Güneş e bi navê *Mamikên Me* hatiye çapkirin. Ev xebat pêşî derbarê mamikan de hin agahiyan dide û piştê jî berhevkarîya ku hatiye kirin pêşkeşî me dike. Ji bilî van wek xebata Xalid Sadînî û gelek xebatên din

<sup>149</sup> Kakeyî Felah, *Pendekanî Pîremêrd*, b. 4, ç. duyem, 1982, r.142-143, vgz. Sedreddîn Nûreddîn Ebûbekr, *Berkotêkî Metellî Folklorî Kurdî*, r. 36-37.

<sup>150</sup> Kadri Yıldırım, *Nûbehara Biçûkan- Ehmedê Xanî Külliyyatı [I]*, Avesta, İstanbul, 2008, r.325.

hene ku mamikên kurdî hatine berhevkirin. Me di vê xebata xwe de ji bilî yên ku rêz kirine, neh xebatên din di beşa “Senifandina Mamikan li Gorî Mijaran” de bi kar anîne.

#### 4.5. Mamik ji Aliyê Sûdeweriyê ve

Mamik ne tenê ji aliyê ziman û hizrê belkî ji aliyê rola xwe ya di nav civakê de jî pir mifayên xwe hebin. Çimkî vegotinên gelêrî yên bi vî şiklî di nav civakê de hin bar û berpirsiyariyan jî digirin ser xwe. Ango piçek dikeve şûna paceyeke wê civakê ku ew civak bikaribe xwe di wir de bide nîşan. Lê em ê di vê beşê de li ser mifayên mamikan ên ku mijara teza me eleqedar dike rawestin. Li gor Ebûbekr hin sûdeyên mamikan ev in:

- a) Di îstrehetkirina mejiyê de roleke girîng dibîne, merheleyên bîr û hizrê zêde dike.
- b) Pirsiyar û ezimandina mamikan, zîrekî, hişyarî, kûrahî û bîrtûjiya kesên derdixê holê.
- c) Ji aliyê bixwebawerî û şermşikênandinê ve bi taybetî zarokan miyêser dike.
- d) Ew kesê ku metelokê dibersivîne, hest bi xweşî û serkeftinê dike û ji aliyê derûnî ve zêdetir bi xwe bawer dibe.
- e) Rewanbêjî, rastbêjî û guhdarîkirinê nîşan dide bi taybetî ji aliyê babeta rewaniya ziman de.
- f) Gelek metelên mebestdar gotin û fêrkirineke baş tê de hene, em berê xwe bidine di babeta metela ayînî de: “ewe çi ye: serî nanî binî nanî?” di serê nanxwarinê de dibêjin; bi navê xweda (bismillah) û bi kurtasî di dawiya xwarinê de jî dibêjin; spas bo Yezdan (elhamdulîllah).
- g) Di şûna televîzyon û satelaytên niha de cure cure çîrok û destan bo bihurandina demê hebûn, lê metel ji hemûyan zêdetir xemê ji mirov dibir.
- h) Bêje û biwêjen resen ên kurdî di xwe de dihevine, resentiya ziman derdixîne û dike ku bêje bo mane û mebestên din bi kar bên û zimanê me pê dewlemendtir bibe.
- i) Aliyê jiyana berê ya neteweyekê ji gelek hêlan ve derdixê, ji ber şewazê, ji kîjan herêmê û serdemê derketiye tê nasîn. Bi sedema naveroka wê mirov pê derdixîne ka ew civak bi kîjan amrazî ew bi kar anîye û ew civak li gel kîjan ajel, balinde û giyandarê jiyaye. Çi karî kiriye û çawa encam daye. Hêla aborî û mêjûyî ya rabirdû û keltûra pêşyan dide dest.
- j) Ji bo neviyên me zîrekayetî, kûrahiya bîrtûjiyê û çawaniya bîrkirinê di xwe de vedişêre...<sup>151</sup>

---

<sup>151</sup> Ebûbekr, *Berkotêkî Metellî Folklorî Kurdî*, r. 40-41.

Mahir Berwarî jî derbarê emraza ji vegotina mamikan bo kîjan sûde û mifayan e, ji me re wiha rêz kiriye:<sup>152</sup>

- a) Borîna demê, mijûlkirina zarokan û rehetiya tenahî ya malbatan. Xurtkirina têkelî, lihevneziçkirina zarokan, qebûlkirina hev û du, gengeşikirin/danûstandin.
- b) Xurtkirin, zîçkirin, xulxulandin/livandin û firehkirina biyavê mejiyê zarokan.
- c) Pirtirkirina pêzanînên zarokan bi rêya metelokan, haydarkirin ji tiştên girêdayî jiyana wan.
- d) Peydakirina fersenda hizirkirinê û nêrînê di tiştên li derdor û girêdayî jiyana wan a rojane ye.
- e) Testkirina asta bîrtîjî û pêzanîna zarokan ji aliyê malbatê ve. Malbat dikarin bizanin ka zarokên wan çiqas zîrek, hişyar, xwedî pêzanîn û fehman e.
- f) Metelok gelek girîng in ji bo hêzkirin û rewaniya zimanê zarokan. Bi taybetî ew hevokên ku dikevîne qalibê rewanbêjiyê de.
- g) Ev beş li derveyî welat, bi taybet li Ewropa girîngiyeke pir pê didin û dibêjinê “Logopadie”. Min bihîstiyê ku kursên bi vê mijarê ve didin rojnamevan, bêjer, payamnêr û pêşkeşkarên bernameyên TV û Radyoyan.
- h) Metelok li gor jiyana mirovan hatine afirandin, metelok hene ji serve serve, zelal û raman belî ne. Piraniya vî rengê metelokan ji bo zarokên biçûk tînen gotin, lê gelek metelok hene aloz in, giran in û veşartî ne, bîrtîjî ji bo wan hewce ye, ji bo zarokên baliq û nûgihîştî tînen gotin.
- i) Piraniya metelokan girêdayî tiştûmiştên derdora zarokan û girêdayî werara jiyana wan e. Di destpêkê de tiştên berceste/madî rola xwe dibînin, hêdî hêdî bi werara mejî û bîrkirinê biyavê manewî tê meydanê.
- j) Metelokên madî pesinên serve serve û berçav ên tiştên candar bo mînak “dewar, kêvrîşk, sivore, masî, mar, pêşî û wd.” Û mirî mîna “distar, aş, kezan, gihûşk, tenûr, bivir, hêk û hwd.” Yê derdûrên biyavê zarok tê de dijîn.
- k) Miraz ji metelokên neberceste/manewî ew in ên girêdayî tiştên ne madî ne mîna “sîber, ewir, sal, ba, deng, mirin, bîrîsî/birûsk û hwd.”
- l) Metelok pesnê tişteki berceste yan neberceste yan haleteki bi nêzîki dikin, hinek ji nîşan û sexletên wan mîna “kiryar, livîn, başî, xirabî, cih, dem, reng, tam û hwd.” diyar dikin bi reneki nepenî û veşartî, ev pesin tînen gugirandin û

---

<sup>152</sup> Min di vê jêgirê de hin bêje û vegotinên kurmanciya behdîni ji bo standartbûna zimanê teze guherandin.

lihevanîn bi çend peyvên nazik, sivik û xwemalî di qalibê helbestê<sup>153</sup> an pexşanê de.<sup>154</sup>

#### **4.6. Egerên li Ser Çêbûn û Teşgirtina Mamikan**

Em ê vê sernavê bikin du beş û li ser her du beşan bi kurtî îzahatekê bikin û bi mînakên jî xurt bikin. Du egerên çêbûna mamikan dê bê nivîsîn û piştî hin pêkarên tesîrdar ên li ser teşgirtina mamikan bê ravekirin. Pêşî em ê li ser egerên çêbûna mamikan bisekinin ku di vê beşê de zêdetir dê gotareke Karademir a di vî warî de rêberiya me bike.<sup>155</sup> Di vê beşê de du sedem hatine jimartin:

##### **4.6.1. Meyla Mirovan a li Ser Tiştên Nepen/Hesta Meraqê, Hewcedariya Perwerdekirin û Kêfkirinê**

Mirov bi nepeniyê dagirtî ye. Ji tiştên nepen hez dike. Ji zaroktiya xwe de ji veşartin û xweveşartinê zewq girtiye. Ew rewş ji hal û hereketên wî bigire heya di gotin û berhemên wî de jî heye. Di mamikan de jî ev rêbaza nepen û veşartinê bi awayekî zelal xwe dide nîşan. Çi heyberên razber çî jî şênber bin, di mamikan de bi awayekî nepen tîne pêşkêşkirin. Di vê yekê de kêfkirin û lîstin jî derdikeve holê, çima ku mirov zanebûna hev dipîvin, bi tiştên eletewş û fantastîk li pey heyînan dikevin. Dema ku kêf çê bibe bi wê yekê re hînbûn jî hasil dibe. Çimkî dema ku mirov hişê xwe di nav sêwirandineke fantastîk de ji bo peydakirina heyînan biwestîne, dê têgeh û tîkiliyên heyînan ên nû jî fêr bibe.

Koneka tarî, tijî tê da durr û mirarî. [**Dev û didan**], (Berwarî. M, r. 47)

Ji bo sêwirandineke nepen û fantastîk di mînaka li jor de hêmana ‘**tarî**’ pêşî atmosferê bi kelecaneke dike û dîmenê bi temamî vedişêre ango nezanîn û nepenîbûnê derdixe asta herî bilind. Piştî du tegêhên din ku yek zêde bi qîmet e yanî ‘**durr**’ ku navê vê têgehê bixwe jî kelecaneke di mirovan de çê dike û têgeha din a ku tu qîmeteke wê tunebe, tîne ziman ‘**mirarî**’. Bi vî awayî dîmeneke ku ji nepeniyê, tirsê û kelecaneke hatiye avakirin nîşanê me dide. Ev dîmen jî hestên mirovan ên meraqê dixwe dewrê.

##### **4.6.2. Jiyan û Şertên Derdorê**

Jiyan û şertên derdor, di mamikan de zêdetir tesîrê li naverokê dike. Çimkî mirovek di jiyana xwe de bi çî tiştî re muxatab bibe, ew tişt dikeve alema wî. Ji ber wê

---

<sup>153</sup> Piraniya metelokan bi helbestkî afirandine, lê bi borîna demê û dev bo devî ango zargotin gelek ji qalibê xwe yê helbestkî qetiyane, beşek qafiyê û selîqa xwe wînda kirine, di encama zargotin û hizarbarkirinê de nêzikî pexşanê bûne. Bnr. Berwarî, *Metelokanê*, r. 23-25.

<sup>154</sup> Berwarî, h.c.

<sup>155</sup> Fevzi Karademir, “Halk Bilmecelerinin Oluşum ve Biçimlenmesindeki Etkenler Üzerine”, *Akademik Bakış Dergisi*, j. 14, Celabat-Kirgizistan, 2008, r. 2-5.



ye ku hin zanyar dibêjin fikr û hizra mirov bi cihê ku lê dijî re sînorkirî ye. Dema ku em bala xwe didin mamikan, em dibînin ku zêdetir jiyana gund û hawirdora gundan tê de dixuyê. Lê bi demê re em dibînin ku hin mamik êdî qala tiştên nû dikin. Ango mamikên berê qala kûsî, kêzik, hêk, mirîşk, lorx, tîfingê dikirin niha jî em dibînin qala pênûs, pirtûk, defter û wd. dikin. Di mamikên kurdî de ji ber ku hêj jiyana modern xwe nedaye nîşan, em mînakên bi vî şiklî kêr dibînin. Lê belê rastî ew e ku mamikên berê bi temamî resmekî jiyana mirovên berê ne.

Ji bilî van her du egeran di teşegirtina mamikan de jî pêkarên xwedîtesîr li jêr hatine rêzkirin:

#### **4.6.3. Mamikbêj û Derdora ku Mamik Tê de Tê Pirsîn**

Di mamikan de ji aliyê honandin, şewaz û taybetiyên ziman ve tesîra mamikbêjan gelek zêde ye. Çimkî mamik hunereke devkî û xwezayî ye. Yanî di wê kêlîkê de rewş, şert û mercên ku mamikbêj di nav de be, di şikilgirtina mamikê de tesîreke mezin çê dibe. Ji ber ku mamikbêj carinan dikare zêde gotinên mustehcen bibêje an jî li gor derdorê dikare heqaretê di nav de bîne ziman. Ev yek bi temamî di teşegirtina mamikê de rol dilîzin.

Mamikê mino, ser şeh dawî das, Ehmeqo de bêje dik. Çi ye? [ **Dîk** ], (Sadinî. M.X , r. 43)

Di vir de mamikbêj bi gotineke heqaretê mamikê diqedîne. Di mamikê de ev şewaz bi îhtîmaleke mezin ji tesîra derdor û samîmiyeta mamikbêj e.

Deyka te heru qefteka kîra dişut. [ **Kefçik** ], (Berwarî. M, r. 66)

Di vê mînakê de jî teşbîheke di navbera “kefçik” û “kîr” de heye. Di vir de jî dîsa mamikbêj li gor derdor û samîmiyeta wê derdorê ev mamik bi vê şewazê pirsîye.

#### **4.6.4. Devokî û Çanda Devkî**

Mamikbêjî hunereke devkî ye. Di hişê mirovan de çî hebe di wê kêlîkê de derdikeve holê. Bi taybetî jî belavbûna mamikan bi devkî çê dibe. Ev pêkar di teşegirtina mamikan de bûye sedema çend xalên din: Ew xal li jêr bi vî şiklî hatine rêzkirin:

##### **a) Çanda devkî di şikil, ziman û şewaza mamikan de xwezayîbûnê çê dibe**

Ji ber ku mamikbêj di derdorekê de di wê kêlîkê de bêtir ku bikeve bin tesîra tiştêkî din, mamikan dibêje ku ev jî rewşeke xwezayî derdixîne holê. Di berhemeke nivîskî ya din de dibe ku mirov li ser bifikire, binivîse û bi temamî jê bibe û careke din

binivîse. Lê belê di çanda devkî de ev yek ne wisa ye. Eger bibe jî bi rêya varyantan vê fonksiyonê bi cih tîne.

### **b) Çanda devkî dibe sedema varyantan**

Ji ber ku metneke nivîskî ya mamikan nîne, êdî ew mamik dikeve bin tasarûfa mamikbêjan. Êdî her mamikbêj li gor taybetiyên devoka xwe, çanda xwe ya wê civakê, heman mamikê ji nû ve saz dike. Wekî mînak:

Deve orya, pişkul firya? [**Tifeng**], (Berwarî. M, r. 60)

Ker zirrî, posil/pişkil firrî. [**Tifeng**], (Berwarî. M, r. 60)

Ker zirî, tersel firî, kê keve dibe mirî. Ew çi ye? [**Tiving**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 430)

Tişkî heye diore, bişkul ji dev difire. [**Tiving**], (Gazî. M, r. 31)

Dirêj enirî, fişqî jê firî? [**Tiving**], (Güneş. K, r. 52)

Di van mamikan de qest û mebest heman tişt e, lê belê ziman û şêwaz guheriye. Ev yek jî ji tesîra çanda devkî ye. Çimkî li deverekê **pişkul** li devera din **posil** an jî **tersel** an jî tişteki din dibe ku wek hev be.

### **c) Çanda devkî di rastnivîs û vegotinê de keyfîyetê çê dike**

Di vê xalê de jî ji ber ku mamika ku niha li ber destê me ye, ne ji mamikbêjê yekem ketiye destê me, em dibînin ku standardek tê de nîne.

Ez çûm serê milekê, hemû bûkê salekê? [**Rêwas-Rêwês**], (Güneş. K, r. 57)

Di vê mînakê de vegotîneke şaş a pirjimariyê heye ku di gelek devokên kurdî de ev yek wisa ye. Yanî qertafa pirjimariyê “ên” “**bûkên>bûkê**” tê daqurtandin û dibe “ê”.

Mamikê mino, kaxezek hate ji bin dinê, qet nayête xwendinê. Çi ye? [**Kîvark, nêrgiz, gul û giya**], (Sadinî. M.X , r. 204)

Di vê mînakê de jî di kişandina lêkeran de rengê devokê dixuye. Lêkera ku wek “nayê” tê kişandin, di vir de wek “nayête” hatiye kişandin.

### **d) Çanda devkî dibe sebeb ku mamik û cureyên din têkilî hev bibin û cureyêke din çê bibe**

Ji bilî mamikên resen di nav mamikan de ji hêla şêwaz an jî ziman ve mirov dibîne ku hin cureyên cuda hene. Di nav mamikên kurdî de jî cureyên wek *mamikên zûgotinokî*, *mamikên efsanewî*, *mamikên çîrokî*, *mamikên biwêjî*, *mamikên mantiqî* derketine holê.

Çil çîq in, çil ber çîq in, çil ode ne, çil mifte ne, çil kilîle ne, çil tê de ne. [**Genim**], (Gazî. M, r. 14)

Ev mînak ji bo mamikên zûgotinokî mînakeke di cih de ye.

Qazî bi qîzê va, mella bi jinê va, çar sêv bi darê va, her yek yekê jê dike, yek dimîne pê va. [**Qîza qazî jina mela ye.**], (Berwarî. M, r. 84)

Ev mamik jî ji bo cureya mamikên mantiqî mîna ke di cih de ye.

Çûme serê milekê, pê min kefte qulekê, min kir hewar, sed mêr hatin bi carekê.

[**Daqutana tûya**], (Berwarî. M, r. 54)

Ji bo mamikên çîrokî jî ev mînak dê di cih de be.

#### **4.7. Mamik ji Hêla Teşeyê ve**

Em ê di bin vê sernavê de mamikên kurdî ji aliyê teşeyê ve binirxînin û li gor qafiyeyê dabeşkirinekê çê bikin. Lê divê neyê jibîrkirin ku ji bo mamikan teşeyê standart dê her mîna xwe nemîne, ji ber ku mamik berhemên devkî ne û guherbar in. Ji bo ku baştir bê fêhmîkirin em ê ji xebata hevpar a Boratav û Başgöz li ser şiklê mamikan nirxandineke wiha neqil bikin:

“Şiklekî hişk û neguherbar ê mamikan tune. Piştî demekê heke mamikê careke din bê dubarekirin, dibe ku şikleke cuda ya ji berî xwe bistîne. Belavbûna metnekê ya di nav dem û warekî de, varyasyonên nû jê re peyda dike. Heman mamik hem bi awayê helbestkî hem bi awayê pexşankî, bi cureyên cuda û zêdebûn an jî kêmbûna malik û hevokan ve dikare bê dîtin. Şiklên cuda yên van heman mamikan di carekê de û bi serê xwe derneketine. Ev ji nav prototîpekê derketine û piştê dibe ku hatibin bişaftin an hatibin guherîn an jî bi zanebûnî hatibin durustkirin.”<sup>156</sup>

Mamik pêşî ji aliyê teşeyên xwe ve dibin du beş. Yek jê mamikên pexşankî ne, ya din jî mamikên helbestkî ne. Hem Boratav û Başgöz hem jî Alperen<sup>157</sup> vê dabeşkirinê dikin. Mamikên pexşankî bi awayê serbest bêtir ku tê de wezin û qafiyê hebin tên gotin. Piraniya wan kurt in û ev cure mamik her çiqas kêmbûn jî di kurdî de têra xwe hene. Lê dîsa jî ji bo piraniya mamikan dema ku em tiştê bibêjin bêguman ji bo ku mamik hunereke devkî ye, şêwaza helbestkî zêdetir tê bikaranîn. Ji bo yên pexşankî em wekî mînak:

Tenûrka êk kade. [**Bahîv**], (Berwarî. M, r. 54)

dikarin binirxînin. Ji vê mamikê piçek jî dirêjtir:

*Her ru sipêdê dayka te teşteka hêka dikit.* [**Girkêt hevîrî**], (Berwarî. M, r. 66)

Mamikên ku bi awayê helbestkî tên gotin piraî du malik, sê malik û çar malik in. Lê hin mamik hene ku ji çar malikan jî zêdetir in. Di kêşa mamikan de standarteke tekûz naxuyê. Hin mamik li hev tên, hin ji wan jî her çiqas qafiyê li hev bîn jî kêşa wan hev nagirin.

##### **a) Mamikên ku ji du malikan pêk tên**

<sup>156</sup> Boratav – Başgöz, “Türk Halk Bilmeceleri”, r. 5.

<sup>157</sup> Alperen, *Folklor ve Edebiyatın Unutulan Unsuru: Bilmeceler*, r. 121.

Qafiyeya van mamikan wek ‘aa’ rêz dibin. Mînak:

Qesra şûştî veşûştî,  
du feqe tê de rûniştî. [**Gûz**], (Akbaş. E, r. 67)

Sor û semawatî,  
şil çû zuha hatî. [**Nan**], (Gazî. M, r. 29)

**b) Mamikên ku ji sê malikan pêk tên**

Qafiyeya van mamikan piranî yan wek ‘aaa’ an wek ‘aab’ rêz dibin. Lêbelê cureyên ku bi ‘aab’ rêz dibin di nav mamikên kurdî de gelek kêr in. Mînak:

Çûme aşkî bêderî,  
keşekî li wê ye bêserî,  
qapûtkî lê ye bêberî. [**Hêk**], (Gazî. M, r. 15)

Helîle babû,  
reşêle sîyar bû,  
zarê malê tev pê şa bûn [**Dîza ser tendûrê**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 426)

**c) Mamikên ku ji çar malikan pêk tên**

Qafiyeya van mamikan piranî yan wek ‘aaaa’ an jî wek ‘aaba’ rêz dibin. Mînak:

Dêlka harî,  
çû koneka tarî,  
îna derî,  
hestiyê binê pê marî. [**Derzîk/şûjin**], (Berwarî. M, r. 66)

Masî çiv da,  
behrê kef da,  
nal sekînî,  
dil xeber da? [**Saet-Demjimêr**], (Güneş. K, r. 96)

Mamikên ku ji çar malikan zêdetir in gelek kêr in. Di nav mamikên kurdî yên li ber destê me de heke mamikeke ji çar malikan zêdetir be, wê çaxê sîstema kêşê an jî qafiyeyê diguhere. Her çiqas dîsa li gor estetîkekê û şibandina dangan çê bûbe jî sîstematîka wan a helbestkî xerab dibe. Ev mamika li jêrê ji bo yên ji çar malikan zêdetir mînakek e:

Şêrîno li darîno,  
darîno li gobelo,  
gobelo bi rê ket,  
pêpano pê ket,

çiz viz bi dorê ket. [Şêrîno: Tirî, Darîno: Selik, Gobelo: Ker, Pêpano: Însan, Çiz viz: Moz], (Gazî. M, r. 30)

#### 4.8. Mamik ji Hêla Vegotinê ve

Piştî ku me ji aliyê teşeyê ve mamikên kurdî nas kirin, em ê niha jî bala xwe bidin li ser vegotinên mamikên kurdî. Ji ber ku mamik hunereke hevpar a hemû neteweyan e, vegotinên wan di hemû zimanan de kêr û zêde dişibin hev. Di xebatên tirkî de heya niha bi awayekî rêk û pêk ên ku tesnîfa vegotina mamikan çê kirine, yek jê Boratav e yê din jî Karademir<sup>158</sup> e. Ji ber ku xebata Karademir gelek berfireh e û di teza me de jî hebûna wê dê ji armancê der be, em ê wek referans rêbaza Boratav ji bo tesnîfa vegotina mamikên kurdî bi kar bînin.

Boratav li gor vegotinê mamikan wiha dabeş dike:<sup>159</sup>

##### a) Mamikên ku destpêka wan di nav qalibekî de ne

- 1) Ew mamikên ku di serî de bi navê mamikê dest pê dikin wek: *mamikê mino, mamikê mino mamanî, tişteke min ji tiştan e, mamikê min e, mamikê mino maman e, tişteke min heye, tiştê min ê tiştanî...*
- 2) Mamikên ku bi gotinên mîna “*zevîkî min heye, darek heye*” dest pê dikin. Di vir de zevî û dar îşaret in ji bo bersivên mamikan. Ji wan mamikan yek wiha ye:

Darek heye pênc gulî, her gulîkî teyrek spî li ser. [Tilî û neynûk], (Gazî. M, r. 15)

Di vir de dar û tilî şibandine hev. Dema ku ji aliyê dewlemendkirina têgehên ziman û ji aliyê fikirîna afirîner ve mirov binirxîne, bi rehetî dikare bibêje ku ev mînak ji bo her du awayan jî rahênanek e.

- 3) Mamikên ku bi vê gotinê dest pê dikin: “*min ecêbek dît di rê de*” di vê gotinê de gesta mamikbêj ew e ku dê di berdewamiya mamikê de tişteke ecêb, fantastîk, awarte bîne ziman. Ev yek jî hesta meraqê û tirsê ya di dilê zarokan de tîne der. Ji bo balkişandin û fêrbûnê jî rêbazeke li pêş e.
- 4) Mamikên ku bi pirsyariya “*ew çi ye?*” dest pê dikin. Li gor ku Boratav dibêje ev her du cureyên dawî yên mamikan ji bo kesên xwe zêde zana dihesibînin tên gotin.

##### b) Mamikên ku pirsên wan ji texlîda dengên pêk tînin

<sup>158</sup> Bnr. Fevzi Karademir, “Kalıp Kullanımları Bakımından Türk Halk Bilmeceleleri”, *Türk Dünyası İncelemeleri Dergisi*, cilt: VII, j. 2, İzmir, 2007, r. 103-132.

<sup>159</sup> Boratav, *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*, r. 126-127.

Ji bo vê cureyê jî em di mamikên kurdî de kê m û zêde mînakên wiha dibînin: *çîz û vîz, çîz tê çîzevîz tê, teq tê teqe-teq tê, hiltîto miltîto, helheloko melmeloko, hilkutî, milkutî* û hwd.

Teq û req li jor, li ban dixê li jêr û jor? [**Çeqçeqa aş**], (Güneş. K, r. 129)

### c) Mamikên ku tê de lîstina peyvên çê dibe

- 1) Hin mamik hene di nav xwe de bi tîpeke peyvê dilîzin û bersiv jî di eslê xwe de rastiya wê peyvê ye.

Mamkê mino, ker firî? [**kew difire**], (Güneş. K, r. 95)

Ev cureyê mamikan çewtiyeke mantiqî dipirse. Ji ber ku “ker” nikare bifire, peyva herî nêzî wê peyvê “kew” e û kew dikare bifire. Yanî lîstika peyvê li ser ker û kewê ye.

- 2) Di pîrsa mamikê de bi zanetî şaşiyên kirpandin û xalbendiyê tîr kirin û bi vî awayî hiş tevlihev dibe.

Mamikê mino, hezar û heftsed feqe, di bin berikekê de radizên. Çi ye?

Di vê mamikê de navê zîlamî Feqe ye û du jin hene. Navê yekê Hezar a dî jî Heftsed e.<sup>160</sup>

- 3) Lîstika sêyem jî bersiva mamikê bixwe di nav mamikê de tê dayîn.

Mamikê mino, sê cara pênc, pazde. Dike çend? [**Pazdeh**], (Sadinî. M.X, r. 111)

- 4) Ji bo pîvana zanebûna tîpên alfabeyê hin lîstikên wisa tîr lîstin. Carinan jî hin tîpên erebî û latîne berawirdiya wan tê kirin û bi wî şiklî hiş tê tevlihevkirin.

Li mam heyê, li xal tune, li mal heyê, li bal tune? [**tîpa “m”yê**], (Güneş. K, r. 92)

### d) Mamikên li ser heman tiştî û bi şewazeke li dij hev tîr şayesandin

Di van mamikan de jî zêdetir li ser lêkerên “heyê” û “tuneyê” avakariya mamikê çê dibe.

Baskê wî heyê çûk nîne, qîloç heyê beran nîne? [**Mêş**], (Güneş. K, r. 33)

Zir zir tûle, eyar heyê mû tune, xwarin heyê gû tune? [**Qirnî-kirnî**], (Güneş. K, r. 137)

## 4.9. Metafor û Metonîmî di Mamikan de

Berî ku em di mamikan de metafor û metonîmiyê vebêjin, divê em pêşî li ser tîkiliya di navbera folklor û ziman de îzahatekê bikin. Li ser vê meselê Murat Cankara ji *Ansiklopediya Folklore* derbarê vê tîkiliyê de vegotîneke wiha neqil dîke:

“Folklor û ziman ji gelek hêlan ve dişibin hev û van xalên hevpar ên di navbera her duyan de, rê li pêşiya danûstandîneke dahêner a di navbera wan zanistên ku

<sup>160</sup> M. Xalid Sadinî, *Mamikên Kurmancî*, Nûbihar, Stenbol, 2011, r. 233.

li ser folklor û ziman dixebitin, vekiriye. Çi di folklorê de çi di zimanzaniyê de be, lêkolîner li ser berhemên kompleks ên ku wan hem bi hev ve dikin hem jî ji hev dikin, radiwestin. Ziman an folklor dema ku di civakekê de hatin parvekirin, bêyî ku eleqeya xwe bi afirîner, dem, karhêner û derdora xwe ve qut bike, barkêşê “wateyekê” ne ku ew her daîm pircure dibin. Her du jî bi tecrûbe û terza jiyana bikarhênerên xwe ve şikil digirin û piştî jî ji bo şikilgirtina kultûr û civakên ku di nav de dijîn, dibin alîkar.”<sup>161</sup>

Di têkiliya folklor û ziman de du xalên sereke derdikevin pêşîya me: Ya yekem mirov wisa bihesibîne ku folklor bixwe an jî berhemeke folklorîk wek “ziman” xwe ava dike û folklorê bi wî şiklî binase. Ya duyem ew e ku li ser “ziman”ê ku di folklorê an jî berhemeke folklorîk de tê bikaranîn, ji hêla nirxandina zimanzaniyê ve raweste.

Di têkiliya ziman û folklorê de Yıldırım, Pertev û Aslan di xebateke hevpar de wiha dibêjin: “Folklornas heya radeyekê zimanzan in, lewra divê ziman û zaravayên berhemên ku li ser wan dixebitin baş bizanin.”<sup>162</sup> Piştî ku vê tespîtê dikin li ser têkiliya folklorê kurdî û zimanê kurdî nêrînên xwe wiha tînin ziman:

“Bi taybetî ji bo folklornasên kurdan dema ku li ser civaka kurdî lêkolînan bikin divê hemû zaravayên zimanê kurdî û her wiha devokên van zaravayan li ber çavan bigirin. Lewra taybetmendiya folklorê ya herî girîng aliyê wê yê devkî ye, ku ev jî rasterast bi ziman ve girêdayî ye. Ziman hem amûrê neqilkirina çandê ye, hem jî xwedî hêmanên çandî ye. Eger mirov li zimanê miletekî binêre, mirov dikare fam bike ku ew millet bi çi awayî fikiriye û jiyaye. Carinan gotineke pêşîyan, biwêjek, heta mamîkek dibe ku bibe neynik ji bo çanda civakan. Her wiha di zimanê civakekê de bi rêya navên kesan, navên amûr û amanên, navên ajel û rihekan, mirov dikare der bareyê çanda wê civakê de gelek encamên zanistî bi dest bixe.”<sup>163</sup>

Piştî ku têkiliya folklor û ziman bi vî rengî di hişê me de zelal bû, em ê li ser hunerên ziman ên wek metafor û metonîmiyê li ser bingehên zimanzaniyê û bi mînakdayîna mamîkên kurdî rave bikin.

Nêrîna yekem li ser langue (ziman) ye. Nêrîna duyem jî li ser parole (gotin) e. Wek ku Cankara jî gotî ji bo nêrîna duyem xebatên ekola Pragê û yê Roman Jakobson

<sup>161</sup> Murat Cankara, “Metafor Yaratma Eylemi Olarak Bilmece”, *Millî Folklor Dergisi*, j. 55, r. 71-72.

<sup>162</sup> K.Yıldırım, R.Pertev, M. Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Mardin Artuklu Üniversitesi, Mêrdîn, 2013, r.35.

<sup>163</sup> H.c.

wekî mînak tèn nîşandayîn. Ew jî li ser geşedena ziman a dîrokî ranaweste, li ser bikaranîna ziman a di heyameke eşkere de radiweste.<sup>164</sup>

Li vir mijara ku me eleqeder dike ev e ku ji aliyê pêşxistin û geşedana ziman ve tesîra mamikan çi ye? Yanî em ê li ser hêla ziman a parole(gotin)ê bisekinin. Metafor û metonîmî jî di vê beşê de derdikeve pêşberî me:

“Tiştê ku di mamikê de tê pirsîn, gelo çawa tê ziman? Tiştê ku di mamikê de hatiye veşartin an jî dixwaze bê dîtin, bi çi şiklî pêşkeşê me dike? Ger mamik ji hêlekê ve tişteki veşêre û ji hêla din ve jî hin delîlan nîşanî me bide û vê yekê bi zimanekî nerasterê pêşkeşî me bike û van her du rêbazan jî yanî (hem veşartin û hem jî bikaranîna şêwaza nerasterê) bi saya serê ziman bike, wê çaxê ev wate jê derdikeve ku mamik û helbest pir zêde dişibin hev. Em ê jî ‘metafor’ û ‘metonîmî’ yê wek zimanê avakar ê ‘veşartin’ û ‘şêwaza nerasterê’ vekolin.”<sup>165</sup>

Di fêrbûna axaftinê ya ziman de du pêkarên ku derdikevin pêş hene. Ev du pêkar di heman demê de bi hunerên metafor û metonîmiyê re jî têkildar in:

**Pevvekirin:** Her hêma ji hêmayên din diafire û dema ku di nav hêmayên din de cih bigire, hebûna xwe nîşan dide. Ev jî nîşan dide ku her xaleke zimanzaniyê hem di nav xwe de hem jî di nav sêwirandineke kompleks de barê pevgirêdanê hildigire. Di pevvekirinê de têgeh li ser bingeha ku dê bi hev ve bin, li rex hev rêz dibin. Di encama vê yekê de jî di ziman de (horizontal axis/eksena asoyî) derdikeve holê. Di vir de peyv li rex hev rêz dibin û her peyv bi peyva beriya xwe ve dibe û zincîr ango hevokekê ava dikin. Metonîmî jî ev tişt bixwe ye.<sup>166</sup>

**Hilbijartin:** Ji nav du alternatîfan hilbijartinek e ku ev hilbijartin alternatîfên hev bin. Yanî ev tê wê maneyê ku yan mirov hêmayeke wek wê be yan jî hêmayeke ku ji wê cuda be, lê hêmaya cuda bikaribe bikeve şûna wê. Mîna ku ev hilbijartin wek du rûyên cuda yên pelekê bin. Hilbijartin jî aliyê zimanî yê (vertical axis/eksena stûnî) ye. Hin têgehên ku ji nav wan hilbijartinek pêk were, heya astekê yan dişibin hev an jî li dij hev in. Ji nav komepeyvekê peyvek tê hilbijartin bi şertê ku ev peyv yan bişibe peyva ku di şûnê de tê bikaranîn an jî xwedî maneyek li dij wê peyvê be. Metafor jî ev yek bixwe ye.<sup>167</sup> Di mamikan de jî em herî zêde aliyê ziman ê metaforîk dibînin. Çimkî him veşartin heye him jî delîl di nav mamikan de dihewin. Di vir de jî barê herî giran li ser pişta ziman dimîne. Yanî divê hem nîşan nede hem jî meraq û cezbekê ji bo

<sup>164</sup> Cankara, “Metafor Yaratma Eylemi Olarak Bilmece”, r. 72.

<sup>165</sup> H.b, r. 71.

<sup>166</sup> H.b, r. 72-73.

<sup>167</sup> H.c.



balkişandinê ava bike û vê yekê jî bi bêje û têgehane bîne der. Em ê niha sê mamikan ji vê hêlê ve binirxînin:

Şiva ter, gilover, ew çi ye? (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 421)

Mamika yekem ev e û bersiva wê jî **mar** e. Peyvên *ter* û *gilover* ji aliyê qafiyê ve hêzê didine mamikê ku ev yek jî tameke helbestê diafirîne. Di vê mamikê de tiştê ku metaforê diafirîne jî *şiv* û *mar* in. Çimkî di vir de şiv di şûna mar de hatiye bikaranîn û di navbera wan de teşbîhek hatiye çê kirin. Ji ber ku şiv hem dirêj e hem jî wek marê zirav e, ji aliyê şibandîne ve di cih de ye. Lê belê ev jî têrê nake û mamik îcar li cureyeke şivê ya ku herî zêde dişibe marê digere ku ew jî *ter* e. Çimkî mar jî bê hestî û nermik in. Hê jî pê de diçe û delîlên xwe zêde dike ku ew jî hem taybetiyeke sereke ya mar e hem jî ya tiştên nerm û ter in ku ew jî dikare bê tewandin. Ango giloverbûn e. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku di vê mamikê de **şiv** metafora **mar** e ku di şûnê de hatiye bikaranîn.

Tûj e weke şûr, xweş e weke bilûr? (Güneş. K, r. 129)

Di vê mamikê de em mecaz, dijayetî û metaforê bi hev re dibînin. Bersiva vê mamikê jî **ziman** e. Ev mamik jî dîsa ji aliyê muzîkalîteyê ve bi hêz e. Metafora vê mamikê jî di navbera *şûr-bilûr* û *ziman* de ye. Helbet di vir de teşbîheke fizîkî tune ye lê belê mecazî heye ku ew jî şûr di eslê xwe de ji bo parastin û êrişê tê bikaranîn. Yanî teşbîha di vir de ji ber ku mecazî ye, di eynî demê de fonksiyonel e jî. Çimkî ziman jî ji bo parastin û êrişê tê bikaranîn. Bilûr jî dîsa ji bo rahetiya can û ruhê mirov xwedî dengê zîz e ku ev jî ji aliyê fonksiyona xwe ya dengî ve şibiyaye ziman. Mecaza duyem a di mamikê de jî sifetên *tûj* û *xweş* in ku em jî dema ku qala ziman dikin, van her du sifetan pîrî caran bi kar tînin. Dijayetiya di mamikê de jî di eslê xwe de bo temamkirina metaforê ye. Çimkî ziman ji du rewşên li dij hev pêk tê. Carinan tûj e û carinan jî şîrîn û xweşik e. Yanî ji her duyan yek jî kêma bimîne dîsa metafor lawaz dibe. Ji ber wê em dibêjin ku di vir de *şûr û bilûr* di vê mamikê de metafora *ziman* e.

Ser e mişarû, pê xeparû.

Di vê mamikê de jî muzîkalîteyek heye. Bersiv jî **dîkil/dîk** e. Di vê mamikê de du metafor hene û ji bo çareserkirina bersivê jî hewcedariya van her du metaforan hene. Çimkî ji metaforan yek *mişar* e ku ev serê dîkilê îşaret dike, metafora din jî *xepar* e ku ew jî pêyên dîkilê îşaret dike. Metafora tam a ku dîkilê li ber çavên me zindî dike, ji her du metaforan pêk tê. Ev yek jî bi xwe re metonomiyê çê dike. Çimkî ne mişar ne jî xepar bi tenê serê xwe nikarin bersivê îzah bikin. Lê dema ku perçe di şûna tevahiyê de

tê bikaranîn ango pêşî mişar yanî serî piştî jî xepar yanî pê derketin holê êdî mirov ji van her duyan metaforê ava dike. Yanî serekî mişar + pêyên xepar = dîkil.

#### 4.10. Mamik û Zarok

Zarok hêj di hemla dêya xwe de dikeve proseya fêrbûn û geşedanê û piştî ku ji dêya xwe çê bû, ev prose her berdewam e. Di vê proseya fêrbûnê de rola gelek pêkaran heye. Zarok piştî ku hate dinê jî ji bo ku têkiliyekê bi derdorê xwe re çê bike hêdî hêdî hînî ziman dibe. Di geşedana ziman a zarokan de seyreke xwezayî heye. Di vê seyrê de pêkarên ku ji derve tesîrê li vê geşedanê dikin zêde ne. Yek ji van pêkaran jî mamik in ku ji aliyê ziman ve gencîneiyên hêja ne.

Ji aliyê tesîra mamikan a li ser geşedana zarokan de Hûlya Çevirme wiha dibêje: “Zarok ji heyama ewil a zarokatiya xwe û pê ve divê li gor alema maneyê bi peyamên dîtbarî, bihîstbarî û zimanî re rû bi rû bimîne. Ji cureyên berhemên gelêrî yên wek stran, lorîk, payîzok, zûgotinok, mamik ku di zarokatiyê de ji zarokan re tîr vegotin ji wan re deriyê têgehên zimanê wan vedikin. Peyv, biwêj, qalibên gotinan, wecîze û gotinên pêşiyên û mûsîqîya ziman a zimanekî bi saya berhemên gelêrî digihêjin zarokan. Qaîdeyên zimanekî û rêbazên vegotina wî zimanî pêşî bi saya vegotinên gelêrî, di jiyana rojane û zimanê rojane de di zarokan de di merheleyeke xwezayî de bi cih dibe. Piştî ku ev vegotinên gelêrî derbasî nivîsê dibin îcar fêrbûn li ser nivîsê didome.”<sup>168</sup>

Di alema zarokan de cihê mamikê û derbarê tesîra wê ya li ser zarokan de bi taybetî jî rola wê ya di geşedana ziman de Sedat Sever wiha dibêje:

“Mamik amûrên lîstikê ne ku ji peyvan hatine der û zarok di nav vê lîstika peyvan de diçin alemeke xeyalî. Mamik bi zimanê xwe yê helbestkî zarokan vedixwîne lîstikeke jîrahiyê ku bi ziman hatiye honandin. Zarokan dixwe rewşeke wisa ku hemû zanînên xwe careke din di hişê xwe re derbas bikin û her wiha dike ku zarok di navbera bûyer, diyarde û têgehên de têkiliyan peyda bikin. Mamik bi alîkariya peyvên dubarekirî û biwêjan jî wê erka xwe ya di ziman de dide nîşan.”<sup>169</sup>

Di pêşketina estetîka zarokan a di ziman de Karakaş ji Kemal Demiray pasajeke wiha neqil dike: “Zarok piştî sê saliya xwe bi mamikan re eleqedar dibin. Ji dîtina bersiva mamikekê hewla ku zarok dikevin navê, wan teşwîqê fikirîne dike û her wiha alîkariya têgihîştina heyberan dike. Mamik bi saya qafîye û kêşa xwe, cara ewil tahma helbestê dide zarokan. Zarok ji vê şahiya ku wan sewqî kifşkirina tiştêkî veşartî dike,

<sup>168</sup> Hûlya Çevirme, “Şiirsel Halk Edebiyatı Ürünlerinin Çocuğun Dil Eğitimine Katkıları”, *İnönü Üniversitesi, Eğitim Fakültesi Dergisi*, cilt: 5, j. 7, 2004, r.1.

<sup>169</sup> Sedat Sever, *Çocuk ve Edebiyat*, Kök Yayıncılık, Ankara, 2003, r.140.

kêfxweş dibin. Kifşkirina her tiştêkî piçûk bixwebaweriya wan xurt dike.”<sup>170</sup> Mirov têdigihêje ku mamik ne tenê ziman belkî ji gelek aliyan ve alîkariya perwerdebûna zarokan dike. Bê guman ev jî ji ber gelêrbûna mamikê ye ku hem di xwe de qaîdeyên ziman hem jî kultûra civakê dihewîne û di ber de jî bi şêwaza xwe tahmeke edebî dide mirovan. Piştî ku Karakaş van gotinan neqil dike bixwe jî digihêje encamekê û fikra xwe bi me re wiha parve dike: “Mamik li ser hêza mûhakeme û zengînkirina xurcika peyvan a zarokan roleke mezin dilîzin. Çimkî zarok cîhanê hêj nû nû dinasin, tişt û objeyan hêj nû têdigihin. Mirov dikare bibêje ku mirov bi mamikan hişê xwe didin xebatê. Çawaniyeke xurt ya mamikan heye ku di geşedana zîhnî û kultûrî ya zarokan de bibe alîkar. Fikirîn û xeyalkirina ku zarok ji bo kifşkirina mamikan xerc dike dê ji bo têgihîştina berhemên nivîskî û dahatûyê, wê amade bike.”<sup>171</sup>

Di bikaranîna mamikan de sudeyên wê yên ji bo zarokan bêhempa ne. Bi rastî tenê ne ji aliyekî, ji gelek aliyan ve zarok bi guhdarîkirina mamikan pêş dikeve. Mîna ku Mihemed Elî jî gotiye mamik lîstikek e û lîstikvanên wê jî zarok in. Îcar lîstikvan dibin du bere yên ku dipirsin ên ku bersivê didin. Ji ber ku bi vî awayî reqabetek derdikeve holê di lîstikê de xelatdayîn û sezakirin jî çê dibe. Yanî kelecana lîstikê hew qas zêde dibe ku fêrbûn tê de bi rêyên xwezayî çê dibe. Her wiha wek pêşbaziyekê zarok zîrekiya hev dipîvin. Ji ber vê yekê her ku pêş dikevin mamikên diwartir ji hev dipirsin û sînore fikirîne didine zorê.<sup>172</sup> Ji bo kesayetiya zarokan jî mamik xwediyê gelek mifayan in. Mihemed Elî piştî ku çend heb mamikên kurdî rêz dike ji bo mifayên wan tespîteke wiha dike:

“Dema ev mamik ji zarokan tîn pirsîn, ew ne tenê li bersiva wan digerin, lê ew berî kelexa vî tiştî di serên xwe de nîgar dikin û bêtirî grîmanekî (egerekê) di serê xwe de diafirînin. Li vir du mifayên bêqam ji kesayetiya zarok re peyda dibin: yek, ev tişt dihêle zarok ramangeriya xwe bigerîne û melevaniyê di pindara xwezayê de bike û bi dehan tiştan di solixekê de di ber hişê xwe re derbas bike, mebest jî teqez ev e ku hişmendiyeke livok û fireh di bîreweriya zarok de peyda bibe û asoyên aqilê xwe bê sînor bike. Du, wek ji mînanan jî dixuye ev mamik bi kurdî ne, ango tevahiya ramangeriya zarok dê bi kurdî be û baş tê zanîn lîstik yekemîn rêgezê ku zimanê zarok diçîne û tiştê ku zarok di

<sup>170</sup> Kemal Demiray, *Açıklamalı Çocuk Edebiyatı Antolojisi*, İnkılâp ve Aka Basımevi, İstanbul, 1977. Vgz. Karakaş, *Ortak Anonim Türk Halk Edebiyatı Ürünlerinden Bilmecenin Çocuk Edebiyatına Katkıları*, r. 815.

<sup>171</sup> H.c.

<sup>172</sup> Mihemed Elî, *Çîvanok û Tiştonek*, r.1.

temenê xwe yê zû de pê lîstiyê heya mirinê ji serê wî naçe, ev jî hemana tev girîng ji bo zarokê kurd e...<sup>173</sup>

Mamik ji aliyê serwextbûn, îdraqkirin û baldarbûnê jî mifayên zêde mezin didin zarokan û di pêşketina wan de dibin alîkar. Derbarê vê babetê de Önür ji Karakaş pasajeke wiha neqil dike:

“Mamik ji hêla serwextiya ziman û dîtbarî ve zarokan pêş dixê. Di pêvajoya geşedana zarokan de ji esasên herî girîng yek jê jî bihêzkirina serwextiya zarokan e. Bi saya mamikan zarok li hemberî derdora xwe, tiştên ku dibîne, dibihîze zêdetir baldar dibe û bi heyînan û rewşan dihese. Mamik bi rêbaza ji tiştên razber peydakirina tiştên şênber an jî bi delîlên şênber ên ji bo taybetiyên tiştan serwextbûna zarokan bi pêş dixê.”<sup>174</sup>

Ji bilî serwextbûnê tesîra mamikan li ser afirîneriya zarokan jî çê dibe. Dîsa di vî warî de Önür bi me dide zanîn ku mamik livoka hêza afirîner a zarokan e. Çimkî mamik bi awayekî razber ji zarokan daxwaza tiştêkî şênber dike. Zarok vê tiştê razber di alema xeyalên xwe de vediguherîne made û maneyekê û jê re bersivêkê dibîne.<sup>175</sup> Zarok pîrsa ku jê tê pîrsîn, di hişê xwe de dixê qalibekî û ji îşaret û teşbîhên di nav de jî xwe digihîne encamekê.

Li gor asta zarokan hîlbijartina mamikan jî babetêke muhîm e. Her mamik dibe ku ne li gor alema zarokan bin an jî her têgeh û heyînen ku di mamikan de diborin dibe ku bala zarokan zêde nekişînin. Di vî warî de Şahin Köktürk wiha dibêje:

“Divê mirov di hîlbijartina mamikan a ji bo zarokan de baldar be, çimkî mamikên ku em ji bo wan hildibijêrin divê eleqa xwe bi objeyên di alema zarokan de hebe. Di vê hîlbijartinê de pêşî divê mirov obje û heyînen wek (çiya, daristan, çem, gol, dar, asîman, hîv, tav, stêrk, ewr, baran) derxîne pêşberê zarokan.”<sup>176</sup>

Zarok di mamikan de qasê ku tiştinan fêr dibe hew qas dikare kesê li hemberî xwe jî fêrî tiştinan bike. Çimkî mamik vegotîneke dualî ye ango yek dipirse yê din jî li dûv bersivê dikeve. Mîna ku Köktürk jî gotî dema ku zarok li dûv bersiva mamikan ket dê hêdî hêdî rûyê veşartî yê mamikê ronî bike û bala xwe bide têkiliya di navbera objeyan de û bêyî

---

<sup>173</sup> H.b, r.2.

<sup>174</sup> A. Karakaş, “Anonim Türk Halk Edebiyatı Ürünlerinden Bilmecenin Çocuk Edebiyatına Katkıları”, *Karadeniz Dergisi*, j. 2, r. 44-52. Vgz. Aysun Önür, *Türkçe Öğretiminde Bilmecenin Yeri ve Önemi*, r. 44.

<sup>175</sup> H.g, r. 46.

<sup>176</sup> Şahin Köktürk, “Çocuklara Şiirin Felsefenin ve İmgesel Dünyanın Kapılarını Açan Tür Bilmeceler”, *HECE Dergisi*, Yıl. 9, j. 104-105, Ankara, 2005, r.124.

ku hay jê hebe dê gelek tiştan fêr bibe. Helbet di vê navberê de jî tiştê ku fêr bûye, dê bixwaze ji yekî din bipirse an jî fêrî hin kesên din bike.<sup>177</sup>

Bi kurtî mamik ji gelek aliyan ve di geşedana zarokan de bi taybetî ji bo zarokên berî dibistanê vegotinên zêrîn in. Ji aliyê zêdekirina peyvan, axaftina tekûz, fêrbûna kultûrê û ji aliyê pratîzekirina zêhnê, xurtkirina serwextî, baldarî û îdraqê û ji bo motîvasyon û bixwebaweriya zarokan û tahmkirina teqdîrê ji aliyên kesên din ve mamik gencîneyên veşartî bo zarokên me ne.

#### **4.11. Mamik di Çarçoveya Geşedana Hizrê de**

Ziman û hizr wek pêçiyên destekî bin. Ango ziman bêyî hizrê nikare xwe îfade bike û hizir jî bêyî ziman nikare dirûveke şênber bigire. Gelek zimanzanan jî gotine ku têgeh di hizrê de maneyekê digire, ruh distîne û qalibekî ji xwe re çê dike û vê yekê bi mekanîzmaya ziman ji bo têgihîştin û têkiliya mirovan dixê dirûveke şênber wek peyv, hevok, îfade û hwd. Pêşketina van her du mekanîzmayan jî di destê mirovan de ye. Herî zêde yê ku tesîrê li van dike pênc hîsên mirovî ne wek bihîstin, dîtîn, bêhnkirin, destdayîn û axaftin. Çimkî hizr her çiqas bi zêde tiştan re muxatab bibe xebitîna wê jî zêde dibe yanî serêşandin an jî fikirîn, ponijîn, mûhakeme û fonksiyonên din ên zêhnê dikevin dewrê û her ku zêde dibe ev mekanîzma hewcedariya fonksiyonekê dibîne ku vê ramangeriya xwe bi dirûveke şênber derxîne holê. Zarok dema ku cara ewil heyînekê dibînin, dixwazin binasin û li ser bifikirin û bipirsîn da ku xwe tatmîn bikin. Zarok her ku mezin dibin dinyaya wan jî bi vî şiklî fireh dibe. Piştî ku mekanîzmaya fîzîkê ya ziman jî tê de bi cih dibe, van tecrubeyên xwe dixwaze bixwe bîne ziman. Li gor heyamên jiyane ev tecrube xurttir dibin û bi vê yekê re ziman fonksiyonel dibe. Ji bo fonksiyonelbûna ziman, mamik jî yek ji wan tecrubeyan e ku zarok ji sê saliya xwe pê ve pê re muxatab dibe û di konseptên hizir û ziman de ji xwe re bi kar tîne. Yanî mamikek tê pirsîn û zarok dest bi fikirîna dibe, tecrubeyên xwe yê din tîne hewara xwe û di nav têgeh û teşbîh û gotinan de melevaniyê dike û digihîje encameke nû. Ji ber vê yekê edebiyat û di bin banê wê de jî vegotinên gelêrî û bi taybetî jî mamik ji bo geşedana hizr û ziman gelekî muhîm in.

Di geşedana zêhnê ya zarokan de tesîra mamikan ji aliyê Önürê ve jî wiha hatiye xulasekirin: “Para mamikan di geşedana zêhnê ya zarokan de zêde ye. Mamik zarokan sewqî fikirîna dibe. Dema ku zarok mamik rast bihîst û fêhm kir, ji ber peydakirina bersîvekê dê hişê xwe bixebitîne. Di nav têgehên de têkiliyên wateyî durust dike. Bi

---

<sup>177</sup> H.g, r. 126.

rêya teşbîh û delîlên di nav mamikan de dest bi mûhakemeyê dike û ev yek jî arîkarê geşedana zêhnî ya zarokan dike.”<sup>178</sup> Ji bilî vê rola mamikan a li ser geşedana zimanê bihîzdar (receptive language) û zimanê vebêjî (expressive language) ya zarokan jî tîne bîra me. Çimkî mamik hunereke vegotinî ya dualî ye. Hem mamikbêjek heye hem jî kesekî ku li dûv bersivê digere heye. Wekî din di têkiliya mamik û hizrê de Balta li ser sê cureyên fikirînê rawestayê û wiha dabeş kiriye: *fikirîna afirîner, fikirîna rexneyî û qabiliyetên çareserkirina probleman*.<sup>179</sup> Em ê niha der barê van her sê xalan de çend tişt bibêjin.

#### 4.11.1. Fikirîna Afirîner

Fikirîna afirîner ji cudabûna rê û rêbazên heyî û lêgerîna yên nû ye. Yanî tiştê heyî êdî klasîk e û divê mirov bi awayekî nû bifikire û çareseriyê nû bibîne. Derbarê vê de Balta ji Tootanceyê wiha neqil dike:

“Li beramberî probleman, kêmasî û valahiyên zanînê û hûrgiliyên ku ji bala mirov derketine, nîşandayîna hesasiyetekê ye. Pênaseya zorbûnê, lêgerîna çareseriyê, texmîn û avakirina hîpotezan, li gor rastiyê lêpîrsîna hîpotezan, careke din lêpîrsîn ta ku mirov gihişt encamekê fikirîna afirîner derdikeve holê.”<sup>180</sup>

Afirînerî hesabkirina şert û mercan e û li gorî wê peydakirina çareseriyê nû ye. Fikirîn jî ne çûyîna li pey ya xuyayî ye, lêgerîna li dûv ya veşartî ye. Bi vê mebestê Balta bi me dide zanîn ku mamik vegotinên wan kesan in ku ew kes dikarin di paceyê cuda de meseleyan temaşe bikin, temrînên zêhnî çê bikin, çareseriyên xweser peyda bikin, bi lez û fireh bifikirin. Ji ber vê jî têkiliya mamik û fikirîna afirîner derdikeve holê. Çimkî mamik li gor ku Elçin jî gotî di zanîn, jîrahî, mûhakeme, hafîza, baldarî û lezbûnê de wek pêşbaziyê kesê herî baş tê dîtin. Gotinên mamikan ên ku dixapînin ji bo jîrahîyê wek testek e û her wiha şêwaza veşartî jî ji bo ku mirov guhên xwe zêde bide ser û baş bifikire rêbazeke serkeftî ye.<sup>181</sup>

#### 4.11.2. Fikirîna Rexneyî

Köktürk dibêje ku mamik tenê ji bo kêf û demborandinê nînin. Bi vê yekê re zarokan sewqî fikirînê dike. Ji ber ku metnên têkilhev in, di lêgerîna bersivê de

<sup>178</sup> Önür, *Türkçe Öğretiminde Bilmecenin Yeri ve Önemi*, r. 44.

<sup>179</sup> Balta, “Bilmecelerin Dil-Düşünme Bağlamında Eğitimdeki Yeri ve Önemi”, r. 894.

<sup>180</sup> H.g, r. 895.

<sup>181</sup> H.c.

fikirîneke piralî divê. Dîsa ji bo pêşxistina qabiliyetên analîz û sentezê, zimanê helbestkî û felsefî û metafor û delîlên veşartî yên di mamikê de muhîm in.<sup>182</sup>

Balta jî stratejiyên fikrîna afirîner ên Paul û hevalên wî yên ku li ser mamikan hatine dîtin wiha neqil dike:

“Bi saya mamikan mirov dikare qabiliyetên zêhnî yên wek berawirdkirina rewşên wekhev, pêşxistina nêrîneke serbixwe, analîzkirin û zelalkirina peyv û gotinan, baldariya li ser teşbîh û tezatan, jihevderxistina diyardeyên eleqedar û bêeleqe bi pêş bixe.”<sup>183</sup>

#### 4.11.3. Qabiliyetên Çareserkirina Probleman

Ji ber taybetiya mamikan a pirs û bersivê rengkî wê ya problemên devkî heye. Çimkî çareserkirina probleman ew e ku mirov ji tiştên tê zanîn dest pê bike û bi awayekî sistematîk û analîtîk bigihêje tiştên ku nayê zanîn. Her wiha metafor û delîlên di nav mamikan de ji bo çareserkirina problemê pêkarên girîng in. Zarok dê hemû hêmayan bînin cem hev, bidin ber hev, cudahî û wekhevîyên wan hîn bibin û li gor van tiştan biryarekê bidin.<sup>184</sup>

Kiryarên bi vî rengî ku bi saya mamikan pêk tên, di zarokan de herî zêde mekanîzmaya ziman bi pêş dixê. Çimkî hiş bi temamî li ser têgeh û metafor, gotin û hevokan dixebite. Fikirînên piralî, di mamikan de dibin sebeb ku bi awayekî tekûz rûniştina têgehên a di hişê mirovî de pêk bîne. Ji ber vê jî di fêrkirina têgeh û xurtkirina xurcika peyvên de sedemên ku mamik çima wek vegotîneke alîkar tên dîtin, ji hêla Balta ve wiha hatine rêzkirin:<sup>185</sup>

- a) Li gor stratejiya pirs û bersivê ne.
- b) Ji ber ku atmosfereke pêşbaziyê tê de heye, teşwîqê zêde dike.
- c) Wekhevî û cudatîyên obje an jî heyînan pêşkeş dike.
- d) Bi alîkariya hêmayan di hiş de dîmeneke şênber ava dike.
- e) Bi saya bêjeyên arîkar koordînasyonê ava dike.
- f) Şopandina rêbazên enduksiyonê pêwîst dike. (ji perçeyê ber bi bitûnê)
- g) Bi saya qafîye û dubarekirinên deng û gotinan, mayîndebûna têgehên di hiş de bi pêş dixê.
- h) Şêwaza honandinê tesîrê li ser mayîndebûnê di hiş de dike.

<sup>182</sup> Şahin Köktürk, “Çocuklara Şiirin Felsefenin ve İmgesel Dünyanın Kapılarını Açan Tür Bilmeceler”, 2005, r. 124.

<sup>183</sup> Elif Emine Balta, “Bilmecelerin Dil-Düşünme Bağlamında Eğitimdeki Yeri ve Önemi”, r. 896

<sup>184</sup> H.g, r. 897.

<sup>185</sup> H.g, r. 894.

Önür jî têkiliya ziman û mamikan dinirxîne ji bilî kilîşeyên klasîk wek dewlemendkirina xurcika peyvan û hwd. dibêje ku mirov mamikan di perwerdekirina rêzimanê de jî dikare bi kar bîne. Heta bi mamikan dê bi kêftir be. Lewra di rêzimanê de zêde qaîde û usûl hene dema ku mirov rasterast van qaîdeyan nîşanî zarokan nede û bi rêya mamikan hêdî hêdî bide wan dê mifatir be. Herwiha ji ber ku wek lîstikekê dê bê dayîn, belkî ev qaîde zêdetir mayînde bin di hişê zarokan de. Ji bo piştrastkirina vê îdiaya xwe jî Önür xebateke rêzimanî li ser mamikan kiriye û daçek, cînavk, hevalnav û peyvên dijawate yên di mamikan de nîşanî me daye.<sup>186</sup>

Dîsa di têkiliya zarok û berhemên gelêrî de Recep Nas bi taybetî tesîra van vegotinên a li ser fêrkirin û perwerdekirina ziman radiweste û wiha dibêje: “zûgotinok, heyranok, mamik hêza hafizaya ziman a zarokan xurt dike. Zimanekî pratîk dide zarokan. Zarok bi van vegotinên gelêrî kêfê dikin, dest bi fikirînê dikin, têkiliya di nava ziman û fikrê de hîs dikin û alema ziman a veşartî kifş dikin. Mamik, heyranok û zûgotinok ji ber ku veşartî qala tiştekî dikin an jî bi têgehên cuda behsa tiştekî dikin ew jî dibe sedem ku xurcika peyvan a zarokan xurt bibe.”<sup>187</sup>

---

<sup>186</sup> Önür, *Türkçe Öğretiminde Bilmecenin Yeri ve Önemi*, r. 47.

<sup>187</sup> Recep Nas, *Örneklerle Çocuk Edebiyatı*, Ezgi Kitapevi, Bursa, 2002, r. 325.



## BEŞA DUYEM

### LI GORÎ MIJARÊN CUDA SENIFANDINA MAMIKÊN KURDÎ

Me di vê beşê de mamikên kurdî li gorî naveroka bersivên wan senifandine. Me senifandin wekî ku berê jî me anîbû ziman, li gor hin rêbazan û hin xebatên berê ku hatine kirin, çê kir. Cudahiya sîstema ku me di vê beşê de daniye, berfirehbûn û nîşandana hûrgiliyan e. Xebatên ku di vî warî de ji bo mamikên kurdî hatine kirin, herî zêde di bin neh an deh sernavan de hatine senifandin. Me jî vê xebatê di bin nozdeh sernav û şazdeh binsernavan de, yanî bi temamî di bin sih û pênc sernavan de senifandine. Ji vê senifandinê mebest bi kurtî ev in:

- a) Ji bo ku bi rehetî were zanîn ka kîjan mamik ji kîjan hêlê ve mifayê dide.
- b) Ji aliyê sîstematîzebûn û hûrgiliyên mamikan ve karê lêkolîneran hêsan bike.
- c) Ji bo ku dewlemendiya mamikên kurdî bi awayekî şênber raxîne ber çavan.
- d) Ji bo ku hûrgiliyên jiyana rojane ya kurdan bi awayekî zelal bide nîşan.

Di nav mamikên senifandî de mamikên ku me berhev kiribin, tunene. Me ev mamik ji 11 çavkaniyên cuda girtine û li gorî naveroka wan senifandine. Ji ber ku bi rehetî bê zanîn kîjan mamik ji kîjan çavkaniyê hatine girtin, me piştî her mamikê bi awayekî kurt çavkaniya mamikê û rûpela wê eşkere kiriye. Mînak heke me ji berhema Mahir Berwarî mamikekê girtibe me di jêrenotê de kunyeya çavkaniyê bi dirêjî wekî “Mahir Berwarî, Metelokanê, Berhevkarî, Elmanya-Dortmund, 2009, r. 33” daye û piştê jî di dawiya mamikên din de me bi tenê bi awayekî kurt mînak “*Berwarî. M, r. 45*” nivîsiye. Bi vê rêbazê me çavkaniyên din jî wek mînaka li jor çê kiriye û bi vî şiklî hem ji bo dîtina çavkaniyan hêsanîyek çê bûye hem jî ji aliyê dîtbariyê ve teza me ketiye pergaleke tekûz.

#### 1. Mamikên li Ser Mirovan

Di vê beşê de têgehên ku li derdorê têgeha ‘mirov’ê çê bûne, hatine senifandin. Ji ber ku hin têgehên vê beşê şênber hin ji wan jî razber in, me di bin du beşan de senifandin. Di vê beşê de zanyariyên li ser alem, têkilî û laşên mirovan bi awayekî berfireh hatiye nîşandan.

##### 1.1. Mirov û Xwezaya Wî

Di fêrbûna ziman û bidestxistina têgehan de zarok pêşî têgehên ku herî zêde li nêzî wan in dibihîsin û hîn dibin. Em gelek caran şahidê wê yekê dibin ku zarok pêşî navê dê, bav, bira, xwişk û hwd. fêr dibin û bi lêv dikin. Yanî zarok pêşî xwe û derdora

xwe ya nêzîk dinasin. Di vê beşê de jî mamikên ku hatine senifandin, têgehên bingehîn ên ku bi mirovan re têkildarin, di xwe de dihewînin. Mînak: “mirov, nav, keç, law, dayîk, bav, jin, zarok, deng, sî, mîz, gû, tir û fis, çilm, xew, xewn, nexweşî, aqil, axaftin, mirin”

- 1- Darekê çar çiqil, her çiqlekî pênc serkêt pê ve. [**Mirov**]<sup>188</sup>
- 2- Ezman sorê didan spîk. [**Mirov**], (Berwarî. M, r. 45)
- 3- Kerê beqala, digêhit li ber derê hemî mala. [**Mirin**], (Berwarî. M, r. 45)
- 4- Tu bimirî jî, her ji te venabit. [**Nav**], (Berwarî. M, r. 45)
- 5- Mamikê mino, her ji vir ta Şam, hemî tirî bi tam, bo xelkê ye helal, bo xwedanî heram. Çi ye? [**Keç, keçik, dot**]<sup>189</sup>
- 6- Mamikê mino, kina malê, çavê gelean lê, çi ye? [**Keç û lawik**], (Sadinî. M.X , r. 74)
- 7- Mamikê mino mamanî, teyr şanzde salan, li ser hêlîna xwe nafire, piştî hingê rojekê li ser hespekî datîne, diçe û nahête. Çi ye? [**Keç dema dizewice**], (Sadinî. M.X , r. 75)
- 8- Tişteke min ji tiştan e, li nav mêzera sultan e, ji Xwedê pê ve kes nizane, çi ye? [**Jina bihemle**], (Sadinî. M.X , r. 70)
- 9- Hêlîna mişarê, li nav darê, ne tav didê, ne jî siya êvarê, çi ye? [**Jina bihemle**], (Sadinî. M.X , r. 71)
- 10- Mamikê min e, kelexê mêşan e, dengê şeşan e, çi ye? [**Zarok**], (Sadinî. M.X , r. 145)
- 11- Mamikê mino maman e, heft bizinêd, rûtêtil dirayî, şax kopêd didan veweryayî, wê li dû barê barholê vemayî, çi ye? [**Pîremêr û pîrejin**], (Sadinî. M.X , r. 159)
- 12- Tişteke min heye, delala dê ye, li ber sêlê ye. [**Qîzik**]<sup>190</sup>
- 13- Qutîkê Silêmanî, serê heft riya danî, pêştirî xwedê kes pê nizanî. [**Kulfeta hemle**]<sup>191</sup>
- 14- Kaniya jiyane ye. [**Dayik**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 414)
- 15- Çil nêriyên tiktîkî, gon naxu, guhan dikî. [**Kiç/Qîz**], (Berwarî. M, r. 48)
- 16- Ji vêrê heta Balete, hemî mihêt kurrete, girêçka hey, avî ne. [**Kiç/Qîz**], (Berwarî. M, r. 48)
- 17- Teyrek heye ji hêlîn, 16 sal nafirit, rojek diçit serê zîn, li hêlîna nû digêrit. [**Kiç/Qîz**], (Berwarî. M, r. 49)
- 18- Sindirûka Silêmanî, ne li erdî, ne li esmanî. [**Jina bihal**], (Berwarî. M, r. 48)

<sup>188</sup> Berwarî, *Metelokanê*, Berhevkarî, Elmanya-Dortmund, 2009, r. 33, r. 45.

<sup>189</sup> M. Xalid Sadinî, *Mamikên Kurmancî*, Nûbihar, Stenbol, 2011, r.74.

<sup>190</sup> Abbas Alkan, *Çîrok û Jiyane*, Weşanxaneya Komal, Stenbol, 2004, r. 78.

<sup>191</sup> Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, *Kurdîsky Folklor*, b. II. Moskova, 1978, r. 414.

- 19- Ne li erda ne li esman e, hêlîna kesrewan e. [**Jina bihal**], (Berwarî. M, r. 48)
- 20- Mirov di behrê da namirit. [**Jina bihal**], (Berwarî. M, r. 48)
- 21- Ji wê da tê, yek li til e yek li mil e, yek jî tê da vilevil e. [**Jina bihal**], (Berwarî. M, r. 48)
- 22- Buxçika çekê mekê, ji Xwedê pê ve kes nikare veke. [**Jina bihal**], (Berwarî. M, r. 48)
- 23- Xodanê pez û mêş e, bo ebdal û derwêş e. [**Şivan**], (Berwarî. M, r. 49)
- 24- Di ser avê ra diçit sihê nakit. [**Deng**], (Berwarî. M, r. 49)
- 25- Di ser avê ra diçit, ne mirov dibînit, ne sîberê dikit. [**Deng**], (Berwarî. M, r. 49)
- 26- Ne pê heye ne qaç e, ez dimînim, ew diçe. [**Deng**], (Berwarî. M, r. 49)
- 27- Serî şêrn e, binî tehl e. [**Şerr**], (Berwarî. M, r. 49)
- 28- Tu li kîrê bî, ya bi dûv te ve. [**Sîber/sî**], (Berwarî. M, r. 49)
- 29- Hindî diçimê, nagehimê. [**Sîber/sî**], (Berwarî. M, r. 49)
- 30- Vî berî dikevit ker nabit, bi avê bikevit terr nabit. [**Sîber/sî**], (Berwarî. M, r. 49)
- 31- Li nav agir germ nabe, li nav avê nerm nabe. [**Sîber/sî**], (Berwarî. M, r. 49)
- 32- Sibe û êvarê ji hevalê xwe mestir e, nîvro biçûktir e. [**Sîber/sî**], (Berwarî. M, r. 49)
- 33- Ez diçim, ew jî diçe, ez radiwestim, ew jî radiweste. [**Sîber/sî**], (Berwarî. M, r. 49)
- 34- Ne sivik e ne giran, hem bê ruh e hem bê can e, geh dirêj e, geh jî gir e, ewê ji me qet ne dûr e. [**Sîber/sî**], (Berwarî. M, r. 49)
- 35- Min hil kir bi bêrê, te hêla bi pozî kêrê. [**Gû/pîsî**], (Berwarî. M, r. 69)
- 36- Pisîk nîne bivêje pişt û kûçik nîne bivêje oşt. [**Tir: bayê ji ber mirov diçe**], (Berwarî. M, r. 69)
- 37- Ne deriyê wî heye, ne jî pacê wî heye, tê û diçe. [**Tir: bayê ji ber mirov diçe**], (Berwarî. M, r. 69)
- 38- Ji şekirê şirîntir e, ji asinî girantir e. [**Xew**], (Berwarî. M, r. 71)
- 39- Tişteke ji risasî girantir e û ji hengivînî şirîntir. [**Xew**], (Berwarî. M, r. 71)
- 40- Ne li erdî, ne li esmanî, dixot leşê înanî. [**Xem**], (Berwarî. M, r. 73)
- 41- Tişteke xoştir di hemî tiştê da diçit. [**Hizir/dalxe**], (Berwarî. M, r. 75)
- 42- Dûr difirit ne çivîk e, ne giran e, ne sivik e. [**Hizir/dalxe**], (Berwarî. M, r. 75)
- 43- Ne mezin e, ne gir e, erş û esman digere, ew ne kur e, ne keç e, her dem bi wê rêç e. [**Hizir/dalxe**], (Berwarî. M, r. 75)
- 44- Bi şelê te, bi şerwalê te, xizmê xalê te, bête mala te, dê çi deyê? [**Bab e**], (Berwarî. M, r. 91)

- 45- Du jina digotine du mêra: Herin kurên me, werin mêtên me, babên hingo xezûrên me. [**Du mêra jin bi jinî bi daykên wan kirbû.**], (Berwarî. M, r. 91)
- 46- Sive çar ling e, nîvro du ling e, êvarê sê ling e. Ew çi ye? [**Merî**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 411)
- 47- Ew çi ye? Dinê da şekir şirîntir e. [**Xew**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 411)
- 48- Ew çi ye? Terazûyê da nasekine, bazarê jî nayê firotanê, xwe jî şirîn e. [**Xew**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 413)
- 49- Yekî kar kir, çara jî bar kir, dê ser kur mar kir. Ew çi ye? [**Meriyê mirî**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 432)
- 50- Çarnig bi rê ket, dunig bi pê ket, çîzo vîzo bi dorê ket. [**Çerçî**]<sup>192</sup>
- 51- Hêj nehatî beran, nêv guhana wê hinde. [**Qîzik, keç**], (Gazî. M, r. 20)
- 52- Hêlîna betê ye, li rastê ye. [**Zarokê di zikê dê de**], (Gazî. M, r. 20)
- 53- Hingî ez diçim pî/pê min tê. [**Sih**], (Gazî. M, r. 20)
- 54- Mamika mino, yekî delîquç. [**Kulek**], (Gazî. M, r. 23)
- 55- Mamikê mino, diçim naçim nagîjimê. [**Sî**], (Gazî. M, r. 25)
- 56- Nanxur û pênc pêçî. [**Însan**], (Gazî. M, r. 25)
- 57- Qol damançe, baz da binê baxçe. [**Gû**], (Gazî. M, r. 27)
- 58- Şalê min şelwarê te, zavê mala xalê te, bêm mala te tê çi bidî? [**Dayik**], (Gazî. M, r. 30)
- 59- Tişkî min heye, ez diçim bi min ra ye, ji min naqete. [**Sî**], (Gazî. M, r. 32)
- 60- Tiştê min ê tiştanî, paş kevira xiştanî, min kir û te hılanî. [**Gû**], (Gazî. M, r. 33)
- 61- Tiştêkî min heye, bi mino ji meno. Ew çi ye? [**Siya mirov**], (Alkan. A, r. 75)
- 62- Tiştêkî min heye, dibêje dûtê min nêzîk bûne, duduyê min bûne sisê. Ev çi ye? [**Mirovê kor û seqet**], (Alkan. A, r. 78)
- 63- Tiştêkî min heye, ez dimeşim ew dimeşe, ez disekinim ew nasekine. Ev çi ye? [**Mirov û siya wî**], (Alkan. A, r. 80)
- 64- Tiştêkî min heye, kundirê daliqandî, çava lê beliqandî. Ev çi ye? [**Hemle**], (Alkan. A, r. 84)
- 65- Tiştêkî min heye, morîka qul bi etara re namîne. Ev çi ye? [**Qîzik**], (Alkan. A, r. 86)
- 66- Tiştêkî min heye, ne li erdê ye ne li ezman e, ser hêlîn e beg nahewîne. Ev çi ye? [**Siwar**], (Alkan. A, r. 86)
- 67- Tiştêkî min heye, dere ber garana gund. Ev çi ye? [**Gavan**], (Alkan. A, r. 94)

<sup>192</sup> Mustafa Gazî, *Gurzek ji Zargotina Zarokan; Disko Disko Danîno*, Enstîtûya Kelepura Kurdî, Weşanxaneyê Aras, Silêmanî, 2006, r. 14.

- 68- Tişteki min heye, ku tere nema tê. Ev çi ye? [**Mirî**], (Alkan. A, r. 95)
- 69- Tişteki min heye, vî alî dîwar, wî alî dîwar, heta sibehê dike hewar. Ev çi ye? [**Bayê zik**], (Alkan. A, r. 97)
- 70- Tişteki min heye, qûça silêmanî, li ser xanî danî, kes pê nizanî. Ev çi ye? [**Jina bi du cana**], (Alkan. A, r. 105)
- 71- Mamikê mino, ew tacek zêrîn e, li ser serê her kesekê nîne. Çi ye? [**Aqil**], (Sadinî. M.X , r. 14)
- 72- Mamikê mino, sîq û sîq, heşt ling û du pîq. Çi ye? [**Cotyar**], (Sadinî. M.X , r. 29)
- 73- Tiştikê min e, Elî xiştixîşt, pişt da te rûnişt. Çi ye? [**Gû**], (Sadinî. M.X , r. 54)
- 74- Mamikê mino, neh in nabin deh. Çi ye? [**Heyvên jina bihemle**], (Sadinî. M.X , r. 64)
- 75- Mamikê mino, mezela sultan e, ne li erd e, ne li ezman e. Çi ye? [**Jina bihemle**], (Sadinî. M.X , r. 71)
- 76- Mamikê mino mamanî, yê li bin mêwek sadanî, ji bilî Xwedê kes nizanî. Çi ye? [**Jina bihemle**], (Sadinî. M.X , r. 72)
- 77- Tişteke ji tiştan e, ne li erd e, ne li sindoqa Silêman e. Çi ye? [**Jina bihemle**], (Sadinî. M.X , r. 72)
- 78- Tişteki min heye tiştanî, tu bibînî tu yê jê bitirsî, tu dikî ber xwe nabînî. Çi ye? [**kefin-kifn**], (Sadinî. M.X , r. 75)
- 79- Mamikê mino, heşt in nabin neh. Çi ye? [**Mehr û heştikên jinê**], (Sadinî. M.X , r. 94)
- 80- Tiştikê min ji tiştan e, bi piyên xwe diçim mala xelkî, bi piyên xelkê diçim mala xwe. Çi ye? [**Mirovê kor û seqet**], (Sadinî. M.X , r. 103)
- 81- Tişteki min heye her tişt e, şûreke beran li pişt e, her çiyê çû nav kuşt e. Çi ye? [**Mirovê mirî**], (Sadinî. M.X , r. 104)
- 82- Mamikê mino, yê mirî ye, cangî dibîne. Çi ye? [**Mirovê qels**], (Sadinî. M.X , r. 104)
- 83- Mamikê mino, kurê kerê li ser bêderê, kayê dixwe nade kerê. Çi ye? [**Mirovê çikûs**], (Sadinî. M.X , r. 104)
- 84- Mamikê mino, yek bû sih û du guh, yê pê ve. Çi ye? [**Mirovek, sih û cerg**], (Sadinî. M.X , r. 104)
- 85- Mamikê mino, ser bê zad e, her digire û pê dade, çi fayde nade. Çi ye? [**Mirovên neduhdar**], (Sadinî. M.X , r. 105)
- 86- Tiştikê mino tişt e, bi hemî tiştan ve dinise. Çi ye? [**Nav**], (Sadinî. M.X , r. 108)

- 87- Tişteki min heye, dikim te û dernaxim. [**Nav**], (Sadinî. M.X , r. 108)
- 88- Mamikê min e, sê ne, nabin çar. Çi ye? [**Telaq**], (Sadinî. M.X , r. 134)
- 89- Mamikê mino, davêje paniya pê, tê bi difinê dikeve. Çi ye? [**Tir û fis**], (Sadinî. M.X, r. 139)
- 90- Mamikê mino, tîr çerm e, kevan çerm e, diberdin pê, tê li difinê dikeve. Çi ye? [**Tir û fis**], (Sadinî. M.X, r. 140)
- 91- Şêrekê rahajote te, tu revî rûbarek, kete rêka te, tu biçî dê xendiqî, tu bizîvirî şêr dê te bixwe û divê tu xelas bibî. Tu çi bikî? [**Xewn**], (Sadinî. M.X , r. 143)
- 92- Mamikê mino, spêdê li ser çaran diçe, nîvro li ser duwar diçe, êvarî li ser sêyan diçe. Çi ye? [**Zarok**], (Sadinî. M.X , r. 146)
- 93- Mamikê mino, pir tiyan e, heçî nizanî, ew heywan e. Çi ye? [**Pîr**], (Sadinî. M.X , r. 151)
- 94- Mamikê mino, deng ji bin têt, ser diçemît. Çi ye? [**Tir û fis**], (Sadinî. M.X , r. 153)
- 95- Mamikê mino mamanan e, heft bizinêd rûtêd til diryayî, şax kopêd didan veweryayî, wê li dû barê barholê vemayî. Çi ye? [**Pîremêr û pîrejin**], (Sadinî. M.X , r. 159)
- 95- Mamikê mino, ser avê re diçît, sih nadetê. Çi ye? [**Deng**], (Sadinî. M.X , r. 167)
- 96- Mamikê mino, eger hat dê te bet. Çi ye? [**Mîz**], (Sadinî. M.X , r. 167)
- 97- Mamikê mino, ez diçim ew nahêt. Çi ye? [**Şop**], (Sadinî. M.X , r. 189)
- 98- Tişteki min heye, ji bo dinyayê hemiyê lazim e. Çi ye? [**Nav**], (Sadinî. M.X , r. 220)
- 99- Bê rûh e, rûha dibezîne. [**Gû**]<sup>193</sup>
- 100- Bi piyê xwe diçe mala xelkê, bi piyê xelkê diçe mala xwe. [**Mirî**], (Güneş. K, r. 32)
- 101- Ciwan e lê serboz e, her dem dora wî toz e. [**Aşyan- aşvan**], (Güneş. K, r. 35)
- 102- Cîhana reş û tarî, tê de dijîn zehf zebanî. [**Pest û zilm**], (Güneş. K, r. 35)
- 103- Çeqmeq e, teq û req e, heçî nizanibe ehmeq e. [**Çeqandina tiliyan**], (Güneş. K, r. 37)
- 104- Çiyayê me reng û reng e, dayê rabe dereng e. [**Banga sibehî**], (Güneş. K, r. 40)
- 105- Diçim diçim, li pey min tê. [**Sêhik-sî**], (Güneş. K, r. 46)
- 106- Dergûşa siltanî kes pê nizanî. [**Zikê dê**], (Güneş. K, r. 52)
- 107- Tişteki min heye, dikeve avê şil nabe. [**Sî**], (Güneş. K, r. 52)

<sup>193</sup> Kenan Güneş, *Mamikên Me*, Evrensel Basım Yayın, Stembol, 2013, r.31.

- 108- Di zeviyê de nasekine, li bazarê nayê firotin, ji şekir şêrîntir e. [**Xew**], (Güneş. K, r. 52)
- 109- Diçîze namîze, ji min derket kete te. [**Deng**], (Güneş. K, r. 52)
- 110- Dengê ji devê te tê çi ye? [**Axaftin- şûrkirin**], (Güneş. K, r. 55)
- 111- Ez hatim min tu xwestî, derketim bi dilek şikestî. [**Cenaze**], (Güneş. K, r. 56)
- 112- Heft belendîrê tek tekê, ji vir heya Mekkê, guhanê xwe dike û nazê. [**Qîz**], (Güneş. K, r. 68)
- 113- Him rast e him derew e, him ferz e him sinet e. [**Şeytan pêkenî- cenabetî**], (Güneş. K, r. 70)
- 114- Ji vir û Mekkê, çil tiştîrê ber tekê, bê nêrî gihanê xwe dike. [**Keç-qîz**], (Güneş. K, r. 79)
- 115- Ji wê da tê, yek li til e yek li mil e, yek jî tê de vilevil e. [**Jina biheml û du zarok pê re**], (Güneş. K, r. 80)
- 116- Kofîya xezalê gêr bû newalê. [**Gûyê zarokan**], (Güneş. K, r. 83)
- 117- Ku çi tişt e, pêva ye, ev çi ye? [**Nav**], (Güneş. K, r. 85)
- 118- Kir nekîr min yaz nekîr, min nêrî min nas nekîr. [**Sihik-sî**], (Güneş. K, r. 85)
- 119- Kurê kerê çû ser bênderê, kayê dixwe, nade kerê. [**Mirovê kund û tima**], (Güneş. K, r. 85)
- 120- Kirina wî ferz e, birin û anîna wî sunnet e. [**Gustîl**], (Güneş. K, r. 86)
- 121- Lawik bang dike diyê, ez naçim xerîbiyê. [**Nexweşî**], (Güneş. K, r. 88)
- 122- Li vê dinya, qafîkî de sê kanî dertên, yekî şîrîn e, yekî tal e, yekî şor e. [**Rûyê meriv**], (Güneş. K, r. 89)
- 123- Merî bulut, derî kilît. [**Mirî**], (Güneş. K, r. 97)
- 124- Ne deriyê wê heye, ne jî pacê wê heye, tê û diçe ev çi ye? [**Tir**], (Güneş. K, r. 100)
- 125- Paşayek tete dinyayê, du berana pê hev dixwê. [**Zarok-bebik û çîçik**], (Güneş. K, r. 102)
- 126- Pisîk nîne bibêje pişt û kûçik nîne bivêje oşt. [**Tir**], (Güneş. K, r. 103)
- 127- Rê ve derim, tişteki bi min re tê? [**Sî**], (Güneş. K, r. 108)
- 128- Serê govendê yek e, binê govendê yek e? [**Zirnebêj û daholkut**], (Güneş. K, r. 110)
- 129- Sibatê heta havînê, ji kul û derdan dixwînê. [**Bang**], (Güneş. K, r. 111)
- 130- Serî qûnê ve ye, qûn serî ve ye. [**Bêrîvan**], (Güneş. K, r. 113)
- 131- Serê wî heye porê wî tuneye, rihê wî heye, ziriyyeta wî tuneye. [**Silêman Demîrel**], (Güneş. K, r. 115)

- 132- Sêvek li darê ye, çavê her kesî lê ye, kes nizane qismetê kê ye. [**Keç**], (Güneş. K, r. 117)
- 133- Sibê çar ling e, nîvro du ling e, êvarê sê ling e. [**Mirov**], (Güneş. K, r. 118)
- 134- Şim şereq li dîwar req. [**Çilm**], (Güneş. K, r. 120)
- 135- Tu diçî ew têt, tu disekinî ew disekinêt. [**Sih-sî**], (Güneş. K, r. 123)
- 136- Mamkê mino, teyr firî bêçeng. [**Nêçîrvan**], (Güneş. K, r. 123)
- 137- Tîr ba ye, kewan çerm e, ji pehniyê difilite, li kepê/poz dikeve. [**Tir**], (Güneş. K, r. 124)
- 138- Tiştî min heye, ne tê kirîn ne tê firotin, tune ji wê şirîntirîn. [**Xew**], (Güneş. K, r. 124)
- 139- Wek şivanê berxika, dinêre li zaroka, fêr dike hêdîka, zanîn û tiştika. [**Mamoste**], (Güneş. K, r. 132)
- 140- Yekî lê dikim, didoyan pê ve dar de dikim. [**Siwarê hespan**], (Güneş. K, r. 135)
- 141- Şimamok şeq dîwarok. [**Fiş, çilm**]<sup>194</sup>

## 1.2. Laşê Mirov

Di vê beşê de têgehên şênber ên ku bi mirovan re têkildarin, hene. Zarok dema ku dest bi axaftina ziman dike, gelek caran ji hêla dê û bavên ve pirsê wan ji wan tê pirsîn. Ev zêdetir bi awayekî leyîstokî çê dibe. Lê em dizanin hin ji bêjeyên sereke yên di xurcika peyvan a zarokan de jî endamên laşê wan in. Tabî bi rêya mamikan dema ku zarok fêrî ziman dibe ew bejêyên ku pêşî hîn bûye êdî wek têgehên wan bêjeyan di hişê xwe de qewî dike. Çimkî dema ku di mamikê de bêjeyek tê danasandin, gelek taybetî û fonksiyonên wan têgehên jî pê re tînin vegotin. Di vê beşê de wekî mînak: “ziman, poz, diran, dev, lêv, çav, birû, enî, guh, por, dest, tilî, neynûk, ling, mû, ser, simbêl, kezî, sing, memik, quz, kêr, gun, parxan, bezê zik, dil, kezêb û cîger, hûr û rûvî, zik, parsû” tînin dîtin.

- 1- Tiştêkî min heye, her tim li mal e, geh şirîn e geh tal e. [**Ezman**], (Berwarî. M, r. 45)
- 2- Dêrakeve ji mal e, him ciwan e, him kal e, geh şûr e, geh mertal e. [**Ezman**], (Berwarî. M, r. 45)
- 3- Şirîn e wekî şekirê, tal e wekî jehrê. [**Ezman**], (Berwarî. M, r. 45)
- 4- Odek şûştî, bilbîlek tê da rûniştî. [**Ezman**], (Berwarî. M, r. 45)
- 5- Ji jehrê taltir e, ji hingivînê şirîntir e. [**Ezman**], (Berwarî. M, r. 45)
- 6- Gayê surê di gelfî da girêday. [**Ezman**], (Berwarî. M, r. 45)

<sup>194</sup> Ömer Toprak, *Ji Aliyê Naverok û Teşeyê ve Nirxandina Mamikên Kurmancî*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mardîn, 2013, r. 43



- 7- Dostê te ye, dijminê te ye, her ji te ye. **[Ezman]**, (Berwarî. M, r. 45)
- 8- Him neyar e, him heval e, geh şêrîn e, geh tal e. **[Ezman]**, (Berwarî. M, r. 45)
- 9- Li vî alî kaş, li wî alî kaş, di nav de heye topek qumaş. **[Ezman]**, (Berwarî. M, r. 46)
- 10- Tebeqa li ser tebeqê, ji nav da marê gezekê, di ser da konên rûvîya, di ser da çirayên nebiya, di serda dehlên hûta. **[Lêv, ezman, difin/poz, çav, por ]**, (Berwarî. M, r. 46)
- 11- Odek şuştî, rêzek zilam lê rûniştî. **[Dev, didan]**, (Berwarî. M, r. 46)
- 12- Sêniya can, tijî mercan. **[Dev, didan]**, (Berwarî. M, r. 46)
- 13- Çûme şikeftê hemî tat bûn, tatekê wilo tunebû nivêjê li ser bikim. **[Dev, didan]**, (Berwarî. M, r. 46)
- 14- 32 diqutin, êk didete ber. **[Dev, didan, ezman]**, (Berwarî. M, r. 46)
- 15- Şikeftuk e, pirr berduk e. **[Dev, didan, ezman]**, (Berwarî. M, r. 46)
- 16- Cêwî ne li kêlek in, ne goşt in, lê nermik in, ev çi ye dê fêm bikin? **[Guh]**, (Berwarî. M, r. 46)
- 17- Sênîka val, tejî hingivînê tal. **[Guh]**, (Berwarî. M, r. 46)
- 18- Tişteki min heye tiştonek, dunya hemû tê de ye. **[Guh]**, (Berwarî. M, r. 46)
- 19- Du golê reş û hişîn, li ser bejna şan û şîn. **[Çav]**, (Berwarî. M, r. 46)
- 20- Du pencerên bêderî, bi şev girtî, bi roj vekirî. **[Çav]**, (Berwarî. M, r. 46)
- 21- Sipî ye wek şîrî, reş e wek qîrî, tîj e wek şîrî. **[Çav]**, (Berwarî. M, r. 46)
- 22- Çendî bideyê têr nabit. **[Çav, meqes, nefis]**, (Berwarî. M, r. 46)
- 23- Odek şuştî mûştî, cotek qazî tê de rûniştî. **[Çav]**, (Berwarî. M, r. 46)
- 24- Kaniya qinê qinê, mîr û hekîm jî dest didinê. **[Çav]<sup>195</sup>**, (Berwarî. M, r. 46)
- 25- Wî lay pêjan, vî lay pêjan, di nav da morî û mercan. **[Çav]**, (Berwarî. M, r. 46)
- 26- Hînî û mînî, ya li bin kûnî, ez yê dibînim, tu nabînî. **[Çav]**, (Berwarî. M, r. 46)
- 27- Hêlîna şimfarê, ya li nîveka du guliyêt darê, ne li berojî, ne li nizarê. **[Çav]**, (Berwarî. M, r. 46)
- 27- Wek stêrikan diçûriske, deriyê wê wek birûsk e, li ser dileqe birû û bisk e, kî ker nebe wê nas dike. **[Çav]**, (Berwarî. M, r. 47)
- 28- Ne kend e ne lend e, bi kendê ve bend e, bizane çi ye û çend e? **[Çav û du ne]**, (Berwarî. M, r. 47)
- 29- Ne dest e lê wek hev e, ne şe ye wek melêv e, pehîn dibe bi erdê ve, mirov dipêve gav e. **[Ling]**, (Berwarî. M, r. 47)
- 30- Koneka tarî, tijî tê da durr û mirarî. **[Dev û didan]**, (Berwarî. M, r. 47)

---

<sup>195</sup> Bo difnê jî têt gotin.

- 31- Şikefta yek derî, tê de hene 32 kevrên spî. [**Dev û didan**], (Berwarî. M, r. 47)
- 32- Şikeftek reş, tije mihên beş. [**Dev û didan**], (Berwarî. M, r. 47)
- 33- Hevrist bi kevrî ve rist. [**Ser, pirça serî**], (Berwarî. M, r. 47)
- 34- Ban guşt e, bagurdan asin e. [**Ser û mekîna sertiraşînê**], (Berwarî. M, r. 47)
- 35- Tiştekek xweşik heye Xwedê ew daye, zana û ronî ye, heft derî ye, kî nizane bê mejî ye. [**Ser**], (Berwarî. M, r. 47)
- 36- Bê avdan, bê kolan, bê zibil û bê xodan şîn dibit. [**Mû/pirç**], (Berwarî. M, r. 47)
- 37- Hindî bibirî kata ji xwe didet. [**Mû/pirç**], (Berwarî. M, r. 47)
- 38- Hevrist bi kevrî ve rist. [**Mû/pirç**], (Berwarî. M, r. 47)
- 39- Postê pisîkê, li ser sivîkê. [**Simbêl**], (Berwarî. M, r. 47)
- 40- Du rêsiyên badayî, li berpâl girêdayî. [**Simbêl**], (Berwarî. M, r. 47)
- 41- Di ser te ra, di bin te ra, kirope<sup>196</sup> di babê te ra. [**Simbêl**], (Berwarî. M, r. 47)
- 42- Cotekî marê reş, jor da xwe berdan geliyê xweş. [**Kezî/gulî**], (Berwarî. M, r. 48)
- 43- Du rêz giya, li pişt çiya. [**Kezî/gulî**], (Berwarî. M, r. 48)
- 44- Malîkî mino, tu bi nikilî ve. [**Difin/poz**], (Berwarî. M, r. 48)
- 45- Girek di pêş te da, du qul tê da. [**Difin/poz**], (Berwarî. M, r. 48)
- 46- Kanîka qinê qinê, mîr û hakim dest didinê. [**Difin/poz**], (Berwarî. M, r. 48)
- 47- Ji goşt û hestî ye, pênc şax û bi destî ye, sed û yek huner lê ye, li heywana pê ye. De bêjin ev çi ye? [**Tilî û dest**], (Berwarî. M, r. 48)
- 48- Serê wî yê vi te, binê wî yê vi deyka te. [**Memik**], (Berwarî. M, r. 48)
- 49- Kundirê di latê de, tamên vê qa dinyayê tê de. [**Memik**], (Berwarî. M, r. 48)
- 50- Şêv bi têxt va ye, qismetek xweşik pê ve ye. [**Memik**], (Berwarî. M, r. 48)
- 51- Kanîya li nizarî/kendalî, mîr û hakima av jê vexwarî. [**Memik**], (Berwarî. M, r. 48)
- 52- Hînî û mînî, hêlîna piştî kûnî, ez ê dibînim, tu nabînî. [**Patik**]<sup>197</sup>, (Berwarî. M, r. 49)
- 53- Tûk heye ne kar e, xorçik heye ne etar e. [**Kîr**], (Berwarî. M, r. 49)
- 54- Çû di konê ve ne mar e, pûrtê pê ve ne kar e, tuvdankê bi milî ve ne cotyar e. [**Kîr**], (Berwarî. M, r. 49)
- 55- Singê li kevrî çiqay, 2 glolik pê ve hejay. [**Gun/hewêcî**], (Berwarî. M, r. 49)
- 56- Tiştîkê mino tiştî, 2ya sêvek dît, 5 hilgirt, 32 xwar. [**Çav, tilî û didan**]<sup>198</sup>, (Berwarî. M, r. 50)

<sup>196</sup> Kirope: Katên êksalî yên darê ne.

<sup>197</sup> Wekî ya çavî ye.

<sup>198</sup> 2 çav in, 5 til in, 32 didan in.

- 57- Ez çûme girê delal, tê da hebûn çar kaniyên zelal, du yên sor, du yên tal. [**Ser, du çav, du kunên guhî**], (Berwarî. M, r. 84)
- 58- Du qulê roviya, du çirê neviya, aşek bêav di bin da geriya. [**Poz/difin, çav, dev**], (Berwarî. M, r. 84)
- 59- Ez çûme ser girê Deilêdizan, 2 marên reş, 2 stêrên geş, 2 kun rûvî, şikeftek tijî mirarî. [**Ser, birî, çav, du kunên difnê, dev, didan**], (Berwarî. M, r. 84)
- 60- 2 kan in 2 ban in, 8 bêrî û 2 şivan in. [**2 lepên kef/destî, 2 piştdest, 8 tilên biçûk, 2 tilên mezin**], (Berwarî. M, r. 84)
- 61- Du xûşkê cînar, ji hev du nakin bawar. Ew çi ye? [**Çev**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 411)
- 62- Tiştêkî min heye tiştanok, diniya hemû tê de ye. Ew çi ye? [**Guh**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 411)
- 63- Divêm: “were were” nayê, divêm “meyê meyê” tê. Ew çi ye? [**Lêv**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 412)
- 64- Vî alî gelî wî alî gelî, ortê de şûrekî şîn. Ew çi ye? [**Ziman**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 412)
- 65- Vî alî dîwar, wî alî dîwar, ortê de girê daye seyekî har. Ew çi ye? [**Ziman**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 412)
- 66- Odeke şûştî mûştî, çil feqîr tê de rûniştî. Ew çi ye? [**Dev û diran**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 412)
- 67- Vî alî aş, wî alî aş, ortê da tope qumaş. Ew çi ye? [**Dev û ziman**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 412)
- 68- Herher dîwar, mermer dîwar, xatûneke çil nobedar. Ew çi ye? [**Dev, diran û ziman**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 412)
- 69- Dîkek e dîkvanek e, çar mî ne, beranek e. Ew çi ye? [**Dest û pênc tilî**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 412)
- 70- Çi belgî nermtir e? [**Destê merîya**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 413)
- 71- Xanmanekî tarî, tijî stûnê çilexarî. Ew çi ye? [**Parxanê merîya**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 413)
- 72- Şikevteke terî, tije stûnê xilexarî. Ew çi ye? [**Parxanê merîya**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 413)
- 73- Zevîke min heye, toxim nareşnim şîn dibe, av nadim digihîje, peretî didirûm, berê wê kêr nayê. Ew çi ye? [**Serrûyê mêra**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 414)

- 74- Almast çû mala mîra, pey bû şeşeşeqa tîra. Ev çi ye? [**Gulî, benpork**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 414)
- 75- Çûm û çûm du rêz morî, çûm û çûm tu qulê tarî, çûm û çûm du çirê reş ronî, çûm û çûm du marê reş, çûm û çûm meydana xweş û dehla hûta. [**Ser û çav**], (Gazî. M, r. 15)
- 76- Darek heye pênc gulî, her gulîkî teyrek spî li ser. [**Tilî û neynûk**], (Gazî. M, r. 15)
- 77- Diçim şikeftêkê, hemû sofiyê ser sipî ne. [**Didan**], (Gazî. M, r. 16)
- 78- Du çirê nebiya, du qulê roviya, di binî de aşekî hewarê. [**Çav, poz û dev**], (Gazî. M, r. 17)
- 79- Du rêsî giha li berwarkî. [**Birû**], (Gazî. M, r. 17)
- 80- Kaniya kevezê, av tê dizê. [**Poz**], (Gazî. M, r. 21)
- 81- Lawikê kumsor. [**Ziman**], (Gazî. M, r. 22)
- 82- Mamikê min ê mamanî, ez digirim val e, ez diberdim tejî. [**Çiçik**], (Gazî. M, r. 23)
- 83- Odak şuştî miştî, bilbilek tê da rûniştî. [**Dev û ziman**], (Gazî. M, r. 26)
- 84- Odekî min heye şuştî miştî, du qor mêvan tê da rûniştî. [**Dev û didan**], (Gazî. M, r. 26)
- 85- Şkefta tarî, tije mirarî. [**Didan**], (Gazî. M, r. 30)
- 86- Şkefto bero bero, tije pezê kevero. [**Diran**], (Gazî. M, r. 30)
- 87- Tişteki min heye, çavikên jêrê, wan du quluk in. Ev çi ye? [**Çav û bêvil**], (Alkan. A, r. 77)
- 88- Tişteki min heye, du marê reş, li ser du gulê geş. Ev çi ye? [**Çav û birhû**], (Alkan. A, r. 77)
- 89- Tişteki min heye, jor çavik in dibînin, du qulikê jêr nabînin. Ev çi ye? [**Çav û Bêvil**], (Alkan. A, r. 84)
- 90- Tişteki min heye, pênc heba li mirovekî xerabî kir, lê şahidê wî tunebû. Ev çi ye? [**Tilî**], (Alkan. A, r. 86)
- 91- Tişteki min heye, şikeftêkî tijî kerî, kûçikê sor li ber derî, Ev çi ye? [**Dev û lêv**], (Alkan. A, r. 90)
- 92- Tişteki min heye, şkeftêkî reş û tarî, tije kavrê kufarî. Ev çi ye? [**Dev û diran**], (Alkan. A, r. 91)
- 93- Tişteki min heye, binî di dê de ye, serî di lawê de ye. Ev çi ye? [**Çiçikê diya mirov**], (Alkan. A, r. 91)
- 94- Tişteki min heye, bi roj direqise, bi şev diçilmise. Ev çi ye? [**Çav**], (Alkan. A, r. 93)
- 95- Tişteki min heye, tim tazî ye, tişteki li xwe nake. Ev çi ye? [**Ziman**], (Alkan. A, r. 94)

- 96- Tişteki min heye, carna pir şêrîn e, lê nayê xwarin. Ev çi ye? [**Ziman**], (Alkan. A, r. 94)
- 97- Tişteki min heye, şikeftek reş, tije golikê beş. Ev çi ye? [**Dev û diran**], (Alkan. A, r. 94)
- 98- Tişteki min heye, xwarinê didin qahba, nadin rahîba. Ev çi ye? [**Çav û kil**], (Alkan. A, r. 98)
- 99- Tişteki min heye, timikê tahtê de, devê her kesî tê de. Ev çi ye? [**Çiçikê diya mirov**], (Alkan. A, r. 103)
- 100- Tişteki min heye, dayê radibe sibehê zû, birek ga didine dû. Ev çi ye? [**Por**], (Alkan. A, r. 104)
- 101- Tişteki min heye, odeya şuştî muştî, sih û sê qatê de rûniştî. Ev çi ye? [**Dev û diran**], (Alkan. A, r. 104)
- 102- Tiştê mino tiştanî, spîndara rût e, tijî mêwê timamît e. Çi ye? [**Amîretê Cinsî**], (Sadinî. M.X , r. 13)
- 103- Mamikê mino, singê di kevir de qutayî, cotekî gulka vê da berdayî. Çi ye? [**Amîretê cinsî**], (Sadinî. M.X , r. 14)
- 104- Mamikê mino, ga di kunê ve dinive, giya li mila digurze. Çi ye? [**Amîretê cinsî**], (Sadinî. M.X , r. 14)
- 105- Mamikê mino, vî alî dîwar, wî alî dîwar, heta sibê dike hewar. Çi ye? [**Bezê zik**], (Sadinî. M.X , r. 25)
- 106- Mamikê mino, vî rexî pencere ye, wî rexî pencere ye, li nîvekê morî mercan e. Çi ye? [**Çav**], (Sadinî. M.X , r. 32)
- 107- Mamikê mino, çûm çûm du gulên geş, çûm çûm du çirayên geş, çûm çûm du şkeftên reş, çûm çûm nav dehlek reş. Çi ye? [**Birû, çav, bêvil, por**], (Sadinî. M.X , r. 41)
- 116- Mamikê mino, çûm şikefteke kûr, tijî tê da bizinên çûr. Çi ye? [**Dev û didan**], (Sadinî. M.X , r. 41)
- 117- Mamikê mino, çûme şkefteke tarî, tijî tê de mirarî. Çi ye? [**Didan**], (Sadinî. M.X , r. 42)
- 118- Mamikê mino, tişteki miz e hinar nîne, yê di behrê de xewas nîne, ew kulîlk e bihar nîne. Çi ye? [**Dil, qelb**], (Sadinî. M.X , r. 44)
- 119- Mamikê mino, hemî dinya diçîtê, lê destek kayê naçîtê. Çi ye? [**Guh**], (Sadinî. M.X , r. 55)
- 120- Mamikê mino, pêçiya bi kevrî ve ye. Çi ye? [**Kezî**], (Sadinî. M.X , r. 81)

- 121- Mamikê mino, hin im dî hînan im dî, rîtil nav singan im dî, rû li nav lingan im dî. Çi ye? [**Memik û rêv**], (Sadinî. M.X , r. 95)
- 122- Mamikê mino, sêva nermbûyî, heşta nanê nevebûyî. Çi ye? [**Memik**], (Sadinî. M.X, r. 95)
- 123- Mamikê mino, helbest helbest, avka mezin şilqa li xwe didet, hindî dibirin kata ji xwe didet. Çi ye? [**Pirça serî**], (Sadinî. M.X , r. 114)
- 124- Mamikê mino, fitlek giya li pişt çiya. Çi ye? [**Por**], (Sadinî. M.X , r. 116)
- 125- Mamikê mino, tepek li ser tepekê, tê da marê gezekê, ser da konên roviyan, di serdatir çirayên nebiyan. Çi ye? [**Rû-sûret**], (Sadinî. M.X , r. 122)
- 126- Mamikê mino, kaniya min e, jê diçin heft co, yek şîrîn e, du tal in, du gemore ne, du jî şor in. Çi ye? [**Serê mirov**], (Sadinî. M.X , r. 124)
- 127- Mamikê min e, hir ve mil e, wê ve mil e, di nav da yek divilvile. Çi ye? [**Ser**], (Sadinî. M.X , r. 124)
- 128- Tiştikê min e, yê rût e, yê bê mût e, dihilgire û nadane. Çi ye? [**Til û nenûk**], (Sadinî. M.X , r. 138)
- 129- Mamikê mino, bapîrê te dapîra te, dikete pişta xwe. Çi ye? [**Til û nênik**], (Sadinî. M.X , r. 138)
- 130- Mamikê mino, deh bira ne, her deh têne deştê, her yekî ferşek li piştê. Çi ye? [**Tilî**], (Sadinî. M.X , r. 139)
- 131- Mamikê mino, yên mirov dinê, bi pênc şahidan ve. Çi ye? [**Tilî**], (Sadinî. M.X , r. 139)
- 132- Mamikê min e, dilivlive ezman nîne, pê baxive. Çi ye? [**Tilî**], (Sadinî. M.X , r. 139)
- 133- Mamikê min e, ew rex dîwar e, ev rex dîwar e, nêvekê seyê har e. Çi ye? [**Ziman û lêv**], (Sadinî. M.X , r. 148)
- 134- Mamikê mino, di nêveka du geliyan, direve seyê har. Çi ye? [**Ziman**], (Sadinî. M.X , r. 148)
- 135- Mamikê mino ji mamikan, rojê sê caran, tu nanî didî sersorkê qasimî. Çi ye? [**Ziman**], (Sadinî. M.X , r. 149)
- 136- Mamikê min e, ga di gelî da ne, gelî dirize, ga narize. Çi ye? [**Ziman**], (Sadinî. M.X , r. 149)
- 137- Tiştêkê min heye tiştanî, hema her tişt e, şûreke beran li pişt e, her çiyê çû nav kuşt e. Çi ye? [**Mirov û didan**], (Sadinî. M.X , r. 153)

- 138- Mamikê mino, hû ve dep e wê ve dep e, di nav da sil e sep e. Çi ye? [**Alek û kep**], (Sadinî. M.X , r. 160)
- 139- Mamikê mino, çûme şarê şik tê ne, goştî dixem hestî tê ne. Çi ye? [**Memik**], (Sadinî. M.X , r. 164)
- 140- Mamikê mino, çûme şkeftêkî tijî tefş û telaş, çûme jortir du kunêd roviyan, çûme jortir kaniyêd zelal, çûme jortir deşt û leylan, çûme jortir rêl û rêlistan. Çi ye? [**Dev, kep, çav, enî, pirça serî**], (Sadinî. M.X , r. 165)
- 141- Mamikê mino, gayê nav govê nivistî, pelpîne rexî ristî. Çi ye? [**Ziman û didan**], (Sadinî. M.X , r. 169)
- 142- Mamikê mino, girkê sor e, pêş malan e. [**Difin**], (Sadinî. M.X , r. 171)
- 143- Mamikê mino, cemik in li kêlek in, ne goşt in, belê nermik in. Ev çi ye de fam bikin? [**Guh**], (Sadinî. M.X , r.175)
- 144- Mamikê mino, dîkilek e dîkvanek, çar mih û beranek. Çi ye? [**Dest û tilî**], (Sadinî. M.X , r. 176)
- 145- Mamikê mino, du sêvên gurover, li ser sîngê sor û zer. Çi ye? [**Memik**], (Sadinî. M.X , r. 177)
- 146- Mamikê mino, du kulekêd bêderî, roj girtî şev vekirî. Çi ye? [**Çav**], (Sadinî. M.X , r. 177)
- 147- Mamikê mino, girkê bert e, du şikeft tê da. Çi ye? [**Difin**], (Sadinî. M.X , r. 178)
- 148- Mamikê mino, newala kûr, tijî genimê hûr. [**Ezman**], (Sadinî. M.X , r. 183)
- 149- Mamikê mino, şikefta şûştî mûştî, sih û du meriv lê rûniştî. Çi ye? [**Dev û didan**], (Sadinî. M.X , r. 183)
- 150- Mamikê mino, şikefta reş tijî gayê beş. Çi ye? [**Dev û didan**], (Sadinî. M.X , r. 185)
- 151- Mamikê mino, vî rexî aş, wî rexî aş, di nav da kerek qumaş. Çi ye? [**Ziman**], (Sadinî. M.X , r. 186)
- 152- Mamikê mino, nan dizî da kurê kumsor, kumsorî da rêza siwaran, siwaran kir kumêd dîwaran. Çi ye? [**Ziman, didan, qirik**], (Sadinî. M.X , r. 187)
- 153- Mamikê mino, çûme şikeftêkê, tijî sofîyêd ser bişaş. Çi ye? [**Dev û didan**], (Sadinî. M.X , r. 190)
- 154- Mamikê mino, kaniya kevwê av tê dizê. Çi ye? [**Difin**], (Sadinî. M.X , r. 191)
- 155- Mamikê mino, qevdek giya, li pişt çiya. Çi ye? [**Por, bisk**], (Sadinî. M.X , r. 191)
- 156- Mamikê mino, vî alî perçîn wî alî perçîn, nav da kewa gogerçîn. Çi ye? [**Çav**], (Sadinî. M.X , r. 193)

- 157- Mamikê mino, çûme şikeftekê tijî tefş û telaş, çûme jortir du kunêt roviyan, çûme jortir kaniyêt zelal, çûme jortir deşt û leylan, çûme jortir rêl û daristan. Çi ye? [**Dev, poz, çav, serê mirovî, enî, por**], (Sadinî. M.X , r. 205)
- 158- Mamikê mino, pênc bira ne, her yekî selek li piştê. Çi ye? [**Tilî û neynûk**], (Sadinî. M.X , r. 205)
- 159- Mamikê mino, heft qul û qultinîk li ser. Çi ye? [**Serî**], (Sadinî. M.X , r. 215)
- 160- Mamikê mino, tumkê di tehtî da, nesîbê însanan hemî tê da. Çi ye? [**Memikê daykê**], (Sadinî. M.X , r. 220)
- 161- Axûrekî min heye, tijî gayê beşik e. [**Dev û diran**], (Güneş. K, r. 26)
- 162- Alîkî reş e, alîkî spî ye, nava wê kun e. [**Kezeb-cîger**], (Güneş. K, r. 26)
- 163- Beraletê heye, birek mih tê de ye, seyekî sor devê wê de ye. [**Dev, diran, ziman**], (Güneş. K, r. 27)
- 164- Bi banî ketim du gulên geş, bi banî ketim du marên reş, bi banî ketim meydana xweş, bi banî ketim ev zala hûta. [**Çav, birî, enî, por**], (Güneş. K, r. 30)
- 165- Cêwî ne li kêlek in, ne goşt in lê nermik in, dangan kom dikin, ev çi ye de fêm bikin? [**Guh**], (Güneş. K, r. 35)
- 166- Çûme camiyê, min derî vekir tijî ayetê kursiyê. [**Dev û diran**], (Güneş. K, r. 36)
- 167- Çi xaniyek damiştî, bilbil tê de rûniştî? [**Dev û ziman**], (Güneş. K, r. 38)
- 168- Çira çûyîne li ser conî, ez dibînîm tu nabînî. [**Çav**], (Güneş. K, r. 42)
- 169- Dernakeve ji mal e, hem ciwan e hem kal e, geh şûr e, geh mertal e, hem neyar e hem jî heval e, geh şîrîn e geh tahl e. [**Ziman**], (Güneş. K, r. 44)
- 170- Du heb gomê me, li ser kutkî ye. [**Çav û poz**], (Güneş. K, r. 48)
- 171- Du qulikê roviya, du çîrê nebiya, aşekî xirabe ber geriya. [**Poz, çav, dev**], (Güneş. K, r. 48)
- 172- Du guniyê tehtî ve, dilê dayîkan pê ve. [**Çiçik-memik**], (Güneş. K, r. 48)
- 173- Du kaniyên tehtê ve, rizqê dinê tê de. [**Çiçik**], (Güneş. K, r. 48)
- 174- Du heb sêvên gilover, li ser sîngê sor û zer. [**Memik, bistan**], (Güneş. K, r. 49)
- 175- Du rîsê giya, li piştê çiya. [**Kezî**], (Güneş. K, r. 49)
- 176- Diçim û diçim du parçe sêv, diçim û diçim du qulên rovî, diçim û diçim du rêz morî, diçim û diçim du çîrayên nebî, diçim û diçim du marên reş, diçim û diçim meydanek xweş, diçim û diçim dêla huta. [**Lim-poz-çav-bihr-enî-por**], (Güneş. K, r. 51)
- 177- Serî ferş e, binî goşt e. [**Tilî**], (Güneş. K, r. 51)
- 178- Deştêkî çermî, li binî du çîrên ronî. [**Enî û çav**], (Güneş. K, r. 53)



- 179- Dirêj e dirêj, heya mala derwêş. [**Hûr û rûvî**], (Güneş. K, r. 53)
- 180- Dixwe naxwe, têr nabe. [**Dev**], (Güneş. K, r. 53)
- 181- Dibêjim were were nayê, dibêjim newe tê. [**Lêv**], (Güneş. K, r. 54)
- 182- Ez radizim ew ranazê. [**Dil**], (Güneş. K, r. 59)
- 183- Gava mû dibîne diherike, gava mû nebîne dihetike. [**Çav**], (Güneş. K, r. 61)
- 184- Gayê sorî serberdayî, di gelî de berdayî. [**Ziman**], (Güneş. K, r. 62)
- 185- Girek di pêş de, du qul tê de. [**Poz**], (Güneş. K, r. 65)
- 186- Heft deriyê wê heye û gelek ezamet e. [**Serî**], (Güneş. K, r. 75)
- 187- Hînî mînî, li binî gonî, ez te dibînim, lê tu nabînî. [**Çav**], (Güneş. K, r. 76)
- 188- Ji hingiv şirîntir e, tiştêk jê ne xweştir e. [**Ziman**], (Güneş. K, r. 79)
- 189- Jora şil û miştî, sih û du carî tê de rûniştî. [**Dev û diran**], (Güneş. K, r. 81)
- 190- Li vî alî mijang, li wî alî mijang, li navê morî û mircan. [**Çav**], (Güneş. K, r. 92)
- 191- Mamkê mino, mar e ne mar e, xurcîk li milan e ne etar e. [**K...mirov**], (Güneş. K, r. 94)
- 192- Mele bi şaşkî, çil ga çûne aşkî. [**Diran**], (Güneş. K, r. 96)
- 193- Ne dest e lê wek hev e, ne şe ye wek melêv e, pehn dibe bi erdê ve, mirov dipêve gav e. [**Ling**], (Güneş. K, r. 99)
- 194- Parçêkî nan da lawikê kumsor, lawikê kumsor da rêza esker, rêza esker avête çala gû. [**Ziman, diran, mîde**], (Güneş. K, r. 101)
- 195- Pênc bira ne her yekî salekî ser e. [**Tilî**], (Güneş. K, r. 103)
- 196- Rojê du sê car, nan dide qazikê qûnxwar. [**Ziman**], (Güneş. K, r. 109)
- 197- Ser ezman e, bin ezman esî û du mercan e. [**Diran**], (Güneş. K, r. 113)
- 198- Stûnikê li ser du mezela ava dikê. [**Difin/poz - Mezel: çav**], (Güneş. K, r. 116)
- 199- Ser min ve, binê dayik ve. [**Memik**], (Güneş. K, r. 118)
- 200- Şikefta tarî, tê de rûniştiye kûçikek harî. [**Dev û ziman**], (Güneş. K, r. 122)
- 201- Şikefta tarî, li ser stûnên xwarî. [**Zik û parsû**], (Güneş. K, r. 122)
- 202- Timî divilvile, ziman nîne lê diştexile. [**Tilî**], (Güneş. K, r. 128)
- 203- Tehl e weke zilindar, gelekani ji xwe re dike neyar. [**Ziman**], (Güneş. K, r. 128)
- 204- Tûj e weke şûr, xweş e weke bilûr. [**Ziman**], (Güneş. K, r. 129)
- 205- Textê rewan dîwarên reş, du stêrkên geş, du rêz morî, du qulên tarî. [**Serê mirovan**], (Güneş. K, r. 130)
- 206- Vî milî rizde, wî milî rizde, yekê nêvê de, navê wî Evdilezîz e. [**Ziman**], (Güneş. K, r. 130)

207- Wek stêrkan diçûriske, deriyê wê wek birûsk e, rondik davê wek nîsk e, li ser dileqe birû û bisk e, kî ker nebe, wê nas ke. [**Çav**], (Güneş. K, r. 132)

208- Xan tijî mêvan. [**Dev û diran**], (Güneş. K, r. 135)

209- Ya min e, min nas nakê, defterên din yaz nakê. [**Tilî**], (Güneş. K, r. 135)

210- Yên ku ez dibînim tu nabînî. [**Çav**], (Güneş. K, r. 136)

211- Mamikên min ê mamanî, leşkerê xala girt dora mala. [**Sing**]<sup>199</sup>

212- Reş e pir tarî ye, du çilê Fatma nebiya, tê de fêxistiye. Çi ye? [**Çav**], (Kan. Ş, r. 19)

213- Qabika qaptan e, quleke reş nav milan e, bi dev e bê diran e. [**Wajîna/quz**], (Kan. Ş, r. 19)

## 2. Mamikên li Ser Cureyên Ajelan

Zarok piştî têkiliya xwe ya bi malbat û mirovan re, têkiliyeke xurt di navbera xwe û ajelan de ava dike. Li gor qaîdeya “ji nêzik ber bi dûr ve” zarok pêşî ajelên nêzikî xwe dinase û ev çarçove her diçe berfireh dibe. Tabî di vê têkiliyê de rola jiyan û çanda civak û neteweya zarokan xwedî tesîr e. Heta welat û axa ku li ser dijîn jî têkiliya zarokan bi ajelan re diguherîne. Di vê beşê de mamikên ku li ser ajelan in û hatine senifandin, neynika jiyanê ne. Di her mamikekê de xisûsiyetên ajelan jî tînin gotin ku ev ji aliyê nasîna wan ajelan ve ji bo zarokan rêbazê gelekî girîng e. Her wiha di bin vê beşê de deh sernavên din hatine danîn ku cure û komên cuda yên ajelan nîşan didin.

### 2.1. Cureyên Kêzikan

Kêzik gelek caran ji zarokan re mexlûqatên pir xerîb xuya bûne. Ji ber taybetiya wan a firîne û dengên wan ên jihevçuda, zarokan bala xwe dane kêzikan û xwestine ku wan binasin. Di mamikan de her kêzik herî zêde bi xisûsiyeta xwe ya naskirî ve hatiye vegotin. Mamikên ku hatine senifandin ji ber ku ji deverên cuda hatine berhevkerin em di wan de şahidê navên cuda yên heman ajelê jî dibin ku ev yek dê di zarokan de zanîna devokan jî xurt bike. Wekî mînak navên “morî, mêrî, gêrik, mûristan, mûrî, mêwî” ji bo heman ajelê hatine gotin. Kêzikên ku di nav malê de dixuyên an jî yên li hewşa malê û li çolê dijîn di vê beşê de hatine senifandin. Herî zêde li ser kêzikên wek: “mêşa hingivîn, kêç, moz, qirnî, gene, kulî, morî/mûristang, pêşî, kelmêş, spih, darmêş, kurm, şeytanok, pinpinî, dûpişk, zerkit, kêza gû, cobir, kirmorî” mamik hatine senifandin.

1- Tiştî tiştik î, hilî wilî, spêdê zû çûye çilî, tu bixweyî keçek kilî, çi ye? [**Mêşa hingivîn**], (Sadinî. M.X, r. 68)

<sup>199</sup> Şerif Kan, *Berhevkerin û Tesnîfa Mamikên Kurdî*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê ya Çapnebûyî, Mardîn, 2013, r. 19.

- 2- Tiştêkî min heye, gûyê wê dermanê nexweşan e, çi ye? [**Mêşa hingivîn**], (Sadinî. M.X , r. 69)
- 3- Mamikê mino, ji min pekya, di te çikya, çi ye? [**Kêç**], (Sadinî. M.X , r. 74)
- 4- Mamikê mino, reş reşê ga ye, virvira tira ye, bêhna wê, bêhna tûla ye. Çi ye? [**Kêzik-moz**], (Sadinî. M.X , r. 81)
- 5- Mamikê mino, dixwe û narît. Çi ye? [**Qirnî-gene**], (Sadinî. M.X , r. 82)
- 6- Mamikê mino, çûm ji vir pê da, cuhyek yê di rê da, lingê gê li ser piştê da. Çi ye? [**Kulî**], (Sadinî. M.X , r. 85)
- 7- Mamikê mino, ne ker e, ne hêstir e, bar ji qalib, mezintir e. Çi ye? [**Morî-gêrik**], (Sadinî. M.X , r. 97)
- 8- Mamikê mino, hacîlokê navtengbestî, ne goşt tê da ne hestî. Çi ye? [**Morî- Gêrik**], (Sadinî. M.X , r. 97)
- 9- Mamikê mino, karika kejik, li ser hejik. Çi ye? [**Moz**], (Sadinî. M.X , r. 106)
- 10- Mamikê mino, di qulekê de, keriyekî pez e. Çi ye? [**Morî-gêrik**], (Sadinî. M.X , r. 107)
- 10- Tiştikê mino tişto, nikul wekî xişto, min pê lê da û kuşto. Çi ye? [**Pêşî-kelmêş**], (Sadinî. M.X , r. 113)
- 11- Mamikê mino, li nav dehlê babo, gayên xezalo. Çi ye? [**Spîh**], (Sadinî. M.X , r. 126)
- 12- Mamikê mino, ihim ihim iho, du per, du mû, sîngê şêra, çavên mara, pir dirende û eca'yib, ka bizanin ew çi ye? [**Kulî**], (Sadinî. M.X , r. 151)
- 13- Mamikê mino, dar e ya li nav daran, jê têt dengê birîndaran. Çi ye? [**Darmêş**], (Sadinî. M.X , r. 155)
- 14- Mamikê mino, reş e wekî qîr, difirît wekî tîr, kutilkan çê diket wekî dayîka mîr. Çi ye? [**Kêzik**], (Sadinî. M.X , r. 184)
- 15- Hilû ye, bê mû ye, mamikê mino, ev çi ye? [**Kurm**], (Sadinî. M.X , r. 195)
- 16- Mamikê mino, spî ye ne keşk e, guhbel e ne mişk e, biharan terr e, payîzan hişk e. Çi ye? [**Şeytanok**], (Sadinî. M.X , r. 199)
- 17- Gomeke me heye, sed hezar pez dikeme têda cî dibe, lê qevşa gîha dikimê, naçe. Ew çi ye? [**Mûristang**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 422)
- 18- Reş e, ne beq e, stru hene, ne ga ne, şeş pê hene bê sim in. Ew çi ye? [**Kêzik**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 422)
- 19- Qurût, qurût, qur tune, eyar heye mû tune. Ew çi ye? [**Gene**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 423)

- 20- Zûrî, zûrî, zûr tune, eyar heye mû tune, dixwe naxwe mîz tune. Ew çi ye? [**Gene - spî**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 423)
- 21- Hespa şê, banzda hewşê, ew çi ye? [**Kêç**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 423)
- 22- Kurtan lê ye ne ker e, xwedî qoç e ne ga ye. [**Şeytanok**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 423)
- 23- Bi per e, ne çivîk e, bi qoç e ne karik e. [**Pinpinî**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 423)
- 24- Mûtê bê pût e, dixot û narîte. [**Tebu/nuj - qirnî**], (Berwarî. M, r. 35)
- 25- Lawkê deştanî, çû serê banî, qûn tîjtir e ji didanî. [**Dûpişk**], (Berwarî. M, r. 37)
- 26- Lawkê Elmana, digêrît li kolana/ser bana, qûn tîjtir e ji didana. [**Dûpişk**], (Berwarî. M, r. 37)
- 27- Mamkê min berekat, terkek li te da, qarên ji te hat. [**Dûpişk**], (Berwarî. M, r. 37)
- 28- Çeq e leq e/meq e, heçî yê destê xwe bidê ehmeq e. [**Dûpişk**], (Berwarî. M, r. 37)
- 29- Hespê sorê nav çav belek. [**Sting/moz**], (Berwarî. M, r. 40)
- 30- Çûme di şikeftê ve, ya tijî tîteçî, êkê wesa nîne bibeme cûtî. [**Sting/moz**], (Berwarî. M, r. 40)
- 31- Hirda wê da di sima gê da, heft mal ecemek tê da. [**Sting/moz**], (Berwarî. M, r. 40)
- 32- Teyrek hat, tutkek pat, ne fitre, ne zekat. [**Mêşa hingiv**], (Berwarî. M, r. 40)
- 33- Bizna kal e, li ser mal e, ne didoşin, ne difiroşin. [**Mêşa hingiv**], (Berwarî. M, r. 40)
- 34- Sed mêr hatin bi rengêkî, sitran gotin bi dengêkî. [**Mêşa hingiv**], (Berwarî. M, r. 40)
- 35- Mirîşka min çû kepir e, zîrça xwe bû şeker e. [**Mêşa Hingiv**], (Berwarî. M, r. 40)
- 36- Ga dakir, dûv jêkir. [**Cobir**], (Berwarî. M, r. 40)
- 37- Tişteke min heye, ji vir riz, heta Xalabe tiz. [**Mêrî**], (Berwarî. M, r. 41)
- 38- Ne ker e, ne hêstir e, bar ji qalibî mezintir e. [**Mêrî**], (Berwarî. M, r. 41)
- 39- Serê aliman e, navtenga zahidan e, gunêt bagîran e. [**Mêrî**], (Berwarî. M, r. 41)
- 40- Min xalek heye li ser zûrî, ser e mezintir e ji ûrî/zig. [**Mêrî**], (Berwarî. M, r. 41)
- 41- Hêstira qero, li bender/bêderê, ne gur dixwe, ne diz dibe. [**Mêrî**], (Berwarî. M, r. 41)
- 42- Çûme ji vêrê pê da, cuhyekê/tiştêkê di rê da, lingê gê li ser piştê da. [**Kulî**], (Berwarî. M, r. 41)
- 43- Çûme wêra jûrî, berazekê xinzirî, çukêt wî pišta helbirî. [**Kulî**], (Berwarî. M, r. 41)
- 44- Çûme mala mîr, pisyar dikim ji mirovê pîr, kê dîtiye teyrê bişîr. [**Pêşî**], (Berwarî. M, r. 41)
- 45- Ji tiştan ne ti tişt e, nikil weke xişt e, perasû li nav pişt e. [**Pêşî**], (Berwarî. M, r. 41)
- 46- Tiştûn e serê tiştû xiştûn e, pilek lêda kuştûn e, pîr e gayê zirçûne. [**Pêşî**], (Berwarî. M, r. 41)

- 47- Reş e û sur e ne bizin e, serma dipêçe ne jin e. [**Kêz**], (Berwarî. M, r. 41)
- 48- Reş e wekî qîrr, difire weke tîr. [**Kêz**], (Berwarî. M, r. 41)
- 49- Reş e wekî qîrr, difire wekî tîr, kutilka çê dike wekî jina pîr. [**Kêz**], (Berwarî. M, r. 41)
- 50- Li vê derê dibe rêz, li wê derê dibe fêz. [**Gêrik**]<sup>200</sup>, (Berwarî. M, r. 41)
- 51- Sihir hêsk, beden nasik, 4 gurçikê bêpêçik. [**Şeytanok**], (Berwarî. M, r. 42)
- 52- Yê kej e wekî keşk, yê mit e wekî mişk, biharan ter e, payizan hişk. [**Şeytanok**], (Berwarî. M, r. 42)
- 53- Çindik çindik, bazda quncik, bê dil û bê gurçik. [**Kêç**], (Berwarî. M, r. 42)
- 54- Hûr e wekî kirzin, reş e weku bizin, hakim ji ber dilerizin. [**Kêç**], (Berwarî. M, r. 42)
- 55- Sir û ba tê, çift vidûna tê. [**Kêç**], (Berwarî. M, r. 42)
- 56- Ji min filitî, li te xebitî. [**Kêç**], (Berwarî. M, r. 42)
- 57- Bizina Berwariya, nav genimê Hekariya, genim bê bistî, bizin bê estî. [**Sipî**], (Gazî. M, r. 13)
- 58- Bê hestî ye, bi bistî ye, pist şikêrê nivistiye. [**Sipih**], (Gazî. M, r. 13)
- 59- Ez çûm nizarekê, nalîna birîndarekê dihat. [**Mêşhingivî**], (Gazî. M, r. 18)
- 60- Gayê bêhestî, ser laşê te nivistî. [**Kêç**], (Gazî. M, r. 18)
- 61- Hespa şê a simaqî baz daye, ne dêl û ne qamçî. [**Kêç**], (Gazî. M, r. 19)
- 62- Mamikê min ê mamanî, ji vira û derî, kişt xwe berda serî. [**Kêç**], (Gazî. M, r. 24)
- 63- Mamikê min ê mamanî, ser mazî ye, qûn derzî. [**Zerkit**], (Gazî. M, r. 24)
- 64- Reş e reş e wey qîr, difire wey tîr, kutilga çê dike wey jina mîr. [**Kêza gû**], (Gazî. M, r. 27)
- 65- Tasa danya, li paş xanya. [**Kirmorî**], (Gazî. M, r. 30)
- 66- Tişkî min heye çindik û çindik, baz dide quncik, bê dil û gurçik. [**Kêç**], (Gazî. M, r. 32)
- 67- Tişteki min heye, girêka koviya, mêrê horiya, Ev çi ye? [**Sipî**], (Alkan. A, r. 81)
- 68- Tişteki min heye, çaqmaqekî laq û paq, kesê ku dest bidê ehmaq. Ev çi ye? [**Dûpişk**], (Alkan. A, r. 104)
- 69- Ji tiştan e ne tişt e, nikil weke xişt e, parsû li nav pişt e. [**Kermêş**]<sup>201</sup>
- 70- Hêstira qero li bênderê, ne gur dixwe ne diz dibe. [**Mûrî**], (Akbaş. E, r. 69)

<sup>200</sup> Mêriya bi darên mazî ve.

<sup>201</sup> Emin Akbaş, *Tiştonek 1*, Weşanên Yekîtiya Mamosteyên Kurd, Bremen, 2006, r. 69

- 71- Mamikê mino, hê ve lat e, wê ve lat e, ya di nav da pîrefat e. Çi ye? [**Kêç**], (Sadinî. M.X , r. 74)
- 72- Mamikê mino, eger bi bar e çar pêyan e, eger bê bar e bi şeş piyan e. Çi ye? [**Kêz-moz**], (Sadinî. M.X , r. 80)
- 73- Mamikê mino, reş reşê ga ye, virvira tira ye, bêhna wê bêhna tûla ye. Çi ye? [**Kêzik-moz**], (Sadinî. M.X , r. 81)
- 74- Mamikê mino, dengêk tê danganek tê, dengê tewş û tirara tê, xwe li binê behra didê. Çi ye? [**Mêşa hingivîn**], (Sadinî. M.X , r. 98)
- 75- Mamikê mino, pezê hemeşîn, berdan nav geleşîn, ne didoşîn, ne difroşîn. Çi ye? [**Mewî-morî**], (Sadinî. M.X , r. 100)
- 76- Mamikê mino, zil bi zîwan, nexş li nîvan, ne gawir e, ne îslam. Çi ye? [**Morî-mêwî**], (Sadinî. M.X , r. 106)
- 77- Mamikê mino, ho ve tat e, wê ve tat e, di nîvekê pîrefat e, hingek lê da û ji ber hate. Çi ye? [**Spîh**], (Sadinî. M.X , r. 155)
- 78- Mamikê mino, revendek hatî li deştê, her birrek heştê heştê, çûne milan hatine çilan, çûne waran nav hizaran, çûne çeman kit jê neman. Çi ye? [**Kuliya zer**], (Sadinî. M.X , r. 204)
- 79- Baskê wî heye çûk nîne, qiloç heye beran nîne. [**Mêş**], (Güneş. K, r. 33)
- 80- Di rêzekê de keriyêke pez, tim û tim dikin lez. [**Mûristan-gêrik**], (Güneş. K, r. 51)
- 81- Dide hev çeleng û xebatkar e, lê ne parsek ne jî cotyar e. [**Mûristan**], (Güneş. K, r. 52)
- 82- Mamikê min û maman e, deng tê danganek tê, diçe ser serê dara û tê, diçe binê behran û tê. [**Mêşa hingiv**], (Güneş. K, r. 54)
- 83- Ha ha dikim, tip tip dikim, sê hezaran tevilhev dikim. [**Mêwî-morî**], (Güneş. K, r. 67)
- 84- Hespa şê, reviya gomê. [**Kêç**], (Güneş. K, r. 70)
- 85- Hespê şevê, ba da hewşê. [**Kêç**], (Güneş. K, r. 71)
- 86- Ji tiştan ne tişt e, nikil weke xişt e, parsû li nava pişt e. [**Kermêş**], (Güneş. K, r. 80)
- 87- Ji vir rîz, heta Xalabe tîz. [**Mirî-morî**], (Güneş. K, r. 80)
- 88- Kurtanê wê heye ker nîne, qiloçê /qoç wê heye ga nîne. [**Şeytanok**], (Güneş. K, r. 87)
- 89- Mamê te exmûr, da kaşê dûr, serî lê bî ûr? [**Mêwî-morî**], (Güneş. K, r. 93)
- 90- Mamikê minê mamanî, me bênderek hilanî, genim ji kayê pirtir anî. [**Mêşa hingivî**], (Güneş. K, r. 94)

- 91- Mirîşka min çû kepirê, zîrça xwe bû şekirê. [**Mêşa hingiv**], (Güneş. K, r. 97)
- 92- Reş e ne beq e, stûr hene ne ga ye, şeş lind hene bê sim e. [**Kêzik**], (Güneş. K, r. 109)
- 93- Ser qufilî, çar nik û tilî, dûv li ser milî. [**Dûpiştik**], (Güneş. K, r. 111)
- 94- Spî ye spî ye ne keşk e, guhbelîsok e ne mişk e. [**Şeytanok**], (Güneş. K, r. 112)
- 95- Tiştêkî min heye tiştok e, gûyê wî li devan xweşkok e? [**Mêşa hingiv**], (Güneş. K, r. 128)
- 96- Wê hêlê teht, vê hêlê teht, di nav de pîra peht.<sup>202</sup>
- 97- Zir zir tûle, eyar heye mû tune, xwarin heye gû tune. [**Qirnî**], (Güneş. K, r. 137)
- 98- Difire bi vizeviz e, gûyê wê li devê te digevize. [**Mêşa hingiv**], (Kan. Ş, r. 8)

## 2.2. Ajelên Kojer

Di bin vê beşê de zarok dê ajelên kojer û xisûsiyetên wan fêr bibin. Di nav van mamikan de ajelên ku nêzîkî zarokan û dûrê wan in hene. Wekî din hin teşbîhên ku di nav civakê de ji bo ajelan tên kirin jî hene. Mînak: “pêziçka şeytanî, cihûyêt kurrete, kalo, feqîr, apê sincik”. Piranî mamikên li ser ajelên wek: “kêvrîşk, sivore, mişk, jûjî, sîxur, xilt” hatine senifandin.

- 1- Ji vî banî, bo vî banî, bo pêziçka Şeytanî. [**Sivore**], (Berwarî. M, r. 35)
- 2- Ji vêrê heta Balete, hemî Cihûyêt kurrete. [**Sivore**], (Berwarî. M, r. 35)
- 3- Helvandira, helwendira, dihavêt lotik û qendira, şaxêt bizina, guhêt kera. [**Kêvrîşk**], (Berwarî. M, r. 35)
- 4- Her li van dera, her li wan dera, tiştêk derket ji nav bera, pêt gurga, guhêt kara. [**Kêvrîşk**], (Berwarî. M, r. 35)
- 5- Helo dera, helo dera, şûn pêt sa, guhêt kara. [**Kêvrîşk**], (Berwarî. M, r. 35)
- 6- Ser gelgel e, bin gelgel e, çav zîqa, simbêl bel e. [**Kêvrîşk**], (Berwarî. M, r. 35)
- 7- Ser gelgelu, bin gelgelu, çav zîq û simbêl belu. [**Kêvrîşk**], (Berwarî. M, r. 35)
- 8- Ser gîle bin gîle çav boq û simbêl bel e. [**Kêvrîşk**], (Berwarî. M, r. 35)
- 9- Pê puka, guh belok. [**Kêvrîşk**], (Berwarî. M, r. 35)
- 10- Çi li deştê bit çî li nav bera, çî li ber qurmên dar û bara, pê n gurgan e, guhên kera. [**Kêvrîşk**], (Berwarî. M, r. 35)
- 11- Çûme rêkekê, mamê mişt ji wê ve tê, piştîyê li nîva piştê, min gutê: Mamo dê kî ve çî? Got: Dê çime Biheştê. [**Jûjî**], (Berwarî. M, r. 36)

<sup>202</sup> Bi wateya pîrhevok an jî pîra mirovxwer hatiye bikaranîn.

- 12- Êk dihat ji deştê, milekê sitirîya li piştê, min gut mam dê çi key? Got dê çime Beheştê. [**Jûjî**], (Berwarî. M, r. 36)
- 13- Feqîrek têt ji deştê, piştiyekê sitiriya li piştê. [**Jûjî**], (Berwarî. M, r. 36)
- 14- Kalo tê ji deştê, barê stiriyan li piştê. [**Jûjî**], (Berwarî. M, r. 36)
- 15- Tişteke min heye, can goşt û hestî ne, kincê wî bi derzî ne. [**Jûjî**], (Berwarî. M, r. 36)
- 16- Kumê gup û bi dirî. [**Jûjî**], (Berwarî. M, r. 36)
- 17- Hebanoka bi derzî, mar ji ber dibezi. [**Jûjî**], (Berwarî. M, r. 36)
- 18- Mamekê min li deştê, barekê sitirîya li piştê, dikit nakit destê wî nagihite piştê. [**Jûjî**], (Berwarî. M, r. 36)
- 19- Hulik mulik, mamê te yê difin gulik. [**Jûjî**], (Berwarî. M, r. 36)
- 20- Apê sincik, baz da quncik. [**Mişk**], (Berwarî. M, r. 37)
- 21- Helhelîko melmelîko, simbêl tîjo guh belîko. [**Mişk**], (Berwarî. M, r. 37)
- 22- Gasim e, dîwar sim e. [**Mişk**], (Berwarî. M, r. 37)
- 23- Reş e wekî qîrr, sipî ye wekî şîr, tîj e wekî tîr. [**Sîxurr**], (Berwarî. M, r. 40)
- 24- Hel helo, bel belo, simêl belo, sim simî, dîwar simî. Ew çi ye? [**Mişk**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 420)
- 25- Tişteki min heye, min da hevraza, min da xebera bavê piling peza, min da berjêra, ewan ez girtim, goştê min dan ber kêra, Ew çi ye? [**Kêwrûşk**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 422)
- 26- Ez çûm deştê, min dît sûfikê jû ve tê, piştîkê stiriye li piştê, min got sofî tê çi ku? [**Jîjû**], (Gazî. M, r. 18)
- 27- Kalo tê ji deştê, piştîkî dirî li piştê, bê şîv û bê taştê. [**Jûjî: Kirpi**], (Gazî. M, r. 21)
- 28- Ser gelgele, bin gelgele, çav ziq û simbêl bel e. [**Sivûrî, sivore**], (Gazî. M, r. 27)
- 29- Tişteki min heye, ser sorek erdê dikole. Ev çi ye? [**Xilt**], (Alkan. A, r. 89)
- 30- Tişteki min heye, li pişt kewara dîya te ye. Ev çi ye? [**Mişk**], (Alkan. A, r. 94)
- 31- Tişteki min heye, timî axê bi serê xwe da dike. Ev çi ye? [**Xilt, mişkê kor**], (Alkan. A, r. 95)
- 32- Tişteki min heye, canê wî goşt e, kincê wî dirî ye. Ev çi ye? [**Joji**], (Alkan. A, r. 96)
- 33- Tişteki min heye, ji ber tîrsa tajiya, radizê li nav devîya. Ev çi ye? [**Kêroşk**], (Alkan. A, r. 100)
- 34- Çindik û çindik çû quncik. [**Mişk**], (Akbaş. E, r. 68)
- 35- Ji bên e ji bên e, du dest in du pê ne, qalib e ruh tê ne. Çi ye? [**Mişk**], (Sadinî. M.X, r. 105)



- 36- Mamikê mino, ser helhel e bin helhel e, çavzîq û simbêlbel e. Çi ye? [**Sivore**], (Sadinî. M.X , r. 158)
- 37- Mamikê mino, hinit diket minit diket, nîva malê kun diket, malxê malê bîjin diket. Çi ye? [**Mişk**], (Sadinî. M.X , r. 160)
- 38- Mamikê mino, himhim e dîwar sim e. Çi ye? [**Mişk**], (Sadinî. M.X , r. 163)
- 39- Mamikê mino, dapîr têtin ji deştê, piştîyê qirşika li piştê. Çi ye? [**Jûjî**], (Sadinî. M.X, r. 165)
- 40- Mamikê mino, zerwêle zerwêle, berfê bikêle. Çi ye? [**Sivore**], (Sadinî. M.X , r. 206)
- 41- Bizina renghinar, baz da çû zinar. [**Sihorî-sivorî**], (Güneş. K, r. 33)
- 42- Helheloko melmeloko, terîsorko guhbelko. [**Kîroşk**], (Güneş. K, r. 68)
- 43- Hilkutî, milkutî, Şêx Zeyneba dûv rûtî. [**Mişk**], (Güneş. K, r. 73)
- 44- Ji hire û cem te, çip li qûna te. [**Kêç**], (Güneş. K, r. 79)
- 45- Kalo tê ji deştê, tefala dirî li piştê. [**Rih an jî jûjî**], (Güneş. K, r. 82)
- 46- Ser morik, axê dike komik. [**Xilt**], (Güneş. K, r. 117)
- 47- Zehf kalekî hilhilî, jê naçe çerm û dirî. [**Jîjo-jûjî**], (Güneş. K, r. 137)
- 48- Tiştö tiştö, bêvil xiştö, baran barî xwe guviştö çi ye? [**Jîjo**], (Kan. Ş, r. 8)

### 2.3. Ajelên Xijende

Ji nav ajelan ên ku zêde bala zarokan jî dikêşin ajelên xijende ne. Zarokên kurd van ajelan piştî temenekî şûnde dinasin. Çimkî li gor jiyana wan ev ajel li gor ajelên din durrî wan in. Lê di nav mamikên kurdî de xaleke balkêş ew e ku me tenê du ajelên xijende peyda kirin, ew jî “mar û kosî” ne.

- 1- Çolî/giyay dixot ne kar e, ser mişk e qon mar e, ne mişk e ne mar e. [**Kîsel/kusî**], (Berwarî. M, r. 36)
- 2- Hêr hêrî ye, ne mar e, çulîxur e ne kar e. [**Kîsel/kusî**], (Berwarî. M, r. 36)
- 3- Ji hêr ve mil, ji wêr ve mil, yê di nav da mîr kurvil. [**Kîsel/kusî**], (Berwarî. M, r. 36)
- 4- Vî alî text, ji wî alî text, jê derket kalekî bêbext. [**Kîsel/kusî**], (Berwarî. M, r. 36)
- 5- Tiştekek heye tiştanok, li ber kevir xiştanok. [**Kîsel/kusî**], (Berwarî. M, r. 36)
- 6- Ser textik e, bin textik e, giya dixwe ne karik e. [**Kîsel/kusî**], (Berwarî. M, r. 36)
- 7- Çerm û çîqal e mû nîne, çar dest û pê ne, dûv lê ne. [**Kîsel/kusî**], (Berwarî. M, r. 36)
- 8- Tiştekek heye ser text e, bin text e, di nivê de pîreke bêbext e. [**Kîsel/kusî**], (Berwarî. M, r. 36)
- 9- Ji vî alî dar, li wî alî dar, di navberê da goştê jar. [**Kîsel/kusî**], (Berwarî. M, r. 36)

- 10- Kutan dikî ne dar e, serî mişk e, ne mar e, diçêre ne ker e. **[Kîsel/kusî]**, (Berwarî. M, r. 36)
- 11- Tiştêkî min heye, teq teq dike, ne dar e, serî mişk e, ne mar e, gîha diwxe, ne kar e. **[Kîsel/kusî]**, (Berwarî. M, r. 36)
- 12- Ji bin ve dar, ji ser ve dar, çolî/gyay dixot ne mişk e ne mar. **[Kîsel/kusî]**, (Berwarî. M, r. 36)
- 13- Diçêrit kar nîne, dizelit mar nîne, hêka dikit mirîşk nîne. **[Kîsel/kusî]**, (Berwarî. M, r. 37)
- 14- Ji ser ve dep e ne dar e, ji bin ve dep e ne dar e, gyay dixut ne kar e, diçite di kunê ve ne mar e. **[Kîsel/kusî]**, (Berwarî. M, r. 37)
- 15- Teyrek firî şîvekê, perr pê ve ne, qûn li nîvekê. **[Mar]**, (Berwarî. M, r. 37)
- 16- Şîva terr, li guher. **[Mar]**, (Berwarî. M, r. 37)
- 17- Şîva ter e, li bin axê. **[Mar]**, (Berwarî. M, r. 37)
- 18- Singê xar e, li bin dîwar e. **[Mar]**, (Berwarî. M, r. 37)
- 19- Zil e wekî zîwan, nexişandiye wek tîman, ne dîn e û ne îman, yarê hemî rihan. **[Mar]**, (Berwarî. M, r. 37)
- 20- Tiştêk heye tiştinok, li nav kevir e xiştinok, ne ber heye ne piştok. **[Mar]**, (Berwarî. M, r. 37)
- 21- Şîva ter, gilover, Ew çi ye? **[Mer]**, (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 421)
- 22- Tiştêkî min heye tiştanî, ber kevirê xiştanî, ne pê ye ne penî. Ew çi ye? **[Mer]**, (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 421)
- 23- Rê diçe bê ling e, çerm heye mû tune. Ew çi ye? **[Mer]**, (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 421)
- 24- Nexşî perwane, ne ecem e ne surman e, ese qesasê serê meriyan e. Ew çi ye? **[Mer]**, (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 421)
- 25- Tiştêkî min heye, dikşe ne mer e, dimike ne kar e, pişt kovik e ser dar e. Ew çi ye? **[Kûsî]**, (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 421)
- 26- Tiştêkî min heye tiştanok, ber kevirê xiştanok, ne gur dixwe ne jî hirç. Ew çi ye? **[Kûsî]**, (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 421)
- 27- Valî dar walî dar, ortê da goştê jar. Ew çi ye? **[Kûsî]**, (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 422)
- 28- Baznê xezalê, çû binê nalê. **[Mar]**, (Gazî. M, r. 13)
- 29- Gir e ne dar e, xişik e ne mar e, çilo dixwe ne kar e. **[Şkevatûk]**, (Gazî. M, r. 19)
- 30- Heçka meçka, fiç û faç û fiz dewrêş. **[Mar]**, (Gazî. M, r. 19)
- 31- Hîs li ser hîs, çar çemil û toqlanîs. **[Kûsî]**, (Gazî. M, r. 20)

- 32- Kalo tê ji deştê, xurîn e bi taştê, kulê dixwe nan naxwe, seba jinê ketiye dinê. **[Kûsî]**, (Gazî. M, r. 21)
- 33- Serî text e ne dar e, binî text e ne dar e, çar pê ye ne dewar e. **[Kûsî]**, (Gazî. M, r. 28)
- 34- Sofîk tê ji deştê, ferşik ser piştê. **[Kîso]**, (Gazî. M, r. 30)
- 35- Tiştêkî min heye, gîha dixwe ne bizin e, hêka dixwe ne mirîşk e, ne text e ne kevir e. Ev çi ye? **[Kosî]**, (Alkan. A, r. 80)
- 36- Tiştêkî min heye, mala wî tim pê re ye. Ev çi ye? **[Kûsî]**, (Alkan. A, r. 96)
- 37- Tiştêkî min heye, ji dûr ve dît min kevirê, çûm nêzîk çar ling û serîyek. Ev çi ye? **[Kosî]**, (Alkan. A, r. 101)
- 38- Tiştêkî min heye, apê hûs, qulûz. Ev çi ye? **[Kosî]**, (Alkan. A, r. 103)
- 39- Tizbiya kalê berê xwe da palê. **[Mar]**, (Akbaş. E, r. 69)
- 40- Mamikê mino, gewr e gewerol e, dike hêkên girover e, dixuşîne ne mar e. Çi ye? **[Kêlûlem-margîsk]**, (Sadinî. M.X , r. 76)
- 41- Tiştêkî min heye tişt nîne, li ser kevirê hişkîn e, hêk dike mirîşk nîne. Çi ye? **[Kêşûle]**, (Sadinî. M.X , r. 77)
- 42- Mamikê mino, ser ve req e ber nîne, bin ve req e dar nîne. Hêka dike mirîşk nîne. Çi ye? **[Kûsî-kûsele]**, (Sadinî. M.X , r. 89)
- 43- Mamikê mino, ser ve dep e dep nîne, bin ve dep e dep nîne, hêka dike mamirk nîne. Çi ye? **[Kûsî-kûsele]**, (Sadinî. M.X , r. 89)
- 44- Mamikê mino, dep e ne darik e, stûqaqîçk e, hêka dike, ne mirîşk e. Çi ye? **[Kûsî]**, (Sadinî. M.X , r. 89)
- 45- Zer e wekî zêran, dixuşe wekî maran, hêka dike wekî mirîşkan. Çi ye? **[Meqezzer]**, (Sadinî. M.X , r. 96)
- 46- Mamikê mino, ser avê nûs, bin avê nûs, çarçeng û fil û fengenûs. Çi ye? **[Kosele]**, (Sadinî. M.X , r. 152)
- 47- Mamikê mino, bi kulav û depik e, wisa dixwet ne karik e. Çi ye? **[Kosele]**, (Sadinî. M.X , r. 195)
- 48- Mamikê mino, asinê sar, kun dîwar, heta bihar. Çi ye? **[Mar]**, (Sadinî. M.X , r. 207)
- 49- Bazinê stîyê, xwe avêt deviyê. **[Mar]**, (Güneş. K, r. 27)
- 50- Bin goşt e, ser mermer e, li hemû dera xwedî mal e. **[Kûsî]**, (Güneş. K, r. 31)
- 51- Çem û çem, teşîka ecem. **[Mar]**, (Güneş. K, r. 36)

- 52- Çûme nava delê, ez geriyam negeriyam, min şivekî rast nedît. **[Mar]**, (Güneş. K, r. 39)
- 53- Digerê war û war, li ser cihê xwe dike hawar. **[Mar]**, (Güneş. K, r. 46)
- 54- Dimeşe bê ling e, çerm heye mû tuneye. **[Mar]**, (Güneş. K, r. 51)
- 55- Dotil e ne satil e, çar çembil e. **[Kûsî]**, (Güneş. K, r. 51)
- 56- Giya dixwe ne golik e, hêk dike ne tûtik e. **[Kûsî]**, (Güneş. K, r. 63)
- 57- Hiltîto miltîto, şêx Silêmanokê dûv rûto. **[Majmajînatik-marmarîjatik-marmarîşik]**, (Güneş. K, r. 66)
- 58- Hundur goşt e, derve hestî ye. **[Kûsî]**, (Güneş. K, r. 74)
- 59- Ji çiyê tê kevirek, çar pê û seriyek. **[Kûsî]**, (Güneş. K, r. 77)
- 60- Kevir e ne kevir e, çar pê ye ne dewar e, hêk dike ne tûtik e. **[Kûsî]**, (Güneş. K, r. 84)
- 61- Li mirov dikeve dibore, xuya nake dizûre. **[Mar]**, (Güneş. K, r. 92)
- 62- Min ji dûr ve dît kevirek, çûm nêzik çar ling û seriyek. **[Kûsî]**, (Güneş. K, r. 97)
- 63- Şkevlâtûk mala, çûye devê deriyê xala. **[Kûsî]**, (Güneş. K, r. 119)
- 64- Tiştêkî min heye, reş e dirêj e, ne werîs e. **[Mar]**, (Güneş. K, r. 124)
- 65- Tiştê tiştê tiştanok, binê kevirê xiştanok. **[Kûsî]**, (Güneş. K, r. 125)
- 66- Tizbiya kalê, berê xwe da palê. **[Mar]**, (Güneş. K, r. 128)
- 67- Tûtika çar çembil çi ye? **[Kûsî]**, (Güneş. K, r. 130)
- 68- Vî milî fis e, wî milî fis e, li xweliyê fetise. **[Kîso-mamê mîz]**, (Güneş. K, r. 130)
- 69- Vî alî hestî, wî alî hestî, di navê de goştê rastî. **[Kûsî]**, (Güneş. K, r. 131)
- 70- Zelê zerwan, nexşê perwan, ne dîn e ne îman. **[Mar]**, (Güneş. K, r. 136)
- 71- Çar pîyan li nava deştê ye, kevir li ser piştê ye. **[Kûsel-kîso]**, (Kan. Ş, r. 4)
- 72- Şivtarok li beyarok. **[Mar]**, (Kan. Ş, r. 6)
- 73- Mamikê mino mamalê, dest û tilî çermêlî. **[Kîso]**<sup>203</sup>

#### 2.4. Ajelên Kedî û Kovî

Ajelên kedî yên ku herî zêde nêzî zarokan in. Zarok di nav ajelan de pêşî van ajelan dinasin. Piştê naskirina ajelên kovî dibe meraq. Lê ev senifandin li gor civatên din dibe ku biguhere. Mesela fil dibe ku ji bo zarokên kurd ajeleke kovî be, lê ji bo zarokên Afrîqî ajeleke kedî ye. Her wiha pênasekirina van ajelan jî dîsa li gor nêrîna civatan a li ser ajelan diguhere. Dema ku zarokên kurd bi rêya mamikan van ajelan

<sup>203</sup> Muhsin Eren, *Mamikên Gundê Şêxê Reş ê Girêdayê Şirnex*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mardîn, 2013, r. 9.

binasin her wiha dê təkiliya civata xwe û van ajelan jî fêr bibin. Di bin vê sernavê de ajelên wek: “pişik, kûçik, berx, bizin, mih, dêlik, tajî, fil” hatine vegotin.

- 1- Fatka melê, têt ji kelê, rih pê ve ne, simbêlbelê. **[Pişik/kitik]**, (Berwarî. M, r. 38)
- 2- Helhela simbêlbela, wê digerhit li ser lêvêt kutela. **[Pişik/kitik]**<sup>204</sup>, (Berwarî. M, r. 38)
- 3- Serê mar e ne mar e, diçêre ne kar e, çarpê ye ne dewar e. **[Fîl]**, (Berwarî. M, r. 43)
- 4- Helê melê, padşa rabû serê kelê, rû heye, simêl belê. Ew çi ye? **[Pişik]**, (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 420)
- 5- Pişo pişo nêrgizo, çû ber ava dengizo, ne gur dixwe ne dizo. Ew çi ye? **[Pişik]**, (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 420)
- 6- Tişteki min heye, eba belek li nav beyara. Ev çi ye? **[Kûçik]**, (Alkan. A, r. 80)
- 7- Mamikê mino, ez çûme ser milekê, min berê xwe da helanekê, hemî bûkên salekê. Çi ye? **[Berx]**, (Sadinî. M.X , r. 161)
- 8- Mamikê mino, helhelê, mîrê kelê, rih heye simbêl belê. Çi ye? **[Pişik]**, (Sadinî. M.X , r. 179)
- 9- Belo rabî, esker der bî. **[Bizin]**, (Güneş. K, r. 27)
- 10- Çarê çêkê, heştê mêkê. **[Dêlik]**, (Güneş. K, r. 36)
- 11- Em çûyin ber pezî, me anî tişteki zêdeyî. **[Berx]**, (Güneş. K, r. 56)
- 12- Helhela simbêl bela, li ser taq û du kela. **[Pisîng]**, (Güneş. K, r. 68)
- 13- Radibe berê xwe dide taxê, nan û avê didimê têr naxwê. **[Bizin]**, (Güneş. K, r. 107)
- 14- Rûçikandin, rêsandin, lê pêçandin. **[Tajî]**, (Güneş. K, r. 109)
- 15- Siltanê ser doşekê, nir nir dike li goşekê. **[Kitik-pisîk]**, (Güneş. K, r. 112)
- 16- Ser ve çayir e tê çinîn, ji bin ve kanî ye tê vexwarin. **[Mih]**, (Güneş. K, r. 113)
- 17- Şev reş e şûv reş e, miha qember e, berxî li ber e. **[Miha reş]**, (Güneş. K, r. 121)
- 18- Baz didê hel hel, avê vedixwe çelp çelp. **[Se, kûçik]**, (Kan. Ş, r. 4)
- 19- Çar lingo, binya tingo. **[Se, kûçik]**, (Kan. Ş, r. 4)
- 20- Ser ve doşek e, bin ve kanî ye. **[Mih]**, (Kan. Ş, r. 10)

## 2.5. Ajelên Avê

Ajel di serî de wiha tên dabêşkirin; ên di nav avê de û yên li bejayê dijîn. Xaleke balkêş e ku di vê beşê de wek ajelên avê tenê “masî” hatine nasandin. Ev yek jî ji ber sedema ku li ser axa Kurdistanê kêmbûna behr û golan, derya û deryaçeyan heye.

---

<sup>204</sup> Dibe ku giyandareke din be.

Careke din gotina ku vegotinên gelêrî neynika civaka xwe ne, ispat dibe. Jixwe ji ber vê ye ku di zimanê kurdî de navên cureyên masiyan jî pir kêr in.

- 1- Temteme, qulinteme, sîngê şêra, çavêt mara, pîr ecem e dirrinde me. **[Masî]**, (Berwarî. M, r. 38)
- 2- Tiştêkî mino tiştanî, li ser textê sultanî, pêxemberî şûrê xwe di stû danî. **[Masî]**, (Berwarî. M, r. 38)
- 3- Di avê de pêlewan e, li bejayiyê/dêmi bê can e. **[Masî]**, (Berwarî. M, r. 38)
- 4- Tiştêkî min heye tiştanî, ji dîya xwe dibe, ne dîya xwe dibîne ne jî ji dîya xwe qinyatê hiltîne. Ew çi ye? **[Mesî]**, (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 420)
- 5- Mamikê mamo, hêlîna şimşedarî, ne li berojî ne li nizarî. Çi ye? **[Masî]**, (Sadinî. M.X, r. 93)
- 6- Mamikê mino, çûme ji vir pê da, kaniyek ya di rê da, şaxilî legenekê tê da. Çi ye? **[Masî]**, (Sadinî. M.X, r. 93)
- 7- Bê dest û bê ling e, lê avjeniyê dike. **[Masî]**, (Güneş. K, r. 32)
- 8- Dere şop nîne, tê toz nîne. **[Masî]**, (Güneş. K, r. 51)
- 9- Gava digêrê mû, dibêjê yê dinyayê hew bikê, ji bo parîkî xwe diavêje şewkê. **[Masî]**, (Güneş. K, r. 61)
- 10- Qemçika wî heye hesp nîne, baskê wî heye teyr nîne. **[Masî]**, (Güneş. K, r. 107)
- 11- Reşahiyê de dimire, deryayê de jîndar dibe. **[Masî]**, (Güneş. K, r. 109)
- 12- Şem û şepal e, serjêkirin betal e, her sê dîna helal e. **[Masî]**, (Güneş. K, r. 120)
- 13- Tiştê minê tiştanî, paş kevirî danî, kêra Hz. Alî li stû danî. **[Masî]**, (Güneş. K, r. 125)
- 14- Mamigê mino mamiyê, tajiya Elî Mirada<sup>205</sup>, dûvê xwe li çema de bada. **[Masû]**, (Muhsin. E, r. 9)

## 2.6. Çûk û Cureyên Wan

Zarok dê di vê beşê de fêrî xisûsiyetên çûkan bibe û her wiha cureyên wan binase. Navên cureyên çûkan di nav mamikên kurdî gelek in. Ev yek dê xurcika peyvan a zarokan dewlemend bike. Mînak: “Dîkil, mirîşk, çêçik, ordek, kew, sûsik, qişqil, legleg, eylo, kund, hudhud, meqesok, pîrçemok, qaqîşk, çeçeqole, darkoke, hacîreşk, reşîle, kewsûsik, quling” cureyên ku li ser wan mamik hatine gotin.

- 1- Himhim e dîwar sim e. **[Darkoke]**<sup>206</sup>, (Berwarî. M, r. 38)

---

<sup>205</sup> “Elî Mirada zilamek e û li herêma me jiyaye. Ji malbata wan re dibêjin Elî Mirada. Ez bawer dikim ku ev nav ji bo lihevhatina gotinê hatiye bikaranîn.” Bnr. Eren, *Mamikên Gundê Şêxê Reş ê Girêdayê Şirnex*, r. 9

- 2- Himhime, darî bi sim e. **[Darkoke]**, (Berwarî. M, r. 38)
- 3- Hindî min li bîr e, Mihemed axa wezîr e, li nav teyra, êkê bi şîr e. **[Darkoke]**, (Berwarî. M, r. 38)
- 4- Tişteke min heye ser mişar, nîkil mikar. **[Dîkil/dîk]**, (Berwarî. M, r. 38)
- 5- Şaşîk li ser sera ye, bang dide, lê ne mela ye. **[Dîkil/dîk]**, (Berwarî. M, r. 38)
- 6- Ser e mişarû, pê xeparû. **[Dîkil/dîk]**, (Berwarî. M, r. 38)
- 7- Ji vêrê heta Mûsil hemî lawkên çav bikil. **[Kew]**, (Berwarî. M, r. 38)
- 8- Ji vêrê heta Mûsil, hemî xatûnên çav bikil. **[Kew]**, (Berwarî. M, r. 39)
- 9- Stû rahêl bi bendala ra dibezit. **[Kew]**, (Berwarî. M, r. 39)
- 10- Wit wit, şûnkê dûl qut. **[Kew]**, (Berwarî. M, r. 39)
- 11- Dengbêjekî dengzelal e, ji qewmê xwe re neyar e. **[Kew]**, (Berwarî. M, r. 39)
- 12- Deh mêr bi rengekî, sitrana dibên bi dengekî. **[Kew]**, (Berwarî. M, r. 39)
- 13- Ser mazîk e, stû derzîk e. **[Kew]**, (Berwarî. M, r. 39)
- 14- Bager dezî, li palê bezî. **[Sûsik]**<sup>207</sup>, (Berwarî. M, r. 39)
- 15- Tişteke ji gezê biçûktir e, ji bihostê mezintir e, ji befrê sipêtir e û ji qîrê reştir e. **[Qişqil]**, (Berwarî. M, r. 39)
- 16- Reş e reş e mîna qîrr, spî ye spî ye mîna şîr, diçe diçe mîna mîr. **[Qişqil]**, (Berwarî. M, r. 39)
- 17- Reş e wekî qetranî, sipî ye wekî kitanî, sûr e wekî mercanî, difirit diçite esmanî. **[Meqesok]**, (Berwarî. M, r. 39)
- 18- Xoşka min a xoristan, çil dergoş di destan, ne ber heye ne bistan. **[Mirîşk û çêlik]**, (Berwarî. M, r. 39)
- 19- Ne li Ademî ye, ne li Cinnî ye, qasidê beyna xelkî ye. **[Hudhud]**, (Berwarî. M, r. 39)
- 20- Tê mîna bayê, serê wî mîna gayê, poça wî mîna seyê. Ew çi ye? **[Firinde]**, (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 432)
- 21- Lem lemo, li devê çemo. **[Legleg]**, (Gazî. M, r. 23)
- 22- Ser mazî, ling derzî, li diyara kir hewar û gazî. **[Kew]**, (Gazî. M, r. 27)
- 23- Ser mazî ye, stû derzî, kendaluga/kendal ve bezî. **[Kew]**, (Gazî. M, r. 27)
- 24- Şeliqî meliqî, bi kevir ve zeliqî. **[Pîrçemok, şevşevîng]**, (Gazî. M, r. 30)

---

<sup>206</sup> Ji bo dûxanê jî tê gotin.

<sup>207</sup> Ji kewan biçûktir e.

- 25- Tişkî min heye bûçim bûçim bûç qidas, pepim canim bûç qidas, teto cano bûç qidas, nikulo cano bûç qidas, sero cano bûç qidas, çavo cano bûç qidas, goştê wê dixwim bernadim. **[Kew]**, (Gazî. M, r. 31)
- 26- Tişkî min heye ji berî mellê bi xwe dihesê. **[Dîk]**, (Gazî. M, r. 32)
- 27- Tişteki min heye, bûka mamosta ket ser desta, ne da kesî ne jî berda. Ev çi ye? **[Mirîşk û çêçik]**, (Alkan. A, r. 75)
- 28- Tişteki min heye, çav zero, simbêl belo, li ser dîwarê hembero. Ev çi ye? **[Kund]**, (Alkan. A, r. 77)
- 29- Tişteki min heye, dixwîne, ne mela ye, ne aşiq e ne jî gewende ye, dijminê qewmê xwe ye. Ev çi ye? **[Kew]**, (Alkan. A, r. 78)
- 30- Tişteki min heye, ew di hundurê malê de ye, mal di hundurê wî de ye. Ev çi ye? **[Hêk û mirîşk]**, (Alkan. A, r. 80)
- 31- Tişteki min heye, hem hema li ber çema. Ev çi ye? **[Bilaçemk, şevşevok]**, (Alkan. A, r. 82)
- 32- Tişteki min heye, hes hesincî, paşekî rabû donzde cindî. Ev çi ye? **[Mirîşk û çêçik]**, (Alkan. A, r. 83)
- 33- Tişteki min heye, li ser gelî li bin gelî, çav zîqo simbêl zero. Ev çi ye? **[Kund]**, (Alkan. A, r. 85)
- 34- Tişteki min heye, serî şeh, dawî das, ehmeqo de bêje. Ev çi ye? **[Dîk]**, (Alkan. A, r. 89)
- 35- Tişteki min heye, bang dike nimêj nake, jina tîne mahr nake. Ev çi ye? **[Dîk]**, (Alkan. A, r. 92)
- 36- Tişteki min heye, tim di nava avê de ye, lê şil nabe. Ev çi ye? **[Ordek]**, (Alkan. A, r. 94)
- 37- Tişteki min heye, tim dibê bûk lê ne zava ye. Ev çi ye? **[Kund]**, (Alkan. A, r. 96)
- 38- Tişteki min heye, zilamê li ser kokelê, rîh tune simbêl belê. Ev çi ye? **[Kund]**, (Alkan. A, r. 99)
- 39- Tişteki min heye, xatûna çilkezî, li pişt malê dibezi. Ev çi ye? **[Mirîşk]**, (Alkan. A, r. 106)
- 40- Li erdê weke gîsk e, li ezman weke nîsk e. **[Eylo]**, (Akbaş. E, r. 69)
- 41- Mamikê mino, hakimê li ber dîwara. Çi ye? **[Dîk]**, (Sadinî. M.X , r. 43)
- 42- Tişteki min heye, binî di dê de ye, serî di lawik de ye. Çi ye? **[Dîk]**, (Sadinî. M.X , r. 43)



- 43- Tişteke ji tiştan e, serve helan e, binve Quran e. Çi ye? [**Hacîreşk**], (Sadinî. M.X , r. 59)
- 44- Mamikê mino, ew dijminê xwe ye, xelk û alem jî dijminê wê ye. Çi ye? [**Kew**], (Sadinî. M.X , r. 79)
- 45- Mamikê mino, ji vir heta bilbil, hemî lawên çavkil. Çi ye? [**Kew**], (Sadinî. M.X, r. 79)
- 46- Mamikê mino, sermasî li kaş û kendala dibazî, dikir hewar û gazî. Çi ye? [**Kew**], (Sadinî. M.X , r. 79)
- 47- Mamikê mino, ji berfê spîtir e, ji xwîne sortir e, ji qîrê reştir e. Çi ye? [**Legleg**], (Sadinî. M.X , r. 90 )
- 48- Mamikê mino, rûto ji ûrto dibe, pûrto ji rûto dibe, Çi ye? [**Mirîşk û çêçik**], (Sadinî. M.X , r. 102)
- 49- Diçîze lê namîze, ew di malê de ye, mal di hundurê wê de ye. Çi ye? [**Mirîşk û çêçik**], (Sadinî. M.X , r. 102)
- 50- Mamikê min ê mamanî, sermişar e, pêxepar e, heçî nezane dewar e. Çi ye? [**Dîk**], (Sadinî. M.X , r. 120)
- 51- Mamikê mino, gulolka dezî, bi betenê ve bezî. Çi ye? [**Sîsik, sûsik**], (Sadinî. M.X , r. 124)
- 52- Mamikê mino, şimşimê kor e, bi şev derdikevît, şevê diçe jor e. Çi ye? [**Çeqçeqole**], (Sadinî. M.X , r. 153)
- 53- Tiştê mino tiştanî, berfa reş û spî nav êk da. Çi ye? [**Qaqîşk**], (Sadinî. M.X , r. 163)
- 54- Mamikê mino, ser derzî stûn mazî, ber çeman diket gazî. Çi ye? [**Kew**], (Sadinî. M.X , r. 198)
- 55- Mamikê mino, serî şeho, terî daso. Çi ye? [**Dîk**], (Sadinî. M.X , r. 217)
- 56- Bi roj raza ye, bi şev şiyar e. [**Şevşevok**], (Güneş. K, r. 33)
- 57- Dîzika daniya, li ser xaniya. [**Mirîşka kurk-qup**], (Güneş. K, r. 43)
- 58- Dixwîne ne mela ye, ne aşiq e ne xwenda ye, dijminê qewmê xwe ye? [**Kew**], (Güneş. K, r. 45)
- 59- Dixwîne fihêt/fedî nake, eşkere malê çê nake. [**Kew**], (Güneş. K, r. 45)
- 60- Guleka dezî, bi diyar ve bezî. [**Kewsûsik**], (Güneş. K, r. 65)
- 61- Kêw kir xurexur, rûyê xwe şa kir, rabî, erdîkî rakir. [**Mêhkew û kewikên wê**], (Güneş. K, r. 85)
- 62- Kidî kidî mistan e, çil dergûş li destan e, ne ber e ne bistan e. [**Mirîşk û çêlikên wê**], (Güneş. K, r. 88)

- 63- Ji sêlê reştir e, li berfê spîtir e, li êr/agir sortir e. [**Legleg**], (Güneş. K, r. 89)
- 64- Li hewa nîsk e, li erdê gîsk e. [**Quling**], (Güneş. K, r. 91)
- 65- Melayê li ser birînê, ji derd û kulan re dixwînê. [**Mêhkew-mêkew**], (Güneş. K, r. 94)
- 66- Mamkê mino, ker firî.<sup>208</sup> [**Kew difire**], (Güneş. K, r. 95)
- 67- Mamkê mino, Reşîne<sup>209</sup> difire. [**Reşîle**], (Güneş. K, r. 95)
- 68- Neynûkdar e, pê xepar e. [**Dîk**], (Güneş. K, r. 98)
- 69- Nexweş e dikevê xazê, biharan şêv ranazê. [**Kund**], (Güneş. K, r. 99)
- 70- Reş e ji teniyê reştir e, bilind e ji çiyayan bilindtir e. [**Qijik**], (Güneş. K, r. 108)
- 71- Rûyê bêmû melayê berî, kurê kîjan pêxemberî? [**Dîk**], (Güneş. K, r. 109)
- 72- Serê malê hêlan e, binê malê hêlan e, mal tune tê de malîvan e. [**Mirîşka navgundî**], (Güneş. K, r. 110)
- 73- Spî ye ji berfê spîtir e, reş e ji reşiyê reştir e. [**Keşkîlan-cûreyeke qijik**], (Güneş. K, r. 111)
- 74- Tişt in mişt in, sernivîşt in, baran barî xwe guviştin. [**Çûçik-çûk**], (Güneş. K, r. 126)
- 75- Tiştêkî min heye, bi ro digere bi şevî xwê qurin. [**Çûçik**], (Güneş. K, r. 128)
- 76- Xaltiya gulistan e, ne ber e ne bistan e, çil dergûş e, li ber destan e. [**Mirîşka kurk-qup**], (Güneş. K, r. 134)
- 77- Xwişka min a hulgistan, ne ber e û ne bostan. [**Mirîşk**], (Güneş. K, r. 135)
- 78- Bûka Eliyê Etmanê, heft dergûş li dastana, ne şîrê ne pizana. [**Kurk, mirîşk**], (Kan. Ş, r. 5)
- 79- Heyv hebe difirê, tav hebe direvê. [**Şevşevok, şevkor**], (Kan. Ş, r. 5)
- 80- Çûm dîwana mîr, min pirsîyar kir ji xelkê pîr, kê dîtiye teyr bi şîr. Ew çi ye? [**Şevşevok- şevgerok**], (Kan. Ş, r. 7)

## 2.7. Ajelên Av û Bejayî

Di bin vê sernavê de mifaya herî girîng ji bo zarokan, afirandina şemayeke nû ye. Yanî ajel hene hem di avê de hem jî li bejayê dijîn. Ajelên ku di bin vê sernavê de hatine vegotin, di vê kategoriyê de ajelên ku herî zêde nêzikî zarokan in. Mînak: “kêvjale, beq, req” di nav mamikên vê kategoriyê de ne.

- 1- Ser tenten e, bin tenten e, çar çeng û fil û ferten e. [**Kêvjale**], (Berwarî. M, r. 40)
- 2- Rimbêlî, dembêlî, seqlana sutî çêlî, dest û pê çembelî. [**Kêvjale**], (Berwarî. M, r. 40)

<sup>208</sup> Ev cureyê mamikan çewtîyeke mantiqî dipirse. Ji ber ku “ker” nikare bifire, peyva herî nêzî wê peyvê “kew” e û kew dikare bifire. Bnr. Güneş, *Mamikên Me*, r. 95.

<sup>209</sup> “Reşîne” navê gundekî Dihê ye, “reşîle” jî navê çûkekî ye. Lîstina bi tîpekê ev mamik derxistiye holê. Li mînaka berî vê binêrin. Bnr. Güneş, h.c.

- 3- Çûme êş, ecêbek hate pêş, bi çar<sup>210</sup> lîngan bû ji xeynî yê pêş. [**Kêvjale**], (Berwarî. M, r. 40)
- 4- Ser deqnenûs, bin deqnenûs, çar çeng û fîl û fengenûs. [**Kêvjale**], (Berwarî. M, r. 40)
- 5- Ser qulufetê, îr çûne, iyar heye, mû tune. [**Beq**], (Berwarî. M, r. 40)
- 6- Eyar heye mû tune, xwe digvêşe gû tune. [**Beq**], (Berwarî. M, r. 41)
- 7- Çerm e û çîqal e, mû pê ve ne, çar dest û pê ne, dûv lê ne. [**Beq**], (Berwarî. M, r. 41)
- 8- Tiştêkî min heye tiştanî, ji diya xwe dibe, panzde ro disekine, paşê dest û ling çê dibe. Ew çî ye? [**Beq**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 422)
- 9- Mamê min î mam belek, dest û tilî tir çêlek. [**Beq**], (Gazî. M, r. 23)
- 10- Mamikê min ê mamanî, ser qulîpançî zirçine, iyar hene mû tune. [**Beq**], (Gazî. M, r. 24)
- 11- Mamikê min ê mamanî, qilingo milingo, çar dest, du lingo. [**Kevjal**], (Gazî. M, r. 24)
- 12- Tiştêkî min heye, bi çar lînga ye lê nameşe, bi avjenê zane. Ev çî ye? [**Beq**], (Alkan. A, r. 99)
- 13- Mamikê mino, zir çî ne, kevil hene, mî tune. Çî ye? [**Beq**], (Sadinî. M.X , r. 23)
- 14- Mamikê mino, dest û pê çermanî, xwe hilavît çaçanî. Çî ye? [**Beq**], (Sadinî. M.X , r. 196)
- 15- Çû tirne eyar heye, çî pût/pirç tune. [**Beq**], (Güneş. K, r. 37)
- 16- Ez çûm êş e, kelaşek li êş e, heft lînga dide pêş e. [**Kêvjal**], (Güneş. K, r. 55)
- 17- Mamê te mam êlek, dest û tilî çerm êlek, daxdane q.zê çêlek. [**Beq**], (Güneş. K, r. 94)
- 18- Rastiyê/deştê de dikeve xazê, kaşa da dikeve radizê. [**Req-kûsiya avî**], (Güneş. K, r. 108)

## 2.8. Laş û Xwezaya Ajelan

Di bin vê sernavê de qala xisûsiyetên ajelan û danasîna laşê wan hatiye kirin. Zarok dê bi rêya van mamikan xwezaya ajelan binasin.

- 1- Çûme şikeftêkê ya tijî gupal, êkê wesa nebû bideme pal. [**Şaxên bizina**], (Berwarî. M, r. 42)
- 2- Çûme rêleka bidar bidar, qet darekê we nebû bikime distar. [**Şaxên bizina**], (Berwarî. M, r. 42)
- 3- Qûn li axê, ser li qûnê, deh li duwa. [**Mihdûşîn**], (Berwarî. M, r. 42)

---

<sup>210</sup> Dibe ku şeş rastir be.

- 4- Çûme duleka bi xireber, min dapîra te girt, bapîrê min xwe havête ser. [**Perîna nêrî**], (Berwarî. M, r. 42)
- 5- Çûme şikeftoka tijî pêlav, êka wesa nebû bikime pê xo. [**Simên bizina**], (Berwarî. M, r. 42)
- 6- Hêlîna leglegî, ne li berojî, ne li nizarî, hetav sipêdê didetê, ne êvarî. [**Dûngê pezê sipî/dûv**], (Berwarî. M, r. 43)
- 7- Derxûnê qunê, malê girarê. [**Dûngê pezê sipî/dûv**], (Berwarî. M, r. 43)
- 8- Distarokê bi kevlî ve. [**Dûngê pezê sipî/dûv**], (Berwarî. M, r. 43)
- 9- Texa çulî bi kevrî ve. [**Kurîya hespî/dûv**], (Berwarî. M, r. 68)
- 10- Çiwar çelê, guh belê, 12 gulê pîr xertelê. [**4 pê, guhên bel, 12 guhanêt biznekê**], (Berwarî. M, r. 83)
- 11- Çar diçeşîn, sê dileşîn, du dizeşîn, du direşîn. [**4 pê, 2 guh û kurî, 2 çav û 2 şaxêt biznê**], (Berwarî. M, r. 83)
- 12- 4 dizeşîn, 4 direşîn, 8 diçeşîn, 90 pê ve, 18 tê ve, ji vêrê û wê ve. [**4 çav, 4 şax, 8 pê, cutek ga**], (Berwarî. M, r. 83)
- 13- Bêrî 4 kiç hene, her kiçekê 6 kon hene, her konekê merrek heye. [**Kon û bizmarên nalên dewar**], (Berwarî. M, r. 83)
- 14- Bi hîmeta Birahîm Xelîl, çar derg in, 24 kilîl. [**Dewar, nal, bizmar**], (Berwarî. M, r. 84)
- 15- Çar çeş çeşîn dikin, du belbelîn dikin, hizar û yek bawewşîn dikin. [**Dewar+2guh+kurî**], (Berwarî. M, r. 84)
- 16- Kepir çerim, pêpelîsk asin. [**Zînê hesp û rikêb**], (Berwarî. M, r. 84)
- 17- Bizna bi sih û du şaxa. [**2 şaxên biznê û siha/sîber wê**], (Berwarî. M, r. 84)
- 18- Tiştêkî min heye tiştanok, destarok, hilpeserok. Ew çi ye? [**Dûvê pez**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 418)
- 19- Tiştêkî min heye, aş e maş e, çar feraş e, dudu pêş e, dudu paş e, Ew çi ye? [**Çêlek lingê wê**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 419)
- 20- Tişt heye dar e ne dar e, belçikê darê çil hezar e, gotin heye bê jimar e. Ew çi ye? [**Dêlbêjiyê hespê**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 419)
- 21- Çar çarix, bîstçar bençarix. Ew çi ye? [**Sol, bizmarê hespa**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 419)
- 22- Kite çarix, şeş bençarix, ew çi ye? [**Nelê hespa**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 419)
- 23- Çara tepe tepe, dudu bele bele, heft hezara hevgele. Ew çi ye? [**Ling, guh û dêlbijiyê hespê**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 420)

- 24- Çarê çemrê çêlekê, heştê dêla zopekê, didoyê bela vîtekê. [**Guhan**], (Gazî. M, r. 14)
- 25- Çar birayên min hene, her carê du heb xwe davêjin golê. [**Guhan**], (Gazî. M, r. 14)
- 26- Derim nav dehlê bavê xwe, rastî şiva rast nayêm. [**Qiloçê bizinê**], (Gazî. M, r. 16)
- 27- Mamikê min ê mamanî, şeql dîwarî. [**Çimle**], (Gazî. M, r. 24)
- 28- Ne li erd e ne li esman e, hêlîna beg rewan e. [**Zîn**], (Gazî. M, r. 26)
- 29- Reşkê galgalî [**Rêxa çêleka**], (Gazî. M, r. 27)
- 30- Tep tepo qurmîçanik. [**Rêx**], (Gazî. M, r. 31)
- 31- Tirtimo, dîwar simo. [**Rêx**], (Gazî. M, r. 31)
- 32- Tişkî min heye di rê da dere xerciya dike. [**Bizin û bişkul**], (Gazî. M, r. 32)
- 33- Tişkî min heye tiştanî, li ber kevirê xiştanî, ne pê û ne panî. [**Hêka kûsiya**], (Gazî. M, r. 33)
- 34- Tişteki min heye, hin ji hesin, hin ji bizin, du heb ji wan gayê mezin, tev bi hev re dibezin. Ev çi ye? [**Ga û cotkarî**], (Alkan. A, r. 83)
- 35- Tişteki min heye, sitara qûnê dermanê girarê, Ev çi ye? [**Dûv**], (Alkan. A, r. 88)
- 36- Zûha dixime, şil derdixime? [**Gema devê hespa**], (Güneş. K, r. 137)
- 36- Tişteki min heye, jinekî xorisan, çil dergûş li destan, ne bax e ne bostan. Ev çi ye? [**Mirîşk û kurk**], (Alkan. A, r. 103)
- 37- Tişteki min heye, diçize lê namîze, ew di malê de ye, mal di hundurê wê de ye. Ev çi ye? [**Mirîşk û hêk**], (Alkan. A, r. 105)
- 38- Ser can e û bin can e, lê çermekî wek heban e. [**Zînê hesp**], (Akbaş. E, r. 67)
- 39- Çûme doleka bi xireber, min dapîra te girt, bapîrê min xwe avêt ser, Çi ye? [**Nêri-bizin**], (Sadinî. M.X , r. 129)
- 40- Mamikê min o, çûm şêftêkê, tijî gopal in, yekî wisa nebû, bi dest xwe bigirim. [**Qiloçên bizin û nêriyan**], (Sadinî. M.X , r. 129)
- 41- Mamikê mino, du yêd çeçê, çar yêd maçeçê, heşt di fitefelekê. Çi ye? [**Guhanê bizin, çêl û dêlan**], (Sadinî. M.X , r. 152)
- 42- Hêlîna şimşetorê, car li beroj e, car li nizar e. Çi ye? [**Dûngê beranî**], (Sadinî. M.X , r. 156)
- 43- Mamikê mino, çar di çikê, du di maçikê, heşt di çipetirê. Çi ye? [**Guhanê çêl, bizin û dêl**], (Sadinî. M.X , r. 158)
- 44- Mamikê mino, aş e aşê çend xeraş e, du li paş du li pêş e. Çi ye? [**Guhan**], (Sadinî. M.X , r. 174)
- 45- Mamikê mino, goşt heram e, şîr helal. Çi ye? [**Mêş û hingivîn**], (Sadinî. M.X , r. 178)

- 46- Mamikê mino, deh li dûyan, ser li qûnê, qûn li erdê. Çi ye? [**Çêl dotî**], (Sadinî. M.X , r. 190)
- 47- Min tiştê heye tişt e, ne ber e ne pişt e, jina Emoyê gişt e. Çi ye? [**Hêk û mirîşk**], (Sadinî. M.X , r. 201)
- 48- Mamikê mino, şeş çav in, sê ser in, du panî. Çi ye? [**Kew, mar, masî**], (Sadinî. M.X , r. 207)
- 49- Aş aş, çil feraş, dido li pêş, dido li paş. [**Guhanê çêlekê**], (Berwarî. M, r. 26)
- 50- Tiştêkî min heye, bi dehan terim dudiya. [**Dûtina bizinê**], (Güneş. K, r. 31)
- 51- Çem çeq e, hezar weşî. [**Dûvê hesp**], (Güneş. K, r. 37)
- 52- Dara ji nav daran, jê tê dengê birîndaran. [**Gubika mêşên hingivî**], (Güneş. K, r. 42)
- 53- Didoyê nêkê, çarê çêkê, heştê zeynetirekê, kîjanî ji xwe re hiltînî? [**Gihanê pez, çêlek û dêlikê**], (Güneş. K, r. 42)
- 54- Du bira bi hev re, tîr diavêne avê. [**Guhanê pez**], (Güneş. K, r. 43)
- 55- Diçim nava dehlê, tev xwar/xwehr in. [**Qiloçê Bizinê**], (Güneş. K, r. 46)
- 56- Dido li pêşiyê, dido li paşiyê, bê ling e, dertê dikeve hewşê. [**Guhanê çêlekan**], (Güneş. K, r. 48)
- 57- Ez dinêrim amê te, nayê dengê mamê te. [**Dikê serjêkirî**], (Güneş. K, r. 56)
- 58- Gurza dara, li wan nizara? [**Dûvê mehînê**], (Güneş. K, r. 63)
- 59- Heftê heştê gêzekê, çarê çermê çêlekê, dido belê kutekê. [**Çiçik-guhan**], (Güneş. K, r. 67)
- 60- Hîva li kadînê. [**Çavê ga**], (Güneş. K, r. 70)
- 61- Mamgê mino mamanî, hêlik reş û mêrganî. [**K...kerê**], (Güneş. K, r. 72)
- 62- Qapaxa qûnê, tama şivê? [**Dûyê miyê-dûvê mihê**], (Güneş. K, r. 105)
- 63- Qol tebance, li nava baxçe. [**Sileka sergîn**], (Güneş. K, r. 106)
- 64- Refan danî ser bendera, ez dîtîm çûn sefera. [**Refê kevokan**], (Güneş. K, r. 108)
- 65- Reş e, qul e, teng e. [**Tenga hespa**], (Güneş. K, r. 108)
- 66- Ser can e û bin can e, lê çermekî wek heban e. [**Zînê hespan**], (Güneş. K, r. 116)
- 67- Şiva hişk li guhişk. [**Stre-stûr-qiloç**], (Güneş. K, r. 120)
- 68- Tenûrek him himê, tijî nanê genimê. [**Gurbika mêşa hingivî**], (Güneş. K, r. 122)
- 69- Xwehr û xwehr, rast û şikestî. [**Stûhr-qiloç**], (Güneş. K, r. 133)
- 70- Mamigê mino mamanî, fena ser fenê, derxûna ser devê denê. [**Dûvê miyan**], (Eren. M, r. 8)

71- Mamigê mino mamanî, sed avê vedixwin, du sed seyrê dikan. [**Şaxê ajelan**], (Eren. M, r. 10)

## 2.9. Ajelên ji bo Siwarbûn û Barkêşanê

Ajelên di vê beşê de zêde ne dûrî jiyana zarokan in. Bikaranîna van ajelan di nav civakê de, ji bo zarokan mînak in ku ev ajel bi kêrî çî tèn. Bi van mamikan zarok dê hin taybetiyên girîng ên van ajelan fêr bibin. Di vê beşê de mamikên li ser ajelên wek “hêstir, hesp, ker, mahîn, dewar” hatine senifandin.

1- Rezê bê ber. [**Hêstir**], (Berwarî. M, r. 42)

2- Dê bi hîr hîr, bav bi zirr zirr, kero bê qantir. [**Hêstir**], (Berwarî. M, r. 42)

3- Çar çeq in çeqîn diken, du belbelîn diken, hizar û yek bawêşin diken. [**Dewar: hesp, mahîn, ker**], (Berwarî. M, r. 43)

4- Hêstira qero li bêndero, ne gur dixwe ne diz dibe. Ew çî ye? [**Qantir**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 420)

5- Hilindir milindir, kur ji bavê bilindtir. [**Hêstir**], (Gazî. M, r. 20)

6- Mamikê mino, her dem zir e, ji babê xwe mezintir e. Çî ye? [**Hêstir**], (Sadinî. M.X , r. 63)

7- Mamikê mino, landarek ya li hewa, biçûkek yê di xewa. Çî ye? [**Mahîn**], (Sadinî. M.X , r. 92)

8- Tiştê mino tiştanî, du tirninî çar şeqşeq e, kişkiş baq e. Çî ye? [**Ker**], (Sadinî. M.X , r. 166)

9- Tişteki min heye, erdê bêhn dike, zîtirkan didê. [**Ker**], (Kan. Ş, r. 4)

10- Mamigê mino mamanî, çarsim axa diçe nav taxa. [**Ker**], (Eren. M, r. 8)

## 2.10. Ajelên Kovî

Di alema zarokan de ajelên kovî li gor ajelên din zêdetir fantastîk in. Çimkî ajelên kovî dûrî zarokan in û zarokan navê wan ajelan gelek caran di çîrokan de bihîstine. Ji ber ku bi wan re têkiliyek wan çê nebûye, zêdetir meraq kirine. Bi rêya van mamikan zarok dê ajelên wek “gur, hirç, rûvî, pezkûvî” binasin.

1- Gur e, mirov dikare bigire. [**Gur/gurg**], (Berwarî. M, r. 43)

2- Li berojî ji tirs dimirin, li nizarî ji birsa dimirin. [**Hirç**], (Berwarî. M, r. 43)

3- Hevrist e, tat e rist e, xoş fêhrist e. [**Hirç**], (Berwarî. M, r. 43)

4- Tişteki min heye, gotiye şeveke reş û pezeke reş û şoveke reş ji min re wek hev e, karim wan ji hevdû kifş bikim. Ev çî ye? [**Gur**], (Alkan. A, r. 96)

5- Dere qula xwe ne mar e, bi pûrt e ne kar e. [**Rûvî**], (Güneş. K, r. 51)

6- Hem gelgel e, hem helhel e hem jî qewet e, nawergere. [**Hirç**], (Güneş. K, r. 66)

7- Serbest digerê, dara vê yê pê ve herê. [**Pezkûvî**], (Güneş. K, r. 110)

### 3. Mamikên li Ser Fêkiyan

Fêkî di nav xwarinên zarokan de cihekî sereke digirin. Mifayên wan gelek caran bi awayên cuda ji zarokan re tên vegotin. Fêkiyên ku herî zêde li Kurdistanê digihêjin di vê beşê de cih digirin. Li her deverê hemû fêkî şîn nabin. Ji ber wê jî hin zarok hemû fêkiyan tam nas nakin. Zarok dê di vê beşê de fêkiyên wek “hinar, zebeş, hêjîr, gûza hindê, hirmî, zerdele, guhîj, gindor, helhelok, şemamok, xurme, tirî, pirteqal, sêv, petêx” nas bikin.

1- Dîzka danqut, ji serê gelî çû binê gelî, dindikek jê nerîşt. [**Hinar**], (Berwarî. M, r. 51)

2- Simê gay, tijî birincê qutay. [**Hinar**], (Berwarî. M, r. 51)

3- Sivorê tiktikî, 107 têşkên di zikî. [**Hinar**], (Berwarî. M, r. 51)

4- Kumê sorik, tijî morik. [**Hinar**], (Berwarî. M, r. 51)

5- Hizar mirovêt di bin lihêfkekê ve. [**Hinar**], (Berwarî. M, r. 51)

6- Himbanok e, pirr danok e. [**Hinar**], (Berwarî. M, r. 51)

7- Simê gê/gay, tije xwê. [**Hinar**], (Berwarî. M, r. 51)

8- Sêniya savarê, li quliya darê. [**Hinar**], (Berwarî. M, r. 51)

9- Sed mal sikakî, ser simê gakî. [**Hinar**], (Berwarî. M, r. 51)

10- Zerikek/tasek tijî morik e, çî qas tol/dol bike, narije. [**Hinar**], (Berwarî. M, r. 51)

11- Min li dikanê kirî hebek, anî malê bû hezar heb. [**Hinar**], (Berwarî. M, r. 51)

12- Qazana îpraxa berda ji banî, kit neket ber derê xanî. [**Hinar**], (Berwarî. M, r. 51)

13- Sivorê sik sikî, yê li ser darê pindikî, 1001 di zikî. [**Hinar**], (Berwarî. M, r. 51)

14- Kevzê mevzê, av tê dizê. [**Şitî/zebeş**], (Berwarî. M, r. 51)

15- Behra şîn e, masî reş in. [**Şitî/zebeş**], (Berwarî. M, r. 51)

16- Ji ser ve şîn e, ji nav de sur e. [**Şitî/zebeş**], (Berwarî. M, r. 51)

17- Hespê çê, zingîr li pê. [**Şitî/zebeş**], (Berwarî. M, r. 51)

18- Gayê beş, dindik reş, tam xweş, tê hûrkinin beş beş. [**Şitî/zebeş**], (Berwarî. M, r. 51)

19- Bajêrê şîn e, mirovêt wî di reş in, dîwarêt wî di sur in, kilîka wî jî asin e. [**Şitî/zebeş**], (Berwarî. M, r. 51)

20- Çûme çolê çolbeyarekî, heft dûv li pey beranekî. [**Şitî/zebeş**], (Berwarî. M, r. 51)

21- Terr e wek xiyar, sor e wek hinar, şîn e/kesk e wek çinar. [**Şitî/zebeş**], (Berwarî. M, r. 51)



- 22- Kumê hûtik, tije nûtik. [**Hijîr**], (Berwarî. M, r. 52)
- 23- Kumê hezî tije derzî. [**Hijîr**], (Berwarî. M, r. 52)
- 24- Impîlê darîn e, ewil tal e, paşê şîrîn e. [**Hirmî**], (Berwarî. M, r. 53)
- 25- Şîrî didet bê guhan. [**Gûza hindê**], (Berwarî. M, r. 54)
- 26- Tişteke min tiştan e, şîrî didet bê guhan e. [**Gûza hindê**], (Berwarî. M, r. 54)
- 27- Tişteke min heye, him çêlek avis e, him golka zikê wî da avis e. Ew çi ye? [**Zeredele, dendikê wê**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 417)
- 28- Ew çi ye? Ga avê dixwe kap diwerime. [**Qeysî**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 417)
- 29- Çûme qesreke bêderî, tê da rûniştiye xezaleke bêmerî, kê tê derxe ew merî, kê tê dernexe ew kerî. Ew çi ye? [**Hinar**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 417)
- 30- Tişteke min heye, dîzek tije denû ye, divim serê çiyakê, gilor dikim livek lê narije. Ew çi ye? [**Hinar**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 417)
- 31- Bera şîn, kewza sor, kilît hesin. Ew çi ye? [**Zeveş û kêr**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 417)
- 32- Tişteke min heye tiştanok, ez avê didime golikê, golik avê naxwe, kap avê dixwe. Ew çi ye? [**Zeveş**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 418)
- 33- Beden kesk, dikan reş, bajar sor. [**Zebeş**], (Gazî. M, r. 13)
- 34- Çiring çiring çarxane, kûpikê bizir barxane. [**Hêjîr**], (Gazî. M, r. 14)
- 35- Dîzika devgirtî, nexweşa li ber ta girtî. [**Hinar**], (Gazî. M, r. 17)
- 36- Mamkê mino sûr hişin e, bajar sor e, mifte hasin e. [**Zebeş**], (Gazî. M, r. 25)
- 37- Sêniya savarê, va l'serê darê. [**Hinar**], (Gazî. M, r. 28)
- 38- Sima hêstirê, sed û sî mal tê da distirê. [**Hinar**], (Gazî. M, r. 29)
- 39- Simika hêstirê, sî û sê mal tê da distirê. [**Hinar**], (Gazî. M, r. 29)
- 40- Tendûra risrisî, tije nanê garisî. [**Hêjîr**], (Gazî. M, r. 31)
- 41- Tişteke min heye, dara hişk, li guhişk. Ev çi ye? [**Guhîj**], (Alkan. A, r. 79)
- 42- Tişteke min heye, hespê çê, zincîr li pê. Ev çi ye? [**Zebeş**], (Alkan. A, r. 82)
- 43- Tişteke min heye, hespê çê, tev qeyd û zincîra xwe tere şer. Ev çi ye? [**Zebeş**], (Alkan. A, r. 82)
- 44- Tişteke min heye, kumkê sorik tije morik. Ev çi ye? [**Hejîr**], (Alkan. A, r. 84)
- 45- Tişteke min heye, kûpikê hûtik, tije nûtik. Ev çi ye? [**Hejîr**], (Alkan. A, r. 84)
- 46- Tişteke min heye, kero hefsar zero, bi dû min re wero. Ev çi ye? [**Gindor**], (Alkan. A, r. 84)
- 47- Tişteke min heye, lib lib kir, li ber min kir. Ev çi ye? [**Hinar**], (Alkan. A, r. 85)
- 48- Tişteke min heye, li sûkê yek e, li malê sed e. Ev çi ye? [**Hinar**], (Alkan. A, r. 86)

- 49- Tişteki min heye, semûno du qûno. Ev çi ye? [**Gindor**], (Alkan. A, r. 89)
- 50- Tişteki min heye, girover e bi bêhn e, du xet lê ne, yek jê sor e yek zer e. Ev çi ye? [**Şemamok**], (Alkan. A, r. 95)
- 51- Tişteki min heye, kupikê mircan tijî ye, taliqandî ye. Ev çi ye? [**Hinar**], (Alkan. A, r. 101)
- 52- Tişteki min heye, qesra şîn bê derî ye, lê mifta wê hesin e. Ev çi ye? [**Zebeş**], (Alkan. A, r. 101)
- 53- Tişteki min heye, guloka mircana datînin ber mêvana. Ev çi ye? [**Hinar**], (Alkan. A, r. 102)
- 54- Tişteki min heye, girovero bi giranî, rûniştî li ser xanî. Ev çi ye? [**Gindor**], (Alkan. A, r. 102)
- 55- Tişteki min heye, sênîya savarê, li ser gulyê darê dimîne heta buharê. Ev çi ye? [**Hinar**], (Alkan. A, r. 105)
- 56- Mamikê mino, dara li nav daran, zer diket wek guharan. Çi ye? [**Guhîj**], (Sadinî. M.X , r. 55)
- 57- Mamikê mino mamanî, hefsed û yek mirov, di bin beteniyekê da razane. Çi ye? [**Hejîr**], (Sadinî. M.X , r. 59)
- 58- Mamê mino, kê dîtiye goştê bigaris. Çi ye? [**Hejîr**], (Sadinî. M.X , r. 59)
- 59- Mamikê mino, meşka sengîn, tijî tê da garis û hinguvîn. Çi ye? [**Hejîr**], (Sadinî. M.X , r. 60)
- 60- Kerê etaran, xwe sor kir, ji bendik û guharan. Çi ye? [**Helhelok**], (Sadinî. M.X , r. 62)
- 61- Mamikê mino, gireka bizmaran, wa li pişt malan, ji bo car û baran. Çi ye? [**Hinar**], (Sadinî. M.X , r. 65)
- 62- Mamikê mino, siworê ziqziqî, sed û bîst û pênc, têtjikên di zikî. Çi ye? [**Hinar**], (Sadinî. M.X , r. 65)
- 63- Mamikê mino, min kirrî yek, li mal bû sed û yek. Çi ye? [**Hinar**], (Sadinî. M.X , r. 68)
- 64- Mamikê min e, mirî dar e, tabût goşt e, Çi ye? [**Xurme**], (Sadinî. M.X , r. 144)
- 65- Mamikê mino, çûm goveke bêder, tijî tê da mihên qer. Çi ye? [**Zebeş**], (Sadinî. M.X , r. 146)
- 66- Mamikê min e, behra sor e, masî di reş. Çi ye? [**Zebeş**], (Sadinî. M.X , r. 146)
- 67- Mamikê mino, pîra te ya mirî, ya di mêzerê werkirî, di kendal sorî rakirî. Çi ye? [**Zebeş**], (Sadinî. M.X , r. 147)

- 68- Tiştikê min e, li dinê sor in, mirovên wê di reş in, bi kulîlkan ve dibin. Çi ye? **[Zebeş]**, (Sadinî. M.X , r. 147)
- 69- Mamikê min e, hespê çê ye, tev qeyd û zincîr e, diçe ser e. Çi ye? **[Zebeş]**, (Sadinî. M.X , r. 147)
- 70- Mamikê mino, kaniya kezê, mîr merezê, av tê nezê. Çi ye? **[Zebeş]**, (Sadinî. M.X , r. 152)
- 71- Tiştê min tiştan e, kaska savarê, ser çiqê darê. Çi ye? **[Hinar]**, (Sadinî. M.X , r. 162)
- 72- Mamikê mino, dîzika tijî îprax, serê kendalî çû binî, dinkek tenê jê nerîştî. Çi ye? **[Hinar]**, (Sadinî. M.X , r. 166)
- 73- Tiştê mino tiştanî, fîstankesk, kirassor e, bijkojreş e. Çi ye? **[Zebeş]**, (Sadinî. M.X , r. 169)
- 74- Tiştê mino tiştanî, gilo/guhê mişk e tijî rişk e. Çi ye? **[Hejîr]**, (Sadinî. M.X , r. 170)
- 75- Mamikê mino, bazinê xezalan, çû binê newalan. Çi ye? **[Zebeş]**, (Sadinî. M.X , r. 190)
- 76- Mamikê mino, reş e şîrîn, em pê ve mirîn, neşên te hilgirîn. Çi ye? **[Tirî]**, (Sadinî. M.X , r. 210)
- 77- Mamikê mino, ji caran carek e, ji yekê derket hezarek e. Çi ye? **[Hinar]**, (Sadinî. M.X , r. 216)
- 78- Bûkek me heye, xiftanê wê kesk e, fîstanê wê sor e, bişkovên wê reş e. **[Zebeş]**, (Güneş. K, r. 29)
- 79- Binî ax e, dorê ax e, birayê mîr e, dorê stirî û şax e. **[Hêjîr û sîsikên di nav de]**, (Güneş. K, r. 32)
- 80- Bi behr e, du xet lê hene, yek jê sor e, yek jê zer e. **[Şemamok]**, (Güneş. K, r. 32)
- 81- Çil heb hûrî, di binê mezalkî de. **[Hinar]**, (Güneş. K, r. 39)
- 82- Çûm odekî çil tax, çil miştax, çil ortax. **[Hinar]**, (Güneş. K, r. 41)
- 83- Çentê mistî, hilawistî. **[Ûşûyê- weşî- tirî]**, (Güneş. K, r. 40)
- 84- Feqê me xwe boyax dide, gava vedibe spî dibe. **[Pirteqal]**, (Güneş. K, r. 60)
- 85- Girêka bizmaran e, li piştî malan e, ji bo car û baran e. **[Hinar]**, (Güneş. K, r. 65)
- 86- Hem ew avis e, hem jî cahniyê di zikê wê de avis e. **[Qeysî-mişmişk]**, (Güneş. K, r. 66)
- 87- Hespê şê, zincîr li pê. **[Zebeş]**, (Güneş. K, r. 71)
- 88- Hesperke çê ye, qeyd û zincîr li pê ye, hin jî şervanekî çê ye. **[Zebeş]**, (Güneş. K, r. 71)
- 89- Hindik hindik, dihdika hezar dendik. **[Hinar]**, (Güneş. K, r. 76)

- 90- Ji devê bilindtir e, xwarina wê ji hingivî xweştir e, şîrê wê ji jehrê nexweştir e, tovê wê ji kuncî hûrtir e. [**Hêjîr**], (Güneş. K, r. 78)
- 91- Ji gayî girtir e, ji garisî hûrtir e. [**Hêjîr**], (Güneş. K, r. 78)
- 92- Ji dûr ve wek dar e, ji nêz ve wek hungiv e. [**Hirmê**], (Güneş. K, r. 82)
- 93- Kap avê vedixwe, golik diwerime. [**Zebeş**], (Güneş. K, r. 87)
- 94- Laliya savarê, ser çiqilê darê. [**Hejîr**], (Güneş. K, r. 88)
- 95- Li sûkê yek e, li malê gelek e. [**Hinar**], (Güneş. K, r. 93)
- 96- Ne bi ber ve ye, ne bi pişt ve ye. [**Zebeş**], (Güneş. K, r. 100)
- 97- Oda Haris, tejî garis. [**Hinar**], (Güneş. K, r. 101)
- 98- Qesrika şîn î bê derî, lê mifta wê jî hêsînî. [**Zebeş**], (Güneş. K, r. 106)
- 99- Qesrek bêderî, tê de rûniştine hezar zerî. [**Hinar**], (Güneş. K, r. 107)
- 100- Sênîka savarê ser guhê darê. [**Hinar**], (Güneş. K, r. 111)
- 101- Sima hêstirê, sî û sê siwar tê de disitirê. [**Hinar**], (Güneş. K, r. 114)
- 102- Tasika min a cim cimî, tijî ardê genimî. [**Hejîr**], (Güneş. K, r. 127)
- 103- Wey sihika nava rê be, gava wext bê çê dibe. [**Sêv**], (Güneş. K, r. 132)
- 104- Xangaka min heye, serî xwe tije rişk. [**Ecir-hêjîr**], (Güneş. K, r. 135)
- 105- Ji kunciyê hûrtir, ji hêştir bilindtir, hinguv şîrîntir. Çi ye? [**Hejîr**], (Kan. Ş, r. 17)
- 106- Kaniya kevgê, xwîna pezê, pez tê dizê. Ew çi ye? [**Zebeş**]<sup>211</sup>
- 107- Hespê ger, berx li ber. Ew çi ye? [**Petêx**], (Baskın. M.Ş, r. 18)
- 108- Mamigê mino mamani, me bînderî ka hilani, liva ji kayê zîdetir ani. [**Hinar**], (Eren. M, r. 15)

#### 4. Mamikên li Ser Sebzeyan

Zarok tiştê ku dixwin, dixwazin binasin jî. Ji bilî nasîne navên sebzeyan ên ku ji ber devokan diguherin, zarok dê bi rêya mamikan fêrî wan bibin. Sebzeyên ku di nav van mamikan de tînan nasandin pîranî sebzeyên ku li derdorên zarokên kurd, şînan dibin. Bi vî şiklî zarok dê bi awayekî berfireh fêrî xisûsiyetên sebzeyên wek “kulind, pîvaz, bacansur, kelem, xiyar, bacanreş, gizer, bîber, îsot, kartol, pîvazterk, tivir” bibin.

- 1- Yê girêday qelew dibit, yê vekirî zeîf dibit. [**Kulind**], (Berwarî. M, r. 52)
- 2- Qesra xodê danî, benîya der lê vekirî. [**Kulind**], (Berwarî. M, r. 52)
- 3- Hespê sipî ye, bijî şînan. [**Pîvaz**], (Berwarî. M, r. 52)
- 4- Gayê dilo, heftê cilo. [**Pîvaz**], (Berwarî. M, r. 52)
- 5- Ho kilo, heft qat cilo. [**Pîvaz**], (Berwarî. M, r. 52)

<sup>211</sup> Mehmet Şirin Baskın, *Pênas, Taybetî û Senifandina Mamikên Kurdî [Kurmançî]*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mardîn, 2013, r. 18.

- 6- Ser seyd e, şaşik şîn. [**Pîvaz**], (Berwarî. M, r. 52)
- 7- Li bin erdî pata dikit. [**Pîvaz**], (Berwarî. M, r. 52)
- 8- Goka min a sor, tê de hene heft çermên spî bi dor. [**Pîvaz**], (Berwarî. M, r. 52)
- 9- Gayên min ên sor hene, heft çermên wan hene, tu dizanî ew çi ne? [**Pîvaz**], (Berwarî. M, r. 52)
- 10- Ji ser ve surî, ji bin ve xumarî. [**Bacansur**], (Berwarî. M, r. 55)
- 11- Ji ser ve reş, ji bin ve sipî. [**Bacanreş**], (Berwarî. M, r. 55)
- 12- Kumê dirêj, tije qirêj. [**Bacanreş**], (Berwarî. M, r. 55)
- 13- Kiça mela, bi hizar kirasa. [**Kelemî**], (Berwarî. M, r. 55)
- 14- Bavê wî yê şeş mehî, kurê wî diçe bazarê. Ew çi ye? [**Xîyar**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 416)
- 15- Heft ga kapkî ve. [**Kundir**], (Gazî. M, r. 19)
- 16- Tiştêkî min heye, gayê zexel, li pêşiya mala mexel. Ev çi ye? [**Kundir**], (Alkan. A, r. 81)
- 17- Tiştêkî min heye, gut reşo, xeftan şîno. Ev çi ye? [**Bacanê reş**], (Alkan. A, r. 81)
- 18- Tiştêkî min heye, gilovero, heft eyarê zer li sero. Ev çi ye? [**Pîvaz**], (Alkan. A, r. 81)
- 19- Tiştêkî min heye, heft tas di hundirê tasekê de. Ev çi ye? [**Pîvaz**], (Alkan. A, r. 82)
- 20- Tiştêkî min heye, sibehê bixwe, nîvro bide hevalê xwe, êvarê bide neyarê xwe. Ev çi ye? [**Pîvaz**], (Alkan. A, r. 90)
- 21- Tiştêkî min heye, serî wek minare ye, li ser serî di ardê de ye. Ev çi ye? [**Gizer**], (Alkan. A, r. 99)
- 22- Mamikê mino, leşê wî reş e, serê wî kesk e, dilê wî spî ye. Çi ye? [**Bacanê reş**], (Sadinî. M.X , r. 19)
- 23- Mamikê mino, ser şehîd e, bin mela. Çi ye? [**Bacanê reş**], (Sadinî. M.X , r. 20)
- 24- Tiştikê mino, her ji vir heta berê bihar, hemî lawkên difinxwar. Çi ye? [**Bîber, îsot**], (Sadinî. M.X , r. 25)
- 25- Mamikê mino, şînahiya wê nayê xwarin, koka wê tê xwarin. Çi ye? [**Kartol, patat**], (Sadinî. M.X , r. 73)
- 26- Mamikê mino, keça hakimane, sed kirasên li ber e. Çi ye? [**Kelem**], (Sadinî. M.X , r. 75)
- 27- Tiştê min tişt e, qesra Xwedê çê kiriye, beyna kun tê vekiriye. Çi ye? [**Kundir**], (Sadinî. M.X , r. 85)
- 28- Mamikê mino, gilvilkî av didin, golik mezin dibin. Çi ye? [**Kundir**], (Sadinî. M.X , r. 86)

- 29- Tiştikê min ji tiştan e, bab yê rûniştî ye dîwan e, Çi ye? [**Kundir**], (Sadinî. M.X , r. 86)
- 30- Tiştikî min e ji tiştan e, çêl li vir dizê, golik li wir xwe hildavêje. Çi ye? [**Kundir**], (Sadinî. M.X , r. 86)
- 31- Mamikê min e, ser seyîd e, nîv mela ye, bin sofî ye. Çi ye? [**Pîvaz**], (Sadinî. M.X , r. 114)
- 32- Tiştikê mino tişteke e, mirov ser jê dike, pê ra digirî. Çi ye? [**Pîvaz**], (Sadinî. M.X , r. 115)
- 33- Mamikê min e, yê mirî ye, mirovan bi girî berdide. Çi ye? [**Pîvaz**], (Sadinî. M.X , r. 115)
- 34- Mamikê min e mehîna spî ye, rişiyên wê şîn in. Çi ye? [**Pîvazterk**], (Sadinî. M.X , r. 115)
- 35- Mamikê mino, gayê nivistî, pêbenê ve veristî. Çi ye? [**Kulind**], (Sadinî. M.X , r. 154)
- 36- Mamikê mino, ez çûme serê milekê, min berê xwe da helanekê, hemî dûngên beranekê. Çi ye? [**Kulind**], (Sadinî. M.X , r. 160)
- 37- Mamikê mino, garanek hate ber me, Xwedê pê dizanît, mûçkê biçûk heft çerm e. Çi ye? [**Pîvaz**], (Sadinî. M.X , r. 169)
- 38- Mamikê mino, garanek hat helme helme, golikê dumahiyê heft çerm e. Çi ye? [**Pîvaz**], (Sadinî. M.X , r. 212)
- 39- Mamikê mino, gurover e ne gok e, sor e ne sêv e, nava wê spî ye ne penîr e, teriya wî heye ne mişk e. Çi ye? [**Tivir**], (Sadinî. M.X , r. 215)
- 40- Bizir tenê yek, jê sadir bû keriyek. [**Kartol**], (Güneş. K, r. 32)
- 41- Bi kabê xwe avê vedixwe. [**Kundir**], (Güneş. K, r. 32)
- 42- Bav reş mehî, law diçe bazarê. [**Xiyar**], (Güneş. K, r. 34)
- 43- Çil çîk in, çil berçîk in, çil ode ne, çil kilîle ne. Çi ye? [**Pîvaz**], (Güneş. K, r. 39)
- 44- Deve merixî, zincîr li dorê çerixî. [**Deve: kundir, Zincîr: lem**], (Güneş. K, r. 45)
- 45- Ez çûm nêv garankê, çêleka kiçik heft çerm e. [**Pîvaz**], (Güneş. K, r. 55)
- 46- Mamikê mino mamanî, ez li hire deynime, ew li wê dera he hişîn dibe. [**Xiyar**], (Güneş. K, r. 57)
- 47- Gulover e ne gok e, serî sor e ne sêv e, hundirê wê spî ye ne penêr e, teriya wî heye ne mişk e. [**Tivir**], (Güneş. K, r. 64)
- 48- Heft qet e, heft boqat e, heft ode ye, heft mizgeft e. [**Kelem**], (Güneş. K, r. 70)
- 49- Minara sor e di bin erdê de çî ye? [**Gêzir-gizêr**], (Güneş. K, r. 94)

- 50- Mamkê minê mamanî, çêlekoka zerik ji xwe re digere. Çi ye? [**Kulind-kundir**], (Güneş. K, r. 97)
- 51- Mehîneka sipî, reşikên wê şîn. [**Pîvaza ter**], (Güneş. K, r. 98)
- 52- Orte/nav esmer e, dorê kevirê mermer e, ava cihokê diçe ser e. [**Kelem**], (Güneş. K, r. 101)
- 53- Qesra Xwedê çêkirî, bayê qul tê vekirî. [**Pîvaz**], (Güneş. K, r. 106)
- 54- Sing li wir dikutim, golik li wer çê dibe. [**Kundir**], (Kan. Ş, r. 18)
- 55- Mamigê mino mamanî, çêlegoga zarik ji xwe re digere. [**Kundir**], (Eren. M, r. 16)
- 56- Mamigê mino mamanî, ji hire heta Manîsa bî virvira telîsa. [**Pîvaz**], (Eren. M, r. 16)

### 5. Mamikên li Ser Qût û Nebatan

Di vê beşê de gelek qût û nebat hene ku dûrî alema zarokan in an jî zarok piştî temenekî şûnde fêrî wan dibin. Ji ber xwezaya Kurdistanê lîteratura navên qût û nebatan di mamikên kurdî de pir dewlemend e. Fêrbûna van navan dê xurcika peyvvan a zarokan gelekî dewlemend bike. Bi vê yekê re zarok dê derdorê xwe baştir binase. Qût û nebatên ku di mamikên kurdî de hatine nasandin ev in: “kuncî, nok, pîvok, dirrî, genmok, dindika birincî, genim, kezan, tovça, kîvark, nêrgiz, nîsk, gûhîşk, pembû, belgêt çolî, sêvbinerd, dara pembû, kuleş, gezo, şîlan, sinc, kertal, pîrpizek, botav, mêw, hêrvist, qîvar, berû, dara hêjîrê, simbêlê genim, gul, lema zebeşan, belgên çilo, garis, kereng, mazî, strî, rêvas, tihok, kulîlkên hinarê, çiçek, silq, ce, rez, pel, binerdik, bilalîsk, nokên şîn, çay.”

- 1- Herec herec, her êkê 15 derec. [**Kuncî**], (Berwarî. M, r. 53)
- 2- Qotu qotu di destî da, singê sur e di pîndê da. [**Nuk**], (Berwarî. M, r. 53)
- 3- Mamikê mino, mamkuk e, ya bi kiras û dersuk e, navê wê ziçepuk e. [**Pîvok**], (Berwarî. M, r. 53)
- 4- Babê te yê mirî, di 7 mêzera werkirî, serê girre kêra kirî. [**Pîvok**]<sup>212</sup>, (Berwarî. M, r. 53)
- 5- Heko yê biçûk rihêt wî di spî ne, heko yê mezin rihêt wî di sor in, heku yê pîr, rihêt wî reş dibin. [**Dirrî**], (Berwarî. M, r. 53)
- 6- Dara şîrîn e, gulî zêrîn e. [**Genmok**], (Berwarî. M, r. 53)
- 7- Mamkê mino, hakim yê dibin bergûza ve. [**Dindika birincî**], (Berwarî. M, r. 53)
- 8- Mamkê mino, pismîrê bi şepkekî. [**Dindika birincî**], (Berwarî. M, r. 53)
- 9- Tişteki min heye, binî ax e, navê şax e, serî zax/zêr e. [**Genim**], (Berwarî. M, r. 53)

<sup>212</sup> Nêzikî meteloka mêsîn û hêkê ye. Pîvok: Giyayek e.

- 10- Digirim mistekê, dihavêm deşteke. [**Genim**], (Berwarî. M, r. 53)
- 11- Çav reşê deştê, du pê gehiştê, êxiste ser teniştê. [**Dexil/genim dema dirûnê**], (Berwarî. M, r. 53)
- 12- Davêjim çalê, heta salê. [**Dindik/tovê dexlî**], (Berwarî. M, r. 53)
- 13- Tu bixwî dikeve ber didanan, tu nexwî dibe gul û gulistan. [**Dindik/tovê dexlî**], (Berwarî. M, r. 53)
- 14- Ez çûme deşta Gever e, min teyrek dît bi şaş û perr e, dara hişk e, fêkiyê terr e. [**Şana hingiv**], (Berwarî. M, r. 53)
- 15- Teyrek hat, nanek pat, ne fitr e, ne zekat. [**Şana hingiv**], (Berwarî. M, r. 53)
- 16- Behra şîn e, av tê nîne. [**Kezan**]<sup>213</sup>, (Berwarî. M, r. 54)
- 17- Bi spî radiçînit, bi surî têdikin, bi keskî didirûn. [**Kezan**], (Berwarî. M, r. 54)
- 18- Li binê kevrî bide naşkê, pavê di şikefteka tarî de dişkê. [**Kezan**], (Berwarî. M, r. 54)
- 19- Tiştê min tişt e, yê bi ber û pişt e, pavêje hemû deran naşkê, pavêje şikeftekê da dê şikê. [**Kezan**], (Berwarî. M, r. 54)
- 20- Bi binê ve şîn e, li bazara reş e, li malê sor e. [**Tovça**], (Berwarî. M, r. 54)
- 21- Ji ser ve hosan e, ji bin ve Qoran e. [**Kîvark**], (Berwarî. M, r. 55)
- 22- Qurana li binê dinê, hindî şêx û mela hatinê, neşyan bidene xandinê, dihête xarinê. [**Kîvark**], (Berwarî. M, r. 55)
- 23- Çûme şarê şik tê nîne, min guşt xar hêsk tê nîne. [**Kîvark**], (Berwarî. M, r. 55)
- 24- Binê axîn e, navtenga şîn e, serê zêrrîn e. [**Nêrgiz**], (Berwarî. M, r. 55)
- 25- Tiştê min tişt e ne ber e ne pişt e, hema bi xwe bi xwe tişt e. [**Nîsk**], (Berwarî. M, r. 55)
- 26- Dara li nav dara zer dîk ji gohara. [**Guhîşk/helhelok**], (Berwarî. M, r. 55)
- 27- Kerê etara, xwe zer kir ji bend û guhara. [**Guhîşk/helhelok**], (Berwarî. M, r. 55)
- 28- Heplepan û heplepan, giya şîn e, belgê pan, kurê pîr e babê can. [**Pembû**], (Berwarî. M, r. 56)
- 29- Cuxîna li pişt banî, ka çêtir e ji danî. [**Pembû**], (Berwarî. M, r. 56)
- 30- Me çandin wekî nuka, şîn bûn wekî sêveloka, pê ve hatin wekî gûzeloka. [**Pembû**], (Berwarî. M, r. 56)
- 31- Ji vêrê pê da, min ecêbiyek dît di rê da, kê dîte mak di zikê berxê da? [**Pembû**], (Berwarî. M, r. 56)

<sup>213</sup> Carinan ji bo kevzê jî dibêjin.



- 32- Ji ser ve hosî, ji bin ve pirasî. [**Belgêt çolî**], (Berwarî. M, r. 56)
- 33- Tiştîkê min tişt e, 7 pirasî li pişt e, ne xûn e ne guşt e. [**Belgêt çolî**], (Berwarî. M, r. 56)
- 34- Ji vêrê heta Awka<sup>214</sup>, hemî piniyên kalka. [**Belgêt çolî**], (Berwarî. M, r. 56)
- 35- Çu nizarê xalka<sup>215</sup>, tijî piniyên kalka. [**Belgêt çolî**], (Berwarî. M, r. 56)
- 36- Ji ser ve şêr e, ji bin ve zêr e. [**Sêvbinerd**], (Berwarî. M, r. 70)
- 37- Tiştêkî min heye mal e, qîz e, pîr e, dê cahil e. Ew çi ye? [**Pembû**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 414)
- 38- Gelo ew çi stîk bû, hevt qîzê wê hebûn, porê qîzê wê spî bibû, porê diya wan hê reş bû. [**Dara pembû**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 414)
- 39- Gulek derketiye ji qudretê, hin dinê kêrî me tê, hin axretê. Ew çi ye? [**Pembû**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 415)
- 40- Serî me ra, kok erdê ra, orte heywîn ra. Ew çi ye? [**Kuleş**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 415)
- 41- Xaliqo te xaliqand, dar û dirî tev aliqand, ne ji darê bû darê aliqand. Ew çi ye? [**Gezo**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 415)
- 42- Çela sor e, genimî spî. Ew çi ye? [**Şilan**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 415)
- 43- Hêl va tê, kendêl va tê, berî sor e, xweber tê. Ew çi ye? [**Şilan**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 415)
- 44- Melle gote mellejinê, go: “Kitêbek derketiye rû dinê, usa hûr e, nayê xandinê.” Ew çi ye? [**Karî**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 416)
- 45- Konekî min heye ser stûnekî, heştê hezar kitêb bin kon da. Ew çi ye? [**Karî**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 416)
- 46- Gayê dar, narînê ar, sor çadir ser. Ew çi ye? [**Sinc**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 417)
- 47- Serî ar e, binî dar e. Ew çi ye? [**Sinc**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 417)
- 48- Çil çîq in, çil ber çîq in, çil ode ne, çil mifte ne, çil kilîle ne, çil tê de ne. [**Genim**], (Gazî. M, r. 14)
- 49- Difire ne çûçik e, dîware ne kûçik e, bi şîr e ne bizin e. [**Kertal**], (Gazî. M, r. 16)
- 50- Ez tehtê de davêm naşkê, ez davêm kulekê de dişkê. [**Kewzan**], (Gazî. M, r. 18)
- 51- Ji vir û Mûsil, hemî keçikê çavkil. [**Pirpizek**], (Gazî. M, r. 21)
- 52- Kumê xezalê, gêndir bû newalê. [**Botav**], (Gazî. M, r. 22)
- 53- Kêra kalanî, tor avêt ser xanî. [**Mêw, mêwa tirî**], (Gazî. M, r. 22)

<sup>214</sup> Navê gund e.

<sup>215</sup> Navê girekî ye.

- 54- Kok di erdê da, serî li or, orte di te da. [**Genim**], (Gazî. M, r. 22)
- 55- Sal duwazde meh şîrîn e. [**Hêrvîst**], (Gazî. M, r. 27)
- 56- Tiştêkî min heye, fîrt û fiyo, li nav devîyo. Ev çi ye? [**Qîvar, kuvark**], (Alkan. A, r. 80)
- 57- Tiştêkî min heye, sofîyo li nav devîyo. Ev çi ye? [**Qîvar, kuvar**], (Alkan. A, r. 91)
- 58- Tiştêkî min heye, zer davêmê spî dertê. Ev çi ye? [**Genim û aş**], (Alkan. A, r. 93)
- 59- Tiştêkî min heye, binî di erdê de ye, nava wî di kerê de ye, serê wî di te de ye. Ev çi ye? [**Kov, ka û genim**], (Alkan. A, r. 95)
- 60- Tiştêkî min heye, çav beloq e nabîne, bejna wê tune, lê kun şîn e. Ev çi ye? [**Berû**], (Alkan. A, r. 97)
- 61- Tiştêkî min heye, xwarinekî ne ji gîyê, çê dibe li nav devîyê. Ev çi ye? [**Qîvar, kuvark**], (Alkan. A, r. 100)
- 62- Tiştêkî min heye, xeftanşînê hejiya, tep û rep jê weşiya. Ev çi ye? [**Dara Hejîrê**], (Alkan. A, r. 100)
- 63- Tiştêkî min heye, por gijik, li ser qirşik. Ev çi ye? [**Simbilê genim**], (Alkan. A, r. 102)
- 64- Tiştêkî min heye, geş e bêhnxeş e. Ev çi ye? [**Gul**], (Alkan. A, r. 102)
- 65- Binî şîn e, serî sipî ye û kulav zêrîn e. [**Nêrgiz**], (Akbaş. E, r. 67)
- 66- Çûme çolê çolbeyarkî, heft dûv li pey berankî. [**Lema zebeşan**], (Akbaş. E, r. 68)
- 67- Bi pel û strî ne, li ber dilê bilbil şêrîn e. [**Gul**], (Akbaş. E, r. 68)
- 68- Ser spî ye ne mele ye, pê panî ye ne deve ye. [**Kifkarik**], (Akbaş. E, r. 69)
- 69- Mamikê mino, ji vir ta alokan, hemî pinyên kerkolkan. Çi ye? [**Belgên çilo**], (Sadinî. M.X , r. 23)
- 70- Mamikê mino, bûk li hundur e, pora wê li der ve ye. Çi ye? [**Garis**], (Sadinî. M.X , r. 50)
- 71- Kesk e rengê giya ye, zer e wek tîrojê e, spî ye wek berfê ye, reş e wek rejûyê ye. Çi ye? [**Genim**], (Sadinî. M.X , r. 51)
- 72- Mamikê mino, serî di te da, nêvî di kerê da, kok di erdê da. Çi ye? [**Genim**], (Sadinî. M.X, r. 51)
- 73- Mamikê mino, qelew e keltor, ji der ve ye por, nayête xwarin, ta nekin nav ava şor. Çi ye? [**Genimok**], (Sadinî. M.X , r. 52)
- 74- Mamikê mino, tiştêkî min heye, geş e bêhnxeş e. Çi ye? [**Gul**], (Sadinî. M.X , r. 56)

- 75- Mamikê mino, bihara pişkoj e, havîna geş e, payîza bêhnxweş e. Çi ye? [**Gul**], (Sadinî. M.X , r. 56)
- 76- Mamikê mino, navê wê navê Pêxember e, bêhna bêhna Ember e, cihê lê seyrangêh e, heke we zanî ew çî ye? [**Gula Mihemedî**], (Sadinî. M.X , r. 56)
- 77- Mamikê mino, ji vir ta Mûseka, hemî ritlên gîska. Çi ye? [**Gulîr-berû**], (Sadinî. M.X , r. 56)
- 78- Mamikê mino, her ji vir heta sindor, hemû cihûyên ritilsor, Çi ye? [**Gulîr-berû**], (Sadinî. M.X , r. 57)
- 79- Mamikê mino, pireka di rê da, hezar kelem di rêkê da. Çi ye? [**Kereng**], (Sadinî. M.X , r. 77)
- 80- Mamikê mino, hir ve ax, wê ve ax, di nîvekê da, mîr bidax. Çi ye? [**Kereng**], (Sadinî. M.X , r. 77)
- 81- Mamikê mino, holekê di kevir de, bavêje naşikêt, bavê kulê dê şikêt. Çi ye? [**Kewzan**], (Sadinî. M.X , r. 80)
- 82- Mamikê mino, diçînin kêçan, radibin wek rîman. Çi ye? [**Kuncî**], (Sadinî. M.X , r. 87)
- 83- Mamikê mino, dayik ji kêran, keç ya li bajêran. Çi ye? [**Mazî**], (Sadinî. M.X , r. 94)
- 84- Tiştêk min ê bêhnxweş e, dara qudretê, xizêmeke bi rex ketê. Çi ye? [**Nêrgiz**], (Sadinî. M.X , r. 109)
- 85- Mamikê mino, darekî li dinê, pênc ta diçînê, sê li sîberê, du li hetavê. Çi ye? [**Nîsk**], (Sadinî. M.X , r. 110)
- 86- Bavê mirî, di sê gilvilka werkirî, li nîva rêkan jibîrkirî. Çi ye? [**Pîvok**], (Sadinî. M.X , r. 116)
- 87- Mamikê mino, firto fiyo, li nav deviyo. Çi ye? [**Qîvar**], (Sadinî. M.X , r. 119)
- 88- Mamikê mino, heybet heybet e, ava bana şilqa li xwe didete, tuy jê diçîn, kata li xwe dide. Çi ye? [**Rêvas**], (Sadinî. M.X , r. 121)
- 89- Mamikê mino, yê mirî ye, xwînê ji vir heta Alokana dirêje. Çi ye? [**Strî-kelem**], (Sadinî. M.X , r. 128)
- 90- Tiştêkî min heye tiştanî, day li rêlan, keç li bajaran. Çi ye? [**Mazî**], (Sadinî. M.X , r. 165)
- 91- Mamikê mino, ferec ferec, her ferecek hezar derec, ew qûtek e yêd qenc. Çi ye? [**Kuncî**], (Sadinî. M.X , r. 168)
- 92- Mamikê mino, her bilind e bilindtir, kur ji babî bilindtir. Çi ye? [**Rêvas**], (Sadinî. M.X , r. 172)

- 93- Mamikê mino, dara nav avê, avê da navê, çûçika li ser, nikilzer. Çi ye? [**Birinc**], (Sadinî. M.X , r. 194)
- 94- Mamikê mino, ez çûm serê banekî, dibînim bostanekî, heft zincîr devê marekî. Çi ye? [**Mêwî**], (Sadinî. M.X , r. 195)
- 95- Mamikê mino, kaxezek hate ji bin dinê, qet nayête xwendinê. Çi ye? [**Kîvark, nêrgiz, gul û giya**], (Sadinî. M.X , r. 204)
- 96- Mamikê mino, serê wê şax e, nîveka wê zer e, binê wê ax e. Çi ye? [**Dexil, genim**], (Sadinî. M.X , r. 211)
- 97- Mamikê mino, Qurana dimdimî, tête xwarinê, nehête xwendinê. Çi ye? [**Kîvark**], (Sadinî. M.X , r. 212)
- 98- Mamikê mino, bab ciwan e, law rihspî. Çi ye? [**Pembo**], (Sadinî. M.X , r. 213)
- 99- Bazinê spî ye, li bin devî ye. [**Pîvok**], (Güneş. K, r. 27)
- 100- Biharan bûk e, havînan sûk e, pehîzan pepûk e. [**Dara fêkî**], (Güneş. K, r. 27)
- 101- Bi şev bi roj mezin dibe, damarê wî heye, xwîna wî tune ye. [**Dara ku şîn dibe**], (Güneş. K, r. 28)
- 102- Bi pîrî ji diya xwe dibe. [**Pêmbû**], (Güneş. K, r. 33)
- 103- Çavspîko, li nav devîko. [**Pîvik- pîvok**], (Güneş. K, r. 36)
- 104- Dara li nav dara, xemilandî ji gihara. [**Tihok-taw**], (Güneş. K, r. 47)
- 105- Fir dide baskê wê tune, datîne lingê wê tune, şîr dide guhanê wê tune. [**Kerengzer**], (Güneş. K, r. 49)
- 106- Difire bê çeng e, geza dide bê diran e. [**Keremper-kerengper-kelemper**], (Güneş. K, r. 54)
- 107- Elo di gelfî de, fotir di serî de. [**Karî-kidadik-karûk**], (Güneş. K, r. 55)
- 108- Ez çûm serê milekê, hemû bûkê salekê. [**Rêwas-rêwês**], (Güneş. K, r. 57)
- 109- Ez çûm ser banekî, lê dinêrim hemû bûkên salekî. [**Kulîlkên hinarê**], (Güneş. K, r. 55)
- 110- Ez xwedî dikim, ew dixemilîne? [**Çîçek**], (Güneş. K, r. 59)
- 111- Mamkê minê mamanî, fexî sax mak mirî. [**Mazî**], (Güneş. K, r. 60)
- 112- Fêkiyên wê xelk dibe, pelên wê ba dibe. [**Dara fêkî**], (Güneş. K, r. 60)
- 113- Gayê sor, bin erdê de dike or or. [**Silq**], (Güneş. K, r. 62)
- 114- Goma bavê min li ser stûnekî. [**Karûk-kidadik-feqîroşk**], (Güneş. K, r. 62)
- 115- Golikê min heye, dibim ser avê av venaxwe, kapikê wî vedixwe. [**Lemê kundir**], (Güneş. K, r. 63)
- 116- Hilindir milindir, kur ji bavê bilindtir. [**Dire-garis**], (Güneş. K, r. 70)

- 117- Heft tir kir, hê jî difna wê xwar. [**Nok**], (Güneş. K, r. 73)
- 118- Her sal dirêj dibe û salê carekî xwe dixemilîne. [**Dar**], (Güneş. K, r. 74)
- 119- Jinik li hundir e, pora wê ji derve ye. [**Lazût-garis-direyê misir**], (Güneş. K, r. 77)
- 120- Ji ningê kewê kintir e, ji pelê Quranê pirtir e. [**Kavkelik-karî-kidadik**], (Güneş. K, r. 80)
- 121- Ji cihê xwe tevnagere, piştî ketinê tevdigere. [**Pel**], (Güneş. K, r. 82)
- 122- Mamkê mino, keçê spîndarek rakir. [**Kuncî**], (Güneş. K, r. 85)
- 123- Mamkê mino, kêçê kuçek/kevirek kir. [**Binerdik**], (Güneş. K, r. 85)
- 124- Kon e bê stûn e. [**Kuvkarik-kidadik**], (Güneş. K, r. 87)
- 125- Li çolê heşîn e, li çarşiyê reş e, li malê sor e. [**Çay**], (Güneş. K, r. 90)
- 126- Mînanî kala, xwe pala? [**Karûk-kidadik**], (Güneş. K, r. 94)
- 127- Mamikê mino, sofîyê çavkildayî. [**Bilafîsk- kulîlka newrozê**], (Güneş. K, r. 95)
- 128- Me çandî wekî nokan, şîn bûn wekî sêvelokan, pê ve hatin wekî gûzelokan. [**Pembû**], (Güneş. K, r. 96)
- 129- Min xwêhkî heyî, illeh enirî. [**Nohk**], (Güneş. K, r. 97)
- 130- Mîr hilgirtî ye dirî. [**Strî**], (Güneş. K, r. 97)
- 131- Mirî mirov li serê digirî. [**Kuncî**], (Güneş. K, r. 98)
- 132- Min ecêbek dît di rê de, kê mak dîtiye di zikê bavê de? [**Pembo**], (Güneş. K, r. 98)
- 133- Pîrika di rê de, çil sing di qûnê de? [**Dêza çilo**], (Güneş. K, r. 102)
- 134- Pelhûra pelxwê ye, heçî nas nake ne ji vê dinê ye. [**Nokên şîn**], (Güneş. K, r. 104)
- 135- Quto quto destê da, singê sorê di pîdê da. [**Nok**], (Güneş. K, r. 107)
- 136- Ser gelgel e, bim gelgel e, çavzîq û simbêl bel e. [**Rêvaz**], (Güneş. K, r. 110)
- 137- Sê rojan li min zivirî, ya çaran li min bî strî. [**Gul**], (Güneş. K, r. 111)
- 138- Ser spî ye ne mele ye, pê panî ye ne deve ye. [**Kifkarik-Kidadik**], (Güneş. K, r. 116)
- 139- Tê de tune dewsa qûnê, heye dewsa stûnekî. [**Kelkevîk-kidadik**], (Güneş. K, r. 122)
- 140- Tişteki min heye, ji tiştan tişt e, bi parsî ye û bi pişt e, bê xwîn û bê goşt e. [**Pel**], (Güneş. K, r. 125)
- 141- Xalê yemrixan, newala goman, sê cenan, duwazdeh qetû<sup>216</sup>, sêzdeh cendan<sup>217</sup>. [**Rez**], (Güneş. K, r. 133)

<sup>216</sup> Kelik, helik, sepeta piçûk.

<sup>217</sup> Savî, sepeta mezin.

- 142- Xwêhek ya te heye, her roj xweliyê li xwe dike. [**Moxila arvên**], (Güneş. K, r. 133)
- 143- Xanî li ser ustûnekê, te rakir şûna qûnekê. [**Kuvarek-kidadik**], (Güneş. K, r. 134)
- 144- Xerîn xerînç, duwazdeh derînç. [**Kuncî**], (Güneş. K, r. 135)
- 145- Xana li pişt malan e, dibe kinc bi însan e. [**Pembû**], (Güneş. K, r. 135)
- 146- Yek dido bawe sisê, çeqlê fisê, sîtila xwînê, dadbalînê. [**Gurzika çilo**], (Güneş. K, r. 136)
- 147- Derve qalik û qirşik, nav de nerm e wek doşik, rû li rengê xwêlî ye, dil ewrê spî û xweşik. Ew çi ye? [**Pembû**], (Baskın. M.Ş, r. 16)
- 148- Kaxiz hate dinê, mêr da destê jinê, jin got mêro, ev ne kaxizê xendinê. Ew çi ye? [**Karok**], (Baskın. M.Ş, r. 17)
- 149- Mamigê mino mamanî, ser cûce, bin cûce. [**Ce**], (Eren. M, r. 14)
- 150- Mamigê mino mamanî, min xwihek heye, her soyî edaw li bin dikevi. [**Dara benê**], (Eren. M, r. 24)

## 6. Mamikên li Ser Çerezan

Di vir de qesda me ji çerezan fêkiyên hişk û yên hişkkirî ne. Zarok piştî ku dest bi xwarinên hişk dikin, bi çerezan re jî hevnas dibin ku ev teqrîben piştî du saliya zarokan dest pê dike. Yanî heyama fêrbûna bêjeyên ziman e. Di vê beşê de mamikên kurdî li ser çerezên wek: “bahîv, mewîj, gûz, dendik, dendikê zebeşê, berûyên daran” hatine senifandin.

- 1- Tenûrka êk kade. [**Bahîv**], (Berwarî. M, r. 54)
- 2- Hu ve hestî, wê ve hestî, di nav da şekra bestî. [**Bahîv**], (Berwarî. M, r. 54)
- 3- Gayê dadikim, kurîyê/dûv jê dikim. [**Mêwîj**], (Berwarî. M, r. 54)
- 4- Çûme şikeftê, lê dinêrim sed pezê tê, her yekê bi şaxekê. [**Mêwîj**], (Berwarî. M, r. 54)
- 5- Bab şîrîn e, korr şîrîn e, nevî dîn e. [**Mêwîj**], (Berwarî. M, r. 54)
- 6- Dayka şîrîn e, kiça şîrîn e, kiça kiçê ya har û dîn e. [**Mêwîj**], (Berwarî. M, r. 54)
- 7- Tenûra zimzimî, tijî nanê genimî. [**Gûz**], (Berwarî. M, r. 56)
- 8- Tenûrka du kade. [**Gûz**], (Berwarî. M, r. 56)
- 9- Qesra şûştî, du begzade tê da rûniştî. [**Gûz**], (Berwarî. M, r. 56)
- 10- Oda miştî, 2 feqe tê da runiştî. [**Gûz**], (Berwarî. M, r. 56)
- 11- Du bira ne, navê herda birak e, bin kumekî da ne. Ew çi ye? [**Gûz**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 416)

- 12- Ew çi ye? Ji yekê hezar. [**Dendikê zeveşê**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 418)
- 13- Dîzika gimgimî, tije ardê genimî. [**Gûz**], (Gazî. M, r. 17)
- 14- Kêrga dimdimî, tejî arê genimî. [**Gûz**], (Gazî. M, r. 22)
- 15- Tendûra dadayî, tije nanê badayî. [**Gûz**], (Gazî. M, r. 31)
- 16- Tenûra xumxumî, tije nanê genimî. [**Gûz**], (Gazî. M, r. 31)
- 17- Tişteki min heye, qesra şûştî mûştî, du feqî lê rûniştî. Ev çi ye? [**Gûz, gwîz**], (Alkan. A, r. 87 )
- 18- Tişteki min heye, tenûra himhimî, tije nanê genimî. Ev çi ye? [**Gûz**], (Alkan. A, r. 97)
- 19- Tişteki min heye, pîra qermiçî, qirşek di qûnê de. Ev çi ye? [**Mewîj**], (Alkan. A, r. 100)
- 20- Tişteki min heye, sindoqa xilqandî, li ser darê daliqandî. Ev çi ye? [**Gûz**], (Alkan. A, r. 101)
- 21- Qesra şûştî veşûştî, du feqe tê de rûniştî. [**Gûz**], (Akbaş. E, r. 67)
- 22- Tu bixwî dikeve ber diran, tu nexwî dibe baxçe û bûstan. [**Dendik**], (Akbaş. E, r. 67)
- 23- Mamikê mino, sê mêvan tèn bo te, yekî dihewînî, duwa nahewînî. Çi ye? [**Dendik**], (Sadinî. M.X , r. 37)
- 24- Mamikê mino, çantika min e, du nan diçin tê da. Çi ye? [**Gûz**], (Sadinî. M.X , r. 57)
- 25- Mamikê mino, ji jehrê taltir e, ji şekirê şirîntir e, ji sêvê biçûktir e, ji dûvê mihan bi rûntir e. Çi ye? [**Gûz**], (Sadinî. M.X , r. 58)
- 26- Mamikê mino, çûm şikeftekê, tijî bizinên bi şaxekî. Çi ye? [**Mewîj**], (Sadinî. M.X , r. 100)
- 27- Mamikê mino, pîra qirmîçî, darik di qûnê da. Çi ye? [**Mewîj**], (Sadinî. M.X , r. 100)
- 28- Mamikê mino, tenûra dadayî, tijî kilorên badayî. Çi ye? [**Gûz**], (Sadinî. M.X , r. 218)
- 29- Ez miyê naxwim, berxê dixwim. [**Goz**], (Güneş. K, r. 59)
- 30- Gava dixwaze heviyê, gava naxwaze dikeve bin deviyê. [**Berû**], (Güneş. K, r. 61)
- 31- Hê dikim, boçê ber de jê dikim. [**Mewîj**], (Güneş. K, r. 70)
- 32- Ji jehrê tehtir e, ji şekir xweştir, ji sêvê biçûktir, ji devê girtir. [**Gûz**], (Güneş. K, r. 86)
- 33- Mizgefta maliştî, du feqe tê de rûniştî. [**Gûz**], (Güneş. K, r. 95)
- 34- Odeyek e çar feqe tê de ne, bê derî ye. [**Gûz û kaklê wê**], (Güneş. K, r. 101)

35- Singek li vir dikutim, golik li wir dinepîxe/diwerime. [**Dendika zebeş**], (Güneş. K, r. 113)

36- Mamigê mino mamanî, gayê qut, datkî bidûv. [**Berûyên daran**], (Eren. M, r. 22)

### 7. Mamikên Bûyerekê yan Meseleyekê Vedibêjin

Di vê beşê de ji têgehan zêdetir zarok dê fêrî vegotina bûyerekê bibin. Ev jî dê zimanê zarokan ê represîf(vebêjî) bi pêş bixe. Bûyerên ku di vê beşê de hatine şayesandin ev in: “Daqutana tûyan, təkiliya garîte, nîre û bagurdanê, qazan û agir, darbirîn, siyar û dewar, ker û barê tirî, jiyana mirovan, bêrî, merivê razayî, rû û dûzan, doşandina şîr, nîvîsar û xwendin, berdêlî, xwê û qantir, sêpêk, meşk û însan, çav û xew, av û agir, genim û aş, ga û cotkarî, bangdana mela, xwarin û beroş, xefik û hwd.”

1- Çûme serê milekê, pê min kefte qulekê, min kir hewar, sed mêr hatin bi carekê.

[**Daqutana tûya**], (Berwarî. M, r. 54)

2- Êkî gut: Ay piştê, êkî gut: Ay teniştê, êkî gut: Ax çend li min xweş tê. [**Garîte, nîre û bagordan**], (Berwarî. M, r. 62)

3- Hudhud e har bû, reşwêlê lê siyar bû. [**Qazan, agir û hiskûk**], (Berwarî. M, r. 64)

4- Helhele har e, reşkele siyar e, dûvdirêjk xilmetkar e. [**Qazan, agir û hiskûk**], (Berwarî. M, r. 64)

5- Ez çûme newalekê, jê tê dengê birîndarekê. [**Darbirîn**], (Berwarî. M, r. 70)

6- Çar dest in, çar pê ne, du qûn in, êk li ser pê ye, êk li ser piştê ye. [**Siyar û dewar**], (Berwarî. M, r. 83)

7- Şîrînok li darînok, darînok li guhbelok, guhbelok bi rê ket, pêpehnok bi dûv ket. [**Ker, barê tirî û karwanî**], (Berwarî. M, r. 83)

8- Êkî di te na, bi pênc şahida ve. [**Taret, kevçik û tilên destî**], (Berwarî. M, r. 83)

9- Ev çi ye? Sibe çar e, nîvro du ye, êvarî sê ye. [**Zaro bi çar lepa diçit, dibe genc bi duya, dibe pîr bi du pêya û gupalekî**], (Berwarî. M, r. 83)

10- Dûr li min nêzîk bûn, du bûne sê, sih û du ya ma ket û cût. [**Pîrî: mirin nêzîk dibit, pêtvî gupalî dibit, 32 didan jî kit û mat dimînin**], (Berwarî. M, r. 84)

11- 4 pê li erdî, 2 li teniştê, qûn li bin kurîyê, kîr li serê piştê. [**Mirovek siyarî hesp**], (Berwarî. M, r. 84)

12- Deh pê ye, du destî ye, sê serî ye, êk perî ye. [**Gulik, çêl, bêrî**], (Berwarî. M, r. 84)

13- Ne çandî li ser piştê ne zay, ne zay li ser piştê bê ruhî, bê ruh li ser piştê bê îmanî. [**Hêstir/dewar, pîr, av**], (Berwarî. M, r. 84)



- 14- Tişteki min heye, dirêj dirêj, kevan dirêj, Ew çi ye? [**Merivê razayî, çaxê lingê xwe kevan dike**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 413)
- 15- Hesin bizin, gayê mezin, tev dilîzin, tev dibezin. Ew çi ye? [**Sol û meriv**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 413)
- 16- Bêder ji goşt, cercer ji hesin, av bidedê bajo. Ew çi ye? [**Rû û dûzan**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 413)
- 17- Can bêcanê siyar bû, can bêcan tev bêîmanê siyar bûn. Ew çi ye? [**Merî, gemî, av**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 414)
- 18- Kêlendiyê xwe hiltînim, diçim zeviyê diçinim, part dimîne cî da, zevî radibe diçe. Ew çi ye? [**Pêz û hirî**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 418)
- 19- Serî qorikê, qorik li erdê, dehe çûm duda. Ew çi ye? [**Kulfet mîyê didoşe**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 418)
- 20- Tişteki min heye, çar ser berê, ber ser çokê, çok ser erdê, Ew çi ye? [**Guhanê çêlekê, doşandina şîr**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 419)
- 21- Kela goştî ne, pêpelîngê tê da hesinî ne, poblîska serê wê darîn e. Ew çi ye? [**Hesp, zengû, zîn**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 419)
- 21- Neça nezayê kir, neça û neza, ser ne li vê ra derbaz kir. Ew çi ye? [**Xoy, qantir, pira**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 432)
- 22- Desta direşînim, çeva didime hev, Ew çi ye? [**Nivîsar û xwendin**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 433)
- 23- Xal û xarzî, met û birazî, hev kirine gazî. Ew çi ye? [**Berdêlî**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 433)
- 24- Bira cawîn, dewla herîn, werîsê darîn. [**Kîsê titûnê, qelûn û boçika wê**], (Gazî. M, r. 13)
- 25- Deh li duda, dudu li deha, serî li qûnê, qûn li erdê. [**Însan û guhan**], (Gazî. M, r. 16)
- 26- Devî bi zinêr ve, mazî pê ve. [**Serî, guh û guhar**], (Gazî. M, r. 16)
- 27- Êk dibêje ay milê mino, êk dibêje ay piştî mino, êk dibêşe ay xwezga/xweşika mino. [**Stûn, girş û bangur**], (Gazî. M, r. 18)
- 28- Qenenezîldayî li qenenezayê siwar bûye. [**Xwê û qatir**], (Gazî. M, r. 27)
- 29- Sê nigê sêdar, çar nigê tê da, du nigê lêda. [**Sêpêk, meşk, însan**], (Gazî. M, r. 28)
- 30- Sêlingo di siyê da, çarlingo pê da, dulingo hat û lê da. [**Sêpêk, meşk, însan**], (Gazî. M, r. 28)

- 31- Sêpê li pê ye, çarpê lê ye, dupê tê hilpkî lê ye. [**Sêpik, meşk û dewkul**], (Gazî. M, r. 30)
- 32- Şêrîno li darîno, darîno li gobelo, gobelo bi rê ket, pêpano pê ket, çiz viz bi dorê ket. [**Şêrîno: tirî, Darîno: selik, Gobelo: ker, Pêpano: însan, Çiz viz: moz**], (Gazî. M, r. 30)
- 33- Tişteki min heye, guhbelo bi rê ket, gilovero bi ser ket, xeftanzerê bi pey ket. Ev çi ye? [**Ker, barê tirî û moz**], (Alkan. A, r. 82)
- 34- Tişteki min heye, Qasimê qulxwar, çû ser darê anî xwar. Ev çi ye? [**Çivîk û hejîr**], (Alkan. A, r. 87)
- 35- Tişteki min heye, reşê siwar bû, kufletê malê şa bû. Ev çi ye? [**Beroş û xwarin**], (Alkan. A, r. 87)
- 36- Tişteki min heye, yekî ji yekê re got: kesek nikare bi min, yekî got: ma ez jî, got: kes behsa te nake. [**Çav û xew**], (Alkan. A, r. 98)
- 37- Tişteki min heye, yekî ji yekî re got: ku ez diherim kesik nikare min bisekinîne. Ê din tu ji min re jî dibêje? Got: kesî behsa te nekiriye. [**Av û Agir**], (Alkan. A, r. 99)
- 38- Tişteki min heye, yekî got: kesek nikare min hûr hûrî bike. Ê din got: tu ji min re jî dibêji? Got: tew min tu ji bîra kiribû. [**Genim û aş**], (Alkan. A, r. 99)
- 39- Tişteki min heye, zîq û zîq heft ling û çîq. Ev çi ye? [**Ga û cotkarî**], (Alkan. A, r. 100)
- 40- Mamikê mino, şîrînok li darînok, darînok li guhbelok, guhbelok bi rê ket, pê pahnok bi dû ket. Çi ye? [**Barê tirî, selik, xwedî**], (Sadinî. M.X , r. 22)
- 41- Mamikê mino, pind li erdê, ser li pindê, Çi ye? [**Bêrî, dema bizinê didoşe**], (Sadinî. M.X , r. 24)
- 42- Mamikê mino, ez çûme diyarekî, newalek li ser newalekî, panav li panavê bû, li serê panavê gopalek bû. Çi ye? [**Çiya û Mar**], (Sadinî. M.X , r. 35)
- 43- Diçim ser kerkekê, divekim bi korkekê, sed çûçik bi dû mamirkekê. Çi ye? [**Hosta û bendikê dîwar**], (Sadinî. M.X , r. 69)
- 44- Şîrînê şarê, hinguvînê darê, guhbel di rê da, pêpaneyî di dûv da. Çi ye? [**Ker, barê tirî, xwedî**], (Sadinî. M.X , r. 76)
- 45- Mamikê mino, guhbelo bi rê ket, girovero bi ser ket, xeftanzero bi pey ket. Çi ye? [**Ker, barê tirî, moz**], (Sadinî. M.X , r. 76)
- 46- Çûme serê darekî, dikim hişkehewarekî, sed mêr tèn bi carekî. Çi ye? [**Mela dema bang dide**], (Sadinî. M.X , r. 95)

- 47- Mamikê mino, bab yê şîn e, kur yê şîrîn e, nevî yê dîn e. Çi ye? [**Mêwa tirî û mey**], (Sadinî. M.X , r. 99)
- 48- Mamikê mino, holekê bavêje dolekê, dol dirize, hol narize. Çi ye? [**Pê û pêlav**], (Sadinî. M.X , r. 110)
- 49- Mamikê mino, herro êvar tu gûyê xeftanreşo dixwî. Çi ye? [**Xwarin û berpêş**], (Sadinî. M.X , r. 144)
- 50- Mamikê mino, li kerekê siwar dibe, ruh tê nîne, du berana dixwe, hestî tê nîne. Çi ye? [**Zarok û çîçikê dayîkê**], (Sadinî. M.X , r. 145)
- 51- Ser li pindê, pind li dotê. Çi ye? [**Bêrî**], (Sadinî. M.X , r. 156)
- 52- Mamikê mino, çûme li ser darekê, dikem hişkehewarekê, sed têne xwarê carekê. Çi ye? [**Gûz û daqutan**], (Sadinî. M.X , r. 164)
- 53- Mamikê mino, qulleteyna tijî av, mareke reş li nav, teyreke spî li hindav, qulleteyn hişk dibît, marê reş dê mirît, teyrê spî dê firît. Çi ye? [**Çirayê neftê, qeytana peliteyê, ronahî**], (Sadinî. M.X , r. 203)
- 54- Mamikê mino, bîst mêrê dirî, hatine barek tirî, neşiyar barken lewra berda girî. Çi ye? [**Mirovek tenê ye, navê wî jî bîsto**], (Sadinî. M.X , r. 209)
- 55- Can li bêcanê siwar bûn, can û bêcan tev bêîmanê siwar bûn. [**Rêwî, keştî û av**], (Güneş. K, r. 35)
- 56- Çar bira berdîn hev, tu carî nagihin hev. [**Çirik - çirçirik - makîneya pêmbû**], (Güneş. K, r. 36)
- 57- Çar ningo bi rê ket, ting û vingo bi dorê ket. [**Ker û Mêş**], (Güneş. K, r. 36)
- 58- Dîkek li ser darê, hêkek jî li wa serê, milek darê av e, milek giya ye, hêk kî alî de bikeve naşiket. [**Dîk hêk nake**], (Güneş. K, r. 46)
- 59- Du ning bi rê ket, çar ning pê ket, çîz û vîzo bi dorê ket. [**Çerçî, hestir, zarok**], (Güneş. K, r. 48)
- 60- Di dinyayê de çî şêrîn e, çî bi bîhn e, çî bi qûwet e? [**Evîn, eşq - nanê tenûrê yê taze - hesp**], (Güneş. K, r. 50)
- 61- Golika sor, çêleka reş dibalize/dialîse. [**Agir û beroş**], (Güneş. K, r. 63)
- 62- Golika Hekariya, ket nav zadê Berwariya, golik bê hestî, genim bê bistî. [**Golik: sipih Genim: por, gevî**], (Güneş. K, r. 63)
- 63- Her sihar diya te, pînekî dibe q.na xwe. [**Nan û sêl**], (Güneş. K, r. 72)
- 64- Neçandî li ser pişta nezayî, nezayî li ser pişta nelepit, nelepit li ser pişta netebit. [**Neçandî: xwê, Nezayî:hêstir, Nelepit:pir, Netebit: av**], (Güneş. K, r. 98)
- 65- Qet neza, qet nezîla, qet newesta. [**Hêstir- xwê-av**], (Güneş. K, r. 105)

66- Sê tişt hatin ser pirê, yek li pirê mêze dike, dibîne û pê lê dike û derbas dibe, yek jî mêze dike, dibîne û pê lê nake derbas dibe, ê din jî ne dibîne ne jî pê lê dike, lê derbas dibe. Ev çi ye? [**Jinek bi heml û zarokek di hambêza wê de**], (Güneş. K, r. 114)

67- Ser spî ye mele nîne, gurzçî ye pale nîne? [**Kumê mela daye serê xwe û mele nîne. Rind gurzan çê dike lê nikare Qirimê bikişîne**], (Güneş. K, r. 116)

68- Sênigo di sêyê da, dunigo pê da, devê li ber zikê diya te, gûyê wî li devê heftê bavê te, tu çawa dikî kêfa te. [**Sênigo: sêpî û meşk, Dunigo: jin, Gû: rûnê meşkê**], (Güneş. K, r. 116)

69- Şîronek, daronek, guhîpelok bi rê keti serpîvok bi du ket. [**Kerge - baxbozumu, Şîronek: tirî, Daronek: dara tirî, Guhîpelok: hêstir, Serpîvok: mirov**], (Güneş. K, r. 120)

70- Yê mirî di erdê de, yê sax hat û xwe lê da, yê mirî yê sax girt û li erdê da. [**Xefik**], (Güneş. K, r. 136)

71- Zîq û zîq, du ling û heşt çîq. [**Cotyar û ga**], (Güneş. K, r. 137)

## 8. Mamikên li Ser Xwarinên Navmalê

Zarok bi alîkariya van mamikan dê xwarinên navmalê binasin, navê wan hîn bibin. Ya herî girîng jî dê xisûsiyetên wan û hûrgiliyên van xwarinan fêr bibin. Navên xwarinên ku di vê beşê de ne, ev in: “hêk, îprax, hingiv, hevîr, xwê, nan, arvan, kêpare/paçe, şekir, nivîşk, şîr, kutilk, zilfet, toraq, beniyê sipî, danê meyîrê, teîn û dims”

1- Tiştîkê min tiştok e, yê bi kolav û dersok e, navê wê zirçepok e. [**Hêk**]<sup>218</sup>, (Berwarî. M, r. 59)

2- Xalê min Emer e, sê kurtekên di ber e, du sipî ne êkê zer e. [**Hêk**], (Berwarî. M, r. 59)

3- Hate meydanê Inter, 3 kortekên di ber, 2 sipî ne, êkê zer. [**Hêk**], (Berwarî. M, r. 59)

4- 2 avêt di tirarekî da, naçine navik. [**Hêk**], (Berwarî. M, r. 59)

5- Qesra sipî bê derî. [**Hêk**], (Berwarî. M, r. 59)

6- Xanîyê bêderî. [**Hêk**], (Berwarî. M, r. 59)

7- Quba bêkutek. [**Hêk**], (Berwarî. M, r. 59)

8- Lawê zerê di qesra sipî da. [**Hêk**], (Berwarî. M, r. 59)

9- Min tiştêkî dîtî, du reng av di nav de dişimitî. [**Hêk**], (Berwarî. M, r. 59)

10- Xaniyekî gilovir/girovir û sipî, bê pencer, roj û derî, tê de rûniştiye bûkeke zerî. [**Hêk**], (Berwarî. M, r. 59)

---

<sup>218</sup> Ji bo pîvokê jî bi kar hatiye.

- 11- Çûme ser banekî, berê xwe dideme ber banekî, 2 avêt di amanekî. **[Hêk]**, (Berwarî. M, r. 59)
- 12- Emer e Emer e, sê pêstê sipî yê li ber e, êkê zer e. **[Hêk]**, (Berwarî. M, r. 59)
- 13- Hate mala me Enter, du kurtekên li ber, êk sipî ye êk zer. **[Hêk]**, (Berwarî. M, r. 59)
- 14- Mamê min Heyder e, sê qutkên li ber e, du sipî ne êkê zer e. **[Hêk]**, (Berwarî. M, r. 59)
- 15- Metelok û metelok, qûna te dikim mencelok, avkên bana, şilqa li xwe didet, yê dibeme Duhok. **[Hêk]**, (Berwarî. M, r. 59)
- 16- Rûto ji pûrto dibit, pûrto ji rûto dibit. **[Hêk]**, (Berwarî. M, r. 59)
- 17- Metelok metête, Qeşey rîte devê te. **[Îprax]**, (Berwarî. M, r. 63)
- 18- Birinca bi şel û şepik. **[Îprax]**, (Berwarî. M, r. 63)
- 19- Her ru sipêdê dayka te teştaka hêka dikit. **[Girkêt hevîrî]**, (Berwarî. M, r. 66)
- 20- Heru deyka te komeka hêkên qaza dikit. **[Hevîr/girkên hevîrî]**, (Berwarî. M, r. 67)
- 21- Pîremêrê pişt keliştî, dermanê hemî tiştî. **[Xwê]**, (Berwarî. M, r. 71)
- 22- Tiştêkî min heye tiştanî, nav dezmalâ siltanî, ne pê heye ne panî. Ew çi ye? **[Hêk]**, (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 415)
- 23- Tiştêkî min heye, du cûre av cêrekî da. Ew çi ye? **[Hêk]**, (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 416)
- 24- Bûzê dişkênim, zîv derdikeve, zîv dişkênim, zêr derdikeve. Ew çi ye? **[Hêk]**, (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 416)
- 25- Cîrnek min heye bi du ava. **[Hêk]**, (Gazî. M, r. 14)
- 26- Çûme aşkî bêderî, keşekî li wê ye bêserî, qapûtkî lê ye bêberî. **[Hêk]**, (Gazî. M, r. 15)
- 27- Li avê dixim naşkê, li teht dixim dişkê. **[Hêk]**, (Gazî. M, r. 23)
- 28- Mamikê min ê mamanî, çar kirasê li ber e, sisiyê sipî ye, yekê zer e. **[Hêk]**, (Gazî. M, r. 23)
- 29- Mamikê min ê mamanî, vî milî teht e, wî milî teht e, navê de şil û şeht e. **[Hevîr]**, (Gazî. M, r. 24)
- 30- Min avêt avê neşikya, min avêt çiya şikya. **[Hêk]**, (Gazî. M, r. 25)
- 31- Sor û semawatî, şil çû zuha hatî. **[Nan]**, (Gazî. M, r. 29)
- 32- Tişkê min ê tiştanî, ne pê û ne panî. **[Hêk]**, (Gazî. M, r. 31)
- 33- Tişkî min heye li avê dixim naşkê, li kevir dixim dişkê. **[Hêk]**, (Gazî. M, r. 32)
- 34- Tiştêkî min heye, sipî sipî wek nivîşk, nêvî ter û nêvî hişk. Ev çi ye? **[Hêk]**, (Alkan. A, r. 89)

- 35- Tişteki min heye, siwarê barê hespê ye, çavê herkesê lê ye, kes nizane qismetê kê ye. Ev çi ye? **[Arvan]**, (Alkan. A, r. 90)
- 36- Tişteki min heye, şêrîno li darîno. Ev çi ye? **[Hingiv]**, (Alkan. A, r. 91)
- 37- Tişteki min heye, gûyê wê dermanê nexweşa ye. Ev çi ye? **[Hingiv]**, (Alkan. A, r. 92)
- 38- Tişteki min heye, mirov bi sedan kilo xwê bikelîne jî dîsa bê xwê dimîne.**[Hêk]**, (Alkan. A, r. 92)
- 39- Mamikê mino, siwarê hespê ye, çavê her kesê lê ye, kes nizane qismetê kê ye. Çi ye? **[Arwan]**, (Sadinî. M.X , r. 14)
- 40- Mamikê mino, ew di hundirê malê da, mal di hundurê wê da. Çi ye? **[Hêk]**, (Sadinî. M.X , r. 61)
- 41- Mamê min e, lawê zer e, yê di qesra spî da. Çi ye? **[Hêk]**, (Sadinî. M.X , r. 61)
- 42- Tiştikê mino tiştî, dermanê hemû tiştî.Çi ye? **[Hingivîn]**, (Sadinî. M.X , r. 69)
- 43- Mamikê mino, metelok metît e, porsil kete ortê te. Çi ye? **[Îprax, pelê dagirtî]**, (Sadinî. M.X , r. 70)
- 44- Germ e û nerm e, doxîne jê bikêşe dane ber me, xwarina wê lazim e, li ser me. Çi ye? **[Kêpare-paçe]**, (Sadinî. M.X , r. 76)
- 45- Mamikê mino, pirt-pirt dikim, ker-ker dikim, hindî dixwim, qed têr nabim. Çi ye? **[Şekir]**, (Sadinî. M.X , r. 130)
- 46- Tiştê mino tiştanî, elamet e silamet e, pir qîmet e. Çi ye? **[Nanê kuçik û tenûran ve]**, (Sadinî. M.X , r. 168)
- 47- Mamikê mino, esmerê sê kiras li berê, du spî ne yek zerê. **[Hêk]**, (Sadinî. M.X , r. 168)
- 48- Mamikê mino, gûyê mêşan, xwarina axan. Çi ye? **[Hingivîn]**, (Sadinî. M.X , r. 179)
- 49- Mamikê mino, ne kulek e ne der, tê da bûka zer. Çi ye? **[Hêk]**, (Sadinî. M.X , r. 183)
- 50- Mamikê mino, qesra bêder, sê perde ketine ber, du spî ne yek zer. Çi ye? **[Hêk]**, (Sadinî. M.X , r. 201)
- 51- Bê bismillah ket ber dinana, qêrîn kir erş û ezmana. **[Nan]**, (Güneş. K, r. 29)
- 52- Bîrek heye, tê de du cure av heye. **[Hêk]**, (Güneş. K, r. 33)
- 53- Derî navika da te, gû dî nav rihêt bavî te. **[Duhnê meşkê-nivîşik]**, (Güneş. K, r. 44)
- 54- Diçize lê nabihîze. **[Hêk]**, (Güneş. K, r. 53)

- 55- Diavêjim tencerê/quçxanê naşike, diavêjim pencerê dişike. [**Kutîlk**], (Güneş. K, r. 54)
- 56- Em çûyîn bêriyê, ma anî teji têrê. [**Şîr**], (Güneş. K, r. 56)
- 57- Ew ji malê derdikeve, mal jî ji wê derdikeve. [**Hêk**], (Güneş. K, r. 59)
- 58- Ga mexel dibe, gayê dorê zer dibe. [**Zilfet**], (Güneş. K, r. 62)
- 59- Îskender e, sê cilê wî hene, du spî yek zer e. [**Hêk**], (Güneş. K, r. 77)
- 60- Mirî sax derdikeve, sax mirî derdikeve. [**Hêk**], (Güneş. K, r. 97)
- 61- Quncikê tarî, berf lê barî. [**Eyarê toraqê**], (Güneş. K, r. 105)
- 62- Qubba bêkulek. [**Hêk**], (Güneş. K, r. 106)
- 63- Qam tune kum şîn e, çavbeloq e lê nabîne. [**Hêk**], (Güneş. K, r. 106)
- 64- Şêr dixwim, newêrim herim cihê şer. [**Nanê binê agir**], (Güneş. K, r. 120)
- 65- Tenûra dadayî, tije nanê badayî. [**Şeran-beniyê sipî**], (Güneş. K, r. 126)
- 66- Xaniyekî gilover û spî, bê pencre, roj in û derf, tê de rûniştiye bûkeke zerf. [**Hêk**], (Güneş. K, r. 134)
- 67- Kelpik çû ma dan. [**Danê meyrê**], (Kan. Ş, r. 26)
- 68- Ez dikelênim xwe têximê şor nabe, ez derdixim xwe têximê şor dibe. [**Hêk**], (Kan. Ş, r. 26)
- 69- Serî rêx binî rêx, jê dertê xwarina şêx. Ev çi ye? [**Hingiv**], (Kan. Ş, r. 26)
- 70- Tiştêkî min heye, sor e sor e hemis e, bê qul e avis e, ev çi ye? [**Hêk**], (Kan. Ş, r. 27)
- 71- Mamigê mino mamani, kalê Misûrani, jiniga Deştelanî. [**Teîn û dims**], (Eren. M, r. 23)

## 9. Mamikên li Ser Amûr û Alavan

Gelek cureyên amûran hene, ji ber wê me xwest ku em çend binbeşan di bin vê sernavê de vekin da ku mirov baştir têbigehê ka kîjan amûr ji bo çi tê bikaranîn. Bi rêya van mamikan zarok dê bi rehetî hîn bibe ka kîjan amûr ji bo kîjan karî tê bikaranîn.

### 9.1. Amûrên Şer û Çandiniyê

Me di bin vê sernavê de şer û çandinî bi zanetî bi hev re nivîsî. Çimkî hin amûrên ku pê çandinî hatine kirin, bûne amûrên şerî yan jî berevajî wê, amûrên şerî ji bo çandiniyê jî hatine bikaranîn. Mînak: bivir, çape, das, tevir û hwd. Amûrên ku navên wan di mamikan de diborin, ev in: “Tifeng, gule, gûzan, bivir, das, milhêb, xencer, tirpan, hincar, rext, gîsin, şûr, rim, keleş, matora avê, tevir, tevşo, barût, top, rext û fişenk”

- 1- Dema jêhel diçit berê wî li jurda, dema jurda diçit berê wî li jêhel. [**Tifeng**], (Berwarî. M, r. 60)
- 2- Tenûra metê, pelek ketê destê kesê nagehtê. [**Tifeng**], (Berwarî. M, r. 60)
- 3- Mirovê bi lingekî çû şerê gundekî. [**Tifeng**], (Berwarî. M, r. 60)
- 4- Deve orya, pişkul fırya. [**Tifeng**], (Berwarî. M, r. 60)
- 5- Ker zirrî, posil/pişkil firrî. [**Tifeng**], (Berwarî. M, r. 60)
- 6- Marê mirî, tirr kirî. [**Tifeng**], (Berwarî. M, r. 60)
- 7- Bi qûnê dixot, bi devî dirît. [**Tifeng**], (Berwarî. M, r. 60)
- 8- Tiştêkî min heye, dev dirêj e, xwîn dirêj e, dest diavêjmê ber diavêje. [**Tifeng**], (Berwarî. M, r. 60)
- 9- Çûm serê darê, diqutim bizmarê, deng diçit hizarî. [**Tifeng**], (Berwarî. M, r. 60)
- 10- Tiştêkê min tiştan e, heke te dest havêtê dengê şeşan e, heke te dest jê berda, mirî ye û ruh tê nîne. [**Tifeng**], (Berwarî. M, r. 60)
- 11- Di ser avê ra diçit ter nabit. [**Tifeng**], (Berwarî. M, r. 60)
- 12- Duxkê vizê, çu ber bizê. [**Gule**], (Berwarî. M, r. 60)
- 13- Kûr tê ji dûr tê, gava vedireşe xwîn tê. [**Gule**], (Berwarî. M, r. 60)
- 14- Bizn/ga hêstira melay, çu serê çiyay, nehêla daveka giyay. [**Gûzan/mus**], (Berwarî. M, r. 62)
- 15- Êşoyê qûnxwar, çu serê latê, lat îna xwar. [**Gûzan/mus**], (Berwarî. M, r. 62)
- 16- Gulkê melay, zilek nehêla li serê çiyay. [**Gûzan/mus**], (Berwarî. M, r. 63)
- 17- Berxika serê çiyay, nahêlit daveka giyay. [**Gûzan/mus**], (Berwarî. M, r. 65)
- 18- Temerê/Emerê leng, li çiyay kire deng. [**Bivir/das**], (Berwarî. M, r. 65)
- 19- Xalê min ê xala, dojminê kendala. [**Bivir/das**], (Berwarî. M, r. 65)
- 20- Qeşê bi lingekî, çu şerê gundekî. [**Bivir/das**], (Berwarî. M, r. 65)
- 21- Qasimê qûnxwar, çu şerê dar, dar anî xwar. [**Bivir/das**], (Berwarî. M, r. 65)
- 22- Çûme serê banekî, min berê xwe da aqarekî, 7 kilîlên di devê marekî. [**Milhêb**], (Berwarî. M, r. 71)
- 23- Çûme rêkekê, rêk li darekê, 7 kilîlên di devê marekî. [**Milhêb**], (Berwarî. M, r. 71)
- 24- Vî alî dar, wî alî dar, di nav da 2 têşkêt har. [**Xencer**], (Berwarî. M, r. 74)
- 25- Ga di gelî da, gelî dirizit, ga narizit. [**Xencer**], (Berwarî. M, r. 74)
- 26- Pirça pê pen, da nav reza, rez xwe pêça. Ew çi ye? [**Kêlendî**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 425)
- 27- Helotirr, melotirr, sîng sipî yê mil kutir, li hemî zevya dikit tirr. [**Tirpan/şalok**], (Berwarî. M, r. 74)



- 28- Mam Hesenê bi lingekî, çû şerê gondekî. [**Tirpan/şalok**], (Berwarî. M, r. 74)
- 29- Şeq şeq şeqşeqî, kete erdî, erd peqî. [**Hevcar/hincar**], (Berwarî. M, r. 74)
- 30- Dane quta qutayî, li rêza kara danayî, bo xolamêt axayî. [**Rext**], (Berwarî. M, r. 60)
- 31- Sivê heta êvarê nava xalîyê da ne, êvarê tê ji bûka malê rindtir e. Ew çi ye? [**Gîsin**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 426)
- 32- Qulçkê terî, dû lê barî, Ew çi ye? [**Tiving**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 430)
- 33- Kûr tê, dûr tê, vedireşe xûn tê. Ew çi ye? [**Tiving**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 430)
- 34- Ker zirî, tersel firî, kê keve dibe mirî. Ew çi ye? [**Tiving**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 430)
- 35- Odeke şuştî mûştî, axekî tê da rûniştî. Ew çi ye? [**Şûr**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 431)
- 36- Serî dar e, binî dar e, ortê da sekî har e. Ew çi ye? [**Şûr**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 431)
- 37- Tişteki min heye, diçe qurê, naçe têrê. Ew çi ye? [**Rim**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 431)
- 38- Diçim serê çiyakî, dibe orêna gakî. [**Tiving**], (Gazî. M, r. 16)
- 39- Êrvist e, dar û bist e, heftê û heft zalim hatin neêxiste. [**Tifeng**], (Gazî. M, r. 18)
- 40- Ji dûr tê, kûr tê, vedireşe xwîn tê. [**Keleş**], (Gazî. M, r. 20)
- 41- Li vî alî text, li wî alî text, di ortê da kalekî bêbext. [**Kalan û şûr**], (Gazî. M, r. 23)
- 42- Mamka mino, çil çilî bin devî [**Dasik**], (Gazî. M, r. 25)
- 43- Marê mirî tirkî kirî. [**Tiving**], (Gazî. M, r. 25)
- 44- Serdirêj e, qûnqelêş e, dest didemê ber davêje. [**Tiving**], (Gazî. M, r. 28)
- 45- Tişkî heye diore, bişkul ji dev difire. [**Tiving**], (Gazî. M, r. 31)
- 46- Tişteki min heye, di jêr re dixwe, di jor re davêje. Ev çi ye? [**Tiving**], (Alkan. A, r. 78)
- 47- Tişteki min heye, ne şûr e wek mertal e, bi qulp e ne guhar e, di malê bin kewar e. Ev çi ye? [**Das**], (Alkan. A, r. 86)
- 48- Tişteki min heye, di qûnê re dixwe, di devê re davê. Ev çi ye? [**Tiving**], (Alkan. A, r. 93)
- 49- Tişteki min heye, serî hesin e, binî dar e, çîya û banî tîne xware. Ev çi ye? [**Bivir**], (Alkan. A, r. 106)
- 50- Tûj e weke kêr e, lê bi xêr û bêr e. [**Dasa paletîyê**], (Akbaş. E, r. 68)
- 51- Ji vê ve dar e, ji wê ve dar e, yê di nav de seyê har e. [**Kalan û xencer**], (Akbaş. E, r. 69)
- 52- Mamikê mino, ez çûm newalekî, dihat nalenala birîndarekî. Çi ye? [**Bivir**], (Sadinî. M.X, r. 27)

- 53- Mamê mino, ez çûme serê milekî, min kir hişkehewarekî, sed mêr hatin bi carekî. Çi ye? [**Doxa tevr**], (Sadinî. M.X , r. 35)
- 54- Mamikê mino, spêdê ta êvarê, axê bi serê xwe da dike, derdikeve wekî bûkan. Çi ye? [**Gêsin**], (Sadinî. M.X , r. 52)
- 55- Tiştêk min heye tiştanî, tê re bike spî dibe, bîne der reş dibe. Çi ye? [**Gêsin**], (Sadinî. M.X , r. 52)
- 56- Çûme serê banekî, min berê xwe da aqarekî, heft beq di devê marekî. Çi ye? [**Malêb**], (Sadinî. M.X , r. 93)
- 57- Mamikê mino, gîskê gurî, li ser avê nirî. Çi ye? [**Matora avê**], (Sadinî. M.X , r. 94)
- 58- Mamikê mino, golkê melayî, zilek nehêla, li serê çiyayî. Çi ye? [**Şaluk-das**], (Sadinî. M.X , r. 128)
- 59- Mamikê mino, mahîna melayî, berdan çiyayî, zilek nehêlayî. Çi ye? [**Şaluk-das**], (Sadinî. M.X , r. 129)
- 60- Mam Hesenê bi lingekî, çû serê gundekî. Çi ye? [**Şaluk**], (Sadinî. M.X , r. 129)
- 61- Tiştikê mino tiştanî, melayê bi lingekî, çû serê gundekî. Çi ye? [**Tevir-tevrî**], (Sadinî. M.X , r. 137)
- 62- Mamikê mino, ho dibêjim tevşo dibêjim, bi nav dikim lê nabêjim. Çi ye? [**Tevşo**], (Sadinî. M.X , r. 137)
- 63- Mamikê mino, tiştêkî min heye, ji qûnê dixwe, ji dev diavêje. Çi ye? [**Tiveng**], (Sadinî. M.X , r. 140)
- 64- Tiştêkî min e, binî dixwe, serî diavêje. Çi ye? [**Tiving**], (Sadinî. M.X , r. 140)
- 65- Mamikê mino, hir ve dar, wê ve dar, yê di nav da seyê har. Çi ye? [**Xencer**], (Sadinî. M.X , r. 142)
- 66- Mamikê mino, reş e wek bizin, hûr e wek erzin, mîr û hakim ji ber dilerizin. Çi ye? [**Barût**], (Sadinî. M.X , r. 154)
- 67- Mamikê mino, ho ve mil e wê ve mil e, yê di nîvekê de mîr kovil e. Çi ye? [**Xencer-şûr**], (Sadinî. M.X , r. 154)
- 68- Marê mirî, deng jê birî. Çi ye? [**Tiving**], (Sadinî. M.X , r. 156)
- 69- Mamikê mino, ban çerm e bagirdan asin. Çi ye? [**Çermê serî û gûzan**], (Sadinî. M.X , r. 162)
- 70- Mamikê min ê lingdar, çû ser darê xwar. Çi ye? [**Tevşo**], (Sadinî. M.X , r. 174)
- 71- Mamikê mino, hû ve dar e wê ve dar e, wê di nav de seyê har e. Çi ye? [**Şîr**], (Sadinî. M.X , r. 180)
- 72- Mamikê mino, kûrka tarî, agir jê barî. Çi ye? [**Tiveng**], (Sadinî. M.X , r. 184)

- 73- Mamikê mino, hindî xwe kurê werdidet, her paqij e. Çi ye? [**Gêsin**], (Sadinî. M.X , r. 187)
- 74- Mamikê mino, li çiya deng didet, li malê pal didet. Çi ye? [**Bivir**], (Sadinî. M.X , r. 188)
- 75- Mamikê mino, vî rexî text wî rexî text, nav da merê bêbext. Çi ye? [**Şîr**], (Sadinî. M.X , r. 193)
- 76- Mamikê mino, diçîte mistê, naçîte teştê. Çi ye? [**Tiving**], (Sadinî. M.X , r. 212)
- 77- Mamikê mino, bejna wê bejna bûkan, hêka wê hêka çûkan. Çi ye? [**Tiving**], (Sadinî. M.X , r. 213)
- 78- Bizina hinar, baz da zinar, sî û sê gulî anî xar. [**Dasa dara an jî jîlet**], (Güneş. K, r. 40)
- 79- Bi şev bi roj dixebite mînanî bûk e, ji eynikê rindtir e. [**Kutan, gêsin**], (Güneş. K, r. 34)
- 80- Çûm nava dehlekî, hat xişîna marekî. [**Tiving**], (Güneş. K, r. 40)
- 81- Çûm ser diyarekî, min dest pê kir karekî, beqek di devê marekî. [**Melhêb**], (Güneş. K, r. 41)
- 82- Dikutim bizmarekî, deng diçe hezarekî. [**Tifing**], (Güneş. K, r. 43)
- 83- Din li dinê ket, piyana şamî li erdê ket. [**Top**], (Güneş. K, r. 46)
- 84- Dirêj enirî, fişqî jê firî. [**Tiving**], (Güneş. K, r. 52)
- 85- Ez çûm ser zinarekî, tiliya min ket qulekî, dengê min çû hezarekî. [**Tiving**], (Güneş. K, r. 57)
- 86- Heft zift, heft zir zift, heft degene û heft megene. [**Kutan-gêsin**], (Güneş. K, r. 68)
- 87- Heta êvarê axê li serê xwe dike, lê dîsa jî ji berê paqijtir e. [**Gêsin**], (Güneş. K, r. 74)
- 88- Ji sibê hetanî êvarê, di bin erdê re diçe, lê dîsa jî eynikê zaftir dibiriqe. [**Gêsin**], (Güneş. K, r. 77)
- 89- Kofiya xezalê, kilîlî bû çû devê newalê. [**Top**], (Güneş. K, r. 83)
- 90- Li malê piştî xwe dide dîharê/dîwar seqîn, li çolê dikê teqîn. [**Bivir**], (Güneş. K, r. 89)
- 91- Li serê carekî, kuta bizmarekî, deng çû hezarekî. [**Gulle**], (Güneş. K, r. 91)
- 92- Li çiyê deng dide, tê li malê pal dide. [**Bivir**], (Güneş. K, r. 92)
- 93- Li gund bê deng e, li daristanê bi deng e. [**Bivir**], (Güneş. K, r. 93)
- 94- Ho dibêm tevşo dibêm, nav hildidim nabêjim. [**Tevşo**], (Güneş. K, r. 94)
- 95- Odeyek şûştî mûştî, axayek tê de rûniştî. [**Şûr**], (Güneş. K, r. 101)

- 96- Qulçê tarî, dû lê barî. [**Tiving**], (Güneş. K, r. 105)
- 97- Qolana li piştê ye, dendik tê de bi rêzê ye. [**Rext û fişek**], (Güneş. K, r. 106)
- 98- Seyê har çû dar. [**Bivir**], (Güneş. K, r. 111)
- 99- Serî reş e binî reş e, dest davêjim ber davêje. [**Tiving**], (Güneş. K, r. 114)
- 100- Ser nikul e, dide xweş agir e. [**Tetik tivingê**], (Güneş. K, r. 118)
- 101- Tûj e weke kêr e, lê pir bi xêr û bêr e. [**Dasa nana**], (Güneş. K, r. 127)
- 102- Porsorê erdê dikole, çi ye? [**Tevir**], (Kan. Ş, r. 13)
- 103- Bejna wê bejna bûkan, hêka wê hêka çûkan. Ew çi ye? [**Tiving**], (Baskın. M.Ş, r. 20)

## 9.2. Amûrên Hûr ên Kar û Barên Malê

Amûrên ku bi destekî tên girtin, wek amûrên hûr hatine senifandin. Ji ber ku ev amûr di kar û barên malê de tên bikaranîn, ne dûrî alema zarokan in. Zarok her gav dibînin, meraq dikin ka ji bo çi karî tên bikaranîn û ji mezinên xwe jî dipirsin. Amûrên ku li vir hatine vegotin ev in: “Meqes, lempe, kil û kildan, pare, teşî, derzîk, şûjin, kefçik, gura rîsî û şîşik, piyale, neynik, çekoçê şekirşikandinê, sabûn, qelûn, xizêm, saet, kilîl, çadan, tizbî, telhe, şe, heste, dûzan, telefon, kevçîdanik, kibrît, şimik, derzîdank, miqilk, dusten, bizmar, mûm, çirîk û bed, niftik, hene, ta, rîs, lembeya xazê, parzûng”

- 1- Min darekê 2 gulte, da nav lingêt babê te, li wê ra hebû qîçqîça da/diya te. [**Meqes**], (Berwarî. M, r. 64)
- 2- 2 têrra, 2 vêrra, çilfindê, hay çilfindê. [**Meqes**], (Berwarî. M, r. 64)
- 3- Hemzêko, di piştê xwe ve neko. [**Meqes**], (Berwarî. M, r. 64)
- 4- Stûna 2 gulte, dana bin ritlêt babê te, bo çîzçîza deyka te. [**Meqes**], (Berwarî. M, r. 64)
- 5- Heta tu tilêt xo nekeye di çavêt gurgî ra, mihê naxot. [**Meqes**], (Berwarî. M, r. 64)
- 6- Tilya tirî, xanî tijî/run kirî. [**Lempe/çira-Momik-Fanos-Lox**], (Berwarî. M, r. 65)
- 7- Tiştêkî min heye biçûk e, lê tijî odekê ye. [**Lempe/çira-Momik-Fanos-Lox**], (Berwarî. M, r. 65)
- 8- Tiştêkê min heye li ser refîkê, dide defîkê. [**Lempe/çira-Momik-Fanos-Lox**], (Berwarî. M, r. 65)
- 9- Tijî çengekî, tijî xaniyekî. [**Lempe/çira-Momik-Fanos-Lox**], (Berwarî. M, r. 65)
- 10- Xanima ser kursî, dixwe nanê bi tursî. [**Lempe/çira-Momik-Fanos-Lox**], (Berwarî. M, r. 65)
- 11- Ser zêr e, aqil ker e. [**Lempe/çira-Momik-Fanos-Lox**], (Berwarî. M, r. 65)

- 12- Behrek av, marek li nav, teyrek li hindav. [**Lempe/çira-Momik-Fanos-Lox**], (Berwarî. M, r. 65)
- 13- Temet tiblekî, pir dikit odekî. [**Lempe/çira-Momik-Fanos-Lox**], (Berwarî. M, r. 65)
- 14- Ez çûme bi rê da, birkeka di rê da, marekê tê da, çûçkeka di devî da, ew mar bi wê avê dijît, ew çûçik bi marî dijît. [**Lempe/çira-Momik-Fanos-Lox**], (Berwarî. M, r. 65)
- 15- Heke kaniyê mar têda bit dê zêt, heke derket nazêt. [**Lempe/Çira-Momik-Fanos-Lox**], (Berwarî. M, r. 65)
- 16- Tiştêkî mino tişt e, av e ne av e, marê mirî li nav e, teyrê zêrî li hindav e. [**Lempe/çira-Momik-Fanos-Lox**], (Berwarî. M, r. 65)
- 17- Av e ne av e, marê reşê li tav e, taca zêrî li hindav e. [**Lempe/Çira-Momik-Fanos-Lox**], (Berwarî. M, r. 65)
- 18- Bîr ji çermî, dolik ji darî, av ji berî. [**Kil û kildan**], (Berwarî. M, r. 65)
- 19- Ji berî reqtir e, ji şekirê şirîntir e. [**Pare**], (Berwarî. M, r. 65)
- 20- Serî gupal e, nêvekê bêder e, binî tîruk e. [**Teşî**], (Berwarî. M, r. 66)
- 21- Tiştê mino, direqîsit, ne dixot ne vedixot. [**Teşî**], (Berwarî. M, r. 66)
- 22- Ser stûr e bin zirav. [**Teşî**], (Berwarî. M, r. 66)
- 23- Hu diken hu diken, şula qûna te diken. [**Derzîk/şûjin**], (Berwarî. M, r. 66)
- 24- Çav tune lê dimeşe, ling tune lê şop dihêle. [**Derzîk/şûjin**], (Berwarî. M, r. 66)
- 25- Ser kunê bin tîj. [**Derzîk/şûjin**], (Berwarî. M, r. 66)
- 26- Şervan dixemlîne, hemû ji wî dirazîne, lê bixwe rût û tazîn e. [**Derzîk/şûjin**], (Berwarî. M, r. 66)
- 27- Dêlka harî, çû koneka tarî, îna derî hestiyê binê pê marî. [**Derzîk/şûjin**], (Berwarî. M, r. 66)
- 28- Dihilhête te, dadihête te, reprepîskê xwe dibete te. [**Kefçîk**], (Berwarî. M, r. 66)
- 29- Deyka te heru qefteka kîra dişut. [**Kefçîk**], (Berwarî. M, r. 66)
- 30- Ker bi bar ve çû di şkeftê ve. [**Kefçîk**], (Berwarî. M, r. 66)
- 31- Ew diçe hundir, gewde dimîne li derve li dûr. [**Kefçîk**], (Berwarî. M, r. 66)
- 32- Deve bi bar çû zinar? [**Kefçîk**], (Berwarî. M, r. 66)
- 33- Pênc bira qesrekê ava diken. [**Gura rîsî û şîşîk**], (Berwarî. M, r. 66)
- 34- Sê heb birayên hev in, her roj çavên hevdû derdixînin. [**Gura rîsî û şîşîk**], (Berwarî. M, r. 66)

- 35- Tişteki min heye tiştanî, ne pê heye ne panî, her roj diçe kanî. [**Piyale**]<sup>219</sup>, (Berwarî. M, r. 67)
- 36- Ew di hundirê malê de, mal di hundirê wê de. [**Neynik/eynik**], (Berwarî. M, r. 67)
- 37- Şewqa wê da newqa min. [**Neynik/eynik**], (Berwarî. M, r. 67)
- 38- Bi şevê nabiriqe, bi rojê dibiriqe. [**Neynik/eynik**], (Berwarî. M, r. 67)
- 39- Çûme rêlewarekî, birim serê darekî, kirime qaziyê şarekî. [**Çekoçê şekirşikandinê**], (Berwarî. M, r. 67)
- 40- Li ser destan dişimite, dikeve çav dişewite. [**Sabûn**], (Berwarî. M, r. 71)
- 41- Ji ser ve nivêj, ji bin ve qirêj. [**Baskê cigara**], (Berwarî. M, r. 73)
- 42- Ya zer e, li guştî hate der e, ya bi per e, ya kêr ser e. [**Xizêm**], (Berwarî. M, r. 75)
- 43- Cuwa darî kutela axê tijî xwelî. [**Sebîl/qelûn**], (Berwarî. M, r. 75)
- 44- Ka disojit, kadîn dimînit. [**Sebîl/qelûn**], (Berwarî. M, r. 75)
- 45- Sê tas in, sê bintas in, sê neynik in, sê reqas in. [**Seet**], (Berwarî. M, r. 75)
- 46- Ne dixwe ne jî radizê, bi şev û rojê dixebite, tu carî nasekine. [**Seet**], (Berwarî. M, r. 75)
- 47- Çêlek diçe avê, çêlek avê naxwe, kapê wê avê dixwe. Ew çi ye? [**Çira**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 424)
- 48- Ro betilî, şev xemilî. Ew çi ye? [**Çira**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 424)
- 49- Berê fûr da, misûr çiv da, gulek derket, nûrek dêv da. Ew çi ye? [**Çira**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 424)
- 50- Her her dîwar, mermer dîwar, her odekê yeke kubar. Ew çi ye? [**Lemp**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 424)
- 51- Diya te heru, hinde rapêç dikit. [**Durka derî/kilîl**], (Berwarî. M, r. 69)
- 52- Hindî dikêşit, xilas nabit. [**Tizbî**], (Berwarî. M, r. 74)
- 53- Pîrê tê nava cumetê, heta mîza xwe neke naçe. [**Çadan/qorrî**], (Berwarî. M, r. 76)
- 54- Dê bi hirhir, bav bi zirzir, kero bê qantir. [**Çadan/qorrî**], (Berwarî. M, r. 76)
- 55- Ser dês e, bin dês e, çeqil û meqil bi xirnês e. [**Telhe**], (Berwarî. M, r. 65)
- 56- Tişteki min heye di rê da, yê sax hat pê da, yê mirî, sax li erdê da. [**Telhe**], (Berwarî. M, r. 65)
- 57- Cot bira ne, du diran e, ew çi ye? [**Meqes**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 427)
- 58- Tişteki min heye, ez destê xwe didime dêlê, devê xwe vedike. Ew çi ye? [**Meqes**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 427)

<sup>219</sup> Bêtir ji bo mesîn û cer jî dibe.

- 59- Dar bê ruh diçe mêş e, ruh tîne. Ew çi ye? [**Şe**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 427)
- 60- Ga diçe aş, poçka wê naçe aş. Ew çi ye? [**Kevçî**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 427)
- 61- Tiştêkî min heye, dê li berok, bav li berok, çêjka tîne sor û zerok, ev meselok, kê da derok? [**Kevir, heste**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 427)
- 62- Tendûr axîn, dûkêşk darîn, babhêrk çermîn. Ew çi ye? [**Qeylûn**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 427)
- 63- Qutu qutê, pêz xarkê. Ew çi ye? [**Dûzan**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 427)
- 64- Pênc bira ne, dêrekê çê dikin, birakê undabe, her çar nikarin çê kin. Ew çi ye? [**Şîşkê gora**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 430)
- 65- Bin dar, ser bar. Ew çi ye? [**Teşî**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 430)
- 66- Ava hindik, bîra qolîk, werîsê kinîk. [**Çira**], (Gazî. M, r. 13)
- 67- Çûçika belek, xeber da felek. [**Telefon**], (Gazî. M, r. 15)
- 68- Dar li ser darê, hinar li ser hinarê, rist li serê ristê bihust e. [**Teşî**], (Gazî. M, r. 15)
- 69- Dest dimê, bustkê dikimê. [**Kilîle**], (Gazî. M, r. 16)
- 70- Eliyê dirêj tije qirêj. [**Qelûn**], (Gazî. M, r. 17)
- 71- Her ro diya min dest û gunnê Ereba dişo. [**Kevçî**], (Gazî. M, r. 19)
- 72- Hespa boz e, rişme li poz e. [**Derzî**], (Gazî. M, r. 19)
- 73- Hino bi çavkî. [**Şûjin**], (Gazî. M, r. 20)
- 74- Hûtê çû ser darê, gulî anî xwarê. [**Makîna teraşê**], (Gazî. M, r. 20)
- 75- Ker û bar ve diçe, dûvikê wê naçe. [**Kevçî**], (Gazî. M, r. 21)
- 76- Kera bi bar çû bin zinar. [**Kevçî û şiv**], (Gazî. M, r. 21)
- 77- Kozka kara, wa l'nizara. [**Kefçîdanîk**], (Gazî. M, r. 22)
- 78- Lemê lem da, behrê kef da, mar çû, marezerk di dev da. [**Lembe**], (Gazî. M, r. 23)
- 79- Lemê lem da, kefê kef da, mar hat marmasî di dev da. [**Çira**], (Gazî. M, r. 23)
- 80- Mamikê min ê mamani, serî steyr e, binî behr e. [**Lampe**], (Gazî. M, r. 24)
- 81- Min avêt çiya neşikiya, min avêt avê şikya. [**Pêlê cixarê**], (Gazî. M, r. 25)
- 82- Şil dike, rep dike, tê re dike. [**Derzî û ta**], (Gazî. M, r. 30)
- 83- Şûtî min şemitî te, hatî min, ketî te. [**Kevçî**], (Gazî. M, r. 30)
- 84- Tabûtîkî da çil heb mirî hene. [**Kibrît**], (Gazî. M, r. 30)
- 85- Tişkî min hey e li kevir dixim naşkê, li avê dixim dişkê. [**Pelê cixara**], (Gazî. M, r. 32)
- 86- Tişkî min heye mere dihere ber, mere dibe dudu. [**Neynik**], (Gazî. M, r. 32)
- 89- Tiştêkî min heye qasî mewijkî, hindirkî tije dike. [**Çira**], (Gazî. M, r. 33)
- 90- Tiştêkî min heye; bi şev bûk e, bi roj pepûk e. Ew çi ye? [**Lembe**], (Alkan. A, r. 75)

- 91- Tişteki min heye; barê wê barê devê ye, qama wê qama kerê ye. Ev çi ye? [**Şimik**], (Alkan. A, r. 76)
- 92- Tişteki min heye, çîz dikim diçikînim, li dîwêr dadiliqînim. Ev çi ye? [**Derzîdank**], (Alkan. A, r. 77)
- 93- Tişteki min heye, dix dirêj e nare tûr. Ev çi ye? [**Miqilk, tawe**], (Alkan. A, r. 78)
- 94- Tişteki min heye, kalê bi çavekî. Ev çi ye? [**Şûjen**], (Alkan. A, r. 85)
- 95- Tişteki min heye, pê digirim tere axir, pê nagirim naçe axir. Ev çi ye? [**Kevçî**], (Alkan. A, r. 87)
- 96- Tişteki min heye, qam pano, bê devo, sed dirano. Ev çi ye? [**Şeh**], (Alkan. A, r. 87)
- 97- Tişteki min heye, serê wê minare, nava wê cehnem e, binê wê behr e. Ev çi ye? [**Lempe**], (Alkan. A, r. 89)
- 98- Tişteki min heye, sê mele bi şaşikekê. Ev çi ye? [**Dusten**], (Alkan. A, r. 90)
- 99- Tişteki min heye, şil dikin, çik dikin, tê re dikin. Ev çi ye? [**Ta û derzî**], (Alkan. A, r. 91)
- 100- Tişteki min heye, şil tê re derbas dikin, ziwa dertê. Ev çi ye? [**Ta û derzî**], (Alkan. A, r. 91)
- 101- Tişteki min heye, serî di dîwêr de ye, binî di hundur de ye. Ev çi ye? [**Bizmar**], (Alkan. A, r. 91)
- 102- Tişteki min heye, bi qasî tiliyekê av bikeve ser difetise. Ev çi ye? [**Mûm**], (Alkan. A, r. 92)
- 103- Tişteki min heye, serkêş e ne mele ye, cemeeta wî heye, yek bi dû yekî daye, lê di destê kala de ye. Ev çi ye? [**Tizbî**], (Alkan. A, r. 88)
- 104- Tişteki min heye, bi roj carî ye, bi şev xatûn e. Ev çi ye? [**Lempe**], (Alkan. A, r. 96)
- 105- Tişteki min heye, mirov bi dawiya wî digre, ew devê xwe ji hev vedike. Ev çi ye? [**Meqes**], (Alkan. A, r. 97)
- 106- Tişteki min heye, bi doxa wî digrim, bixwe tere axwir. Ev çi ye? [**Dev û kevçî**], (Alkan. A, r. 101)
- 107- Tişteki min heye, lem lem da, buhar bê xem ma, mar hat masî di dev da. Ev çi ye? [**Lempe**], (Alkan. A, r. 104)
- 108- Mamikê mino, tişteki min heye, serî di dîwar de ye, binî di hundur de ye. Çi ye? [**Bizmar**], (Sadinî. M.X , r. 27)



- 109- Tiştekek heye, heke bigirî mistek, heke berdî deştekek. Çi ye? [**Çira**], (Sadinî. M.X , r. 34)
- 110- Mamikê mino, du ebareşan, daye kaşekî. Çi ye? [**Çirîk û bed**], (Sadinî. M.X , r. 34)
- 111- Mamikê mino, çêlek diore, golik mezin dibe. Çi ye? [**Çirîk**], (Sadinî. M.X , r. 34)
- 112- Mamikê mino, ho dike ho dike, li dora qûna te dike. Çi ye? [**Derzî**], (Sadinî. M.X , r. 38)
- 113- Mamikê mino, çik dikim diçikînim, li dîwêr dadiliqînim. [**Derzîdank**], (Sadinî. M.X , r. 38)
- 114- Tiştekekî min heye, bindarê serasin, kero dirêj ke. Çi ye? [**Dirîşkê pînedoz**], (Sadinî. M.X , r. 45)
- 115- Mamikê mino, ker bi bar ve diçe jor, lê kurrî naçe jor. Çi ye? [**Kevçî**], (Sadinî. M.X , r. 77)
- 116- Mamikê mino, pê digirim diçe axur, pê nagirim naçe axur. Çi ye? [**Kevçî**], (Sadinî. M.X , r. 78)
- 117- Pêşî stûr e, dawî zirav e, wexta dikeve, qula mubarek, rehetî dikeve canê mirov. Çi ye? [**Kevçî**], (Sadinî. M.X , r. 78)
- 118- Mamikê mino, hero deyka te, qewdek şîşkan dişo. Çi ye? [**Kevçî**], (Sadinî. M.X , r. 78)
- 119- Mamikê mino, kanî çerm e, av ber e, dolik dar e. Çi ye? [**Kil**], (Sadinî. M.X , r. 81)
- 120- Tiştekekî min heye, bi roj bûk e, bi şev pepûk e. Çi ye? [**Lempe**], (Sadinî. M.X , r. 91)
- 121- Mamikê mino, ho dike ho dike, li derê bazaran kar dike. Çi ye? [**Meqes**], (Sadinî. M.X , r. 96)
- 122- Tiştekekî min heye, mirov dûvê wê digire, ew devê xwe vedike, dike çîreçîr. Çi ye? [**Meqes**], (Sadinî. M.X , r. 96)
- 123- Mamikê min î, pira darîn î, koça axîn î, xwerê wê giyayê şîn î. Çi ye? [**Qelûn**], (Sadinî. M.X , r. 117)
- 124- Mamikê mino, tenûra axînî, dûkêşka darînî, bû buhurkek çermînî. Çi ye? [**Qelûn**], (Sadinî. M.X , r. 118)
- 125- Tiştekekî min ji tiştan e, deh bira ne, kerek dinê ava dikin. Çi ye? [**Şîşkê gorê**], (Sadinî. M.X , r. 131)

- 126- Mamikê mino, ji zikê deyka xwe derdikeve, pišta bavê xwe dixurîne. Çi ye? [**Şîşkên gora**], (Sadinî. M.X , r. 132)
- 127- Mamikê mino, mahîna li canî, caniya li banî. Çi ye? [**Şixatik, niftik**], (Sadinî. M.X, r. 132)
- 128- Mamikê mino, kêla bi çavekî. Çi ye? [**Şûjin**], (Sadinî. M.X , r. 133)
- 129- Mamikê mino, dox dirêj e, naçe tûr. Çi ye? [**Tawe**], (Sadinî. M.X , r. 133)
- 130- Tiştikê mino tiştan e, teng e bikêşî teng e, bavêjî teng e, hema her teng e. Çi ye? [**Teşî**], (Sadinî. M.X , r. 136)
- 131- Tiştikê min e ji tiştan e ji bin ve spîndar e, serda meydan e, serê wê kofixar e. Çi ye? [**Teşî**], (Sadinî. M.X , r. 136)
- 132- Tiştikê mino direqîse, ne dixwe ne vedixwe. Çi ye? [**Teşî**], (Sadinî. M.X , r. 137)
- 133- Mamikê min e, sed û yek bira ne, rîvyek bi tenê ye. Çi ye? [**Tizbî**], (Sadinî. M.X , r. 141)
- 134- Mamikê mino, bi şevê kesk dîkin, bi rojê sor dîkin. Çi ye? [**Hene, xene**], (Sadinî. M.X , r. 142)
- 135- Mamikê mino, dizivirît wekî aş e, diket şûlê mîr û paşe. Çi ye? [**Teşî**], (Sadinî. M.X , r. 154)
- 136- Mamikê mino, dayik asin bab ber e, jê diçît gurya zer e. Çi ye? [**Çeqmaq**], (Sadinî. M.X , r. 165)
- 137- Tiştê mino tiştanî, destberîk û destberîk, destberîk û hulîsîk. Çi ye? [**Sabîn**], (Sadinî. M.X , r. 166)
- 138- Mamikê mino, du yekê ve yek yekê ve, pindirê fiskê rêkê ve. Çi ye? [**Meqes**], (Sadinî. M.X , r. 167)
- 139- Mamikê mino, heta hindê nebe te, çi nadete te. Çi ye? [**Kevçî**], (Sadinî. M.X , r. 172)
- 140- Mamikê mino, cot bira ne, bê didan e. Çi ye? [**Meqes**], (Sadinî. M.X , r. 175)
- 141- Mamikê mino, çar bira ne, di xetekê de cotî diken. Çi ye? [**Şîşikên gora**], (Sadinî. M.X , r. 175)
- 142- Mamikê mino, serî mist e, binî rist e. Çi ye? [**Teşî**], (Sadinî. M.X , r. 176)
- 143- Mamikê mino, dizê jûr ve serê der ve. Çi ye? [**Bizmar**] , (Sadinî. M.X , r. 177)
- 144- Mamikê mino, ji çûçikê biçûktir e, ji minarê dirêjtir e, ji derziyê ziravtir e. Çi ye? [**Guloka ta**], (Sadinî. M.X , r. 180)
- 145- Mamikê mino, serî dişidînim bin vedibît. Çi ye? [**Meqes**], (Sadinî. M.X , r. 189)

- 146- Mamikê mino, baxçekî dehlê me heye, keteka xwar tê da nîne. Çi ye? [**Şeh**], (Sadinî. M.X , r. 192)
- 147- Mamikê mino, heft gira gerî, li xwe vegerî. Çi ye? [**Derzî**], (Sadinî. M.X , r. 198)
- 148- Mamikê mino, yek çengî tijî xanî. Çi ye? [**Şemal**], (Sadinî. M.X , r. 203)
- 149- Mamikê mino, çûme aşekî kes lê ne, min pirsyar kir çu av û hevran lê ne, min gotê tu çi tişt î? Got: ez hesabdarê dinê me. Çi ye? [**Saet, demhijmêr**], (Sadinî. M.X , r. 204)
- 150- Mamikê mino, pênc bira ne, hindî dibezin, yek û dû ra nagehin. Çi ye? [**Gulajena rîsî**], (Sadinî. M.X , r. 205)
- 151- Mamikê mino, kebanî her roj serê zava dişot. Çi ye? [**Kevçî**], (Sadinî. M.X , r. 207)
- 152- Mamikê mino, çalika qutik, tijî av. Çi ye? [**Çira**], (Sadinî. M.X , r. 214)
- 153- Mamikê mino, serî sorê qiyametê, binî behra elametê. Çi ye? [**Çira**], (Sadinî. M.X, r. 217)
- 154- Tişteke min heye tiştanî, di heft kaş û newala diqulibî. Çi ye? [**Derzî**], (Sadinî. M.X, r. 218)
- 155- Tişteke min heye, binî behr e, serî agir e. Çi ye? [**Lembe**], (Sadinî. M.X , r. 218)
- 156- Tişteke min heye, bîr çermînî, av axînî, dewl narînî, çi ye? [**Kildan**], (Sadinî. M.X , r. 219)
- 157- Tişteke min heye, reş e ji reşan, keft nav mûyê diya te yê reş, reşa reş kir, dilê diya te xweş kir. Çi ye? [**Kil**], (Sadinî. M.X , r. 219)
- 158- Tişteke min heye, spîndarok e, serê spîndarê panavek e, serê panavê gopalek e. Çi ye? [**Teşî**], (Sadinî. M.X , r. 219)
- 159- Aspa şîn, hemû kullehên serî şîn. [**Şixate-kîbrît**], (Güneş. K, r. 25)
- 160- Mamgî minî mamanî, aşê dêm çi ye? [**Saet**], (Güneş. K, r. 26)
- 161- Bê rih diçe, rihan tîne. [**Şeh û sipih**], (Güneş. K, r. 29)
- 162- Bi şevê dibiriqe, bi rojê nabiriqe. [**Lambe**], (Güneş. K, r. 29)
- 163- Bîr çermînî, av axînî, dewl darînî. [**Kildank- kilçov**], (Güneş. K, r. 31)
- 164- Bi roj dibetilê, bi şev dixemilê. [**Çira**], (Güneş. K, r. 34)
- 165- Çil derzî, çil û çar derzî, qula derziyê de bezî. [**Ta**], (Güneş. K, r. 37)
- 166- Çil mêvanê şuştî, li ba hev rûniştî. [**Neftik-kîbrît**], (Güneş. K, r. 38)
- 167- Çav tune lê dimeşe, ling tune lê şop dihêle. [**Derzî**], (Güneş. K, r. 38)
- 168- Çar çarox, bîst û çar bendeçarox. [**Nal û bizmar**], (Güneş. K, r. 41)
- 169- Çiz dikim diçikînim, li dîwêr dialiqînim. [**Derzîdank**], (Güneş. K, r. 41)

- 170- Çar bira nin, her çar jî di xetekî de cot dikin. [**Şîşkên gora**], (Güneş. K, r. 41)
- 171- Dest dêxim qûnê, dev ji hev vedibe. [**Meqes**], (Güneş. K, r. 43)
- 172- Dixwe û dixwe narî. [**Meqes**], (Güneş. K, r. 44)
- 173- Diçim nava dehlekî, tev şivê rast in. [**Şeh**], (Güneş. K, r. 46)
- 174- Deve tev bêr/bar, narê axûr. [**Kevçîk**], (Güneş. K, r. 49)
- 175- Dar e, li ser darê hinar e, li ser hinarê kopal e, li ser kopalê rist e, li ser ristê kulumist e. [**Teşî**], (Güneş. K, r. 50)
- 176- Digere digere rêç tune, difetile difetile toz û dûman tune. [**Saet**], (Güneş. K, r. 53)
- 177- Dirêj e spîndar e, di ser de rist e, di bin de mist e. [**Teşî**], (Güneş. K, r. 55)
- 178- Ez hespê xwe dibim avê, hesp avê venaxwê, kapê wî avê vedixwe? [**Lembeya Xazê**], (Güneş. K, r. 57)
- 179- Ez çûm aşkî aş dêm e, min got: aşo tu çi aş î? Aşî got: ez hesabdarê dinê me. [**Demjimêr**], (Güneş. K, r. 56)
- 180- Ez çûm Gite, min anî stûna du gulte, min êxist navrana bavê te, bî çirçira diya te. [**Meqes**], (Güneş. K, r. 57)
- 181- Eywana şuştî mûştî, bûkek tê de rûniştî. [**Lambe**], (Güneş. K, r. 58)
- 182- Ew diçe hundur, gewde dimîne li derve dûr. [**Kevçî**], (Güneş. K, r. 58)
- 183- Êr/ar berdî kadîne ka dişewite, kadîna naşewite. [**Qelûn**], (Güneş. K, r. 60)
- 184- Guhê wê badidim, zimanê wê dertê. [**Fitîla lambeyê**], (Güneş. K, r. 62)
- 185- Gurî ket nav firaqê, min berdayê bi şirmaqê. [**Sabûn**], (Güneş. K, r. 66)
- 186- Hespê boz e, rişme li poz e. [**Derzî û ta**], (Güneş. K, r. 69)
- 187- Hingî tiliyekê ye, yep xaniyekê ye. [**Çira**], (Güneş. K, r. 72)
- 188- Himber tilikê, teji mezelkê. [**Çira**], (Güneş. K, r. 73)
- 189- Hewşika tengik, tijî eskerê kinik. [**Niftik û derbikên wê**], (Güneş. K, r. 75)
- 190- Jineke kurt û mêrekî dirêj, bi rê ve diçin şev û roj? [**Saet**], (Güneş. K, r. 81)
- 191- Ji çûkê biçûktir e, ji minarê bilindtir e, ji derziyê ziravtir e? [**Giloka ta**], (Güneş. K, r. 82)
- 192- Kerê bi bar, çû qulika zinar. [**Kevçî**], (Güneş. K, r. 83)
- 193- Kumikê xezalê, gêr bû newalê. [**Teşî**], (Güneş. K, r. 84)
- 194- Li kuç didim naşkê, li avê didim dişkê. [**Kaxiz-pelkê cixarê**], (Güneş. K, r. 88)
- 195- Li teht û zinaran wer dikî namire, avê lê dikî dimire. [**Pelê cixarê**], (Güneş. K, r. 89)
- 196- Li ser destan dişemite, dikeve çav dişewite. [**Sabûn**], (Güneş. K, r. 90)
- 197- Li Amedê şîr rijiya, bêhna wî hat vira. [**Têlêfon**], (Güneş. K, r. 91)

- 198- Li ser refikê, ronî dide defikê. [**Çira**], (Güneş. K, r. 91)
- 199- Li vir xîşt, li ardê din qûna xwe almoşt. [**Şijing**], (Güneş. K, r. 92)
- 200- Masî çiv da, behrê kef da, nal sekinî, dil xeber da. [**Saet-demjimêr**], (Güneş. K, r. 96)
- 201- Ne dixwe ne radizê, ne bîn digire ranaweste, ew bê razan û west e. [**Katjimêr, demjimêr, saet**], (Güneş. K, r. 100)
- 202- Pênc heb xwişk, koşkekê çê dikin. [**Şîşikê gorê**], (Güneş. K, r. 102)
- 203- Pênc heb xalên min henin, li dora çalekî direqisin. [**Şîşikên goreyê û gore**], (Güneş. K, r. 102)
- 204- Pêdevê pêezmanê, hemî wexta dizanê. [**Saet**], (Güneş. K, r. 103)
- 205- Pîrê tê nava civatê, hetanî mîza xwe neke naçê. [**Çaydan**], (Güneş. K, r. 103)
- 206- Polîs li hundir e, şewqeya wê li derve ye. [**Bizmar**], (Güneş. K, r. 104)
- 207- Serê wî kun e, devê wî tûj e. [**Derzî**], (Güneş. K, r. 115)
- 208- Şewqa wê da newqa min. [**Eynik**], (Güneş. K, r. 121)
- 209- Tehta da çû, av ê de çû. [**Paznûk, parzûng, safok**], (Güneş. K, r. 126)
- 210- Tişt tiştê tîne, kul evdî mişka tîne. [**Şeh**], (Güneş. K, r. 126)
- 211- Weke şahîna vedike birîna. [**Derzî**], (Güneş. K, r. 131)
- 212- Xwişka min her ro, baxek çavik dişo. [**Kevçî**], (Güneş. K, r. 133)
- 213- Xatûna ser kursî, naxwe nanê tirsî. [**Çira**], (Güneş. K, r. 134)
- 214- Yek tabût, tê de vezelîne çil kesê tebût. [**Niftik**], (Güneş. K, r. 136)
- 215- Zerik goştinî, girar qîrînî, hesko darînî. [**Kildank-kil û kilçov**], (Güneş. K, r. 137)
- 216- Hiltîto miltito, sivûriyê dûv rûto. [**Derzî**], (Toprak. Ö, r. 25)
- 217- Xelkê hemûan bi kinc/cil û berg dike, bi xwe tazî ye. Çi ye? [**Derzî**], (Kan. Ş, r. 11)
- 218- Tiştêkî min heye, dimeşe bê ling e, tazî ye tiştêkî li xwe nake, tim şiyar e qet ranazê. Çi ye? [**Derzî**], (Kan. Ş, r. 12)
- 219- Çalka kutik, tijî eskerkê ser reşik. [**Kiftik, derbik, kibrît**], (Kan. Ş, r. 12)
- 220- Mamikê minî mamanî, yekî serê xwe li serê te û diya te da. Ew çi ye? [**Şeh, şe**], (Kan. Ş, r. 15)
- 221- Ne derî ne cobarî, hesinê hesavdarî. Ew çi ye? [**Demjêmir**], (Baskin. M.Ş, r. 20)
- 222- Mamigê mino mamanî, zerik goştinî, girar qîrînî, hesko darînî. [**Kil û kildank**], (Eren. M, r. 11)

223- Mamigê mino mamanî, çêrogê çêrvanogê, pîrga mi çû gozbelogê<sup>220</sup>, ji wî ve hat serî li stûnê ket, bara mi ji ber piştêngê ket. [**Pere**], (Eren. M, r. 12)

### 9.3. Amûrên Gir ên Kar û Barên Malê

Ji van amûran ên ku di nav malê de û yên ku li derveyî malê ne jî hene. Zarok ji van mamikan dê fêrî navên amûrên gir bibin, navên cuda yên heman amûran bibin. Xisûsiyetên van mamikan û nêrîna civakê ya li ser van amûran dê fêr bibin. Amûrên ku hatine nasandin ev in: “Terazî, destar, mesîn, derî, sivnik, bagurdan, meşk, conî, himban, semawir, dolik, mîrku, dolab, zengil, şixarte, dergûş, mencel, sêl, werîs, sobe, tekerê erebê, kam, muxil, dîz, sîtil, beroş, elek, serad, tevn, refîk û çura, mêrdewar, sac, cêr, mîrku, teşt, şal, sîwan, xortim, sepet, sîtil, kursî, sing, mişar, gurbik, şehîn.”

1- Ecêb e lew ecêb e, mahîna şeş rikêb e, koriyeka bi dûv ve, êka bi piştê ve. [**Tirazî**], (Berwarî. M, r. 59)

2- Heldim, heldim, şeş pê û du sim. [**Tirazî**], (Berwarî. M, r. 60)

3- Benik benik, şeş benik, yek derik, du kodik. [**Tirazî**], (Berwarî. M, r. 60)

4- Sê ben û defek, 2 def û darek. [**Tirazî**]<sup>221</sup>, (Berwarî. M, r. 60)

5- Şeş bend û bendikek, darek û 2 dewil û kutilkek. [**Tirazî**], (Berwarî. M, r. 60)

6- Sindorûka li ser sindorûkê, kilîla di destê bûkê. [**Distar**], (Berwarî. M, r. 61)

7- Ez çûme Elkûşka/oda, tax, xanî jêrî, min dît jina li ser mêrî, min gutê dê çi lê key? Gut: Dê înim nêrî. [**Distar**], (Berwarî. M, r. 61)

8- Berek li ser berekê, teyrek dixûnit li dolekê, kuna qûnê li nêvekê. [**Distar**], (Berwarî. M, r. 61)

9- Te dibeme lateka asê, di kunê diqutim lûliya dasê. [**Distar**], (Berwarî. M, r. 61)

10- Babê mirî kîrê rep. [**Mesîn**], (Berwarî. M, r. 62)

11- Ji ser ve qîrêj ji bin ve nivêj. [**Mesîn**], (Berwarî. M, r. 62)

12- Ji Heleb û Wan tê, bo qûna babê te tê. [**Mesîn**], (Berwarî. M, r. 62)

13- Hu dikit hu dikit, bo derê qûna te şul dikit. [**Mesîn**], (Berwarî. M, r. 62)

14- Navê wî zerbenduk e, yê bi kulav û dersok e. [**Mesîn**]<sup>222</sup>, (Berwarî. M, r. 62)

15- Heru dîkil te difîsînit. [**Dergih**], (Berwarî. M, r. 62)

16- Qeşê bi riha ve hilawîstî. [**Dergih**], (Berwarî. M, r. 62)

17- Tiştêkê min heye bi rihên xwe ve li dar xistiye. [**Dergih**], (Berwarî. M, r. 62)

18- Apê minê rû kurkirî, şev û rojê bi dar ve kirî. [**Dergih**], (Berwarî. M, r. 62)

---

<sup>220</sup> Kulîlkek e.

<sup>221</sup> Şaşî tê de heye.

<sup>222</sup> Nêzikî mamika pîvok û hêkê ye.

- 19- Heta bab kîrê xwe nekêşit, biçûk nanivit. **[Dergih]**, (Berwarî. M, r. 62)
- 20- Mamê min bi lingekî, hemberî gundekî. **[Dergih]**, (Berwarî. M, r. 62)
- 21- Babê te li ser kîrê xwe dizivrit. **[Dergih]**, (Berwarî. M, r. 62)
- 22- Bapîrê te her spêdê heta êvarî li ser binê xwe dizivrit. **[Dergih]**, (Berwarî. M, r. 62)
- 23- Qeşê rih dirêj. **[Cerîfk/sivnik]**, (Berwarî. M, r. 63)
- 24- Tişt û mişt, çû li wêra he rûnişt. **[Cerîfk/sivnik]**, (Berwarî. M, r. 63)
- 25- Xişt û xişt/mişt çû dira/wêra he rûnişt. **[Cerîfk/sivnik]**, (Berwarî. M, r. 63)
- 26- Kir xişt e xişt, çû dira he rûnişt. **[Cerîfk/sivnik]**, (Berwarî. M, r. 63)
- 27- Uşe keru, bi dû min ra weru. **[Bagurdan/pangor]**, (Berwarî. M, r. 63)
- 28- Zivistanê bi şul, havînê betal. **[Bagurdan/pangor]**, (Berwarî. M, r. 63)
- 29- Hîno mîno, du qîno. **[Bagurdan/pangor]**, (Berwarî. M, r. 63)
- 30- Pê pano, li ser bano. **[Bagurdan/pangor]**, (Berwarî. M, r. 63)
- 31- Ço kero, hevsar zero, li dû min wero. **[Bagurdan/pangor]**, (Berwarî. M, r. 63)
- 32- Ne ker e, ne maker e, hefsarî bide ser e, hêdî hêdî li berî herr e. **[Bagurdan/pangor]**, (Berwarî. M, r. 63)
- 33- Helbet helbet, ava li bana şilqa vedidet, Şileymûnkê kata ji xwe didet. **[Bagurdan/pangor]**, (Berwarî. M, r. 63)
- 34- Deng jê dihêt, rih tê ne. **[Meşk]**, (Berwarî. M, r. 68)
- 35- Dema mast didimê, bi reqasa xwe re nîvişk li min vedigerîne. **[Meşk]**, (Berwarî. M, r. 68)
- 36- Sê lingo di siyê da, du lingo pê da, devê wî li ber zikê diya te, gûyê wî di devê heftê bavê te, tu çawa dikî kêfa te. **[Meşk]**, (Berwarî. M, r. 68)
- 37- Tipên e xoş tipên e, du dest in du pê ne, deng jê tê ruh tune. **[Meşk]**, (Berwarî. M, r. 68)
- 38- Ser nişîv e, ling li hewa, spêdê radibin ji ber xew e, karê bêrîvana ew e. **[Meşk]**, (Berwarî. M, r. 68)
- 39- Tişteke min ji tiştê, derê wî li dayka te, gûyê wî dide devê babê te. **[Meşk]**, (Berwarî. M, r. 68)
- 40- Marhulîsê di kurê da dilîze. **[Dest conî]**, (Berwarî. M, r. 68)
- 41- Hir ve ber û wir ve ber, yê di nîvê da mîr Omer. **[Dest conî]**, (Berwarî. M, r. 68)
- 42- Mamê memo, bi lingekî, çû şerê gundekî. **[Malhisînk]**<sup>223</sup>, (Berwarî. M, r. 69)
- 43- Du dest in, du pê ne, qalib e ruh tê ne. **[Himban]**, (Berwarî. M, r. 69)

<sup>223</sup> Ji bo bivir û dasê jî tê gotin.

- 44- Diya te heru, Erebê kîrreş dihavête ser xu. [**Kunê avê/cewdik**], (Berwarî. M, r. 69)
- 45- Binî qul e, serî qul e, di nav de av û agir e. [**Semawir**], (Berwarî. M, r. 70)
- 46- Vekirî kon e, girtî gopal e. [**Sêwan/şemsî**], (Berwarî. M, r. 70)
- 47- Şerbikê pîrê, çû binê bîrê. [**Dewil/dolik**], (Berwarî. M, r. 70)
- 48- Tep tep dike, şeq şeq dike, genim bê sitar dike. [**Mîrkut**], (Berwarî. M, r. 70)
- 49- Gayê li nav govê nivistî, pezê li dûv qûnê ve damiştî. [**Dolab**], (Berwarî. M, r. 72)
- 50- Hildidim digirî, datînim aşt dibî. [**Zengil**], (Berwarî. M, r. 72)
- 51- Sed terim yê di tabîtekê da. [**Şixarte**], (Berwarî. M, r. 74)
- 52- Çûm bajarê lakêşe, hemî mirovên li wir, ser sor in bin sipî ne. [**Şixarte**], (Berwarî. M, r. 74)
- 53- Ji zigê diya xwe derdikevit, piştî babê xwe diperixînit. [**Şixarte**], (Berwarî. M, r. 74)
- 54- Diya mirî, devê beş. [**Mencilok/dergûş**], (Berwarî. M, r. 74)
- 55- Hêr ve ax, wêr ve ax, di nav da mîr bidax. [**Cerê rûnî**], (Berwarî. M, r. 74)
- 56- Ho dilivit, ho dicivit, ezman nîne pê baxivit. [**Lanik**], (Berwarî. M, r. 74)
- 57- Herîşan û perîşan, cihê axa û feqîran. [**Lanik**], (Berwarî. M, r. 74)
- 58- Siwarê me bi nîşan e, li ser maîna bê giyan e. [**Lanik**], (Berwarî. M, r. 74)
- 59- Helhey har e, reşwêley siyar e. [**Mencela ser agirî**], (Berwarî. M, r. 75)
- 60- Ebdekê hey yê reş e bi guhar e. [**Sêl**], (Berwarî. M, r. 75)
- 61- Dirêj e ne mar e, kej û hît e ne kar e, serî hişk e ji dar e. [**Werîs**], (Berwarî. M, r. 76)
- 62- Apkê minî rû kurkirî, şev ro dardakirî. Ew çi ye? [**Derî**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 423)
- 63- Kalê rizî, darda kirî. Ew çi ye? [**Derî**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 423)
- 64- Rûko darda. Ew çi ye? [**Derî**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 423)
- 65- Tiştêkî min heye, dardan, rûtan. Ew çi ye? [**Derî**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 423)
- 66- Sê nig e, stû xar, wedê wî çar meh e. Ew çi ye? [**Sobe**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 423)
- 67- Vira xişt li wira xişt, çû dera han kulê lê da kuşt. Ew çi ye? [**Gêzî**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 423)
- 68- Yek, dudu, sisê, çar, ew in bira ne bê par. Ew çi ye? [**Tekerê erebê**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 425)
- 69- Çar bira ne, herdê çûk direvin, ê mezin pê ra nagîhjin. Ew çi ye? [**Tekerê erebê**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 425)
- 70- Du serî ye, heyşt ling, ser dar e, binî kevir e. Ew çi ye? [**Kam**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 425)



- 71- Çi dixot bi serê xo werdikit. [**Muxil**], (Berwarî. M, r. 75)
- 72- Tiştêkê hey li dinê, hindî bikenê têr nabit. [**Muxil**], (Berwarî. M, r. 75)
- 73- Ezmanê darîn e, berfê dibarîne. [**Muxil**], (Berwarî. M, r. 75)
- 74- Babê mirî biçwîk û miçîwîka serê pêvenay yên bo diken girî. [**Garîte**], (Berwarî. M, r. 62)
- 75- Xalê minî lingekî, dajo garana gundekî. Ew çi ye? [**Mêkut**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 426)
- 76- Huldum duldum, çar pê du sim. Ew çi ye? [**Mêzîn**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 426)
- 77- Şeş bend, du kod, darek. Ew çi ye? [**Mêzîn**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 426)
- 78- Hildidim digrî, datînim nagrî. Ew çi ye? [**Zengil**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 426)
- 79- Helîle babû, reşêle sîyar bû, zarê malê tev pê şa bûn. Ew çi ye? [**Dîza ser tendûrê**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 426)
- 80- Helhele ba bû, reşêle sîyar bû, çûk û mezinê malê tev pê şa bûn. Ew çi ye? [**Sîtîla xarinê ser êgir**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 426)
- 81- Wî alî hesin, vî alî hesin, ortê da mîrekî mezin. Ew çi ye? [**Beroş û şîr**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 426)
- 82- Serî reşêle binî reşêle, taqlatîzo, çirtêle. Ew çi ye? [**Meşk**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 429)
- 83- Wexta sax e gîhê dixwe, wexta dimire şeravê vedixwe. Ew çi ye? [**Hîz**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 429)
- 84- Tiştêkî min heye, ser dezî, stu dezî, stûnê ve bezî, kire gazî, go: “Şivano, gur hate pezî.” Ew çi ye? [**Elek**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 429)
- 85- Tiştêk heye tiştanî, ne pê heye, ne penî, hero hero diçe kanî. Ew çi ye? [**Cêr**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 429)
- 86- Qotir çû mala Babir, ser kire giregir. Ew çi ye? [**Destar**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 429)
- 87- Zik ser zik, zikî kunê, şuxulê jinê. Ew çi ye? [**Destar**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 430)
- 88- Çîz tê çîzevîz tê, teq tê, teqereq tê, gur tê bi guregur tê, rev tê bi reva gur tê. Ew çi ye? [**Bangeran**], (Gazî. M, r. 15)
- 89- Darole darole, ortasî çermole, qaqlovîsko çirtole. [**Dewkul**], (Gazî. M, r. 16)
- 90- Dûv daro, qul hezaro. [**Serad**], (Gazî. M, r. 17)
- 91- Emerê lingekî, hat şerê gundekî. [**Mêkut**], (Gazî. M, r. 17)
- 92- Hemzêko, piştê xwe veneko. [**Çîtîk, gêzî, melkes**], (Gazî. M, r. 19)
- 93- Ji min qalintir e, ji rêsiyê gîha siviktir e. [**Meşk**], (Gazî. M, r. 20)

- 94- Keçika du kezî, ser serbanî ve bezî. [**Bangur, bangeran**], (Gazî. M, r. 21)
- 95- Kerê kur çû afir. [**Mêkut**], (Gazî. M, r. 21)
- 96- Kudinikê du qûnik. [**Bangeran**], (Gazî. M, r. 22)
- 97- Mamikê min ê mamanî, ji têrê ye, ji rêrê ye û ji kêrê ye. [**Bangur**], (Gazî. M, r. 24)
- 98- Misîniko, du quliko. [**Bageran**], (Gazî. M, r. 25)
- 99- Mamikê min ê mamanî, sê bira lêk difeke. [**Kuçik**], (Gazî. M, r. 25)
- 100- Pîrikek min heye, ji sibê heya êvarê pînan/pehînan li xwe dixê. [**Sêla nan**], (Gazî. M, r. 26)
- 101- Qol damançe, li nav baxçe. [**Siviya sergîna**], (Gazî. M, r. 27)
- 102- Serî zirav, dûv dirêj e. [**Sope**], (Gazî. M, r. 28)
- 103- Serîkî kurkirî, di binê diya te da kirî. [**Tevn**], (Gazî. M, r. 28)
- 104- Simsimo, qasimo. [**Sivnik û carût**], (Gazî. M, r. 29)
- 105- Sindirûk li ser sindirûkê, qefil û miftik li ser destê bûkê. [**Destar**], (Gazî. M, r. 29)
- 106- Sî û sê bar hilanî, qe li eynê xwe dananî. [**Sêl**], (Gazî. M, r. 29)
- 107- Sûk li ser sûk, mefte da dest bûk. [**Destar**], (Gazî. M, r. 30)
- 108- Teq tê teqeteq tê, çîz tê çîzovîz tê, sewt tê sewta gur tê. [**Bangeran**], (Gazî. M, r. 31)
- 109- Tişkî min heye ez didimê dixo, nedimê naxo, ew çi ye? [**Sobe**], (Gazî. M, r. 31)
- 110- Tişkî min heye cûno du qûno. [**Loq, bangeran**], (Gazî. M, r. 32)
- 111- Tişt mişt çû li pišta derî rûnişt. [**Sivnik**], (Gazî. M, r. 33)
- 112- Tişkî min heye pišta wê tim girêdayî ye. [**Melkez**], (Gazî. M, r. 33)
- 113- Tişteki min heye, ez çûm newalekî, dihat nalenala birîndarekî. Ev çi ye? [**Bivir**], (Alkan. A, r. 79)
- 114- Tişteki min heye, her êvar tu gûyê xeftanreşê dixwî, Ev çi ye? [**Xwarin û beroş**], (Alkan. A, r. 82)
- 115- Tişteki min heye, hebana dayê, li navberê maye. Ev çi ye? [**Sobe**], (Alkan. A, r. 83)
- 116- Tişteki min heye, li ser şahfik, li ser dahfik. Ev çi ye? [**Refik û çura**], (Alkan. A, r. 85)
- 117- Tişteki min heye, sinsil li ser sinsil, nifte di destê bûkê da ye. Ev çi ye? [**Destar**], (Alkan. A, r. 88)
- 118- Tişteki min heye, reşê ji bizina me ye, çar lingê wê heye, gûyê wê li devê e ye. Evçi ye? [**Meşk**], (Alkan. A, r. 88)
- 119- Tişteki min heye, bi sê lînga ye. Ev çi ye? [**Destar**], (Alkan. A, r. 92)

- 120- Tişteki min heye, xişt û mişt, çû li quncikê rûnişt. Ev çi ye? [**Melkes, gêzik**], (Alkan. A, r. 98)
- 121- Tişteki min heye, zik li ser zik e bê serî ye, bê destî û bê pî ye, bêjing hevalê wî ye. Ev çi ye? [**Destar**], (Alkan. A, r. 99)
- 122- Tişteki min heye, kewara reş, mirov li ber dibe xweş. Ev çi ye? [**Sobe**], (Alkan. A, r. 102)
- 123- Tişteki min heye, xatûnekî kirasreş, tama deva dike xweş. Ev çi ye? [**Beroş, qûşxane**], (Alkan. A, r. 102)
- 124- Tişteki min heye, pêk pêk, danî li ber xanî. Ev çi ye? [**Mêrdewar**], (Alkan. A, r. 102)
- 125- Mamikê mino, kero kero, kayê dikem bero, hêdî hêdî dibêmê wero. Çi ye? [**Bangeran**], (Sadinî. M.X , r. 21)
- 126- Tiştê mino tişt e, li dûv te ra xiştexişt e, ne ber e ne pişt e. Çi ye? [**Bangeran**], (Sadinî. M.X , r. 21)
- 127- Mamikê mino, şimînê darqûn, anko dibêjim, şimin e dar li qûn e. Çi ye? [**Bangeran**], (Sadinî. M.X , r. 21)
- 128- Tiştê tiştê, li dûv min were, ne ker e ne maker e. Çi ye? [**Banger**], (Sadinî. M.X , r. 21)
- 129- Mamikê mino, du lingo bi rê ket, çîzo vîzo bi dû ket. Çi ye? [**Bangeran**], (Sadinî. M.X , r. 22)
- 130- Mamikê mino, mar hilûsî di kunê da, heçî yê hat hingek lê da. Çi ye? [**Conî**], (Sadinî. M.X , r. 28)
- 131- Mamikê mino, hil hil e, di hil hilî de ne. Çi ye? [**Conî**], (Sadinî. M.X , r. 28)
- 132- Mamikê mino, mela bi rihan hilawistî ye. Çi ye? [**Dergih**], (Sadinî. M.X , r. 38)
- 133- Çûm malkên jêrî, jinê xwe diavêt ser mêrî, min got: dê çi lê kî, got: dê înim nêrî. Çi ye? [**Destar**], (Sadinî. M.X , r. 39)
- 134- Mamikê mino, ew ê çê dike nebûye, ew ê bikire bi kar nîne, ew ê bi kar tîne nabîne. Çi ye? [**Destar**], (Sadinî. M.X , r. 39)
- 135- Mamikê mino, zik li ser zik, darik di devê tizik. Çi ye? [**Destar**], (Sadinî. M.X , r. 40)
- 136- Mamikê mino, xişt û xişt çû cem derî rûnişt. Çi ye? [**Gêzî**], (Sadinî. M.X , r. 53)
- 137- Mamikê mino, Hemzeko, piştê xwe veneke. Çi ye? [**Gêzik**], (Sadinî. M.X , r. 53)
- 138- Mamikê mino, giroverê bi giranî, rûniştiye li ser xanî. Çi ye? [**Gindor**], (Sadinî. M.X , r. 54)

- 139- Tiştikê mino, hel hele har bû, reşole siwar bû. Çi ye? [**Kuçik-qazan**], (Sadinî. M.X, r. 84)
- 140- Mamikê mino, ê mirî yê sax hildigire. Çi ye? [**Landik**], (Sadinî. M.X , r. 90)
- 141- Mamikê mino, lê da hitik, ketî kudik, bo ji dil mexnik. Çi ye? [**Meşk**], (Sadinî. M.X , r. 98)
- 142- Denê wê li denê te da, gûyê wê li nav rihên babê te. Çi ye? [**Meşk**], (Sadinî. M.X , r. 99)
- 143- Ser li nişîva, ling li hewa, spêdê radibin ji xewa, karê bêrîvana ewa. Çi ye? [**Meşk**], (Sadinî. M.X , r. 99)
- 144- Mamikê mino, hindî dayika tepê da dide, dirîte bi xwe ve. Çi ye? [**Moxil**], (Sadinî. M.X , r. 106)
- 145- Mamikê min e, kevilê ga ye, di avê de maye, ne nimya ye. Çi ye? [**Sac**], (Sadinî. M.X , r. 123)
- 146- Mamikê mino, min birayek heye, herro diçe malekê. Çi ye? [**Sêl**], (Sadinî. M.X , r. 123)
- 147- Mamikê min e, sê mela bi şaşkekê. Çi ye? [**Sêpiya meşkê**], (Sadinî. M.X , r. 123)
- 148- Mamikê mino, du bend û bendilkek e, du nan û kutilkek e. Çi ye? [**Terazî**], (Sadinî. M.X , r. 135)
- 149- Mamikê mino, dileyize lê nabeze. Çi ye? [**Terazî**], (Sadinî. M.X , r. 136)
- 150- Mamikê mino, adlim Didim, şeş pê û du sim. Çi ye? [**Terazî**], (Sadinî. M.X , r. 161)
- 151- Mamikê mino, mamanî, bapîrê min lingekî, diket şerê gundekî. Çi ye? [**Der**], (Sadinî. M.X , r. 162)
- 152- Mamikê mino mamanî, bê pê ye ser banî, qûn tîjtir e ji didanî. Çi ye? [**Bagurdan**], (Sadinî. M.X , r. 163)
- 153- Mamikê mino, kalê pîr, civata mîr. Çi ye? [**Semawer**], (Sadinî. M.X , r. 173)
- 154- Tiştekan min heye tiştanî, ne dest pê ve ne panî, heroj diçît ser kanî. Çi ye? [**Cêrê avê**], (Sadinî. M.X , r. 186)
- 155- Mamikê mino, kun ser kunê, şûlê jinê. Çi ye? [**Destar**], (Sadinî. M.X , r. 187)
- 156- Mamikê mino, Ehmedê lingekî, diket şerê gundekî. Çi ye? [**Mîrkut**], (Sadinî. M.X, r. 190)
- 157- Mamikê mino, şeş ben û benik, du nan û kutilk. Çi ye? [**Terazî**], (Sadinî. M.X , r. 192)

- 158- Mamikê mino, sê ling û sê dar, çar ling pê da, du pê hat û hîmek lê da. Çi ye? **[Meşk û sêdar]**, (Sadinî. M.X , r. 192)
- 159- Mamikê mino, esmanê tarî berf dibarî. Çi ye? **[Moxil]**, (Sadinî. M.X , r. 196)
- 160- Mamikê mino, arqulik û darqulik, deh û du qulik. Çi ye? **[Teşt]**, (Sadinî. M.X , r. 198)
- 161- Mamikê mino, girêbest e tijî dest e. Çi ye? **[Gêzî]**, (Sadinî. M.X , r. 198)
- 162- Mamikê mino, helhele ba bû, reşhêle siwar bû, piçûk û mezin pê şa bû. Çi ye? **[Satil]**, (Sadinî. M.X , r. 199)
- 163- Mamikê mino, melayê du şaşik serî. Çi ye? **[Bangeran]**, (Sadinî. M.X , r. 203)
- 164- Min tiştê heye, mîr û hakim pêş ve radibin. Çi ye? **[Gêzik, cerîfk]**, (Sadinî. M.X , r. 203)
- 165- Mamikê mino, teqteqê diket, reqreqê diket, karê bejn û balayê diket. Çi ye? **[Şal û şepikê pê çê dîkin]**, (Sadinî. M.X , r. 205)
- 166- Mamikê mino, reşo siwar bû, kulfetê malê pê şa bû. Çi ye? **[Beroş]**, (Sadinî. M.X , r. 217)
- 167- Atûrek du qûn. **[Lox-banger]**, (Güneş. K, r. 26)
- 168- Bi pişt e û bê zik e, bi dest e lê bê ling e, bi dev e bê didan e, bi çav e lê nabîne. **[Meşk]**, (Güneş. K, r. 29)
- 169- Bi şev xatûn e, bi roj qewraş e. **[Sivnik-milkis]**, (Güneş. K, r. 30)
- 170- Bê kinc e, pîna li xwe dike. **[Sêla nê]**, (Güneş. K, r. 32)
- 171- Çermê gayî, li ser avê nayî, ne nimhayî. **[Sêl-Sêlik]**, (Güneş. K, r. 39)
- 172- Çermê mirî, dev vekirî. **[Meşk]**, (Güneş. K, r. 41)
- 173- Datînim digirî, hildidim digirî, çawa dikim digirî. **[Zengil]**, (Güneş. K, r. 42)
- 174- Diya te dibê: çirr, bavê te dibê: zirr. **[Derî]**, (Güneş. K, r. 44)
- 175- Diya te her sibeh, qûnekî tazî deynê ser milê xwe. **[Cêrik]**, (Güneş. K, r. 45)
- 176- Dor dar, qul hezar. **[Moxil-bêjîng]**, (Güneş. K, r. 45)
- 177- Devê wê qasê devê te, gûyê wê li devê bavê te. **[Dewkil-meşk]**, (Güneş. K, r. 47)
- 178- Du xwêhikê/xwîşk min henin, Îlleh/her dem li hev dinêrin. **[Her du milên tîfikê]**, (Güneş. K, r. 48)
- 179- Darîni ye, mûyîni ye, hasinî ye. **[Mêzîn-şehîn û weqî]**, (Güneş. K, r. 50)
- 180- Ewrekî piçûk, dibarîne berfa pûk. **[Moxil]**, (Güneş. K, r. 58)
- 181- Eva deva hanê nakeve hundir, serê wê jê ke bila bikeve hundir. **[Sîwan]**, (Güneş. K, r. 59)
- 182- Gedekî min heye, her sibe destê min dişû. **[Misîn]**, (Güneş. K, r. 62)

- 183- Gloka mû bi havodo. [**Xortim**], (Güneş. K, r. 63)
- 184- Hilistan milistan, keça mîrê gulistan, ne memik e ne pizdan. [**Mêkew-sepet**], (Güneş. K, r. 67)
- 185- Hespê boz, meydanê dike toz. [**Mehtik-dergûş**], (Güneş. K, r. 69)
- 186- Hespê qeleng û du ling. [**Mehdik-dergûş**], (Güneş. K, r. 69)
- 187- Her gemo, mer gemo, bi şev û roj li ber çemo. [**Sîtil**], (Güneş. K, r. 74)
- 188- Hilerim bilerim, şeş pî û du ser im. [**Mêzîn**], (Güneş. K, r. 74)
- 189- Ji Bexdayê heta Bilîsê, keyf û xem li ser dirîsê. [**Telefon**], (Güneş. K, r. 78)
- 190- Ji darê ye, ji berê ye, ji biznê ye. [**Pembrûtik- banger**], (Güneş. K, r. 79)
- 191- Ji tetik teniktir e, ji kêran zeximtir e. [**Dewkil- Meşk**], (Güneş. K, r. 81)
- 192- Kalê li ser lingekî, dike xizmeta gundekî. [**Derî**], (Güneş. K, r. 84)
- 193- Kalê li ser lingekî, ho dike garana gundekî. [**Mêrkut û dan**], (Güneş. K, r. 84)
- 194- Kalê rû bi dar de çi ye? [**Derî**], (Güneş. K, r. 84)
- 195- Kela rûdar de çi ye? [**Derî**], (Güneş. K, r. 86)
- 196- Mamkê mino, kerê kerr çû afîr. [**Mîrkut-mêhkut**], (Güneş. K, r. 86)
- 197- Kewa kejo, li hewa re diajo. [**Sirsûm-meşk**], (Güneş. K, r. 86)
- 198- Keçika dukezî, serbanan ve bezî. [**Banger-bangur**], (Güneş. K, r. 87)
- 199- Li wî alî ber, li vî alî ber, di navê de mîr Emer. [**Mîrkut**], (Güneş. K, r. 92)
- 200- Li jor disekine, mirov ji berf û baranê diparêze. [**Sîwan**], (Güneş. K, r. 93)
- 201- Mirîşka dirûnê/rûdinê, radibe hêk nake. [**Textik-kursî**], (Güneş. K, r. 95)
- 202- Mange sor, şak ber jor. [**Meşk**], (Güneş. K, r. 97)
- 203- Nav mîna navê tazî, toponî mîna topono xîştiro. [**Terazî**], (Güneş. K, r. 100)
- 204- Mamgê mino, pap çû ma danê kutayî. [**Bêjîng**], (Güneş. K, r. 103)
- 205- Qefkî pûş, li pişt kevirkî tûj. [**Simnik-milkis**], (Güneş. K, r. 106)
- 206- Qesir ji goşt, derece ji hesin. [**Mêzên**], (Güneş. K, r. 107)
- 207- Singa min li singa te, Kî...ê min li qûna te. [**Gêresûk-destar**], (Güneş. K, r. 112)
- 208- Sê ling li erdê, çar lingê wê qiyamê/li ber jor ve, gûyê wê li devê dê û bavê te. [**Meşk**], (Güneş. K, r. 114)
- 209- Mamkê mino, sê bira daîmî difekin. [**Tifik-kuçik**], (Güneş. K, r. 116)
- 210- Serî li derve, binî di erdê de. [**Sing**], (Güneş. K, r. 117)
- 211- Sinbilûska li ser simbilûskê, destmala destê bûkê. [**Sivnik-milkis**], (Güneş. K, r. 119)
- 212- Şildim bildim, heşt pê du sim. [**Şehîn û kîlo**], (Güneş. K, r. 119)
- 213- Şilo milo kete qul û milo. [**Dewl û bîr**], (Güneş. K, r. 122)

- 214- Tiştêkî min heye, li nava malê ye, yek pê nizane. [**Sivnik**], (Güneş. K, r. 124)
- 215- Tiştêkî min heye, diçe nexşika li pey xwe çê dike. [**Lastîka pê**], (Güneş. K, r. 124)
- 216- Tiştêkî min heye, sê dev e, devê mezin qûna te ve. [**Şal**], (Güneş. K, r. 124)
- 217- Tep tep dike, şeq şeq dike, genim bê sitar dike. [**Mîrkut**], (Güneş. K, r. 127)
- 218- Teyare xweş teyare, çi bikim serê wê dar e? [**Werîs û heçik-heçû**], (Güneş. K, r. 129)
- 219- Vî milî dar, wî milî dar, di nav de sayê har. [**Mişar-birek**], (Güneş. K, r. 131)
- 220- Vî milî rêx, wî milî rêx, di nav de xweriyê/xwarina şêx. [**Karîkê hingiv-gurbik-qowan**], (Güneş. K, r. 131)
- 221- Vekirî kon e, girtî gopal e. [**Sîwan**], (Güneş. K, r. 131)
- 222- Xişt û mişt, çû dergehê rûnişt. [**Milkis**], (Güneş. K, r. 133)
- 223- Xwêhek ya te heye, her roj xweliyê li xwe dike. [**Moxila arvên**], (Güneş. K, r. 133)
- 224- Zînê reşo siwar bû, kulfet pê şa bû. [**Sêl**], (Güneş. K, r. 136)
- 225- Zivistanê azab e, havînê axa ye. [**Lox-banger**], (Güneş. K, r. 137)
- 226- Zik li ser zik, dest li ser destik, karê jinik. [**Destar**], (Güneş. K, r. 137)
- 227- Şeş benî berikî di, du şikeva qutikî. [**Şehîn**], (Toprak. Ö, r. 44)
- 228- Tiştêkî min heye, her roj xwe pîne dike. [**Sêla Nan**], (Kan. Ş, r. 13)
- 229- Tiştêkî min heye, tê tê ji ber qurmê firêt tê, hûrik hûrik xwe dibe tê. Çi ye? [**Bêjîng**], (Kan. Ş, r. 16)
- 230- Dor bi dar e, qul hezar e. Çi ye? [**Bêjîng**], (Kan. Ş, r. 16)
- 231- Gayê kejo li hewan dajo. [**Sirsûm, meşk**], (Kan. Ş, r. 29)
- 232-Keçika qazî, serê bana dibezi, dike hawar û gazî. Ew çi ye? [**Bangeran-loq**], (Baskin. M.Ş, r. 19)

#### 9.4. Amûrên li Ser Cil û Bergan

Zarok di nav amûran de pêşî fêrî navê van amûran dibe. Çimkî amûrên ku herî zêde nêzîkî zarokan in, ev in. Bi vegotina mamikan zarok dê amûrên lixwekirinê baştir binasin. Peyvên devokî yên ji hev cuda dê hîn bibin. Di ber hînbûnê de dê kêfê bikin û bilîzin. Amûrên ku hatine vegotin ev in: “gure, şûtik, doxîn, kum, pêlav, şerwal, kiras, lepik, bîcame, çarix, şekal, çakêt, gustîlk, şewqe, derpî, pantor, gîzme, qundire, xizme, derpê jinan, saet, kefi.”

1- Da te dikit, babê te têrra dikit. [**Gure**], (Berwarî. M, r. 62)

2- Li dur te wertêt û te nagêt. [**Şûtik, doxîn**], (Berwarî. M, r. 63)

- 3- Serevraz kî dê vala bit, sernişîv kî dê tijî bit. [**Kolav, kum**], (Berwarî. M, r. 64)
- 4- Serspî ye, ne mele ye, pêpanî ye ne deve ye. [**Kolav, kum**], (Berwarî. M, r. 64)
- 5- Demê sernişîv diken tijî dibit. [**Kolav, kum**], (Berwarî. M, r. 64)
- 6- Qasî kewekî, digerîne barê kerekî. [**Pêlav**], (Berwarî. M, r. 67)
- 7- Lat û lat, min pê tev da evqas welat. [**Pêlav**], (Berwarî. M, r. 67)
- 8- Tiştekek heye ku girê didim diçe, vedikim naçe. [**Pêlav**], (Berwarî. M, r. 67)
- 9- Ez siwar bûm ne zîn e. Girê didim bi rê ve diçe, vedikim disekine. [**Pêlav**], (Berwarî. M, r. 67)
- 10- Min hulek havête dolekê, dol dirya hul ne. [**Pêlav**], (Berwarî. M, r. 67)
- 11- Serî yek e binî du, di qûna bab û bapîran ra çû. [**Şerwal**], (Berwarî. M, r. 67)
- 12- Qesra du der e, ji derekî derdikevim, ji derekî ser dikevim. [**Kiras**], (Berwarî. M, r. 68)
- 13- Qesra 2 der, tê çûme der, Ilahu ekber. [**Kiras**], (Berwarî. M, r. 68)
- 14- Pat e/mil e bê ser, pişt e bê zig, dest e bê pê. [**Kiras**], (Berwarî. M, r. 68)
- 15- Dara di dulê da, dul rizî, dar ma wisa. [**Kiras**], (Berwarî. M, r. 68)
- 16- Destekî çermîn e, bi demar e, bê xwîn e. [**Lepik**], (Berwarî. M, r. 71)
- 17- Dara dutayî, di te hildayî. [**Bîcame**], (Berwarî. M, r. 75)
- 18- Tiştekekî min heye, bar bin zik e, teng ser pişt e, ew çi ye? [**Çarix**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 427)
- 19- Kerkî bavê min heye cil î bi zik, teng li ser piştê. [**Çarix**], (Gazî. M, r. 21)
- 20- Tişkî min heye bi ro digere, bi êvara disekine. Dema disekine devê wê vekirî dimîne. [**Sol**], (Gazî. M, r. 32)
- 21- Tiştekekî min heye, heya meriv goşt nedîyê nameşe. Ev çi ye? [**Şekal, sol**], (Alkan. A, r. 83)
- 22- Tiştekekî min heye, sê dev e, devê mezin di te ve. Ev çi ye? [**Çakêt**], (Alkan. A, r. 90)
- 23- Tiştekekî min heye, ku mirov wî berjêr dike vala dibe, ku mirov wî berjor dike tijî dibe. Ev çi ye? [**Kum**], (Alkan. A, r. 95)
- 24- Tiştekekî min heye, digere digere, dema ku disekine devê xwe vedike. Ev çi ye? [**Şekal, pêlav**], (Alkan. A, r. 105)
- 25- Tiştikê mino, patik e bê ser e, pişt e bê zik e, dest e, bê pê ye. Çi ye? [**Çakêt, şerpik**], (Sadinî. M.X , r. 30)
- 26- Mamikê mino, darekî du ta, di lingê te quta, anko dibêjin; serî yek e bin du. Çi ye? [**Derpê, pêceme**], (Sadinî. M.X , r. 38)
- 27- Mamikê mino, li dor te dîzivire, lê nagihîte te. Çi ye? [**Doxîn**], (Sadinî. M.X , r. 47)



- 28- Mamikê mino, li dû te dizîvire. Çi ye? [**Doxîn**], (Sadinî. M.X , r. 47)
- 29- Mamikê mino, têrakirin sinnet e, anîn û birin ferz e, bizane ew çi ye? [**Gustîlk**], (Sadinî. M.X , r. 57)
- 30- Mamikê mino, serevraz diken xalî dibît, sernişîv diken tijî dibît. Çi ye? [**Şewqe**], (Sadinî. M.X , r. 150)
- 31- Mamikê mino, ez çûme serê milekî, piyê min kete qulekî. Çi ye? [**Pêlav**], (Sadinî. M.X , r. 159)
- 32- Mamikê mino, heçkê du ta, xwe nav lingê babê te quta. Çi ye? [**Derpî**], (Sadinî. M.X , r. 171)
- 33- Mamikê mino, heke girêden diçît, heke berden radiwestît. Çi ye? [**Pêlav**], (Sadinî. M.X , r. 171)
- 34- Mamikê mino, asin û bizin gayê mezin, pêk ve dibezin. Çi ye? [**Pêlav**], (Sadinî. M.X , r. 180)
- 35- Mamikê mino, hind ji min hind ji bizin, hind ji gayê mezin, em hemî pêk ve dibezin. Çi ye? [**Çarox**], (Sadinî. M.X , r. 194)
- 36- Mamikê mino, qama wê ya kewê ye, barê wê yê devê ye. Çi ye? [**Şekal**], (Sadinî. M.X , r. 216)
- 37- Çûme ser çiyayekî, pey min dikeve qulekî. [**Pêlav**], (Güneş. K, r. 42)
- 38- Dargê du ta, te li xwe kuta? [**Pantor-şal**], (Güneş. K, r. 43)
- 39- Ez çûm dîwara, ningê min ket eyara. [**Gîzme-cezme-çîzme**], (Güneş. K, r. 57)
- 40- Hespê şê, zincîr li pê. [**Sol**], (Güneş. K, r. 71)
- 41- Hêsin û bizin, quretiya mezin, bi hev re dibezin. [**Îskapet, qundire, pêlav**], (Güneş. K, r. 74)
- 42- Qam qama mêşê ye, bar barê gamêşê ye. [**Qebqebik-pêlav**], (Güneş. K, r. 104)
- 43- Qesra spî ya du derî. [**Cûreyeka goreyê**], (Güneş. K, r. 105)
- 44- Roj digere, şev radizê. [**Pêlav**], (Güneş. K, r. 108)
- 45- Seriyek li jorê ye, dido di binî de, fistiqî qula dê de. [**Derpê jina**], (Güneş. K, r. 113)
- 46- Ser kurkirî, bin kurkirî, nav de hirî. [**Kulav**], (Güneş. K, r. 115)
- 47- Sorê kurkirî, bi te re kirî? [**Kulav**], (Güneş. K, r. 115)
- 48- Sivik hişk, ser kurîşk. [**Pozsimik-xizme**], (Güneş. K, r. 120)
- 49- Ya li ser zenda, hate çenda? [**Saet**], (Güneş. K, r. 135)
- 50- Mamigê mino mamanî, hingî soyî ez radibi, sofigê di berê ciya te de. [**Kitan, kefi**], (Eren. M, r. 24)

### 9.5. Amûrên ji bo Xwendin û Nivîsînê

Hin mamikên di vê beşê de mamikên modern in an mamikên çêkirî ne. Çimkî amûrên ku tên nasandin bixwe amûrên nû ne. Zarok berî ku biçin dibistanê bi van amûran re rûbirû dimînin. Ji bo ku fonksiyonên van amûran binasin, mamikên li jêr dê mifayên mezin bidin wan. Li ser: “name, çante, qelem, pirtûk, nexşe, kaxez, defter” mamik hatine gotin.

- 1- Qîz û vîz, çû bajêrê Ebdulezîz. [**Name**], (Berwarî. M, r. 69)
- 2- Kaxez e çîzavîz, çû bajarê Ebdilezîz, tîne kêfa xort û qîz. [**Name**], (Berwarî. M, r. 69)
- 3- Her roj li dibistan e, lê tişteke nizane. [**Çante**], (Berwarî. M, r. 72)
- 4- Mele ye mele nîn e, aqilmend e, ruh tê nîn e. [**Qelem/pênûs**], (Berwarî. M, r. 72)
- 5- Pênc di sax in, naxivin, êk miriye daxivit. [**Qelem/pênûs**], (Berwarî. M, r. 72)
- 6- Tişteke e hemî di bin ra diçin. [**Qelem/pênûs**], (Berwarî. M, r. 72)
- 7- Ximav û xar, lastîk û dar, tilfê lê hewar, li kaxezê bar, tîpên yar û har, digirin rêz û tar. [**Qelem/pênûs**], (Berwarî. M, r. 72)
- 8- Çini çini hezar çini, Meri dînin/dixwînin hilçini. [**Pirtûk**], (Berwarî. M, r. 72)
- 9- Şuva sipî, xeta reş. [**Pirtûk**], (Berwarî. M, r. 72)
- 10- Wekî pîrpel e, nivîs lê bel e, bi bend û bal e, ji te re heval e. [**Pirtûk**], (Berwarî. M, r. 72)
- 11- Çiyayê bêkevir, deryaya bêav, rêlê/daristan bêdar, bajarê bê mirov. [**Nexşe**], (Berwarî. M, r. 72)
- 12- Bi pişt e, bê zik e, bi dest e, lê bê ling e, bi dev e, bê didan e, bi çav e, lê nabîne. [**Nexşe**], (Berwarî. M, r. 72)
- 13- Dinya hemî diçitê, kefeka pûşî naçitê. [**Kaxez**], (Berwarî. M, r. 66)
- 14- Li berî bidey çî lê nahêt, li avê bidey dişikêt. [**Kaxez**], (Berwarî. M, r. 66)
- 15- Ber kevirê xiştanî, ne pê heye ne penî, kevir dixim naşkê, avê dixim dişkê. Ew çî ye? [**Kaxaz**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 433)
- 16- Tişteke heye hemû tişt diçine tê da. [**Defter**], (Gazî. M, r. 33)
- 17- Tişteki min heye, çîz û vîz, Ebdilezîz, hat malê qîz. Ev çî ye? [**Name**], (Alkan. A, r. 77)
- 18- Tişteki min heye, her tişt di bin re derbas dibe. Ev çî ye? [**Pênûs**], (Alkan. A, r. 93)
- 19- Tişteki min heye, bi dev e bê ziman e, bê fikr e bê raman e, navê her tiştî dizane. Ev çî ye? [**Pênûs**], (Alkan. A, r. 97)
- 20- Mamikê min, dinya hemû li ser nîkê wî ava ye. Çî ye? [**Pênûs**], (Sadî. M.X, r. 112)

- 21- Mamikê min e, mela ye mela nîne, aqildar e rih tê nîne. Çi ye? [**Pirtûk**], (Sadinî. M.X , r. 114)
- 22- Mamikê mino, vî rexî kaş wî rexî kaş, din av da topek qumaş. Çi ye? [**Kitêb**], (Sadinî. M.X , r. 197)
- 23- Mamikê mino, li vir keliya, li Stenbolê fûriya/firiya. Çi ye? [**Name**], (Sadinî. M.X , r. 216)
- 25- Ez çûm serê milê, tiştêk bi min re diştexilê. [**Name**], (Güneş. K, r. 56)
- 26- Mele ye şaşik nîne, aqilmend e ruh tê nîne. [**Pênûs**], (Güneş. K, r. 96)
- 27- Serê gelî bist e, ji me re biye mamoste. [**Qelem û defter**], (Güneş. K, r. 111)
- 28- Zana ye ziman nîne, aqilmend e rû nîne. [**Pirtûk**], (Güneş. K, r. 137)
- 29- Li vir dişînim, li Bexdayê hiltînim. Ew çi ye? [**Name**], (Baskın. M.Ş, r. 20)

### 9.6. Amûrên Raxistinê yên Nav Malê

Di geşedana ziman û di heyama fêrbûna bêjeyan de zarok van amûran bi kar tînin an jî ji nêz ve dibînin. Mamikên heyî dê ji hêla nasandina van têgehên ve alîkariya zarokan bikin. Amûrên wek “nivîn, xalîçe, mafûr, çarşev, mavling” hatine nasandin.

- 1- Tiştêkî min heye, bi şevê bûk e, bi rojê pepûk e. [**Nivîn**], (Berwarî. M, r. 71)
- 2- Şevê datên, rojê hiltên. Ew çi ye? [**Nivînê razanê**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 424)
- 3- Tiştêkî min heye, rengîno li erdê raxistî, paşê li ser rûniştî. Ev çi ye? [**Xalîçe**], (Alkan. A, r. 105)
- 4- Mamikê mino, sor dikim, kur dikim, di binê diya babê te re dikim. Çi ye? [**Mafûr**], (Sadinî. M.X , r. 92)
- 5- Mamikê mino, rengîno li erdê raxistiyo, paşê li ser vezeliyo. Çi ye? [**Xalîçe, mafûr**], (Sadinî. M.X , r. 141)
- 6- Mamikê mino, erebê reş dayka te hembêz kir. Çi ye? [**Çarşev**], (Sadinî. M.X , r. 161)
- 7- Mamikê mino, Bi şev cêrî ye, bi roj xatûna. Çi ye? [**Nivîn**], (Sadinî. M.X , r. 213)
- 8- Bi roj xemilî, bi şev kemilî. [**Mavling, cihnivîn**], (Güneş. K, r. 28)
- 9- Bi şev bela ye, bi roj kela ye. [**Kulîn, cihnivîn**], (Güneş. K, r. 28)
- 10- Gava min danî ava kir, gava min rakir xirab kir. [**Mehfûr, xalî**], (Güneş. K, r. 61)
- 11- Sofikî ûr pehn, xwe davêje ser diya te heta dibe sibeh. [**Nivîn**], (Güneş. K, r. 117)

### 10. Mamikên li Ser Têgehên Dînî

Di vê kategoriyê de ji aliyê lîteratura dînî ve tenê têgehên ku bi dînê îslamê re têkildar in, hene. Ev yek ji aliyê pedagojîk ve ne xurt e. Çimkî di nav civakên kurdan de

ji bilî îslamê hin dîn û baweriyên din jî hene. Lê zarok têgehên bingehîn ên dînê îslamê di vê beşê de dikarin fêr bibin. Mînak: “quran, roja xutbê, xweda, nimêj, bihuşt û dojah, rojiyên remezanê, destnimêj, cebraîl, Mûhammed, ruknên dînî, ruknên îmanê, îblîs, Hewa, Adem, Yehya pêxember, niviştî, tabût, ezraîl, şeytan” têgehên di vê beşê de ne.

- 1- Çil taq in, çil bertaq in, çil ode ne, ji çil di zêde ne. [**Quran**], (Berwarî. M, r. 61)
- 2- Sê taq e, sê bertaq e, sê derge ye, sê hucre ye. [**Quran**]<sup>224</sup>, (Berwarî. M, r. 61)
- 3- Çil derp e çil derpîç e, çil xolam e çil xecîc e. [**Quran**], (Berwarî. M, r. 61)
- 4- Çil çît in, çil berçît in, çil xidam in, çil xulam in, çil xecîc in. [**Quran**], (Berwarî. M, r. 61)
- 5- Çûme serê darekê, radihêlim hişke hewarekê, sed mêr dihên bi carekê. [**Roja xotbê/înî**], (Berwarî. M, r. 79)
- 6- Yek serî, yek pênc, du tij e, yek val e. [**Xweda, nimêj, bihuşt û dojah, cîhan**], (Berwarî. M, r. 84)
- 7- Rêzika daniya li serê xaniya, sê li sihê, du li tavê. [**Nivêj**], (Berwarî. M, r. 84)
- 8- 30 mêvan hatine gundê me, her mirovekî 30 bo çûn. [**Heyva remezanê**], (Berwarî. M, r. 84)
- 9- 30 siyarên li dinê, her bajar 30 diçinê, her gund 30 diçinê, her mal 30 diçinê. [**Heyva remezanê**], (Berwarî. M, r. 84)
- 10- 30 Qaz in, 50 Beraz in, 3 Tiktike ne, 10 Reşwêle ne. [**30 rojî, 50 reman, 3 rojka fela, 10 dehkêt eyda haciyan e. Dibit 40 roj reman û 3 rojiyên êzidiya bin. Rojiyên remezanê**], (Berwarî. M, r. 85)
- 11- Barê gondura 30 bûn, her êkî 30 giheştinê. [**Rojîyên remezanê**], (Berwarî. M, r. 85)
- 12- Dara çinçinê, pelê gozel çinê, kî mêr e hilçinê. [**Quran**], (Gazî. M, r. 15)
- 13- Dara li pehnavê, pênc gulî li navê, sisê li siyê, dido li tavê. [**Pênc wextê limêjê**], (Gazî. M, r. 15)
- 14- Darkî min heye hezar û yek pel e. [**Quran**], (Gazî. M, r. 15)
- 15- Dismala Bekir, tije şîr û şekir, xweziya min bi wî kesî ek vekir. [**Quran**], (Gazî. M, r. 17)
- 16- Mamikê min nîne, dar e ne li axê ye. Çi ye? [**Dara behiştê**], (Sadinî. M.X , r. 35)
- 17- Mamikê mino, yê mirî ye, mirov rê dike aqarî. Çi ye? [**Destnimêj**], (Sadinî. M.X , r. 41)

---

<sup>224</sup> Sê ciziyên Quranê.

- 18- Mamikê mino, elîfê gote cîmê, qafê bibe bo mîmê. Çi ye? [**Ellah, Cebrail, Quran, Mûhemmed**], (Sadinî. M.X , r. 47)
- 19- Mamikê mino, seyê ne tajandî, bexê ne mêjandî, mêrga ne çêrandî. Çi ye? [**Hewa, Adem, Bihuşt**], (Sadinî. M.X , r. 63)
- 20- Mamikê mino, mêrê ne li ocaxê. Çi ye? [**Îblîs**], (Sadinî. M.X , r. 69)
- 21- Mamikê mino, sî hêkan bi dev hildigire. Çi ye? [**Meha remezanê**], (Sadinî. M.X , r. 94)
- 22- Tiştêkî min ji tiştan e, du bav û du kur, sê sêvan lêk veken, her yekî yek digihê, ew çawa çê dibe? [**Nivêj**], (Sadinî. M.X , r. 110)
- 23- Dareke li hindav avê, pênc çeq jê di belav in, sê li ber sîberê, du li ber hetavê. Çi ye? [**Nivêjên rojê**], (Sadinî. M.X , r. 110)
- 24- Mamikê mino, pênc in nabin şeş. Çi ye? [**Ruknên dînî**], (Sadinî. M.X , r. 122)
- 25- Mamikê mino, şeş in nabin heft. Çi ye? [**Ruknên îmanê**], (Sadinî. M.X , r. 122)
- 26- Mamikê mino, yek e nabe du. Çi ye? [**Xweda, yezdan**], (Sadinî. M.X , r. 144)
- 27- Camî ji canê ye, destnimêj ji xwînê ye, nimêj dike, qibla wî ne kifş e. Çi ye? [**Yehya Pêxember**], (Sadinî. M.X , r. 145)
- 28- Tiştê mino tiştanî, zeviya spî ye tovê reş. Çi ye? [**Quran**], (Sadinî. M.X , r. 161)
- 29- Mamikê mino, pênc bira hene, sê rojê dibînin, du nabînin. Çi ye? [**Nimêj**], (Sadinî. M.X , r. 188)
- 30- Mamikê mino, sih siwar çûne gundekî, her malekê sih siwar gehiştinê. Çi ye? [**Sih rojên remezanê**], (Sadinî. M.X , r. 210)
- 31- Mamikê mino, dara li nav avê, pênc katan davê, sê li sihê du li tavê. Çi ye? [**Pênc nivêj**], (Sadinî. M.X , r. 211)
- 32- Bi roj radize li ser piştê, êvarê radibe dora testê. [**Rojî**], (Güneş. K, r. 28 )
- 33- Çil çît in, çil ber çît in, çil ode ne, çil zêde ne. [**Quran**], (Güneş. K, r. 39)
- 34- Dara silîva, sisê li sihê, dido li tava? [**Mêj, nimêj**], (Güneş. K, r. 50)
- 35- Nexweşê li nav nivînê, dibîne dermanê birînê. [**Nivîştî**], (Güneş. K, r. 100)
- 36- Pênc bira ne, birê mezin çar salî ye, ê dû wî dihe salî ye, birakî dû wî heşt salî ye, ê dinê dû wî pênc salî ye, terî/herî dû giya/hemû deh û sê salî ye, ev çi ye? [**Nimêj**], (Güneş. K, r. 103)
- 37- Sebiyê nemêjandî, mêrga neçêrandî, kerê korê, ji garana veqetandî. [**Melayîket, Cinnet, Şeytan**], (Güneş. K, r. 113)
- 38- Xwedayê mîhrîban, ji me ra donzdeh sêva şand, me yanzdeha xwarin yekê nexwar. [**Rojiya meha remezanê**], (Güneş. K, r. 134)

- 39- Yek serî, yek pênc, didu tije, yek vala. [**Xweda-Nimêj-Bihûst û Dojeh- Cîhan**], (Güneş. K, r. 136)
- 40- Yek li ser mûç, çila dike qûç. Çi ye? [**Mela**], (Toprak. Ö, r. 21)
- 41- Sinî li erdê ye, dûvê pez li serê ye, zincîr ezman e, kêr li ser e, dibire nabire xelas nabe. [**Ruhstîn-Ezraîl**], (Kan. Ş, r. 11)
- 42- Sindoqa Silêmanî, min ew li hewşê danî, çi ye? [**Tabût**], (Kan. Ş, r. 11)

### 11. Mamikên li Ser Cih û Waran

Di vir de qesda cih û warên hemû heyînan hatiye kirin. Di vê beşê de her cih û warekî bi serê xwe temsîliyeteke wan heye. Zarok dê hem fêrî navê cih û waran bibin hem jî dê têkiliya heyîn û cihên wan bi hev re çê bikin. Mînak: “aş, rê, kon, pir, tenûr, welat, berîk, gor, sûta kewa, basme, qelax, çirik, kewar, qula kirmoriya, bostan, mal, hundur, derve, kolemişk, bêder, minare, kuçik, derence, xanîk, darmêş, ban, çem, afir, malnivînk, kort, dolab, tereg, hêlîn, qefesa kew, pencere, kulek, tirb” têgehên di vê beşê de ne.

- 1- Hindî bikenê tijî nabit, hindî bidenê têr nabit. [**Aş**], (Berwarî. M, r. 61)
- 2- Firrfît û firrfît, bo te û babê te dirît. [**Aş**], (Berwarî. M, r. 61)
- 3- Gîskê gorrî, li avê xorî. [**Aş**], (Berwarî. M, r. 61)
- 4- Tebeqa li ser tebeqê, kona qunê di nîvekê. [**Aş**], (Berwarî. M, r. 61)
- 5- Çi diken karê ew dihêt xarê. [**Aş**], (Berwarî. M, r. 61)
- 6- Gîskê gurrî, li ser avê/rubarî xorî. [**Aş**], (Berwarî. M, r. 61)
- 7- Him himo, li ber çemo, ne diz diben, ne gur dixot. [**Aş**]<sup>225</sup>, (Berwarî. M, r. 61)
- 8- Hindî dibezit, ji cihê xwe naçit. [**Aş**], (Berwarî. M, r. 61)
- 9- Sindorîka li ser sondirîkê kilîla di destê bûkê. [**Aş**], (Berwarî. M, r. 61)
- 10- Şûtka du ta, heta Bexda. [**Rê**], (Berwarî. M, r. 64)
- 11- Tiştêkê dirêj e, sîber nîne. [**Rê**], (Berwarî. M, r. 64)
- 12- Diçit serê çiyay, nalivit. [**Rê**], (Berwarî. M, r. 64)
- 13- Ji vêrê heta Bexda/Helebê, hemî cangê du ta. [**Rê**], (Berwarî. M, r. 64)
- 14- Ji vêrê heta mala Obeydullay, hemî cangê qutay. [**Rê**], (Berwarî. M, r. 64)
- 15- Pisê pisê nêrgizê, li ser avê dihezê, ne gur dixwe ne dizê. [**Pir**], (Berwarî. M, r. 67)
- 16- Derê wê reş e qubhet e, nava wê sor e, edawet e. [**Tenûr**], (Berwarî. M, r. 73)
- 17- Kewara agir, hevîr dike nanê hazir. [**Tenûr**], (Berwarî. M, r. 73)

<sup>225</sup> Hin kes dikin Distar.

- 18- Lêv reş e bi qîmet, nav sor e bi helamet, bi terî dibemê, bi hişkî dîfnime der, sela ela pêxember. [**Tenûr**], (Berwarî. M, r. 73)
- 19- Dayka daykan e bo mirovî nav û nîşan e. [**Welat**], (Berwarî. M, r. 73)
- 20- Belot belot, ji ser ve req e, ji bin ve pot. [**Berîk**], (Berwarî. M, r. 73)
- 21- Bajar e, bazar nîne, sîber e, hetav nîne. [**Gor**], (Berwarî. M, r. 76)
- 22- Koşka tarî û bi mar, bi dûpişk û cinawar. [**Gor**], (Berwarî. M, r. 76)
- 23- Sindoqa Silêmanî, li hemû cî û bajaran danî. [**Gor**], (Berwarî. M, r. 76)
- 24- Bajêr e deng jê nahêt, sûka bazar jê nahêt. [**Gor**], (Berwarî. M, r. 76)
- 25- Hespêkî siyar dibim, dajom orta berê, lingê hespê şil nabe, pişta wê şil dibe. Ew çi ye? [**Xanî**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 423)
- 26- Ji dûr ve hindî gayekî ye, ji nêzik ve hindî çiyayekî ye. [**Xîvet/kun**], (Berwarî. M, r. 64)
- 27- Mûyê/pûrtê kara, li ser dara. [**Xîvet/kun**], (Berwarî. M, r. 64)
- 28- Tiştêkê hey heku dinivit hindî gay e, heku radibit hindî çiya ye. [**Xîvet/kun**], (Berwarî. M, r. 64)
- 29- Dipêçî, barê ga ye, vedinî wek çiya ye, bi serê de tê baran û ba ye, girêdane bi werîsa ye, malbat tev li bin razaye. [**Xîvet/kun**], (Berwarî. M, r. 64)
- 30- Mûyên karan, li ser daran, di bin de distirin bi hezaran. [**Xîvet/kun**], (Berwarî. M, r. 64)
- 31- 10 dar û 2 ben, êxsîr tê da bûye reben. [**Sûta kewa**], (Berwarî. M, r. 70)
- 32- Mûyê du karika, avêtine ser du darika. Ew çi ye? [**Kon**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 428)
- 33- Mûyê serê darê ye. Ew çi ye? [**Kon**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 428)
- 34- Ho Reşo, to Reşo, qeretîyo, qe ranebîyo. Ew çi ye? [**Basme, qelax**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 428)
- 35- Hesp çû zîn ma. Ew çi ye? [**Pira**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 431)
- 36- Ew çi ye? Şevro li çolê ye, ne diz dive ne gur dixwe. [**Pira**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 431)
- 37- Kilît ji dêr, mifte ji avê, nêçîr çû, nêçîrvan ma navê. Ew çi ye? [**Aş**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 432)
- 38- Hespê boz, afirê quloz, pêbendê lê, çivta davê, sor dixwe, spî davê. Ew çi ye? [**Aş û genim**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 432)
- 39- Ez çûm qurbanek mi dî, bê xûn bû, berîk hebû bê av bû. Ew çi ye? [**Nan, cinet, cenime**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 432)

- 40- Bûk li pê, kezî li erdê. [**Çirik**], (Gazî. M, r. 13)
- 41- Çindik mindik, baz da quncik, bê dil û bê gurçik. [**Çirçirik**], (Gazî. M, r. 14)
- 42- Devreşa nêv sor, şil dike, za/ziwa dertêxe. [**Tenûr**], (Gazî. M, r. 16)
- 43- Dimexile wek gakî, radibe wek çiyakî. [**Kon**], (Gazî. M, r. 16)
- 44- Dirêj, dirêj, dirêj, ji vir heta serê dinê, nagêyê boça kerê. [**Rê**], (Gazî. M, r. 17)
- 45- Erebe reş bazda ser diya te. [**Kon**], (Gazî. M, r. 17)
- 46- Hespa şê, baz da hewşê. [**Çironek**], (Gazî. M, r. 19)
- 47- Kalo miriye, dev vekiriye. [**Kewar**], (Gazî. M, r. 21)
- 48- Sindoqa Silêmanî, li diyaran danî. [**Gor**], (Gazî. M, r. 29)
- 49- Sindoqa zana, dimîne heya axirê zemana. [**Mezel**], (Gazî. M, r. 29)
- 50- Tê girtin venabe. [**Mezel, gor**], (Gazî. M, r. 31)
- 51- Tişkî min heye diçe diçe qet li pişt xwe nafetile. [**Rê û av**], (Gazî. M, r. 32)
- 52- Tişkî min heye, rêsiya giya, pişt xaniya. [**Qula kirmoriya**], (Gazî. M, r. 33)
- 53- Tişteki min heye; Çîrokê xetxetokê li ber cihokê, kolika xala li pişt mala, ne gur dixwe ne diz dibe. Ev çi ye? [**Aş**], (Alkan. A, r. 76)
- 54- Tişteki min heye, lem lemo li ber çemo. Ev çi ye? [**Aş**], (Alkan. A, r. 86)
- 55- Tişteki min heye, pirçika karik, li ser darik. Ev çi ye? [**Kon**], (Alkan. A, r. 86)
- 56- Tişteki min heye, sê lingo li ber gundo. Ev çi ye? [**Bostan**], (Alkan. A, r. 86)
- 57- Tişteki min heye, bi şev bûk e, bi roj pepûk e. Ev çi ye? [**Çeq çeqa aş**], (Alkan. A, r. 92)
- 58- Tişteki min heye, karê wê pihîna li xwe dixwe. Ev çi ye? [**Tenûr**], (Alkan. A, r. 93)
- 59- Tişteki min heye, ser xet e bin xet e, ne qelem e ne jî kaxet e. Ev çi ye? [**Pir**], (Alkan. A, r. 96)
- 60- Tişteki min heye, di dev re dixwe, di dev re derdixwe. Ev çi ye? [**Tenûr**], (Alkan. A, r. 97)
- 61- Tişteki min heye, yek dibê ay pişt min, yeka din dibê ez fetisîm, yek jî dibê ez qefilîm. Ev çi ye? [**Mal, hundur û derve**], (Alkan. A, r. 98)
- 62- Tişteki min heye, axwirekî min heye, hezar pez diçê lê baqek gîha naçê. Ev çi ye? [**Qula moristana**], (Alkan. A, r. 106)
- 63- Rêz bi rêz heta tewrêz. [**Kolemişk**], (Akbaş. E, r. 69)
- 64- Mamikê mino, dayikek jêhatî, tim xwelî li ser hatî. Çi ye? [**Aş û ard**], (Sadinî. M.X , r. 15)
- 65- Tiştê mino tiştanî, heyveka li ser heyvekê, bahîveka li ser şîvekê, kuna qûnê li nîvekê. Çi ye? [**Aş**], (Sadinî. M.X , r. 16)



- 66- Mamikê mino, hindî bidenê, têr naxwe. Çi ye? [**Aş**], (Sadinî. M.X , r. 16)
- 67- Mamikê mino, ka çû ma dan. Çi ye? [**Bêder**], (Sadinî. M.X , r. 22)
- 68- Mamikê mino, teqoreqo, kinca dişo. Çi ye? [**Aş**], (Sadinî. M.X , r. 33)
- 69- Mamikê mino, qesra du derî, ji binî tê hilçûm, li serî min got: Ellah û Ekber. Çi ye? [**Minare**], (Sadinî. M.X , r. 82)
- 70- Mamikê mino, xaniyê bê dîwar e, bi stûn e karîte ne, bi ban e bê ax e. Çi ye? [**Kon**], (Sadinî. M.X , r. 83)
- 71- Mamikê mino, eba berleko, li nav beyaran. Çi ye? [**Kuçik**], (Sadinî. M.X , r. 85)
- 72- Mamikê mino, çûme şikeftê da, heft mal diçûn pê bizinê da. Çi ye? [**Kuna moriyan**], (Sadinî. M.X , r. 87)
- 73- Mamikê mino, pêk pêk danî, li ber xanî. Çi ye? [**Merdewan-derence**], (Sadinî. M.X, r. 97)
- 74- Tiştêkî min heye, ser xet e, bin xet e, ne qelem e, ne kaxez e. Çi ye? [**Pir**], (Sadinî. M.X , r. 113)
- 75- Mamê min e, li ser şafik, li ber dafik. Çi ye? [**Rê**], (Sadinî. M.X , r. 120)
- 76- Tiştêkî min e, teyrek hafî, nanek patî, ne ji rengê zadî. Çi ye? [**Şana mêşan-kewar**], (Sadinî. M.X , r. 129)
- 77- Mamikê mino mam e, ecêba min ew ecêb e, mahîna bi şeş rikêb e, kurrya bi nîva piştê ve. Çi ye? [**Tenûr**], (Sadinî. M.X , r. 135)
- 78- Tiştikê mino tiştan e, pirtan e her tan e, yê nezan e, kerê heywan e. Çi ye? [**Tenûr**], (Sadinî. M.X , r. 135)
- 79- Mamikê mino mamik e, yê bi sê lingan e, yarê jinkan e. Çi ye? [**Xanîk**], (Sadinî. M.X , r. 142)
- 80- Mamikê mino, gîskê gurî, çû devê avê nirî. [**Aş**], (Sadinî. M.X , r. 150)
- 81- Mamikê mino, gîskê gurrî, li dev avê nirî, heft batmanan bo te û bo babê te dirî. Çi ye? [**Aş**], (Sadinî. M.X , r. 152)
- 82- Mamikê mino, dar e ya li nav daran, jê têt dengê birîndaran. Çi ye? [**Darmêş**], (Sadinî. M.X , r. 155)
- 83- Ji vê derê heta Bexda, cangê qutayî. Çi ye? [**Rê**], (Sadinî. M.X , r. 155)
- 84- Ser hisû, bin perasî. Çi ye? [**Ban**], (Sadinî. M.X , r. 157)
- 85- Ji hêrê heta Bêdilyatê, bapîrê min li ser dapîra te. Çi ye? [**Aş**], (Sadinî. M.X , r. 157)
- 86- Mamikê mino, çûme derî, ecêbiyek hate serî, dar diqutî berî. Çi ye? [**Aş**], (Sadinî. M.X , r. 164)

- 87- Mamikê mino, eger rabû hindî çiyayekî ye, eger raza hindî gayekî ye. Çi ye? [**Kon**], (Sadinî. M.X , r. 167)
- 88- Mamikê mino, berhev diken barê ga ye, danin erdî wekî çiya ye. Çi ye? [**Kon**], (Sadinî. M.X , r. 173)
- 89- Mamikê mino, bê ser û bin e, belav dibît hindê dinê. Çi ye? [**Çem**], (Sadinî. M.X , r. 174)
- 90- Mamikê mino, mahîna boz, li meydanê kir toz. Çi ye? [**Aş**], (Sadinî. M.X , r. 182)
- 91- Mamikê mino, darek e, li ser darê hinarek e, li ser hinarê gopalek e, li ser gopalê rist e, li ser ristê bihust e. Çi ye? [**Çem**], (Sadinî. M.X , r. 192)
- 92- Tiştê mino tiştanok, du kevirên xiştanok, ne gur dixwet ne diz dibet. Çi ye? [**Aş**], (Sadinî. M.X , r. 193)
- 93- Mamikê mino, quncê tarî berf lê dibarî. Çi ye? [**Afir**], (Sadinî. M.X , r. 197)
- 94- Xudê hezkirî, beniyar çêkirî, zîn li piştê şêrê kirî. Çi ye? [**Pire**], (Sadinî. M.X , r. 200)
- 95- Pirtan e, pirtan e, ber pê hemiyar e, her çi nezanît nezan e. Çi ye? [**Pire**], (Sadinî. M.X , r. 200)
- 96- Himhimê diket, rimrimê diket, qesta dergehê Stenbolê diket. Çi ye? [**Çem**], (Sadinî. M.X , r. 200)
- 97- Mamikê mino, serî sorî elametî, binî sorî qiyametî, şil diximê ziwa derdikeve. Çi ye? [**Tenûr**], (Sadinî. M.X , r. 217)
- 98- Çar pê ye ne li ser rê ye, bi bar e ne dewar e. [**Malnivînk**], (Güneş. K, r. 36)
- 99- Çar tajî, çar kulav, ji vir hetanî Bexda. [**Berf**], (Güneş. K, r. 36)
- 100- Diçim naçim dirêj e, dişûm naşûm qirêj e. [**Rê**], (Güneş. K, r. 43)
- 101- Mamkê minê mamarî, du stûn gulte, dan ber şaş û perên bavê te, her bî cîzvîza diya te. [**Aş**], (Güneş. K, r. 43)
- 102- Dar û du ben, heçî bikeviyê bû reben. [**Qefesa kew**], (Güneş. K, r. 52)
- 103- Ez dihilînim wek gaki ye, ez dideynim wek çiyakî ye. [**Kon**], (Güneş. K, r. 56)
- 104- Ez hatim ji ha ve, min ecêbek dît bi çav e, sîtilek li ser e agir û av e. [**Aş**], (Güneş. K, r. 59)
- 105- Goma bavê te tijî pez e, stûna rast tê de dirêj e. [**Moristank-kunmêwî**], (Güneş. K, r. 64)
- 106- Hilhil rabû, qijik li dorê şabû. [**Tenûr**], (Güneş. K, r. 67)
- 107- Hinî minî, li binê gûnî. [**Hêlîn**], (Güneş. K, r. 71)
- 108- Hêstira xiro, banê giro. [**Pir**], (Güneş. K, r. 72)

- 109- Himber sima gakê, hinek bajarkê. [**Kunmêwî**], (Güneş. K, r. 73)
- 110- Hesp diçe, zîn nameşe? [**Av û pir**], (Güneş. K, r. 74)
- 111- Hesin li ser hesin, çi fîncana qûn mezin. [**Bîstan**], (Güneş. K, r. 75)
- 112- Hepino, çar çepino, radikî piya, weke çiya. [**Kon**], (Güneş. K, r. 76)
- 113- Herku mirov jê dibe, mezin dibe. [**Kort-çalik**], (Güneş. K, r. 76)
- 114- Îp, derî kîp. [**Gor**], (Güneş. K, r. 77)
- 115- Ji hire û wê de, sed mal û mezel, di nav sima ga da? [**Kunmêwî**], (Güneş. K, r. 78)
- 116- Ji hire û Bexda, şûtik li dû ta. [**Rê**], (Güneş. K, r. 78)
- 117- Ji hesin û kevir e, dixwe naxwe têr nabe û naşêkire. [**Aş**], (Güneş. K, r. 81)
- 118- Kurtan e heçî nezan heywan e. [**Pir**], (Güneş. K, r. 83)
- 119- Kewara agir, hevîr dike nanê hazir. [**Tenûr**], (Güneş. K, r. 86)
- 120- Mamkê mino, li cihê xwe rûdine ranabe. [**Xanî**], (Güneş. K, r. 88)
- 121- Li ser girekî sê rê terin/derin. [**Dolap**], (Güneş. K, r. 89)
- 122- Li maxa bi dîwarî, çar çivê bi kerî, wekî derî, roj jê dibarî, têk diçe tarî. [**Pencere**], (Güneş. K, r. 90)
- 123- Li dîwar e, ne kewar e, qor bi qor e, wekî per e, tişt li ser e, kî nezane ew ker e. [**Tereg**], (Güneş. K, r. 94)
- 124- Malek bêderî, tijê serî. [**Kunmêwî**], (Güneş. K, r. 94)
- 125- Mûyê karan, li ser daran, di bin de disitirin, bi hezaran. [**Kon**], (Güneş. K, r. 96)
- 126- Pîra dirêj, tijî qirêj. [**Kulek û dû**], (Güneş. K, r. 102)
- 127- Pişo pişo nêrgiz, li ber ava dengiz, ne gur dixwe ne jî dibe diz. [**Pir**], (Güneş. K, r. 104)
- 128- Qûtiya dûdermana, venabe heta axirê zemana. [**Mezel**], (Güneş. K, r. 106)
- 129- Qotîka bê dev û ziman, navê bê tu zeman. [**Tirb-mezel**], (Güneş. K, r. 107)
- 130- Rêsiya giya, li pişt xaniya. [**Qula kurmorî-kuna girêkan/mêwî**], (Güneş. K, r. 108)
- 131- Sindoqa Silêmanî, li çolê danî. [**Mezil-gor**], (Güneş. K, r. 112)
- 132- Sindok mindok, giş li meydan. [**Mezel**], (Güneş. K, r. 113)
- 133- Tişkî min heye, wer derê, paş xwe nanêre. [**Çem**], (Güneş. K, r. 125)
- 134- Teq û req li jor, li ban dixwe li jêr û jor. [**Çeqçeqa aş**], (Güneş. K, r. 129)
- 135- War û war çar pê ne dewar. [**Dolap**], (Güneş. K, r. 131)
- 136- Ji ha û ji wir ve, bin serê gir ve, çil hezar derî tê ve. Çi ye? [**Kuna miroya**], (Kan. Ş, r. 6)
- 137- Nelepî, li ser piştta netevit. [**Pir**], (Kan. Ş, r. 24)

138- Ji der ve şêx e, ji hundur ve kox e. [**Mal**], (Kan. Ş, r. 25)

139- Tişteki min heye, diçim naçim dirêj e, dişom naşom qirêj e. [**Rê**], (Kan. Ş, r. 29)

## 12. Mamikên li Ser Xwezayê

Di eslê xwe de her gotineke gelêrî neynika civak û welatê xwe ye. Bi rastî di temamê mamikan de jî em dikarin vê yekê bibînin. Lê hin kategorî hene ku bi temamî herêmî ne. Yek ji van jî xweza ye. Zarokên kurd dê di vê beşê de xwezaya welatê xwe binasin. Mifaya herî mezin a mamikan ew e ku jiyana zarokan bi awayekî edebî li wan dide nasîn. Mînak: “Dûkêl, agirdan, çiya, agir, mîkrob, berfemêr, derya, coka avê, dilopa avê, av, rûbar, komir, şape, erd û berf, tîrêj, qeşa, deng û ba, xwelî, şironek, tîna êvarê, şev û roj, dinya, ronahî, kevz, şilî, lehî, keskesor, gêrûse” têgehên li ser xwezayê ne.

1- Mêzera Sultanî, bê dest û pê çû ser banî. [**Dûkêl/kadî**], (Berwarî. M, r. 63)

2- Tiştê min tiştanî, ne pê pê ve ne, ne panî, bixwe diçite ser banî. [**Dûkêl/kadî**], (Berwarî. M, r. 63)

3- Him him e, dîwar sim e. [**Dûkêl/kadî**]<sup>226</sup>, (Berwarî. M, r. 63)

4- Gewru dirît, soru dihavêt. [**Supe/agirdan**], (Berwarî. M, r. 68)

5- Sê tilî sê pê ne, li nav deştê ne, mîr û hakima pal lê ne. [**Supe/agirdan**], (Berwarî. M, r. 68)

6- Ne li erdî, ne li esmanî, dixut guştê xodanî. [**Mîkrob/vîros**], (Berwarî. M, r. 69)

7- Hilindir milindir, kur/law ji babê bilindtir. [**Agir û dû/dûkêl**], (Berwarî. M, r. 70)

8- Mêr e ji baranê dibizde, ji germê bi xwe de dimîze. [**Berfemêr**], (Berwarî. M, r. 71)

9- Tişteki min heye çiqas bixwe, têr nabe. [**Agir**], (Berwarî. M, r. 72)

10- Sê bira ne, êk diçit nahêteve, êk dimirit narabiteve, êkî hindî bidenê têrnabiteve. [**Agir**], (Berwarî. M, r. 72)

11- Ne mezinê wan biçûk dibin, ne biçûkên wan mezin dibin. [**Çiya**], (Berwarî. M, r. 76)

12- Goleke şîn e, tije çirayên rengîn e. [**Derya**], (Berwarî. M, r. 79)

13- Tifenga xala, ya li der mala. [**Coka avê**], (Berwarî. M, r. 80)

14- Hade û made, korîka xo bade, here di nav zevîka bi qura de. [**Coka avê**], (Berwarî. M, r. 80)

15- Tişteki min heye, gora xwe bi xwe dikole. [**Dilopa avê**], (Berwarî. M, r. 80)

16- Spî spî, dibê şil dike, erdê jî tim qul dike. [**Dilopa avê**], (Berwarî. M, r. 80)

---

<sup>226</sup> Ji bo Darkokeyê jî tê gotin.

- 17- Fatimko, erdê simko. **[Dilopa avê]**, (Berwarî. M, r. 80)
- 18- Sor sorik, erdê dikolik. **[Dilopa avê]**, (Berwarî. M, r. 80)
- 19- Tiştê min li çik e û ê diz e. **[Dilopa avê]**, (Berwarî. M, r. 80)
- 20- Hada û bada, çû nav werzê qurra da, têr xwar û koriya xwe bada. **[Av]**, (Berwarî. M, r. 80)
- 21- Hurr hurr dikit, bûrr bûrr dikit, qesta dergihê Stembol dikit. **[Av]**, (Berwarî. M, r. 80)
- 22- Tiştêkî min heye diçe, li pişt xwe nanêre. **[Av]**, (Berwarî. M, r. 80)
- 23- Hindî bişûy, pîs dibit. **[Av]**, (Berwarî. M, r. 80)
- 24- Dojmin e lo agirî, bi ton dara hildigirî, bizmarekê ranagirî. **[Av]**, (Berwarî. M, r. 80)
- 25- Bê ser û bê ling e, diherike li bajar û gund e. **[Rûbar/çem]**, (Berwarî. M, r. 80)
- 26- Çêla zayî, di geliya badayî. **[Rûbar/çem]**, (Berwarî. M, r. 81)
- 27- Hindî bideyê dê xot. **[Rûbar/çem]**, (Berwarî. M, r. 81)
- 28- Hindî bêjî, dê dirêj bit. **[Rûbar/çem]**, (Berwarî. M, r. 81)
- 29- Xwar e ne dar e, dikale ne kar e, dixuşe ne mar e. **[Rûbar/çem]**, (Berwarî. M, r. 81)
- 30- Tiştêkî min heye tiştanok, ar hûrtir e, devê bilindtir e. Ew çi ye? **[Dû]**, (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 410)
- 31- Xar e ne dar e, dimike ne kar e, dikişe ne mer e. Ew çi ye? **[Av]**, (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 411)
- 32- Him şil dike, him dîwêr qul dike. Ew çi ye? **[Dilop]**, (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 411)
- 33- Mirîşka reş kibab e, çiyê bixot seba e. **[Rejî/komir]**, (Berwarî. M, r. 68)
- 34- Reş e di agir de sor û gewr e. **[Rejî/komir]**, (Berwarî. M, r. 68)
- 35- Hespê boz, meydan kir toz. **[Şape, aşî]**, (Gazî. M, r. 20)
- 36- Tişkî min heye serê sibê ji berî kevaniya dihere ser xênî. **[Dû]**, (Gazî. M, r. 33)
- 37- Tiştêkî min heye; Bav ciwan e, law ixtiyar e. Ev çi ye? **[Agir û dûxan]**, (Alkan. A, r. 76)
- 38- Tiştêkî min heye, ez çûm diyarekî, newalek li ser newalekî, parav li paravê bû, li serê paravê gopalekî bû. Ev çi ye? **[Çiya û mar]**, (Alkan. A, r. 79)
- 39- Tiştêkî min heye, terim newala tê xuşîna mara. Ev çi ye? **[Av û cihok]**, (Alkan. A, r. 79)
- 40- Tiştêkî min heye, Ewrê reş tarî bû, bû sibeh çik sipî bû. Ev çi ye? **[Erd û berf]**, (Alkan. A, r. 80)
- 41- Tiştêkî min heye, tim tere nasekine. Ev çi ye? **[Av]**, (Alkan. A, r. 93)
- 42- Tiştêkî min heye, sipî sipî herî sipî ye. Ev çi ye? **[Av]**, (Alkan. A, r. 94)

- 43- Tişteki min heye, tim sar e, germ nabe. Ev çi ye? [**Berf**], (Alkan. A, r. 95)
- 44- Tişteki min heye, xaniya maniya, ferşikê li ser devê kaniya, rê nade rêwiya. Ev çi ye? [**Qeşa**], (Alkan. A, r. 98)
- 45- Tişteki min heye, quncikê reş û tarî, nûr lê dibarî. Ev çi ye? [**Tîrêj**], (Alkan. A, r. 105)
- 46- Tişteki min heye, tişteki di tev de agir e, dikeve avê venamire. Ev çi ye? [**Roj û heyv**], (Alkan. A, r. 106)
- 47- Tişteki min heye, ji vir heta Bexdayê, kulav û doşek radayê. Ev çi ye? [**Erd û berf**], (Alkan. A, r. 106)
- 48- Mêr e ji baranê dibizde, ji germê bi xwe de dimîze. [**Berfemêr**], (Akbaş. E, r. 69)
- 49- Tişteki min heye, gotiye şeveke reş û pezeke geş. Çi ye? [**Agir û dûkel**], (Sadinî. M.X, r. 13)
- 50- Mamikê mino, dihêt wekî hakimî, dirûne wekî wezîran, diçe wekî feqîran. Çi ye? [**Av û berf**], (Sadinî. M.X, r. 17)
- 51- Yekê ji yekê ra got: Dema ez biçim, kesek nikare min bisekinîne. Ê din: Tu ji min re jî dibêjî? Got: Kesê behsa te nekiriye. Çi ye? [**Av û agir**], (Sadinî. M.X, r. 17)
- 52- Tişteki min heye, tim diçe, qet nasekine. Çi ye? [**Av**], (Sadinî. M.X, r. 18)
- 53- Tişteki min heye, her dem tazî ye, tişteki li xwe nake. Çi ye? [**Av**], (Sadinî. M.X, r. 18)
- 54- Tişteki min heye, dimeşe bê ling e, tazî ye tişteki li xwe nake, tim şiyar e qet ranazê. Çi ye? [**Av**], (Sadinî. M.X, r. 18)
- 55- Mamikê mino, diçim newalan, tê xwişîna maran. Çi ye? [**Ava cihokê**], (Sadinî. M.X, r. 196)
- 56- Mamikê mino, piqîn li nizarê Kurdistanê. Çi ye? [**Berf**], (Sadinî. M.X, r. 22)
- 57- Tişteki e ji tiştan e, sîbera wê nadet avê. Çi ye? [**Deng û ba**], (Sadinî. M.X, r. 37)
- 58- Mamikê mino, êvarê reştarî bû, bû sibe çikspî bû. Çi ye? [**Erd û berf**], (Sadinî. M.X, r. 47)
- 59- Mamikê mino, çêlê jûr ve za, golkî banî reqîsî. Çi ye? [**Agir û dûkel**], (Sadinî. M.X, r. 176)
- 60- Mamikê mino, qesra spî ber derî. Çi ye? [**Berf**], (Sadinî. M.X, r. 183)
- 61- Mamikê mino, tişteki min heye, hindî dixwet têr nabît. Çi ye? [**Agir**], (Sadinî. M.X, r. 18)
- 62- Mamikê mino, xaniya maniya, ferşê devê kaniya, rê nadet beniya. Çi ye? [**Cemed**], (Sadinî. M.X, r. 189)

- 63- Mamikê mino, marê mirî erd kunkirî. Çi ye? [**Dilop**], (Sadinî. M.X , r. 194)
- 64- Mamikê mino, sê bira hene, yek hindî dixwet têr nabît, yek hindî rûdinît ranabît, yek li dinyayê belav dibît. Çi ye? [**Agir, xwelî û dûkel**], (Sadinî. M.X , r. 211)
- 65- Ava banî di latê de danî. [**Şironek-mezrîb**], (Güneş. K, r. 26)
- 66- Av dinyayê têr dike, çi avê têr dike? [**Tîna êvarê**], (Güneş. K, r. 26)
- 67- Bi şev û roj diçe, lê naweste. [**Av**], (Güneş. K, r. 28)
- 68- Behra şîn e, av tê nîne. [**Kevz- kez**], (Güneş. K, r. 31)
- 69- Çêlek li hundir dize, golik li banî direqise. [**Agir û dû**], (Güneş. K, r. 42)
- 70- Dibezim dibezim, lê nagihim. [**Av**], (Güneş. K, r. 45)
- 71- Dikim nakim zûwa nake, ez lê nenêrm feyde nake. [**Av**], (Güneş. K, r. 45)
- 72- Dîwana tarî û ronî. [**Şev û roj**], (Güneş. K, r. 53)
- 73- Der û hundur agir e, yek zûwa yek şil e. [**Dinya**], (Güneş. K, r. 53)
- 74- Gava min dît min ava kir, pişt da min xwe winda kir. [**Ronahî**], (Güneş. K, r. 61)
- 75- Gayê zer li kû de were mexel, salekî giya tê de hêşîn nabe. [**Agir**], (Güneş. K, r. 61)
- 76- Giloka reş, avêt piştta heft çiya. [**Şev**], (Güneş. K, r. 65)
- 77- Hatim hêt û hêt, min lê nêrî li min bî pêt. [**Çiya**], (Güneş. K, r. 66)
- 78- Hewa re difire, perê wê tune, dimîne/mîna şekir e, tama wê tune. [**Berf**], (Güneş. K, r. 66)
- 79- Hêlo mêlo, simbêl belo, mîna kala, xwe da pala, şirqîn ketê, çû ezmana. [**Şilf-barîn**], (Güneş. K, r. 71)
- 80- Ji ha heta Handan<sup>227</sup>, kulav radan. [**Berfende-aşîte, şapa berfê**], (Güneş. K, r. 77)
- 81- Ji şikêrê ye, ji têrê ye, ji rêrê ye. Çi ye? [**Gêrûse**], (Güneş. K, r. 79)
- 82- Keçeke min heye, tirba xwe bi destê xwe dikole. [**Dilop**], (Güneş. K, r. 83)
- 83- Li hewa re diçe, baskê wê tune, mînanê şekir e, tama wê tune. [**Berf**], (Güneş. K, r. 88)
- 84- Mamikê mino, ez ji serî dikim dirêj dibe, ez ji rexê dikim pehn dibe. [**Coya avê**], (Güneş. K, r. 93)
- 85- Mexel tê pez tune, dimeşe şop tune. [**Lehî**], (Güneş. K, r. 98)
- 86- Ne kes dikare bixwe ne dikare bipêve. [**Agir**], (Güneş. K, r. 100)
- 87- Qesra spî li ber derî. [**Berf**], (Güneş. K, r. 105)
- 88- Soro rît, gewro avît. [**Agir**], (Güneş. K, r. 110)
- 89- Sîhorê tîktîkî, baz da serê zilîkî, zilîk li bin de hejîkî. [**Dû**], (Güneş. K, r. 114)

---

<sup>227</sup> Navê gundekî Miksê ye.

- 90- Sêvek min heye gelek xweş, nêvî spî ye nêvî reş. [**Roj û şev**], (Güneş. K, r. 118)
- 91- Seriyeke wê li erdê ye, seriyek li ezman e. [**Keskesor**], (Güneş. K, r. 119)
- 92- Mamigê mino mamani, hûr e hûr e, ji kilê siphani hûrtir e, ji minara Sêrtê bilindtir e. [**Dûxan**], (Eren. M, r. 24)

### 13. Mamikên li Ser Wesayîtan

Mamikên di vê beşê de nûjentir in. Çimkî wesayîtan ku tên nasandin ên salên dawî ne. Hin ji wan nêzîkî zarokan in hin ji wan jî dûr in. Yê nêzîkî zarokan wek teyare, keştî û hwd. bala zarokan zêde kişandine. Çimkî li hewaçûyîn an jî li ser avê hereketkirin ne rewşeke asayî ye. Ev yek jî bûye warê meraqê ji bo zarokan. Zarokên sê çar salî her gav derbarê van wesayîtan de ji mezinên xwe pirsan dikin. Wek bersivê mirov dikare van mamikan ji wan re vebêje û hem bi wan bide nasîn hem jî bike amûreke listinê. Di vê beşê de wesayîtan wek “Tirektor, teyare, tirên, gemî, kelek, erebe, patos, erebeya ga, tawik, moşene, balafir” hatine nasandin.

- 1- Cot dike ne ga ye, xwarinê dixwe, birçî nabe. [**Tirektor**], (Berwarî. M, r. 66)
- 2- Ne li erd e, ne li esman e, hêlîna begrewan e. [**Teyare**], (Berwarî. M, r. 67)
- 3- Gayê kejo, li hewa dajo. [**Teyare**], (Berwarî. M, r. 67)
- 4- Agir û asin, kelê mezin, vêkra dibezin. [**Teyare**], (Berwarî. M, r. 67)
- 5- Or or dike, bor bor dike, qesta bajarani dike. [**Tirên**]<sup>228</sup>, (Berwarî. M, r. 70)
- 6- Ne li erd e ne li esman e, hêlîna bet rewan e. [**Gemî**], (Gazî. M, r. 26)
- 7- Ne li erd e ne li esman e, hukmê destê însan e. [**Teyare**], (Gazî. M, r. 26)
- 8- Ne li erd e ne li esman e, mifte li destê însan e. [**Kelek**], (Gazî. M, r. 26)
- 9- Ne li erdê ye ne li ezmanan e, hefsarê wê destê însanan e. [**Gemî**], (Gazî. M, r. 26)
- 10- Tiştê heye ne li erd e ne li ezmana, zincîr li destê însana. [**Gemî**], (Gazî. M, r. 33)
- 11- Mamikê mino, ne li erd e, ne li ezman e, hêlîna betrewan e, şiva destê însan e. Çi ye? [**Kelek**], (Sadîni. M.X, r. 199)
- 12- Gava têr dixwe şa dibe, mû dest didiyê radibe. [**Erebe-seyare**], (Güneş. K, r. 60)
- 13- Gir dixwe, hûr diavêje. [**Patos**], (Güneş. K, r. 66)
- 14- Kerika kerajo, kê te diajo? [**Erebeya ga**], (Güneş. K, r. 85)
- 15- Li ser erdê naçe, li ser golê diçe. [**Keştî**], (Güneş. K, r. 91)
- 16- Li ser golê naçe, li ser erdê diçe. [**Erebe-seyare**], (Güneş. K, r. 91)
- 17- Li ser erdê naçe, li ser berfê diçe. [**Tawik-qol**], (Güneş. K, r. 91)
- 18- Masî nîne lê tim deryayê de ye. [**Keştî**], (Güneş. K, r. 97)

<sup>228</sup> Ji bo avê jî dibêjin.



- 19- Rê diçe, rêç tune, bi lez diçe toz tune. [**Keştî**], (Güneş. K, r. 109)
- 20- Ser dar e, bin kevir e, sê serî ye, deh ling e. [**Moşene**], (Güneş. K, r. 117)
- 21- Sindoqa çar ling, dibeze mîna piling. [**Erebe gerûnde**], (Güneş. K, r. 118)
- 22- Şûva reşî ew dimeşî, dil û cîger pê digeşî. [**Trên**], (Güneş. K, r. 121)
- 23- Tê mîna bayê, serê wê mîna gayê, boça wê mîna seyê. [**Balafir**], (Güneş. K, r. 129)
- 24- Wek şûva reşî, ew dimeşî, dil û cîger pê digeşî. [**Trên**], (Kan. Ş, r. 29)
- 25- Hor hore bor bore, heba pûrtê lê tune. Ew çi ye? [**Trên**], (Baskin. M.Ş, r. 20)

#### 14. Mamikên li Ser Mûzîk û Enstrûmanan

Di nav enstrûmanên mûzîkê de exlebî enstrûman hene ku kurdan bi kar anîne. Ji bilî wan hin amûrên mûzîkê yên mîna radyo jî hatine nasandin. Zarok dê li vir şemayeke ziman a nû biafirîne. Di nav vê şemayê de têgehên wek “radyo, def, bilûr, ney, saz” dê bên bicihkirin.

- 1- Sindoqa tijî têt, deng dide pêl bi pêl. [**Radyo**], (Berwarî. M, r. 71)
- 2- Serî çerm e, binî çerm e, ortê dar e, çirtik çilûrî. Ew çi ye? [**Def**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 430)
- 3- Sorê ser hilû, ket nav qevdek mû, keyfa dîwanê pê xweş bî. [**Bilûl, bilûr**], (Gazî. M, r. 30)
- 4- Tişkî heye dikute bi bizmarkî, deng dere hezarkî. [**Def**], (Gazî. M, r. 31)
- 5- Tişteki min heye, bi qirik e bê ziman e, bi dev e bê diran e, dilorîne ne însan e. Ev çi ye? [**Bilûr**], (Alkan. A, r. 76)
- 6- Tişteki min heye, bê dev e bê diran e, bê kinc e, tev eyar e, li dawetê li dar e. Ev çi ye? [**Def**], (Alkan. A, r. 76)
- 7- Ez çûme serê banekî, min lêxist gopalekî, deng çû welatekî. [**Def**], (Akbaş. E, r. 67)
- 8- Mamikê mino, ser darok e, bin darok e, yê di bin de tirî û rêya bizirokê. Çi ye? [**Def**], (Sadinî. M.X , r. 36)
- 9- Mamikê mino, bab yê razayî, biçûk û miçûkan, serên xwe pê ve nayî. Çi ye? [**Ney**], (Sadinî. M.X , r. 109)
- 10- Mamikê mino, bilbilê bi hezar dangan e. Çi ye? [**Radyo**], (Sadinî. M.X , r. 120)
- 11- Bûk li sindoqê, deng li zaboqê. [**Radyo**], (Güneş. K, r. 28)
- 12- Bilbila rengî, derdixe hezar dengî. [**Radyo**], (Güneş. K, r. 33)
- 13- Diçim nava dehlekî, tê çirîna marekî. [**Bilûr**], (Güneş. K, r. 46)
- 14- Darê hişkê gûz, derfîne dengê bi bandor û zîz. [**Bilûr**], (Güneş. K, r. 50)
- 15- Hilûse wey ava pêlê, gava mû radihêjiyê jê tê dengê têtê. [**Saz**], (Güneş. K, r. 73)

16- Ji min tenê re fihêt nake, di civatê de deng nake. [**Radyo**], (Güneş. K, r. 77)

17- Timî dizire, ji bavê xw mezintir e. [**Def**], (Güneş. K, r. 129)

18- Darê min ê hişkegûz, dertîne dengê bandor û zîz. [**Bilûr**], (Kan. Ş, r. 28)

### 15. Mamikên li Ser Demê

Zarok têgehên demê heya pênc şeş saliya xwe ji hev dernaxînin. Ango ji aliyê geşedana zêhnî ve zarok hêj negihîştine asta kiryarên razber. Lê hin têgehên wek havîn, zivistan û hwd. ji ber ku zêde ne tevlihev in, zarok dikarin berî pênc şeş saliya xwe jî fêrî wan bibin. Her ku zarok mezin bibin, divê mirov li gorî temenê wan têgehan bi wan bide nasîn. Dema ku em bala xwe bi giştî bidine mamikan, em ê têgehên wek “Newroz, sal, havîn, îni, heft rojên hefteyê, heyvên biharê, demsal, dozdeh meh, wext, meh, dehkên heciya, rojên salê, bihar, hatina payîzê” fêr bibin.

1- Daran movik anî, mêşan hingiv anî, miyan şîr anî, kewan rê danî, fesad tazî mayî, mîran xwe da alî, gayan şer hilanî. [**Newroz û hatina biharê**], (Berwarî. M, r. 73)

2- Dara bayê, 12 tayê, her tayekê hêlîneka lê, her hêlînekê hêkeka tê da, her hêkekê navê xwe yê hey. [**Sal**], (Berwarî. M, r. 78)

3- Çar bira ne, çar diyar, yek germ, yek hênîk, yek şilî, yek sar. [**Sal**], (Berwarî. M, r. 78)

4- Çûme bestekê, min av vexwar bi mistekê, 12 aş geriyan li ser bistekê. [**Sal**], (Berwarî. M, r. 79)

5- Mamê Xelîl e, dergihê wî bi 12 kilîl e. [**Sal**], (Berwarî. M, r. 79)

6- Mencela Hembelî, birrêne ya dikelî, ne agir e ne xwelî. [**Havîn**], (Berwarî. M, r. 79)

7- Mencela Indelî, pirç pirç dikelî, ne agir e, ne xwelî. [**Havîn**], (Berwarî. M, r. 79)

9- Çûme serê darekê, radihêlim hişke hewarekê, sed mêr dihên bi carekê. [**Roja xotbê/îni**], (Berwarî. M, r. 79)

10- Roja navî, şeva navî, 7 bira li pey hev direvî. [**Heft rojên heftiyê**], (Berwarî. M, r. 83)

11- Sê sênîkên savarê, dudi sar in, êk germ e. [**Heyvên biharê**], (Berwarî. M, r. 85)

12- Sê bih in, sê zerdebih in, sê hinar in, sê jehremar in. [**Demsal**], (Berwarî. M, r. 85)

13- Çar bira ne bi qasî hev, derbas dibin li dû hev, yek germ e, yek sar e, di yekê de Adar e, di ya din de Mijdar e. [**Demsal**], (Berwarî. M, r. 85)

14- Sêsid û şêst reşêle, donzdeh ga, du çêlek, nîvîyê reş, nîvîye belek. Ew çi ye? [**Sal, donzdeh meh û rojê salê**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 408)

- 15- Şeşê reş, şeşê belek, du box in donzdeh çêlek, Ew çi ye? [**Sal, donzdeh meh û rojê salê**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 409)
- 16- Tiştêk heye bê ruh e, lê dimeşe. Ew çi ye? [**Wext**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 410)
- 17- Tişkî min heye reş e reş e reşçêlek, nivî reşnivî belek, du ga donzde çêlek. [**Reşçêlek: sal e. Nivî reş nivî belek: şev û roj e. Du ga: her du îd in, îda qurbanê û îda remezanê, Donzde: donzde meh in.**], (Gazî. M, r. 33)
- 18- Tiştêkî min heye, dara benavê, donzde gul terin navê, her gulekî sîh şax e, her şaxekî bi pênc bera ye. Ev çi ye? [**Sal, meh û hefte**], (Alkan. A, r. 78)
- 19- Mamikê mino, deh in nabin yanzdeh. Çi ye? [**Dehkên heciya**], (Sadinî. M.X , r. 36)
- 20- Mamikê mino, çar in nabin pênc. Çi ye? [**Demên salê**], (Sadinî. M.X , r. 37)
- 21- Mamikê mino, diwazde ne nabin sêzde. Çi ye? [**Heyvên salê**], (Sadinî. M.X , r. 65)
- 22- Mamikê mino, heft in nabin heşt. Çi ye? [**Rojên heftê**], (Sadinî. M.X , r. 121)
- 23- Dara benavê, diwanzde gul diçin navê, her gulek bi sîh şoxa, her şoxek bi pênc bira ye. Çi ye? [**Sal, meh, hefte**], (Sadinî. M.X , r. 123)
- 24- Mamikê mino, duwanzde mil in, her milekê sîh şiv in, her şivekê pênc gul in. Çi ye? [**12 meh, 30 roj, 5 wext nimêj**], (Sadinî. M.X , r. 166)
- 25- Tiştê mino tiştanî, helîl û melîl, dergehêk e û duwanzde kilîl. Çi ye? [**Sal û remezan**], (Sadinî. M.X , r. 172)
- 26- Mamikê mino, daran movik îna, maran hingivîn îna, mihan şîr îna, fêsad tazî man, mîran xwe da alî, gayan şer hilanî. Çi ye? [**Bihar**], (Sadinî. M.X , r. 193)
- 27- Mamikê mino, çiyayekî diwanzde mil, her milekî sîh dar tê da ne, har darekê pênc gul pê ve ne. Çi ye? [**Sal, heyv, pênc wext nimêj**], (Sadinî. M.X , r. 210)
- 28- Darek, duwazdeh şax û sî çêlik. [**Sal, meh, roj**], (Güneş. K, r. 53)
- 29- Ez diçim ew diçe, ez disekinim ew diçe. [**Zeman-dem**], (Güneş. K, r. 58)
- 30- Morî kişiya, erd hejiya. [**Hatina payîzê**], (Güneş. K, r. 98)
- 31- Dara movik anî, maran hingiv anî, miyan şîr anî, kewn xwe rê danî, fêsad tazî mayî, mîran xwe da alî, gayan şer hilanî. Ew çi ye? [**Nemroz**], (Baskin. M.Ş, r. 23)

## 16. Mamikên li Ser Esmannasiyê

Ji bo zarokan esmannasî yek ji qadên efsanewî û fantastîk e. Piştî ku zarok derbasî heyama hînbûna bêjeyan dibin, tiştên ku meraq dikin her gav ji mezinên xwe dipirsin. Di nav van tiştan de gelek caran tiştên ku ji wan re pir ecêb dixuyên, cih digirin. Di mamikên kurdî de di vê qadê de têgehên wek “Esman û sitêr, hetav û roj,

ewr, hîv, roj, tava êvarê, hîva nivî, tîrêncê tevê, erd û ezman, birq, birûsk, dinya” hatine nasandin.

- 1- Şkefta reş, tijî gayên beş. **[Esman û sitêr]**, (Berwarî. M, r. 77)
- 2- Sêniya can, tijî mercan. **[Esman û sitêr]**, (Berwarî. M, r. 77)
- 3- Mêrga şîn, tijî helal û beybîn. **[Esman û sitêr]**, (Berwarî. M, r. 77)
- 4- Dersokeya gulgulî, tijî sêvên sorgulî. **[Esman û sitêr]**, (Berwarî. M, r. 77)
- 5- Kepreka bê stûn e. **[Esman û sitêr]**, (Berwarî. M, r. 77)
- 6- Tenûra dimdimî/zimzimî, tijî nanê genimî, spêdê rabîn xetimî. **[Esman û sitêr]**, (Berwarî. M, r. 77)
- 7- Tişteke ji cihê xwe nalivit û li hemî erda digêrhit. **[Hetav û roj]**, (Berwarî. M, r. 77)
- 8- Tenûra metê pelek ketê. **[Sitêr]**, (Berwarî. M, r. 77)
- 9- Sênîka mircanan, li serê banan. **[Sitêr]**, (Berwarî. M, r. 77)
- 10- Mêzera sultanî, tijî sêvên zemanî. **[Sitêr]**, (Berwarî. M, r. 77)
- 11- Pezê Mihema êvara kete çema, sipêdê rabûm lib jê nema. **[Sitêr]**, (Berwarî. M, r. 77)
- 12- Mencela çiftê, qirpên keftê. **[Ewir]**, (Berwarî. M, r. 77)
- 13- Tiştikê min tişto, difirit yê bê per e, digirit yê bê çav e. **[Ewir]**, (Berwarî. M, r. 77)
- 14- Weke kulavekî sûtî ye, ji vir heta Bexda raxistiye. **[Ewir]**, (Berwarî. M, r. 77)
- 15- Tasa/elba mast, li guhara rast. **[Hîv]**, (Berwarî. M, r. 77)
- 16- Cama mastî, li ser destî, req rawistî. **[Hîv]**, (Berwarî. M, r. 78)
- 17- Bazina sitiyê, kete kaniyê, şewqê da Amêdiyê. **[Hîv]**, (Berwarî. M, r. 78)
- 18- Bizna kal, li ser berekê val, hindî gazî dikimê nahête mal. **[Hîv]**, (Berwarî. M, r. 78)
- 19- Hespê belek, li binê deştê bû xelek. **[Hîv]**, (Berwarî. M, r. 78)
- 20- Bazinkê Sitîyê, keft kanîyê, şewq da Amêdiyê. **[Roj]**, (Berwarî. M, r. 78)
- 21- Zerîfa serbanî, keziyên şurrbine binê banî. **[Roj]**, (Berwarî. M, r. 78)
- 22- Serê dinê, binê dinê, du guhîj bi tenê. **[Esman, heyv û roj]**, (Berwarî. M, r. 78)
- 23- Behra şîn e, av tê nîne, 2 mar tê da xişîne, êk hesp e, êk mahîn e. **[Esman, heyv û roj]**, (Berwarî. M, r. 78)
- 24- Her her dîwar, ber ber dîwar, xanim yek e, carî hizar. **[Hîv û stêr]**, (Berwarî. M, r. 78)
- 25- Her her diyar, merr merr diyar, çil kose, du xanim, gulî hizar. **[Roj, hîv û stêr]**, (Berwarî. M, r. 78)
- 26- Behra şîn e, du mar tê da xişîne. **[Roj û hîv]**, (Berwarî. M, r. 78)
- 27- Tata şîn e 2 hesp pê ve hejîne. **[Roj û hîv]**, (Berwarî. M, r. 78)

- 28- Serê dinê, binê dinê, du kon jê tenê. [**Roj û hîv**], (Berwarî. M, r. 78)
- 29- 366 quling, hêlînek e û 2 têjik. [**Hijmara rojê salê, esman, heyv û roj**], (Berwarî. M, r. 83)
- 30- Av dinîyayê têr dike, çi avê têr dike? [**Teva êvarê**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 409)
- 31- Tiştêkî min heye, serê dinê, binê dinê, du partosê tek û tinê. Ew çi ye? [**Hîv û roj**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 409)
- 32- Ew kî ye ku mehê carekê kal dibe dimire û dîsa dizê. [**Hîv**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 409)
- 33- Kofiya Xezalê, dot bû newalê, ew çi ye? [**Hîv**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 409)
- 34- Kerî kete ser stêr. Ew çi ye? [**Hîva nîvî**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 409)
- 35- Tiştêkî min heye tiştanok, kîskê kapa darda, deqê min î nav da. Ew çi ye? [**Stêrkê ezmana û hîv**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 409)
- 36- Tendûra zimzimî, tijî nanê genimî. Ew çi ye? [**Stêrk**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 409)
- 37- Hildikişime ser zinarekî, lê dixim deng diçe hezarekî. Ew çi ye? [**Ewr û ezman**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 410)
- 38- Hêlva tê, kendêlva tê, porsorê nermêva tê. Ew çi ye? [**Tîrênc tevê**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 410)
- 39- Tiştêkî min heye tiştanok, vira danî, wira danî, kulekê ra derket. Ew çi ye? [**Tîrênc Tevê**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 410)
- 40- Rojê bûk e, şevê pepûk e. Ew çi ye? [**Stêr**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 424)
- 41- Tiştêkî min heye, rojê dixemile, şevê ditemire. Ew çi ye? [**Stêr**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 424)
- 42- Çûme serê zinarkî, lê bixin gopalkî, deng here hezar û yekî. [**Erd û ezman**], (Gazî. M, r. 15)
- 43- Diçim serê zinarkî, dikutim nal û bizmarkî, deng diçe heftê û yek hezarkî. [**Ewr û esman**], (Gazî. M, r. 16)
- 44- Dîzika daniya, piştî xaniya. [**Stêrk**], (Gazî. M, r. 17)
- 45- Kumê xezalê, gêr bû newalê. [**Hîv**], (Gazî. M, r. 22)
- 46- Kumê mellê, li ser golê. [**Hîv**], (Gazî. M, r. 22)
- 47- Kulavê pevdadayî, ji vir heta Bexdayê. [**Ewr**], (Gazî. M, r. 22)
- 48- Pezê Elî hemuya min berda çema, sibehî ez rabûm liv/lib, heb jî jê nema. [**Steyr**], (Gazî. M, r. 26)
- 49- Sênî li ser sênî, deng dere Husênî. [**Ewr**], (Gazî. M, r. 28)

- 50- Tişteki min heye; bi şev razam hewş tije bû, sibehê rabû yek tune bû. Ev çi ye? **[Stêrik]**, (Alkan. A, r. 75)
- 51- Tişteki min heye, besteke reş tije çirîsk, ne agir lê heye ne xwelî. Ev çi ye? **[Ezman û stêrik]**, (Alkan. A, r. 76)
- 52- Tişteki min heye, dîzika daniya li ser xaniya. Ev çi ye? **[Esman û stêrik]**, (Alkan. A, r. 79)
- 53- Tişteki min heye, ez çûm ser dîwarekî, min kuta bizmarekî, deng çû hezarekî. Ev çi ye? **[Birq]**, (Alkan. A, r. 79)
- 54- Tişteki min heye, Ew kî ye ku mehê carekê kal dibe, dimire û dîsa sax dibe tê dinyayê? **[Hîv]**, (Alkan. A, r. 28)
- 55- Tişteki min heye, teşte mast, li derek rast. Ev çi ye? **[Hîv]**, (Alkan. A, r. 75)
- 56- Tişteki min heye, ji vir heta Mûsil, qîzikên çav bi kil. Ev çi ye? **[Stêrik]**, (Alkan. A, r. 83)
- 57- Tişteki min heye, bê dar û bê stûn e. Ev çi ye? **[Ezman]**, (Alkan. A, r. 92)
- 58- Tişteki min heye, zevîya şîn, mara li ser xwişîn. Ev çi ye? **[Birq û ezman]**, (Alkan. A, r. 103)
- 59- Tişteki min heye, garana mama, girt ser çema, bû sibeh yek jê nema. Ev çi ye? **[Ezman û stêrik]**, (Alkan. A, r. 104)
- 60- Tişteki min heye, kofîya xezala, tot bû li çîya û newala. Ev çi ye? **[Hîv]**, (Alkan. A, r. 103)
- 61- Tişteki min heye, tişte min ê ji tiştan e, li ser banê xiştan e. Ev çi ye? **[Sitêrik]**, (Alkan. A, r. 104)
- 62- Tişteki min heye, kofîya hişîn, tev hêkên neqşîn. Ev çi ye? **[Ezman û stêrik]**, (Alkan. A, r. 106)
- 63- Deng tê ji ezmanan, qîjîn dikeve newalan. **[Birûsk]**, (Akbaş. E, r. 69)
- 64- Mamikê mino, holhol dike, golgol dike qesta derê Stenbol dike. Çi ye. **[Birûsk]**, (Sadinî. M.X , r. 28)
- 65- Mamikê mino, du ye nabe sê. Çi ye? **[Heriv; heyv û roj]**, (Sadinî. M.X , r. 63)
- 66- Mamikê mino, keziya xezalê, davêje newalê. Çi ye? **[Heyv]**, (Sadinî. M.X , r. 64)
- 67- Mamikê mino, teşte mast, li dereke rast. Çi ye? **[Hîv-heyv]**, (Sadinî. M.X , r. 69)
- 68- Mamikê mino, quncikê tarî, nûr lê barî. Çi ye? **[Tîrêj]**, (Sadinî. M.X , r. 140)
- 69- Mamikê mino, çûme mêrgeke şîn, du mar tê da xişîn, yek hesp e yek mehîn. Çi ye? **[Roj û heyv]**, (Sadinî. M.X , r. 164)

- 70- Mamikê mino, gel şaxê spêdê, dizek tête xanî. Çi ye? [**Tîrêjkên rojê**], (Sadinî. M.X, r. 170)
- 71- Mamikê mino, şevê xemilîne, rojê vemirîne. Çi ye? [**Stêrk**], (Sadinî. M.X , r. 174)
- 72- Mamikê mino, dersûka mermerî, tijî şevêde heyderî. Çi ye? [**Asman û stêr**], (Sadinî. M.X , r. 176)
- 73- Mamikê mino, serê dinê binê dinê, du guhîj tinê. Çi ye? [**Roj û heyv**], (Sadinî. M.X, r. 184)
- 74- Mamikê mino, diçim ser zinarekî, diqutim bizmarekî, deng diçît hezarekî. Çi ye? [**Brûsk**], (Sadinî. M.X , r. 194)
- 75- Mamikê mino, şev têt şemal têt, gah têt gopal têt, nik padişah û sultan têt. Çi ye? [**Heyv**], (Sadinî. M.X , r. 197)
- 76- Mamikê mino, we zer e wekî hêkerûnê, we xwar e wekî daska dirûnê, bêje da aqil bête şûnê. Çi ye? [**Heyv**], (Sadinî. M.X , r. 206)
- 77- Bazina elê, avêt kelê. [**Roj-tav**], (Güneş. K, r. 27)
- 78- Bi roj vedimire, bi şev vêdikeve. [**Istêrek, stêrk**], (Güneş. K, r. 29)
- 79- Bi şev xuya ye, bi roj winda ye. [**Stêrk**], (Güneş. K, r. 30)
- 80- Bizina kal, li ser kendal, yah yah dikim nayê xwar. [**Heyv**], (Güneş. K, r. 33)
- 81- Çavê ga li kadînê, çi ye? [**Hîv**], (Güneş. K, r. 39)
- 82- Dîzika mîra şikest, deng li dinê ket. [**Birîsk-birûsk**], (Güneş. K, r. 47)
- 83- Distar li ser distarê, deng li erşê Xudanê. [**Ewr û esman**], (Güneş. K, r. 47)
- 84- Der têt diwara, lê dixin bizmara, dengê wê diçe erş û ela. [**Birûsk**], (Güneş. K, r. 50)
- 85- Di gir de naşewite, di avê de şîn nabe. [**Roj-tav**], (Güneş. K, r. 53)
- 86- Desteke reş tije çirîsk, ne agir lê heye ne xwelî. [**Ezman û stêrk**], (Güneş. K, r. 54)
- 87- Dersoka mermerî, tijî sêvê heyderî. [**Esman û stêrk**], (Güneş. K, r. 55)
- 88- Ez derketim dîwarkî, min kutiya bizmarkî, deng çû hezarkî. [**Birûsk-ewr**], (Güneş. K, r. 59)
- 89- Êvarê di ezmên de dirnî ye, siwê radibim ku tuneye. [**Stêrek**], (Güneş. K, r. 60)
- 90- Fincan dor bi deq, heya Şam û şerq. [**Roj û heyv**], (Güneş. K, r. 60)
- 91- Hesenê meman, pez bir çeman, sibê rabû, yek jê neman. [**Stêrk**], (Güneş. K, r. 67)
- 92- Ji hire û afirê, çawa deynê welê difirê. [**Heyv**], (Güneş. K, r. 77)
- 93- Ji Mûsil heya Mûsil, çel keçikên çav bi kil. [**Stêrk**], (Güneş. K, r. 78)
- 94- Ji Beda heya Bexda, çel kulavê li hev rada/pêçandî. [**Ewr**], (Güneş. K, r. 78)
- 95- Ji vir heta Helebê, hema têtê qesebê? [**Tîrêjên rojê**], (Güneş. K, r. 81)
- 96- Ji vir heya Êrêwanê, weke kulavekê sûviya. [**Ewr**], (Güneş. K, r. 82)

- 97- Kofiya xezalê, tûtiya newalê. [**Hîv**], (Güneş. K, r. 83)
- 98- Koka xwe berjor e, guliyê xwe berjêr e, livê dinyayê çi ye? [**Roj**], (Güneş. K, r. 84)
- 99- Mêrgeşîn mêrgeşîn, du siwar tê de xuşîn, yek hesp e yek mehîn. [**Heyv û roj**], (Güneş. K, r. 98)
- 100- Newaleke kûr tije genimê hûr. [**Asîman**], (Güneş. K, r. 100)
- 101- Serê dinê binê dinê du gidîş tenê. [**Heyv û roj**], (Güneş. K, r. 112)
- 102- Sênî li ser sênî, deng diçe Hiseynî. [**Dengê ewran**], (Güneş. K, r. 113)
- 103- Tenûra metê, kadek ketê, destê kesek negihijitê. [**Heyv**], (Güneş. K, r. 123)
- 104- Tendûra himhimî, tijî nanê genimî, bi ev tijî bi roj hedimî. [**Stêrk**], (Güneş. K, r. 123)
- 105- Tişteki min ji tiştan e, li ser bana xiştan e. [**Stêrk**], (Güneş. K, r. 128)
- 106- Wek kulaveki sûtî ye, ji vir heta Bexdayê raxistiye. [**Ewr**], (Güneş. K, r. 132)
- 107- Weke hêkê ye, lê ji wê girantir tuneye. [**Dinya**], (Güneş. K, r. 133)
- 108- Xalkî xala, çû pişt mala, şingîn kete ezmana. [**Birûsk**], (Güneş. K, r. 134)
- 109- Nûra li ser xaniya, ronî daye baniya. [**Roj**], (Kan. Ş, r. 22)
- 110- Mamikê mino mamanî, rê ve diçit bê pê ye, digirt bê çav e, çi ye? [**Ewr**], (Kan. Ş, r. 22)
- 111- Serê dinê binê dinê, du hejîrokên tenê tenê. Ew çi ye? [**Roj û heyv**], (Baskin. M.Ş, r. 23)
- 112- Mamigê mino mamanî, piyana cam li erdê ket, deng li dinê ket. [**Birûsk**], (Eren. M, r. 19)

### 17. Mamikên li Ser Rewşa Hewayê

Di zimanê rojane de têgehên li ser hewayê, gelek caran tên bikaranîn. Zarok jî di temenekî zû de bi bûyerên hewayî re rûbirû dimînin. Bi vê mebestê jî fêrî van têgehan dibin. Di nav mamikên jêrê de têgehên li ser rewşa hewayê ev in: “Birwisî, mij, baran, ba, cemed, qeşa, berf, qerîsek, zîpik”

- 1- Deng tê ji esman, qîjîn dikeve newala. [**Birwisî**], (Berwarî. M, r. 79)
- 2- Guloka mû, li çiyê wer bû. [**Mij**], (Berwarî. M, r. 79)
- 3- Marê mirî, erd qul kirî. [**Baran**]<sup>229</sup>, (Berwarî. M, r. 79)
- 4- Ga di ser ra diborî, çêl li çema avis dibî. [**Ba**], (Berwarî. M, r. 79)
- 5- Hanîka manîka, ferşê ber devê kanîka. [**Cemed/qeşa**], (Berwarî. M, r. 79)
- 6- Anîkê manîkê, çû ber kanîkê, rê neda heywanekê. [**Cemed/qeşa**], (Berwarî. M, r. 79)

<sup>229</sup> Wekî meteloka dilopê.



- 7- Hat wekî mîra, rûnişt wekî wezîra, çû wekî feqîra. **[Befir/berf]**, (Berwarî. M, r. 80)
- 8- Sipî ye ne şekir e, difire lê bêper e. **[Befir/berf]**, (Berwarî. M, r. 80)
- 9- Gayê kejo, di esmanî re diajo. **[Befir/berf]**, (Berwarî. M, r. 80)
- 10- Ebabekrê li ber dîwara. **[Befir/berf]**, (Berwarî. M, r. 80)
- 11- Spî ye ne şekir e, difire bê perr e, çîyan di bin xwe de digire. **[Befir/berf]**, (Berwarî. M, r. 80)
- 12- Dihêt şîr e, dirûnit mîr e, diçit ebdal û êxsîr e. **[Befir/berf]**, (Berwarî. M, r. 80)
- 13- Lez e bez e, wekî fesal hev e, wê merîya vegevize. Ew çi ye? **[Ba]**, (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 410)
- 14- Hûr hûr barî, hey hey barî, deşt û banî, her çar alî, girt û danî. Ew çi ye? **[Berf]**, (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 410)
- 15- Wê da tê wezîr e, rûdinê qisîl e, radibe hêsîr e. Ew çi ye? **[Berf]**, (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 411)
- 16- Avê dikim selekê, dimîne weke berê. **[Cemed]**, (Gazî. M, r. 13)
- 17- Ji vêdê heta Baxdayê, hemû kulavê radayî. **[Berf]**, (Gazî. M, r. 20)
- 18- Hanyana manyana, ferşê deryê kanyana, rê nade karwanyana. **[Qerîsek]**, (Gazî. M, r. 19)
- 19- Kofiya delalê, baz da newalê. **[Zîpik]**, (Gazî. M, r. 22)
- 20- Mamikê min ê mamanî, ji vira û Mûsil, moriya sinsil. **[Teyrûk]**, (Gazî. M, r. 24)
- 21- Tiştêkî min heye, kûpikê xezala, gindirî binê newala, Ev çi ye? **[Teyrok, terez]**, (Alkan. A, r. 84)
- 22- Tiştêkî min heye, sar e bê deng e, ne xuya ye, nayê girtin bê reng e. Ev çi ye? **[Ba]**, (Alkan. A, r. 90)
- 23- Tiştêkî min heye, li ser ban û xanîka, bû tip tipa noka. Ev çi ye? **[Teyrok, tediz]**, (Alkan. A, r. 105)
- 24- Mamikê mino, sar e bi deng e, ne xuya ye, nayê girtin û bê deng e. Çi ye? **[Ba]**, (Sadinî. M.X , r. 19)
- 25- Mamikê minê mamanî, ji vira heta Mûsil, hemî moriyên sinsil. Çi ye? **[Baran]**, (Sadinî. M.X , r. 19)
- 26- Mamikê mino, girêka mû, li serê çîyan belav bû. Çi ye? **[Mij]**, (Sadinî. M.X , r. 101)
- 27- Mamikê mino, eger hat wezîr e, eger rûnişt mîr e, eger rabû êxsîr e. Çi ye? **[Berf]**, (Sadinî. M.X , r. 167)
- 28- Camiya kurtisandî, li ser xaniya reqîsandî. **[Zîpik]**, (Güneş. K, r. 35)

- 29- Ji hire û Balûka<sup>230</sup>, bî tivtîva nohka. [**Teyrok-zîpik**], (Güneş. K, r. 78)  
 30- Ji dûr ve pir xuyaye, ji nêz ve nexuyaye. [**Mij**], (Güneş. K, r. 82)  
 31- Kofîya xezalê dol bû newalê. [**Gijlok-teyrok-zîpik**], (Güneş. K, r. 83)  
 32- Tizbeha delalê, gindirî binê newalê. Ew çi ye? [**Teyrok**], (Baskın. M.Ş, r. 22)

### 18. Mamikên li Ser Mantiq û Matematîkê

Em di vê beşê de ji fêrkirina ziman û têgehên zêdetir, li ser pêşdebirina geşedana zêhnî ya zarokan sekinîne. Çimkî di nav mamikan de kiryarên mantiqî û matematîkî tî xwestin. Ev mamik dê di serdema dibistanê de zêdetir bi kêrî zarokan bî. Zarok dê bi van mamikan qabiliyeta xwe ya kiryarên şênber pêş bixin.

1- Qazî bi qîzê va, mella bi jinê va, çar sêv bi darê va, her yek yekê jê dike, yek dimîne pê va. [**Qîza qazî jina mela ye.**], (Berwarî. M, r. 84)

2- 9 tenûrên neh nan, her nanekê 9 kutilk li ser, her kutilkekê 9 pişik li ser, her pişikê 9 tejk li ber. Hijmara têjkan çendin? [**9 tenûr, 81 nan, 729 kutilk, 6561 pişik, 59049 têjik**], (Berwarî. M, r. 85)

3- Refeka çûçika difirin. Çûçekê dî li ser darê gutê: hûn çend çûçik in? Êkê bersiva wê da û gutê: em û hindî me, nîveka me û çarêka me li gel te dê bîne sed. Erê hemî çend çûçik in? [**Hawkêşa cebriye: me girtî jimara refa çûçika [S] e. Loma:  $S+S+0.5S+0.25S+1=100$ ,  $2.75S+1=100$ ,  $2.75S=100-1=99$   $S=99/2.75= 36$  jimara wan teva 36 çûçik in.**], (Berwarî. M, r. 86)

4- Refeka teyra gute refeka teyrên dî: heke êk ji we bête nav me, em dê sê car hindî we lêhêyin. Refa dî gutê: Na! Heke êk ji we bête nav me em dê hindî êk lêhêy in. Erê jimara her refekê çend bûn? [**3, 5**], (Berwarî. M, r. 86)

5- Bi pêstirê serkeftime ser kela Hewlêrê. Min pêpkên wê du du hijmartin êk di ma, sê sê hijmartin êk di ma, çar çar hijmartin êk di ma, pênc pênc hijmartin êk di ma, şeş şeş hijmartin her êk di ma. Hijmara pêpka çend in? [**61, 121**], (Berwarî. M, r. 86)

6- Xirarekê gûza du du danêy êk dimînit. Sê sê danêy du dimînin. Çar çar danêy sê dimînin. Pênc pênc danêy çar dimînin, Şeş şeş danêy pênc dimînin. Heft heft danêy şeş dimînin. Heşt heşt danêy heft dimînin. Neh neh danêy heşt dimînin. Deh deh danêy neh dimînin. Erê xirarî çend gûz tê da ne? [**2519 gûz**], (Berwarî. M, r. 86)

7- Du pîrejina her êkê selkeka/sebeta hêka hebû. Heke pîrejina êkê du hêka bidete pîrejina dî dê hêkên wan wek hev bin. Heke pîrejina du yê du hêka bidete ya êkê dê hêkên pîrejina êkê bine du hindî ya duyê. [**10, 14**], (Berwarî. M, r. 86)

<sup>230</sup> Navê gundekî Dihê ye.

8- Jinekê hêk difiroştin. Zelamekî nîveka hêka û nîv hêk jê kirîn. Zelamekê dî nîva hêkên may û nîv jê kirîn. Zelamekê sê nîva hêkên may û nîv jê kirîn bêy çî bimînin. Erê çend hêk wê jinê hebûn? [ $7/2=3.5$ ,  $3.5-0.5=3$ ,  $3/2=1.5$ ,  $1.5-0.5=1$ ,  $1/2=0.5$ ,  $0.5-0.5=0$  (**7 hêk hebûn**).], (Berwarî. M, r. 86)

9- Sê kes çûne xaringehê xarnê bixun. Paştî xarê viyan parê xarnê bidin. Yê êkê gute xwediyê xaringehê çendê bideme te? Xodanê xaringehê gutê: parên/dexlê min çend tê da ne tu jî hindê bike tê da û heşt derhema jê rake. Her heman axiftin jî gute yê duyê û sêyê. Domahiyê lê nêrî ku çî pare bo nemane? Erê parê wî bi xwe/dexil çend bû? [**7+7-8=6**, **6+6-8=4**, **4+4-8=0** (**7 derhem bûn**).], (Berwarî. M, r. 87)

10- Nesaxekî sêvek dixwest. Li baxekî sêv difiroştin, lê di heft dergiha ra bac/gomrik werdigirtin. Li her dergihekî nîva sêva bac distendin, divê çend sêva ji baxvanî bikin heta sêvekê bigehînine nesaxî? [**128 sêv**], (Berwarî. M, r. 87)

11- Sê bira sê celebên pezî hebûn. Hineka êk berx, hineka du berx û hineka sê berx li ber bûn. Wan pezên xwe li xwe parve kirin, her êkî deh pez û bîst berx gihanê bi mercekî çî berx ji diya xwe neqe. Erê wan çend pezê êk berxî, du berxî û sê berxî hebûn? [**3x** (**3 pezê êk berxî**, **4 pezê du berxî**, **3 pezê sê berxî**), (Berwarî. M, r. 87)

12- Sed Dînarê te yê heyn bû kirîna sed pezî (mih, beran, berx). Her beranek bi 5 Dînara ye, her mihek bi Dînarekê ye û her berxek bi Derhemekê ye. Erê çawa dê kirî ku parê te têra te bikit û çî ji ber zêde û kêm nebin û ji hemî toxma bikirî? [**19 beran/95 Dînar**, **1 mih/ 1 Dînar**, **8 berx/ 4 Dînar**], (Berwarî. M, r. 87)

13- Bi sed Dînara divê sed dewara (hesp, hêstir û ker) bikirî, bi mercekî her hespek bi 4 Dînara ye, her hêstirek bi nîv Dînarê ye û her kerek bi çareka Dînarê ye. [**15 hesp/60 Dînar**, **75 hêstir/37.5 Dînar**, **10 ker/ 2.5 Dînar**], (Berwarî. M, r. 87)

14- Êkî du sêv dane du kurr û du baba her êkî sêvek geştişê. [**Kur, bab û bapîr**], (Berwarî. M, r. 88)

15- Aşvan bi xwe û jina xwe ra, karwanî bi xwe û xweşka xwe ra. Sê hinar danê her êkê/i hinek giheştê. [**Jina aşvanî xûşka karwançî ye**.], (Berwarî. M, r. 88)

16- Sê candara bi hev ra sê ser, şeş çav û du ling hene. [**Masî, mar, kew**], (Berwarî. M, r. 88)

17- Mela û jina xwe, qeşe û jina xwe, mamosta û jina xwe divên li rûbarî bi gemiyê ku bê xwedî ye û tenê du kesan digire derbaz bibin. Vana teva bawerî bi hevdu nîne û dilxirab in. Gelo çawa ev hemû bê alozî dê derbaz bibin? [**Her sê jin bi du caran derbaz dibin. Jina Mamostay vedigere û gemiyê diînit. Qeşe û mela bi gemiyê derbaz dibin. Mela û jina melay vedigerine ve. Mela û mamosta jinên xwe dihêlin**

**û derbaz dibin. Jina qeşey bi du caran her du jinên dî derbaz dikit.**], (Berwarî. M, r. 88)

18- Mirovekî gurek, mihek û cihalekê cihî hebû, dixwest li rûbarî derbaz bibit, gemiyek hebû xwedî û tiştêk ji wan bi tinê digirt. Gelo ew zelum dê çawa xwe û tiştên xwe derbaz kit bêy ku hevdu bixûn? [**Zelum bo cara êkê dê mihê derbaz ket, gurg û cih li wir dihêlit. Paşî vedigere gurgî dibe û mihê li gel xwe vedigerîne ve. Vê carê mihê li wêrê dihêlit cihî dibe li gel xwe. Cara dawî vedigere mihê jî bi xwe ra dibe. Bi vî rengî hemuyan derbaz dikit.**], (Berwarî. M, r. 88)

19- Sih kes di gemiyekê da bûn, di niva deryayê da diçûn. Ji wana 15 Mosilman bûn yên dî Bitperist bûn. Gemî kun dibit, çare divêt 15 kes jê dakevin da gemî niqum nebit. Wesa rêk keftin ku xwe rêz ken û her carê heşt kesa bijmêrin yê nehê derxînin. Wisa hatine rêzkirin ku her 15 Bitperist havêtine avê û her 15 Mosilmana xwe rizgarkirin û bi silametî gihan rexê avê. Erê vana çawa xwe qurtalkirin? [**X=Mosilman, += Bitperist Rêzkirna wan bi vî rengî bû. XXXX +++++ XX + XXX + X ++ XX +++ X ++ XX +**], (Berwarî. M, r. 88)

20- Sê kes bi pirê da çûn. Êkî pir dît û pê li pirê da û bûrî, ya dî pir dît û pê li pirê neda û bûrî, ya sê ne pir dît, ne pê lêda û bûrî. Ev çawa çê dibe? [**Jineke zarokek li milî ye û êk di zikî da ye.**], (Berwarî. M, r. 89)

21- Ji keçekê pirsîn: diya te kî ve çûye? Wê bersiv da: ya çûy dostî bikete dojmin, êkî bikete du, dê hêteve du ya dê kete êk. [**Çûbû ji dostekî qera bikit, pîrkiyê bû jineka bi hal bikit, dema vegerê wê lihêfeka du tûx/qat çê kit.**], (Berwarî. M, r. 89)

22- Hem xesî ye, hem bûk e. [**Jinekê xesiya hey û ew bi xwe jî xesî ye.**], (Berwarî. M, r. 89)

23- Li mam heye li xal tune, li mal heye li bal tune. [**Pîta [m] ye.**], (Berwarî. M, r. 89)

24- Şêst û du ker li serê milekê kirne der, şeş guh û sê ser. [**Şêst navê mirovekî ye li gel du kerên xwe.**], (Berwarî. M, r. 89)

25- Çar û çar û çarde, bîst û pênc û pazde, hivdek û du hijde, dike çiqasî? [**115**], (Gazî. M, r. 14)

26- Çil û çar û çarde, bîst û pênc û pazde, hevde û du hijde. Dike çiqas? [**Dike 151**]<sup>231</sup>, (Gazî. M, r. 14)

27- Du şeş û panzde, bîst û çar û şanzde dike çiqas? [**Dike 67**], (Gazî. M, r. 17)

28- Sê pênc û pazde, bîst û çar şazde, bû çî? [**Bû 70**], (Gazî. M, r. 18)

---

<sup>231</sup> Ev li ser hev pir zû tê gotin, wekî zûgotinokan.

- 29- Mamikê mino, kurê kurê mino, birayê mêrê mino. Çi ye? [**Guhurîna dayîkan**], (Sadinî. M.X , r. 55)
- 30- Mamikê mino, darekê çar sêv pê ve bûn, mamoste û jina xwe, hekîm û keça xwe, çûne bin wê darê, her yekê yek jê kir, yek ma bi darê ve. Ev çawa dibe? [**Jina mamoste û keça hakim**], (Sadinî. M.X , r. 72)
- 31- Ney ji te ye, ney ji axê ye, ney ji hîkmeta Xwedê ye, beney çi ye? [**Nevî û bab û bapîr**], (Sadinî. M.X , r. 109)
- 32- Birreke qazan li ber esman difirin, qazeke li jêr gote qazên difirin, ey sed qazîn hin dê kî ve çin, ez jî dê bêm. Qazên jêrî gotin: ey qazê em û hindî me, nîvya me û çarêkên me û tu jî bêye ser me, em ê bibin sed. Ka bizane em çend in da tu bêyî û bigehî me? [**36**  $36+36+18+9+1=100$ ], (Sadinî. M.X , r. 150)
- 33- Mamikê mino, şalê te şelwarê te, xizmê mala xalê te, bête mala te, tû dê çi deyê. Çi ye? [**Bab û kur**], (Sadinî. M.X , r. 210)
- 34- Mamikê mino, mela bi jina xwe ve, keşe bi keça xwe ve, çûne bi dêrê ve, hatin sê ji wê ve. Çi ye? [**Jina mela keça keşe ye**], (Sadinî. M.X , r. 211)
- 35- Neh mih, deh beran, yazdeh şivan, dozdeh kûçik, eviya çend dike? [**Dozdeh heb**], (Güneş. K, r. 99)
- 36- Sê pênc panzde û dido hevde û sisê bîst, dike çend? [**Bîst e**], (Güneş. K, r. 112)
- 37- Şewqa herî mezin, kî dide serê xwe? [**Ê serê wî herî mezin**], (Güneş. K, r. 121)
- 38- Refek çûk li hewa bû, çûkek jî li erdê bû. Ref ji çûkê re dibêje: Selamûn aleykûm ey sed çûk! Çûk dibêje: ez ne sed im. Bi du qatê we û nîvê we û çaryeka we û bi min ve em sed in. Li gor vê rewşê, refa çûkan ji çend çûkan pêk tê? [**Hejmara refê: 36 e**], (Güneş. K, r. 166)
- 39- Mirovek çû ser erd. Av li ser erd tune bû. Kûpîkek av li ser kerê girêdayîbû û ker winda bûye. Mirov destmêj digire û nimêj dike. Di vê demê de ker hat û ziriya û avdesta mirov şikest. Çima? [**Ji ber ku mirov avdesta teyemûmê girtiye**], (Güneş. K, r. 166)
- 40- Mirovek bi sed panotê xwe diçe mezatê, dixwaze sewalan bikire: beşekî ga, beşekî bizin, beşekî mih. Gayekî bi deh panota ye. Li gor vê rewşê bi vî pereyî çend ga, bizin û mih tèn kirîn? [**40/10=4 ga, 44\*2=88 bizin, 16/2= 8 mih**], (Güneş. K, r. 166)

### 19. Mamikên ku Bersivên Wan di Nav de ne

Mifaya van mamikan ji bo pîvan û qewîkirina serwextî û bala zarokan gelekî girîng e. Çimkî bersivên van mamikan di nav mamikan de veşartî ne. Ev yek jî dibe sebeb ku zarok pêşî matmayî bibin û piştîre baştir li ser mamikan bifikirin.

- 1- Ew çi ye? Ser biçûkê dêl dirêj, ew şêlim e kavirê gêj. [**Şêlim**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 418)
- 2- Dûrva çêlekek ketiye ser lodê, gîhê dixwe, çawa zanivî ga ye yan çêlek? [**Çêlek**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 419)
- 3- Ser şe ye, dûv das e, kero bê dîk. Ew çi ye? [**Dîk**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 420)
- 4- Tas dihele, ruh nahele. Ew çi ye? [**Ruh**], (Celîlê. O, Celîlê. C, r. 432)
- 5- Tişteki min heye; Bi tirkî min gur dî çi ye? [**Ben kurt gördüm**], (Alkan. A, r. 75)
- 6- Tişteki min heye, ho dibêjim tevşo dibêjim, bi nav dikim lê nabêjim. Ev çi ye? [**Tevşo**], (Alkan. A, r. 83)
- 7- Tişteki min heye, ka çû ma nok. Ev çi ye? [**Ka çû ma nok**], (Alkan. A, r. 85)
- 8- Tişteki min heye, dirêj dirêj perî dirêjê. Ev çi ye? [**Dirêj**], (Alkan. A, r. 101)
- 9- Dê bi hîr hîr, bav bi zirr zirr, kero bê qantir. [**Hêstir**], (Berwarî. M, r. 42)
- 10- Mamikê mino, ser şeh dawî das, Ehmeqo de bêje dîk. Çi ye? [**Dîk**], (Sadinî. M.X , r. 43)
- 11- Mamikê mino, ka nokan e, heçî yê nizane, ew nezan e. Çi ye? [**Kay noka**], (Sadinî. M.X , r. 73)
- 12- Ey Melayê Erwasî, tu di ilmê Xwedê de xewasî, sê ser in, şeş çav in, du panî, ka çi ye tu dizanî? Ey melayê Xanî, tu ilmê Xwedê dizanî, ew kew û mar û masî. Çi ye? [**Kew û mar û masî**], (Sadinî. M.X , r. 78)
- 13- Mamikê mino, sê cara pênc, pazde. Dike çend? [**Pazdeh**], (Sadinî. M.X , r. 111)
- 14- Tişteki min heye, spî spî her spî ye. Çi ye? [**Spî**], (Sadinî. M.X , r. 126)
- 15- Mamikê min e, dirêj e teng e, kurt e teng e, fireh e teng e, teng e teng e û her teng. Çi ye? [**Tenga ker**], (Sadinî. M.X , r. 134)
- 16- Mamikê mino, teyr difirît, pûş li mila. Ev e çi ye? [**Teyr û pûş**], (Sadinî. M.X , r. 151)
- 17- Mamikê mino, hezar û heftsed feqe, di bin berikekê de radizên. Çi ye? [**Hezar û heftsed**], (Sadinî. M.X , r. 208)
- 18- Mamikê mino, şêst û du ker, şeş çav û şeşguh û sê ser. Çi ye? [**Şêst û du ker**], (Sadinî. M.X , r. 209)
- 19- Mamikê mino, pezê payizê kuştî, biharê şuştî, wê gavê şuştî, heku kuştî. Çi ye? [**Payiz û bihar**], (Sadinî. M.X , r. 209)
- 20- Hezar û hefsed mirov, nêva nivînekê de ne? [**Hezar û hefsed e**], (Güneş. K, r. 73)
- 21- Li mam heye, li xal tune, li mal heye, li bal tune? [**Tîpa “m”yê**], (Güneş. K, r. 92)
- 22- Mamkê mino, mil li te ve? [**Mil**], (Güneş. K, r. 95)

23- Mamkê mino, ka çû ma dan?<sup>232</sup> [**Ka diçe zad dimîne**], (Güneş. K, r. 95)

24- Willeh pêçî ye, billeh pêçî ye, famkero fam bike ka va çî ye? [**Pêçî**], (Güneş. K, r. 131)

---

<sup>232</sup> Ev cureyê mamikan wek zûgotinokan e. Dema ku zû tê gotin, bi awayê “kaç ma dan” tê bihîstin.

## BEŞA SÊYEM

### MAMIKÊN KURDÎ JI HÊLA TAYBETMENDIYÊN ZIMAN VE

Di vê beşê de em ê analîza ziman a di nav mamikên kurdî de bikin. Hem ji aliyê peyv û têgehên hem ji aliyê rêziman û sentaksa ziman ve mamikên kurdî dê bîn veçirîn. Di vê analîz û veçirînê de em ê li gor rêbazekê tevbigerin da ku yeksaniyek çê bibe. Mesela di bin sernava “Navên Şexsan” de dema ku navên şexsan ên di mamikên kurdî de hatin peydakirin bi vê rêbazê dê bê zanîn ka ev nav di nav kîjan mamika kurdî de derbas dibe. Mînak: “**Xaltiya Gulistan** (2.6/76 mirîşka kurk)” navê ku bi nivîsa tarî hatiye nivîsîn navê şexsekê ye. Agahiyên di nav kevanekê de “2.6” di **beşa duyem** a teza me de sernava mamikên senifandî ne. Nimra “76” di bin wê sernavê de rêza wê mamikê ye ku navê **Xaltiya Gulistan** tê de derbas bûye. “Mirîşka kurk” jî bersiva wê mamikê ye. Bi vî şiklî di temamê beşa sêyem de dema ku me referansên xwe nîşan dane, me ev rêbaz bi kar aniyê. Lê di hin beşan de me di nav kevanekê de hewce nedîtiye ku bersiva mamikê bidin.

#### 1. Nêrîneke Giştî li Ser Peyv û Têgehên

Mamik di bîr û hişên neteweyan de wek hunereke devkî ji mêj ve ye tê gotin û bûye amûreke lîstina li ser peyv û têgehên. Ji ber vê yekê ye ku mamik di eslê xwe de wek behreke ziman an jî gencîneyeke bîr û zimanê gel e. Fevzi Karademir derbarê vê yekê de wiha dibêje:

“Mamikên ku berhemên çanda gel in, ji hêla ziman ve ew qas malzemeyên pircure û zêde di xwe de dihewînin ku mirov lê heyirî bimîne, ne tiştekî anormal e. Di mamikan de wek nav, hevalnav, cînav, hoker, daçek, baneşan, lêker, weklêker û peyvên ji dangan pêkhatî bi têra xwe hatine bikaranîn. Lê belê ji ber ku bi gelemperî heyînen şênber bûne mijara mamikan û bi sêwirandinên xwemal jî hatine durustkirin û ev heyîn tê de hatine veşartin, ew jî bûye rêyeka din ji bo hebûna gotinan.”<sup>233</sup>

Em ê niha bi awayê binbeşan li ser van taybetmendiyan bisekinin.

<sup>233</sup> Fevzi Karademir, *Türk Halk Bilmecelerinin Yapı, Dil ve Üslup Özellikleri*, Teza Doktorayê ya Çapnebûyî, Dicle Üniversitesi, Diyarbakir, 2007, r. 308.



## 1.1. Bikaranîna Navên Taybet

Navên taybet ew peyv in ku di eslê xwe de tekane ne û tenê ji bo heyîneke diyar tînin gotin. Ango ew nav in ku tenê kesekî an tiştekî pênase dikin û jê re dibin nasnameyek. Navên taybet ên di mamikên kurdî de, li gorî deveran diguherin. Ji bilî vê, hin navên ku di nav gel de navdar in û ji bo her kesî heman tiştî îfade dikin, hatine bikaranîn.

Di mamikên kurdî de piranî navên şexsan, welatan û kêrên jî navên hin neteweyan û zimanan hatine vegotin.

### 1.1.1. Navên Şexsan

Navên şexsan bêtir wek sembola tiştekî hatine gotin an jî maneyeka wisa li wan navan hatiye barkirin. Di vê xebatê de piranî navên ku hatine bikaranîn ev in:

Qutîkê **Silêmanî** (1.1/13 kulfeta hemle), Sindirûka **Silêmanî** (1.1/18 jina bihal), **Elî** xişxişt (1.1/73 gû), sindoqa **Silêman** (1.1/77 jina bihemle), navê wî **Evdilezîz** e (1.2/206 ziman), du çilê **Fatma nebiya** (1.2/212), **Şêx Zeyneba** dûv rûtî (2.2/43 mişk), **Şêx Silêmanokê** dûv rûto (2.3/57 majmajînatik), **Fatka** malê (2.4/1 pişik/kitik), tajiya **Elî Mirada** (2.5/14 masû), **Mihemed axa** (2.6/3 darkoke), **Xaltiya Gulistan** (2.6/76 mirîşka kurk), bûka **Eliyê Etmanê** (2.6/78 kurk, mirîşk), **Birahîm Xelîl** (2.8/14 dewar, nal, bizmar), jina **Emoyê** gişt (2.8/47 hêk û mirîşk), oda **Haris** (3/97 hinar), **Elo** (4/107 karî), **Qasimê** qulxwar (7/34 çivîk û hejîr), xalê min **Emer** (8/2 hêk), **Enter** (8/13 hêk), mamê min **Heyder** (8/14 hêk), **Îskender** (8/59 hêk), **Ûşoyê** qûnxwar (9.1/15 gûzan-mus), **Temerê leng** (9.1/18 bivir-das), **Qasimê** qûnxwar (9.1/21 bivir-das), mam **Hesen** (9.1/28 tirpan-şalok), **Hemzeko** (9.2/3 meqes) **Eliyê** dirêj (9.2/70 qelûn), **mîr Omer** (9.3/41 dest conî), **Qotir** çû mala **Babir** (9.3/86 destar), **Ehmedê** lingekî (9.3/156 mîrkut), dismala **Bekir** (10/15 quran), **Obeydullah** (11/14 rê), **Fatimko** (12/17 dilopa avê), mamê **Xelîl** (15/5 sal), pezê **Mihema** (16/11 sitêr), pezê **Elî** (16/48 steyr), **Husênî** (16/49 ewr), **Hesenê meman** (16/91 stêrk), **Ebabekr** (17/10 befir), **melayê Erwasî**, **melayê Xanî** (19/12 kew û mar û masî)

### 1.1.2. Navên War û Welatan

Em di mamikên kurdî de bikaranîna navên war û welatan zêdetir wek war û welatên cînar ên ku nêzî Kurdistanê ne dibînin. Her wiha navên hin gundan jî em tê de dibînin ku ev der jî bi ihtîmaleke mezin kana wê mamikê bixwe ne. Navên war û welatan ên ku di vê xebatê de derbas dibin ev in:

**Şam** (1.1/5), **Balete** (1.1/16), **Mekkê** (1.1/112), **Girê Deilêdizan** (1.2/59), **Xalabê** (2.1/37), **Berwarî** (2.1/57), **Hekarî** (2.1/57), **Balete** (2.2/2), **Mûsil** (2.6/7), **Manîsa** (4/56), **Awka** (5/34), **Alokan** (5/69), **Mûseka** (5/77), **Misûranî** (8/71), **Deştelanî** (8/71), **Amed** (9.2/192), **Elkûşka** (9.3/7), **Heleb** (9.3/12), **Wan** (9.3/12), **Bexda** (9.3/189), **Bilîs** (9.3/189), **Stenbol** (9.5/23), **Bêdilyat** (11/85), **Kurdistan** (12/56), **Handan** (12/80), **Siphan** (12/92), **Sêrt** (12/92), **Amêdî** (16/17), **Şam û şerq** (16/90), **Balûka** (17/29), **Hewlêr** (18/5)

### 1.1.3. Navên Netewe û Zimanan

Em di mamikan de ji bilî çend neteweyên ku cînarê kurdan e û pê ve zêde navan nabînin. Di vê xebatê de em rastî navê **Tirk** û **Faris** jî nehatin. Di şûna navê **Faris** de **Ecem** hatiye bikaranîn. Lê belê tişteki ku li ser tirkî hatibe gotin tune. Ji bilî navê neteweyan em rastî du navên zimanan hatin ew jî yek jê erebî û yê din jî tirkî ye. Navên netewe û zimanên ku hatine bikaranîn ev in:

Dest û gunê **Ereba** (9.2/71 kevçî), **Erebê kîrreş** (9.3/44 cewdik), **Erebê reş** (9.6/6 çarşev), **Erebê reş** (11/45 kon), **Ecem** (2.1/31 sting-moz), **Ecem û Surman** (2.3/24 mer), teşika **Ecem** (9.3/51 mar), lawkê **Elmana** (2.1/26), **Erebî** (19/21), **Tirkî** (19/5)

### 1.1.4. Navên Dînî

Dema em bala xwe didine peyvên dînî yên di mamikên kurdî de em zêdetir peyvên derdora dînê Îslamê dibînin. Peyvên ku hatine bikaranîn ev in:

**Xwedê** (1.1/22), **Ferz** (1.1/113), **Sunet** (1.1/120), **Rahîb** (1.2/98), **Nebî** (1.2/125), **Ayetê Kursiyê** (1.2/166), **Cihû** (2.2/2), **Fitre** (2.1/32), **Zekat** (2.1/32), **Gawir** (2.1/76), **Îslam** (2.1/76), **Şeytan** (2.2/1), **Biheşt** (2.2/11), **Pêxember** (5/76), **H.z.Alî** (2.5/13), **Ademî** (2.6/19), **Cinnî** (2.6/19), **Quran** (2.6/43)

## 1.2. Navên Rengan

Di kurdî reng li gorî xwe maneyên cuda hene, an jî di tebîetê de di hin heyînan de rengên eşkere hene ku ji wan heyînan re bûne sembola. Di zimanê kurdî de jî ev yek dewlemendiyeke mezin li ziman bar dike. Zêdetir jî di şayesandina heyberan de reng argûmanên pir bi qîmet in.

**Tablo 3: Di Mamikên Kurdî de Navên Rengan li Gorî Rêjeya Bikaranînê û li Gel Mînakên Xwe**

Navê Rengan	Bi tevahî çend caran hatiye	Mînak
-------------	-----------------------------	-------

	<b>bikaranîn</b>	
Reş	115	Şikeftek reş, tije mihên beş. <b>(1.2/32 dev û didan)</b>
Reşahî	1	Reşahiyê de dimire, deryayê de jîndar dibe? <b>(2.5/11 masî)</b>
Reşik	4	Çalka kutik, tijî eskerkê ser reşik? <b>(9.2/219 kiftik)</b>
Reşw(h)êle-reşêle	11	Serî reşêle binî reşêle, taqlafîzo, çirtêle. Ew çi ye? <b>(9.3/82 meşk)</b>
Reşetarî	5	Mamikê mino, êvarê reştarî bû, bû sibe çikspî bû. Çi ye? <b>(12/58 erd û berf)</b>
Qîr	9	Sipî ye wek şîrî, reş e wek qîrî, tîj e wek şîrî. <b>(2.1/21 çav)</b>
Qer	4	Mamikê mino, çûm goveke bêder, tijî tê da mihên qer. Çi ye? <b>(3/65 zebeş)</b>
Qetranî	1	Reş e wekî qetranî, sipî ye wekî kitanî, sûr e wekî mercanî, difîrit diçite esmanî. <b>(2.6/17 meqesok)</b>
Tenî	1	Reş e ji teniyê reştir e, bilind e ji çiyayan bilindtir e? <b>(2.6/70 qijik)</b>
Spî / sipî	82	Feqê me xwe boyax dide, gava vedibe spî dibe? <b>(3/84 pirteqal)</b>
Spîk	2	Ezman sorê didan spîk. <b>(1.1/2 mirov)</b>
Çikspî	1	Mamikê mino, êvarê reştarî bû, bû sibe çikspî bû. Çi ye? <b>(12/58 erd û berf)</b>
Kej	7	Yê kej e wekî keşk, yê mit e wekî mişk, biharan ter e, payizan hişk. <b>(2.1/52 şeytanok)</b>
Boz	7	Heşpa boz e, rişme li poz e. <b>(9.2/72 derzî)</b>
Zer	42	Mamikê mino, dayik asin bab ber e, jê diçît gurya zer e. Çi ye? <b>(9.2/136 çeqmaq)</b>
Zerik/zerk	5	Mamkê minê mamanî, çêlekoka zerik ji xwe re digere. Çi ye? <b>(4/50 kulind-kundir)</b>
Zêrîn	3	Dara şîrîn e, gulî zêrîn e. <b>(5/6 genmok)</b>
Zerwêle	2	Mamikê mino, zerwêle zerwêle, berfê bikêle. Çi ye? <b>(2.2/40 sivore)</b>
Zêrî	2	Tiştêkî mino tişt e, av e ne av e, marê mirî li nav e, teyrê

		zêrî li hindav e. <b>(9.2/16 lempe/çira-momik-fanos-lox)</b>
Zerok	1	Tiştêkî min heye, dê li berok, bav li berok, çêjka tîne sor û zerok, ev meselok, kê da derok? <b>(9.2/61 kevir, heste)</b>
Zerwan	1	Zelê zerwan, nexşê perwan, ne dîn e(heye) ne îman? <b>(2.3/70 mar)</b>
Sor	69	Terr e wek xiyar, sor e wek hinar, şîn e/kesk e wek çinar. <b>(3/21 şitî/zebeş)</b>
Sork	2	Helheloko melmeloko, terîsorko guhbelko? <b>(2.2/42 kîroşk)</b>
Sur/sûr	4	Reş e wekî qetranî, sipî ye wekî kitanî, sûr e wekî mercanî, difirît diçite esmanî. <b>(2.6/17 meqesok)</b>
Sûrhişîn	1	Mamikê mino sûrhişîn e, bajar sor e, mifte hasin e. <b>(3/36 zebeş)</b>
Surî	2	Ji ser ve surî, ji bin ve xumarî. <b>(4/10 bacansur)</b>
Sorik	3	Tiştêkî min heye, kumkê sorik tije morik. Ev çi ye? <b>(3/44 hejîr)</b>
Kesk	7	Mamikê mino, bi şevê kesk dikin, bi rojê sor dikin. Çi ye? <b>(9.1/134 hene, xene)</b>
Keskî	1	Bi spî radiçînit, bi surî têdikin, bi keskî didirûn. <b>(5/17 kezan)</b>
Şîn	42	Binê axîn e, navtenga şîn e, serê zêrrîn e. <b>(5/24 nêrgiz)</b>
Hişîn/hêşîn	6	Li çolê heşîn e, li çarşiyê reş e, li malê sor e? <b>(5/125 çay)</b>
Şînahî	1	Mamikê mino, şînahiya wê nayê xwarin, koka wê tê xwarin. Çi ye? <b>(4/25 kartol, patat)</b>
Gewr	4	Reş e di agir de sor û gewr e. <b>(12/34 rejî/komir)</b>
Belek	8	Hespê belek, li binê deştê bû xelek. <b>(16/19 hîv)</b>

Li gor vê tabloyê ji aliyê rengan ve taybetmendiyên mamikên kurdî wiha ne:

- 1) Rengê ku herî zêde hatiye bikaranîn “reş” e. Piştî rengê spî, sor, zer, şîn hatine bikaranîn. Ji bilî rengên sereke hin rengên wek “reşêle, qer, tîr” an jî “tarî” ku li ser rengên reş tîne hesabandin an jî rengên wek “çikspî, kej, spîk” li ser rengê spî

û rengên wek “zêrîn, zerik, zerwêle” ku li ser rengê zer tèn hesibandin jî hatine bikaranîn.

- 2) Rengê reş û spî hem zêde hatine bikaranîn hem jî di nav heman mamikê de wek du têgehên dijwate derbas dibin ku ev jî rewşa tebîetê bi awayeke rasterast nîşanî me dide. Mînak:

“Êvarê reştarî bû, bû sibe çikspî bû”

“Sipî ye wek şîrî, reş e wek qîrî”

“Reş e wekî qetranî, sipî ye wekî kitanî”

- 3) Ji bilî rengên sereke em rengên talî yên ku ji tevlihevbûna rengên sereke pêk tèn nabînin. Ji ber vê yekê me mîna rengên “mişmişî, pirteqalî, qehweyî” di mamikan de nedîtîn. Ev yek jî dide nîşanê me ku mamikên kurdî rengên tebîetê yên sade û yên ku herî zêde tê dîtîn bi me didin zanîn.

### 1.3. Taybetmendiye Devokan

Di mamikên kurdî de devokên curbicur hatine bikaranîn. Yanî zimanekî standart tune. Wisa bûye ku gund bi gund diguherin û eger lêkolîner ne şarezayî devokan bin, ne mimkûn e ku ji wan mamikan fêhm bikin.

Li gor devokên kurdî û xusûsiyetên wan me di vê beşê de mamikên kurdî li gorî pênc sernav û mijaran dabeş kirin ku em bizanin bikaranîna devokan bi çi awayî ne. Dabeşkirina me bi vî şiklî ye:

- 1) Peyvên devokî, yanî bikaranîna peyvên cuda li gor herêman.
- 2) Di ravek û pirjimariyê de tunebûna standardekê.
- 3) Di devokên kurdî de cudahiya kişandina lêkeran.
- 4) Daqurtandina daçekan ku ev zêdetir li herêma Serhedê û Bahdînanê çê dibin.
- 5) Di heman peyvê de li gor deverên cuda guherîna dengan.

Di mamikên kurdî de dema ku mirov dêhna xwe dide ziman, mirov dibîne ku ji gelek herêmên cuda yên Kurdistanê hatine berhevkirin ku nîşaneyên wê jî cudahiya hin tiştên di ziman de ne.

#### 1.3.1. Peyvên Devokî

**spîk** (1.1/2), **xwedanî** (1.1/5), **şanzde**, (1.1/6) **pêştirî** (1.1/13), **kîrê**: li ku derê (1.1/28), **hindî** (1.1/29), **mestir** (1.1/32), **asin** (1.1/38), **hingo** (1.1/45), **hinde** (1.1/51), **difin** (1.1/89), **lay** (1.2/25), **kat** (1.2/123), **vêrê** (2.1/42), **şkêr** (2.1/58), **hire** (2.2/44), **bêvil** (2.2/48), **şaxilîn** (2.5/6), **parîkî** (2.5/9), **fihêt** (2.6/59), **iyar** (2.7/10), **wesa** (2.8/1), **hetav** (2.8/6), **weşî** (2.8/51), **qapax** (2.8/62), **tebance** (2.8/63), **hinguvîn** (3/59), **ard** (3/102),

**xang** (3/104), **dûng** (4/36), **çûçik** (5/49), **şilq – kat** (5/88), **xwêh** (5/129), **kurî** (6/3), **pind** (7/41), **jêhel** (9.1/1), **se** (9.1/65), **şul** (9.2/23), **axwir** (9.2/106), **yek û du** (9.2/150), **almost** (9.2/199), **şahîn** (9.2/211), **nişîv** (9.3/38), **çûk**: **biçûk** (9.3/80), **ortasî** (9.3/89), **serevraz – sernişîv** (9.4/3), **bab û bapîr** (9.4/11), **xalî** (9.4/30), **hind** (9.4/35), **gî**: **hemû** (10/36)

### 1.3.2. Bikaranîna Devokê di Ravek û Pirjimariyê de

**Bizinêd rûtêd tildirayî** - **kopêd didan weveryayî** (1.1/11), **mihêt kurrete** (1.1/16), **nîveka du guliyêt darê** (1.2/27), **qulê roviya – çirê neviya** (1.2/58), **ayetê kursiyê** (1.2/166), **du çilê Fatma nebiya** (1.2/212), **gunêt bagîran** (2.1/39), **mirovêt pîr** (2.1/44), **şaxêt bizina – guhêt kera** (2.2/3), **pêt sa – guhêt kara** (2.2/5), **guhên kera** (2.2/10), **hêka dike** (2.3/44), **lêvêt kutela** (2.4/2), **çavêt mara** (2.5/1), **her sê dîna** (2.5/12), **li nav teyra** (2.6/3), **jina tîne** (2.6/35), **ji tirsî dimirin** (2.10/2), **guloka mircana** (3/53), **mêrêt dirî** (7/54), **2 avêt** (8/4), **rihêt bavî** (8/53), **têşkêt har** (9.1/24), **xulamêt axayi** (9.1/30), **ritlêt babê** (9.2/4), **tilêt xo – çavêt gurgî** (9.2/5), **tama deva** (9.3/123), **mezinêt wan** (12/11), **êvara ket çema** (16/11), **sêvê heyderî** (16/87)

### 1.3.3. Bikaranîna Devokê di Kîşandina Lêkeran de

**Digerhit** (1.1/3), **venabit** (1.1/4), **nahête** (1.1/6), **nafirit – digerit** (1.1/17), **namirit** (1.1/20), **diçît – dibînît- dikit** (1.1/24), **nagehimê** (1.1/29), **bivêje** (1.1/36), **dixot** (1.1/40), **dirî** (1.1/67), **tere** (1.1/68), **rahajot – xendiqî** (1.1/91), **nizanît** (1.1/93), **têt - diçemît** (1.1/94), **diçît – nadet** (1.1/95), **bet** (1.1/96) **nahêt** (1.1/97), **yaz nekir** (1.1/118), **derim** (1.1/127), **fêr dike** (1.1/139), **didete** (1.2/14), **bideyê – nabit** (1.2/22), **ez yê dibînim** (1.2/26), **şîn dibit** (1.2/36), **meyê** (1.2/63), **diçîtê** (1.2/119), **nadane** (1.2/128), **newe** (1.2/181), **fêxistiye** (1.2/212), **çê diket** (2.1/14), **dikeme** (2.1/17), **pisyar dikim** (2.1/44), **dihavêt** (2.2/3), **çime** (2.2/11), **key** (2.2/12) **nagihite** (2.2/18), **çî** (2.2/26), **diket** (2.2/36), **têtin** (2.2/39), **diçêrit – dizelit** (2.3/13), **çuyin** (2.4/11), **naxwê** (2.4/13), **baz didê** (2.4/18), **hîlfîne** (2.5/4), **dibezit** (2.6/9), **dibên** (2.6/12), **derdikevît** (2.6/52), **zane** (2.7/12), **hilavît** (2.7/14), **bideme** (2.8/1), **terim** (2.8/50), **digerê** (2.10/7), **nerîşt** (3/1), **mirîn – neşên** (3/76), **dizanît** (4/37), **dihavêm** (5/10), **dihête** (5/22), **şikêt** (5/81), **dikevi** (5/150), **mirît – firît** (7/53), **naşiket** (7/58), **niza** (8/35), **çuyîn** (8/56), **dikelênim** (8/68), **nagehtê** (9.1/2), **dirît** (9.1/7), **nehêla** (9.1/14), **îna** (9.1/15), **danayi** (9.1/30), **neêxiste** (9.1/39), **didemê** (9.1/44), **nekeye** (9.1/5), **dijît** (9.2/14), **zêt** (9.2/15), **direqisit** (9.2/21), **dirazîne** (9.2/26), **dihilhêt** (9.2/28), **dişut** (9.2/29), **disojît – dimînît** (9.2/44), **dikêşit** (9.2/52), **vedibît** (9.2/145),

**êxist** (9.2/180), **henin** (9.2/203), **key** (9.3/7), **dixûnit** (9.3/8), **nanivit** (9.3/19), **dizivrit** (9.3/21), **dihêt** (9.3/34), **vedidet** (9.3/33), **baxivit** (9.3/56), **çi lê kî - înim** (9.3/133), **dirûnê** (9.3/201), **wer têt – nagêt** (9.4/2), **dûnin** (9.5/8), **bidey –nahêt** (9.5/14), **dihên** (10/5), **digihê** (10/22), **nalivît** (11/12), **dînim** (11/18), **nahêteve – narabiteve – têrnabiteve** (12/10), **nalivit** (16/7), **bêt** (16/62)

#### **1.3.4. Daqurtandina Daçekan**

... **dinê da** (1.1/47), ... **xwe jî** (1.1/48), **jû ve tê** (2.2/26), **valî – walî** (2.3/27), ... **ber kevirê** (2.3/26), ... **kaşa da** (2.7/18), **şik tê nîne** (5/23), ... **bin kon da** (5/45), ... **tehta da çû** (9.2/209), **zik ... ser zik** (9.3/87), **lêk** (9.3/99), ... **serê bana** (9.3/232), **lêk veken** (10/22), ... **kulekê ra** (16/39), ... **pišta xaniya** (16/44)

#### **1.3.5- Di Devokan de Guherîna Dengan**

**sive** (1.1/46), **mezel** (1.1/75), **çi fayde** (1.1/85), **him** (1.1/113), **nivêj** (1.2/13), **diquitin** (1.2/14) **tîj** (1.2/21), **nevî** (1.2/58), **divêm** (1.2/63), **tejî** (1.2/82), **qevş** (2.1/17), **qarên** (2.1/27), **estî** (2.1/57), **wey: wekî** (2.1/64), **helvandira - helwendira** (2.2/3), **gîha** (2.3/11), **hemî** (2.3/19), **gilover** (2.3/21), **penî** (2.3/22), **merî** (2.3/24), **hişkîn** (2.3/41), **stî** (2.3/49), **simêl** (2.4/4), **rabî – der bî** (2.4/9), **befr** (2.6/15), **donzdeh** (2.6/32), **rîh** (2.6/38), **nav êk** (2.6/53), **îr çûne** (2.7/5), **mî** (2.7/13), **êkê** (2.8/1), **xo** (2.8/5), **havêt** (2.8/4), **dudu** (2.8/19), **dido** (2.8/49), **am** (2.8/57), **birsî** (2.10/2), **qutay** (3/2), **divim – gilor dikim – livek** (3/30), **taliqandî** (3/51), **hefsed** (3/57), **dinkek** (3/72), **bijkojreş** (3/73), **bişkov** (3/78), **stirî** (3/79), **kilîle** (4/43), **kiçik** (4/45), **kendêl** (5/43), **usa** (5/44), **devî** (5/61), **rêkan** (5/86), **êkî – gut** (7/2), **nig** (7/29), **kuflet** (7/35), **bîhn – qûwet** (7/60), **sipêdê** (8/19), **her ru** (8/19), **dezmal** (8/22), **aşkî** (8/26), **zuha** (8/31), **dinan** (8/51), **da te** (8/53), **jur** (9.1/1), **hizar** (9.1/9), **melay – çiyay – giyay** (9.1/14), **têşkêt hat** (9.1/24), **xûn** (9.1/33), **tursî** (9.1/10), **dêv** (9.2/49), **çêjik** (9.2/61), **bust** (9.2/69), **mere** (9.2/86), **dîwêr** (9.2/101), **çu** (9.2/149), **bêr : bar** (9.2/174), **êr** (9.2/183), **tirsî** (9.2/213), **himber** (9.2/188), **çêrog çêrvanog** (9.2/223), **qîno** (9.3/29), **xu** (9.3/44), **maîn** (9.3/58), **siyar** (9.3/59), **hey** (9.3/60), **heyşt** (9.3/70), **nifte** (9.3/117), **reşhêle** (9.3/162), **nimhayî** (9.3/171), **keyf** (9.3/189), **serevraz** (9.4/3), **soyî – sofig** (9.4/50), **şuv** (9.5/9), **dive** (11/36), **heyv** (11/65), **xodanî** (12/6), **sebab: sevab** (12/33), **beybîn** (16/3), **rabîn** (16/6), **keft** (16/12), **çirîsk** (16/51), **hişîn** (16/62), **winda** (16/79), **çel** (16/93), **gîhê - zanivî** (19/2)

#### 1.4. Bikaranîna Peyvên ku ji Dengan Têna Dariştin

Li gor hin teorîsyenan peyv bi dengên ku ji sirûştê têne der, çê dibin. Ew deng dema ku ji hêla mirovan ve tîna bikaranîn di nav konteksta ziman de êdî ji dirûvê dengan derdikevin, dikevin dirûvê peyveke xweser. Li ser vê yekê zimanzanê elman Walter Porzig di çêbûna peyvan de fikreke wiha dibêje:

“Peyvên qedîm ên berê, bi dengên di nav xwe de wek dengên r û î û bi tevgera ku di nav wê peyvê de ye, texlît dikin. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin di navbera tevger û dengên pêyvên qedîm ên berê de tîkiliyeke ku ji sirûştê pêk tî, çê dibe.”<sup>234</sup>

Di kurdî de ji bo vê yekê eger em peyva “**qijik**”ê wekî mînak bidin nîşan, ev peyv her çiqas îroj jî bi vî şiklî bê bikaranîn, di navbera deng û tevgera vê heyberê û navê wê de tîkiliyeke mezin heye. Lewre dema ku qijik deng derdixîne herî zêde dengê “q”yê tî bihîstin.

Di mamikên kurdî de kêma û zêde peyvên ku ji dengan pêk hatine me li jêrê rêz kirine. Di van peyvan de xaleke girîng ew e ku gelek ji wan bi serê xwe ne xwedî mane ne. Lê belê dema ku di nav hevokê de hatin bikaranîn, mirov bi rehetî pê derdixe ka ji bo çî hatine gotin. Ya duyem jî di van peyvan de em karakterê û peyvên wî zimanî hîn dibin. Wekî mînak mirov pê derdixîne ku peyva “xişt” ji bo tiştê ku dixiştike an jî peyva “pişt”ê ji bo ajelên wek pişkê tîna bikaranîn.

**tiktikî** (1.1/15), **vilevil** (1.1/21), **pişt** (1.1/36), **oşt** (1.1/36), **çîzo vîzo** (1.1/50), **xiştixişt** (1.1/73), **çeqmeq** (1.1/103), **teq û req** (1.1/103), **tek tekê** (1.1/112), **vile vilê** (1.1/115), **şim şereq** (1.1/134), **şeq** (1.1/141), **şeqşeq** (1.2/74), **divilvil** (1.2/127), **virvir** (2.1/4), **çeq e leq e meq e** (2.1/28 dûpişk), **laq û paq** (2.1/68 dûpişk), **ha ha** (2.1/83), **tip tip** (2.1/83), **zir zir** (2.1/97), **vizeviz** (2.1/98), **helhel** (2.2/36), **himhim** (2.2/38), **çip** (2.2/44), **hilhilî** (2.2/47), **xiştanok** (2.3/5), **teq teq** (2.3/11), **xiştinok** (2.3/20), **xiştanî** (2.3/22), **xişik** (2.3/29), **fiç û faç û fiz** (2.3/30), **fis** (2.3/68), **pişo pişo** (2.4/5), **nir nir** (2.4/15), **çelp çelp** (2.4/18), **tingo** (2.4/19), **wit wit** (2.6/10) **lem lemo** (2.6/21) **bûçim bûçim bûç qidas** (2.6/25), **şimşimê** (2.6/52), **xurexur** (2.6/61), **kidî kidî** (2.6/62), **qurin** (2.6/75), **tenten** (2.7/1), **deqnenûs** (2.7/4), **zirçine** (2.7/10), **dîçeşin...dileşin...dizeşin...direşin** (2.8/12), **çeq çeqîn...belbelîn...bawewşin** (2.8/15), **zopekê...vîtekê** (2.8/24), **tirtimo** (2.8/31), **çeqê ... maçeqê ... fitefelekê** (2.8/41) **şimşetorê** (2.8/42), **çipetirê** (2.8/43), **xeraş**(2.8/44), **nêkê...çêkê...zeynetirekê** (2.8/53), **hîr hîr...zirr zirr** (2.9/2), **tirninnî...şeqşeq** (2.9/8), **gelgel** (2.10/6), **sik**

<sup>234</sup> Walter Porzig, *Dil Denen Mucize I*, wer. Vural Ülkü, Kültür Bakanlığı, Ankara, 1990, r. 12.



sikî...pindikî (3/13), çiring çiring (3/34), risrisî (3/40), ziqziqî (3/62), cimcimî (3/102), gilvilkî (4/28), heplepan (5/28), çîq (5/48), tep û rep(5/62), şilq (5/88), dimdimî (5/97), quto quto (5/135), çeqlê fisê (5/146), zimzimî (6/7), gimgimî (6/13), dimdimî (6/14), xumxumî (6/16), hudhud (7/3), çiz viz (7/32), zîq û zîq (7/39), ting û vingo (7/57), çîz û vîzo (7/59), zirçepok (8/1), pirt pirt ... ker ker (8/45), zirrî (9.1/5), tirr (9.1/6), vizê (9.1/12), helotirr melotirr (9.1/27), şeq şeq şeqşeqî (9.1/29), peqî (9.1/29), xişîn (9.1/80), zift (9.1/86), ho (9.1/94), çilfind (9.2/2), çîzçîz (9.2/4), reprepîskê (9.2/28), hirhir (9.2/54), xişt e xişt (9.3/26), tep tep (9.3/48), helhey (9.3/59), taqlatîzo çirtole (9.3/82), çîz çîzevîz ... teq teqereq ... gur guregur (9.3/88), çirr (9.3/174), çini çini (9.5/8), firrfît firrfît (11/2), teqoreqo (11/68), rimrimê (11/96), hilhil (11/106), xiro (11/108), hurr hurr (12/21), bûrr bûrr (12/21), xuşîn (12/39), piqîn (12/56), hêt û hêt (12/77), şirqîn (12/79), or or ... bor bor (13/5), çirîn (14/13), zîz (14/14), pirç pirç (15/7), dimdimî, zimzimî (16/6), holhol ... golgol (16/64), yah yah (16/80), şingîn (16/108), hey hey (17/14), tivtiv (17/29), hîr hîr (19/9).

### 1.5. Dijûn û Bikaranîna Gotinên Mustehcen

Di mamikên kurdî de gotinên mustehcen û dijûn jî hatine bikaranîn. Çi wek yarî û henek çî jî wek biçûkxistinê be, bi piranî mamik di rewşên samîmî û lîstikan de tên gotin. Doğan Aksan gotinên argoyê wiha pênase dike:

“Li her welatî, di her zimanî de di nav hin kesan an tebeqeyan de ji bo ku ragihandineke dualî di nav hev de çêkên wek zimanêke taybet ev yek derdikeve holê. Gotinên argoyê bi watedayîneka taybet ya peyvên heyî yên wî zimanî, di hin peyvên de guherîneke bi zanebûnî an jî bi rêya girtina peyvên biyanî, peyvên zaraveyêke din û hêmanên kevin, tên afirandin.”<sup>235</sup>

Di kurdî de jî hin gotinên ku di nîvîsê de ji mirovî re giran û nexweş werin di zimanê rojane de wek kêf û henekan dixuyin. An jî hin peyvên ku di rastiya xwe de maneyên zêde mustehcen in, di qalibekî din de bi rehetî vediguherin qalibekî normal û nerm.

Di mamikên ber destê me de me ev mînak peyda kirin:

**kerê** beqala (1.1/3 mirin), **gon naxu guhan dikî** (1.1/15 kiç/qîz), **hêj nehatî beran** (1.1/51 qîzik-keç), **nêv guhana wê** (1.1/51 qîzik-keç), **kurê kerê** li ser bêderê (1.1/83 mirovê çikûs), **ehmeq** (1.1/103 çeqandina tiliyan), **bê nêrî gihanê xwe dike** (1.1/114

<sup>235</sup> Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil; Ana Çizgileriyle Dilbilim*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara, 2009, r.89.

keç-qîz), **kurê kerê** (1.1/119 mirovê kund û tima), **serî qûnê...qûn serî** (1.1/130 bêrivan), kî nizane **bê mejî** ye (1.2/35 ser), xwarinê didin **qahba** (1.2/98 çav û kil), **birek ga didine dû** (1.2/100 por), nîvekê **seyê har** (1.2/133 ziman û lêv), **çala gû** (1.2/194 mîde), **qazikê qûnxwar** (1.2/196 ziman), **kûçikek harî** (1.2/200 ziman), **gûyê wê** dermanê nexweşan (2.1/2 mêşa hingivîn), **virvira tîra** (2.1/4 kêzik-moz), **dixwe û narît** (2.1/5 qirnî-gene), **dixwe naxwe mîz tune** (2.1/20 gene-spî), **qûn tûjtir** e ji didanî (2.1/25 dûpişk), **gunêt bagîran** (2.1/39 mêrî), **hingek lê da** (2.1/77 spih), **gûyê wê li devan** (2.1/95 mêşa hingiv), xwarin heye **gû tune** (2.1/97 qirnî), **dihavêt lotik û qendîra** (2.2/3 kêvrîşk), **çip li qûna te** (2.2/44), **qûn li nîvekê** (2.3/15 mar), **kulê dixwe nan naxwe** (2.3/32 kûsî), **dûv rûto** (2.3/57 majmajînatik), **q.zê çêlek** (2.7/17 beq), **min dapîra te girt, bapîrê xwe havêt ser** (2.8/4 perîna nêrî), **derxûnê qûnê** (2.8/7 dûv), **sîtara qûnê** (2.8/35 dûv), **diçize lê namîze** (2.8/37 mirîşk û hêk), **hêlik reş û mêrganî** (2.8/61 K...kerê), **qapaxa qûnê** (2.8/62 dûvê mihê), **kero bê qantir** (2.9/2 hêstir), **kero hefsar zero** (3/46), semûno du **qûno** (3/49), **heft tir kir** (5/117 nok), **çil sing di qûnê de** (5/133 dêza çilo), **dewsa qûnê** (5/139 kidadik), **pîra qermeçî qirşek di qûnê de** (6/19 mewîj), **qûn li bin kuriyê, kîr li serê piştê** (7/11 mirovek siyarî hesp), **tu gûyê xeftanreşo dixwî** (7/49 xwarin û berpêş), **pînekî dibe q.na xwe** (7/63 nan û sêl), **gûyê wî li devê heftê bavê te** (7/68 rûnê meşkê), **qûna te dikim mencelok** (8/15 hêk), **qeşey rîte devê te** (8/17 îprax), **gûyê mêşan xwarina axan** (8/48 hingivîn), **gû di nav rihêt bavî te** (8/53 nivîşik), **serî rêx binî rêx** (8/69 hingiv), **bi qûnê dixot bi devê dirît** (9.1/7 tifeng), **ûşoyê qûnxwar** (9.1/15 gûzan-mus), **qûnqelêş** (9.1/44 tiving), **di qûnê re dixwe** (9.1/48 tiving), **aqil ker e** (9.2/11 çira), **şula qûna te** (9.2/23 derzîk), **rût û tazî** (9.2/26 derzîk), **qefteka kîra dişut** (9.2/29 kefçik) **heta mîza xwe neke** (9.2/53 çadan), **dest û gunnê ereba** (9.2/71 kevçî), **şil dike rep dike tê re dike** (9.2/82 ta û derzî), **li dora qûna te** (9.2/112 derzî), **kero dirêj ke** (9.2/114 dirîşkê pînedoz), **dest dêxim qûnê** (9.2/171 meqes), **dixwe narî** (9.2/172 meqes), **jina li ser mêrî** (9.3/7 distar), **kîrê repp** (9.3/10 mesîn), **bo qûna babê te** (9.3/12 mesîn), **bo derê qûna te** (9.3/13 mesîn), **bab kîrê xwe nekêşit** (9.3/19 dergih), **li ser kîrê xwe dizivrit** (9.3/21 dergih), **uşe kero** (9.3/27 bagurdan), **ço kero** (9.3/31 bagurdan), **erebê kîrreş dihavête ser xu** (9.3/44 cewdik), **li dûv qûnê ve damîştî** (9.3/49 dolab), **qaqlavîsko çirtole** (9.3/89 dewkul), **du qûno** (9.3/110 bangeran), **gûyê xeftanreşê** (9.3/114 xwarin û beroş), **kero kero kayê dikem bero** (9.3/125 bangeran), **dar li qûn** (9.3/127 bangeran), **hingek lê da** (9.3/130 conî), **jinê xwe diavêt ser mêrî** (9.3/133 destar), **dirîte bi xwe ve** (9.3/144 moxil), **qûnekî tazî** (9.3/175 cêrik), **kerê kerr** (9.3/196 mêhkut), **kî...ê min li qûna te** (9.3/207

gêresûk), **devê mezin qûna te ve** (9.3/216 şal), **babê te têra dikit** (9.4/1 gure), **wertêt û te nagêt** (9.4/2 şûtik), **di qûna bab û bapîran ra çû** (9.4/11 şerwal), **te li xwe kuta** (9.4/38 pantor), **fistiqî qula dê de** (9.4/45 derpê jina), **sofigê di berê ciya te de** (9.4/50 kitan), **di binê diya babê te re dikim** (9.6/4 mafûr), **erebê reş dayka te hembêz kir** (9.6/6 çarşev), **xwe davêje ser diya te** (9.6/11 nivîn), **bo te û babê te dirît** (11/2 aş), **qeretiyo qe ranebiyo** (11/34 basme), **erebê reş baz da ser diya te** (11/45 kon), **bapîrê min li ser dapîra te** (11/85 aş), **heçî nezan heywan e** (11/118 pir), **kî nezan e ew ker e** (11/123 tereg), **bi xwe de dimîze** (12/8 berfemêr), **soro rît** (12/88 agir), **timî dizire** (14/17 def), **kavirê gêj** (19/1 şêlim), **kero bê dîk** (19/3 dîk), **famkero** (19/24 pêçî).

### 1.6. Peyvên Dubarekirî

Du peyvên hemcins ên ku li pey hev rêz dibin û maneyê xurt dikin, jê re peyvên dubarekirî tê gotin. Li gor Muharrem Ergin di zimanekî de peyvên dubarekirî sê fonksiyonên xwe hene: Bihêzkinin, pirkirin û berdewamî.<sup>236</sup>

Li gorî Ahanov jî peyvên dubarekirî ji bo ku maneyê xurt bikin tîr çêkinin û bi du awayan çê dibin: ya yekem peyvek an du caran tîr dubarekinin an jî du sê dengên wê tîr guherandin û wisa tîr çêkinin. Ya duyem jî du peyvên cuda tîr bal hev û bi dubarekirina wan çê dibe.<sup>237</sup>

Ergin peyvên dubarekirî li gor zimanê tirkî dike çar beş.<sup>238</sup> Me jî mînakên kurdî adapteyên van kirin û dabeşkirineke wiha çê kir:

- a) Dubarekirinên heman gotinê ku ji mînakên me yê li jêr wek **“reng û reng”**, **“qinê qinê”**, **“heştê heştê”** û hwd. dikarin bidin nîşan.
- b) Dubarekirinên gotinên hemwate an jî nêzwate ne, mînakên wekî **“reş û tarî”**, **tewş û tîrar**, **“tefş û telaş”** di cih de ne.
- c) Dubarekirinên gotinên dijwate ne, mînakên wekî **“birin û anîn”**, **“xort û qîz”** di cih de ne.
- d) Dubarekirinên ku bi serê gotinan ve hêmaneke bêwate tîr zeliqandin ku mînakên wekî **“çekê mekê”**, **hilî wilî**, **“şeliqî meliqî”** di cih de ne.

Peyvên dubarekirî ji bo ku zimanekî resen û bihêz derkeve holê û mebest û meqseda mirovî baş derkeve pêş, di vegotinê de rêbazeke kêrhatî ye.

**Çekê mekê** (1.1/22), **sîq û sîq** (1.1/72), **reng û reng** (1.1/104), **diçim diçim** (1.1/105), **birin û anîn** (1.1/120), **reş û hişîn** (1.2/19), **şan û şîn** (1.2/19), **şûştî mûştî** (1.2/23),

<sup>236</sup> Muharrem Ergin, *Türk Dil Bilgisi*, Bayrak, 2007, İstanbul, r. 377.

<sup>237</sup> Kaken Ahanov, *Dil Bilimin Esasları*, vgz. Murat Ceritoğlu, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara, 2008, r. 303.

<sup>238</sup> Ergin, h.b, r. 377-378.

**qinê qinê (1.2/24), hînî û mînî (1.2/26), birû û bisk (1.2/27), kend e lend (1.2/28),**  
**goşt û hestî (1.2/47), her her (1.2/68), xan man (1.2/71), çûm û çûm (1.2/75), bero**  
**bero (1.2/86), reş û tarî (1.2/92), hin im dî hinanim dî (1.2/121), tefş û telaş**  
**(1.2/140), deşt û leylan (1.2/140), rêl û rêlistan (1.2/140), qul û qultinîk (1.2/159),**  
**hilî wilî (2.1/1), qurût qurût (2.1/19) zûrî zûrî zûr (2.1/20), dixwe naxwe (2.1/20),**  
**çindik çindik (2.1/53), dil û gurçik (2.1/66), dengek tê denganeke tê (2.1/74), tewş û**  
**tîrar (2.1/74), heştê heştê (2.1/78), tim û tim (2.1/80), dar û bar (2.2/10), dîkit nakit**  
**(2.2/18), hulîk mulîk (2.2/19), helhelîko melmelîko (2.2/21), hel helo bel belo**  
**(2.2/24), hînit minit (2.2/37), zerwêle zerwêle (2.2/40), helheloko melmeloko**  
**(2.2/42), hilkuî milkuî (2.2/43), tiştê tiştê (2.2/48), hêr hêrî (2.3/2), çerm û çîqal**  
**(2.3/7), heçka meçka (2.3/30), fil û fengenûs (2.3/46), çem û çem (2.3/51), geriyam**  
**negeriyam (2.3/52), war û war (2.3/53), hîltîto mîltîto (2.3/57), zelê zerwan (2.3/70),**  
**helê melê (2.4/4), şem û şepal (2.5/12), şeliqî meliqî (2.6/24), hes hesincî (2.6/32),**  
**xelk û alem (2.6/44), derd û kul (2.6/65), fîl û ferten (2.7/1), dest û pê (2.7/2), fîl û**  
**fengenûs (2.7/4), dest û tilî (2.7/9), qilingo milingo (2.7/11), aş e maş e (2.8/19), çarê**  
**çermê (2.8/59), xwehr û xwehr (2.8/69), fena ser fenê (2.8/70), hilindir milindir**  
**(2.9/5), kevzê mevzê (3/14), beş beş (3/18), lib lib (3/48), hindîk hindîk (3/89), helme**  
**helme (4/38), herec herec (5/1), qotu qotu (5/2), gul û gulistan (5/13), şaş û perr**  
**(5/14), ber û pişt (5/19), bend û guhar (5/27), dar û dirî (5/41), pel û strî (5/67), fîrto**  
**fiyo (5/87), heybet heybet (5/88), ferec ferec (5/91), qalîk qîrşîk (5/147), har û dîn**  
**(6/6), himhimî (6/18), şûştî veşûştî (6/21), baxçe û bûstan (6/22), dirêj dirêj (6/14),**  
**xal û xwarzî met û birazî (6/23), şel û şepik (8/18), şil û şeht (8/30), sipî sipî (8/34),**  
**sor e sor e (8/70), quta qutayî (9.1/30), dar û bist (9.1/39), çil çilî (9.1/42), xêr û bêr**  
**(9.1/50), rût û tazî (9.2/26), çeçil û meçil (9.2/55), destberîk destberîk (9.2/137),**  
**digere digere (9.2/176), difetile difetile (9.2/176), toz û dûman (9.2/176), hîltîto**  
**mîltîto (9.2/216), heldim heldim (9.3/2), benîk benîk (9.3/3), tişt û mişt (9.3/24), hîno**  
**mîno (9.3/29), hêdî hêdî (9.3/31), helbet helbet (9.3/33), av û agir (9.3/45), herîşan û**  
**perîşan (9.3/57), huldum duldum (9.3/76), hero hero (9.3/85), pêk pêk (9.3/124),**  
**hêdî hêdî (9.3/125), ben û benîk (9.3/157), hilistan milistan (9.3/184), hilerim**  
**bilerim (9.3/188), şildim bildim (9.3/212), şilo milo (9.3/213), qul û milo (9.3/213),**  
**lat û lat (9.4/7), qam qama (9.4/42), xort û qîz (9.5/2), şîr û şekir (10/15), dibire**  
**nabire (10/41), him himo (11/7), pisê pisê (11/15), nav û nîşan (11/19), belot belot**  
**(11/20), çindik mindik (11/41), dirêj dirêj dirêj (11/44), diçe diçe (11/51), lem lemo**  
**(11/54), pêk pêk (11/73), pîrtan e pîrtan e (11/95), diçim naçim (11/100), dişûm**

**naşûm** (11/100), **dixwe naxwe** (11/117), **pişo pişo** (11/127), **sindok mindok** (11/132), **dişom naşom** (11/139), **him him** (12/3), **hilindir milindir** (12/7), **hade û made** (12/14), **sor sorik** (12/18), **hada û bada** (18/20), **xaniya maniya** (12/44), **dibezim dibezim** (12/70), **dikim nakim** (12/71), **hêlo mêlo** (12/79), **hor hore bor bore** (13/25), **reş e reş e reşçêlek** (15/17), **helîl û melîl** (15/25), **her her ber ber** (16/24), **her her merr merr** (16/25), **tek û tinê** (16/31), **mêrgeşîn mêrgeşîn** (16/99), **serê dinê binê dinê** (16/11), **tenê tenê** (16/111), **hanîka manîka** (17/5), **anîkê manîkê** (17/6), **hûr hûr** (17/14), **hey hey** (17/14), **hanyana manyana** (17/18), **ihim ihim iho** (2.1/12),

### 1.7. Peyvên Hemwate

Peyvên hemwate ew peyv in ku wateya wan wek hev an nêzî hev in lê nivîsandina wan cuda ne. Ev komepeyv axaftinê dewlemend dikin û vegotina merama mirovan bi peyvên cuda hêsantir û siviktir dikin. Çetîn Taş di vê bareyê de nêrîna xwe wiha aniye ziman:

“Ew peyvên ku ji hêla deng û nivîsînê ve ji hev cuda ne, lê belê ji hêla wateyê ve wekî hev in, peyvên hemwate ne. Peyvên hemwate zêdetir di devokên kurmançî de derdikevin pêşberî me. Wekî mînak em bibêjin “axaftin” di devoka Behdînanê de, “xeberdan” jî di devoka Serhedê de ji bo heman wateyê tê bikaranîn.”<sup>239</sup>

Lêkolîner Rûkiye Özmen li devera Botanê li ser peyvên sînonîm yanî hemwate xebateke qadî çê kiriye û nîşan daye ku li vê herêmê devokên cuda tînin axaftin û ji ber vê yekê ye ku peyvên hemwate li vir gelek in:

“Di pir zimanan de peyvên sînonîm hene. Zimanê kurdî ji aliyê peyvên sînonîm de xwedî ferhengeke dewlemend e. Mebesta min li vir ez balê bixşînim li ser peyvên li herêma Botanê. Botan herêmeke biçûk e, lê pir devokaxêv e. Sedem jî di wê herêmê de Bajarî, Koçer, Dêmanî û cur bi cur êl û eşîret hene.”<sup>240</sup>

Di xebata Özmenê de li ser endamên laş çend mînak wiha ne: **“Difin, bêhvil, kepî”, “arçen, zenî”, “sing, beden, pêsîr, çîçik”**.

Di mamikên kurdî de peyvên hemwate yên ku me peyda kirin, ev in:

**Pez-mêş** (1.1/23), **ebdal-derwêş** (1.1/23), **ruh-can** (1.1/34), **dirêj-gir** (1.1/34), **mezin-gir** (1.1/43), **erş-esman** (1.1/43), **şel-şerwal** (1.1/44), **reş-tarî** (1.1/102), **ferz-sinet** (1.1/113), **kul-derd** (1.1/129), **reş-beş** (1.2/32), **fitre-zekat** (2.1/32), **dêl-qamçî** (2.1/61), **dep-dar** (2.3/14), **dîn-îman** (2.3/19), **hewar-gazî** (2.6/22), **bax-bostan**

<sup>239</sup> Taş, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmançî*, r.30.

<sup>240</sup> Rukiye Özmen, *Nîşana Hebûna Me Ziman; Li Botanê Peyvên Sînonîm*, amd. Grûba Zimanperwer, Pêrî, Stenbol, 2012, r. 171.

(2.8/36), **am-mam** (2.8/57), **xidam-xulam** (10/4), **kilît-mifte** (11/37), **çik spî** (12/40), **lez-bez** (17/13),

### 1.8. Peyvên Dijwate

Peyvên dijwate ew peyv in ku ji du bêjeyên cuda û du wateyên cuda yên ku li dij hev in, pêk tê. Ev bêje di ziman de hizr û bîrê xurt dikin ku mirov peyvekê ji bîr kir ji dijwateya wê peyvê ew peyv bîne bîra xwe. Taş jî di vê bareyê de gotiye ew peyvên ku ji hêla wateyê ve li dijî hev in, peyvên dijwate ne. Di dijwateyê de divê rasterast berevajîya peyvê bê bîra mirov. Wekî mînak dema em dibêjin “tarî” divê rasterast tiştê berevajî tariyê, ango “ronahî” bê bîra mirov.<sup>241</sup>

Hasan Huseyîn Denîz jî di gotareke xwe de li ser dijwatehiyê rawestayê û gotiye:

“Di ziman de qasî peyvên hemwate, peyvên dijwate jî hene. Dema mirov peyvekê ji bîr bike, ji peyva dijwateya wê dikare bîne bîra xwe û bi kar bîne. Dibe ku em ramana xwe bi peyvekê tînin ser ziman ku em jê bi guman in, ka tam wateya armanca ramanê dide, yan nade. Wê demê mirov li peyva dijwateya wê dinêre û ger tam li gor armanca ramana mirov be, yan ne li gorê be ji wir dikare binase û bi vî awayî xwe bigihîne rastvegotinekê.”<sup>242</sup>

Her wiha peyvên dijwate di ziman de bi taybetî ji bo rastvegotineke tekûz dewlemendiyeke girîng e. Di mamikên kurdî de peyvên dijwate yên ku me kom kirin, ev in:

**helal-heram** (1.1/5), **diçe-nahête** (1.1/7), **erdî-esmanî** (1.1/18), **dimînîm-diçe** (1.1/26), **şêrîn-tehl** (1.1/27), **sibe-êvar** (1.1/32), **mestir-biçûktir** (1.1/32), **diçe-radiwestim** (1.1/33), **sivik-giran** (1.1/34), **kur-keç** (1.1/43), **herin-werin** (1.1/45), **dûr-nêzîk** (1.1/62), **dimeşe-disekinim** (1.1/63), **tere-tê** (1.1/68), **xwe-xelkî** (1.1/80), **derket-ket** (1.1/109), **rast-derew** (1.1/113), **şîrîn-tal** (1.1/122), **ser-bin** (1.1/128), **kirîn-firotin** (1.1/138), **ciwan-kal** (1.2/2), **dost-dijmin** (1.2/7), **neyar-heval** (1.2/8), **val-tejî** (1.2/17), **şev-roj** (1.2/20), **girtî-vekirî** (1.2/20), **spî-reş** (1.2/21), **beroj-nizar** (1.2/27), **were-meyê** (1.2/63), **jor-jêr** (1.2/89), **bihar-payîz** (2.1/16), **terr-hişk** (2.1/16), **hevraz-berjêr** (2.2/25), **ber-piştok** (2.3/20), **dûr-nêzîk** (2.3/37), **hundur-derve** (2.3/58), **dere-tê** (2.5/8), **reşahî-derya** (2.5/11), **dimire-jîndar dibe** (2.5/11), **da-berda** (2.6/27), **raza-şiyar** (2.6/56), **hene-tune** (2.7/10), **rastî-kaş** (2.7/18), **pêş-paş** (2.8/19), **zûha-şil**

<sup>241</sup> Taş, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, r. 30.

<sup>242</sup> Hasan Huseyîn Denîz, *Sazbûn û Bîkaranîna Peyvên Kurdî*, <http://www.pen-kurd.org/kurdi/hesen-deniz/sazbun-u-bikaranina-peyven-kurdi.html> (13.07.2014).

(2.8/36), **dixim-derdixim** (2.8/36), **ber-pişt** (2.8/47), **pêşî-paşî** (2.8/56), **girtir-hûrtir** (3/91), **hûrtir-bilindtir** (3/105), **qelew-zeîf** (4/1), **biçûk-mezin** (5/5), **pîr-can** (5/28), **mak-berx** (5/31), **dinê-axretê** (5/39), **hundur-derve** (5/70), **sîber-hetav** (5/85), **ciwan-rihspî** (5/98), **qetûf-cendan** (5/141), **mirî-sax** (7/70), **têxim-derdixim** (8/68), **stûr-zirav** (9.2/22), **dixebite-nasekine** (9.2/46), **kurt-dirêj** (9.2/190), **bişol-betal** (9.3/28), **hil Didim-datînin** (9.3/50), **digirî-aşt dibî** (9.3/50), **pişt-zik** (9.3/168), **dirûnê/rûdinê-radibe** (9.3/201), **serevraz-sernişîv** (9.4/3), **digere-disekine** (9.4/20), **berjêr-berjor** (9.4/23), **xalî- tijî** (9.4/30), **datên-hiltên** (9.6/2), **sih-tav** (10/7), **sîber-hetav** (10 23), **dibemê-diînim** (11/18), **dipêçî-vedinî** (11/29), **çû-ma** (11/67), **rabû-raza** (11/87), **dihilînim-dideynim** (11/103), **diçit-nahêteve** (12/10), **ciwan-ixtiyar** (12/37), **reş tarî-çikspî** (12/40), **tere-nasekine** (12/41), **reş û tarî- nûr** (12/45), **tarî-ronî** (12/72), **der-hundur** (12/73), **gir-hûr** (13/13), **hesp-mahîn** (16/23), **vira-wira** (16/39), **vedimire-vêdikeve** (16/78), **xûya-winda** (16/79), **ser-dawî** (19/10), **dirêj-kurt** (19/15), **fireh-teng** (19/15).

### 1.9. Lêker

Lêker hêmana sereke ya hevokê ye ku hevok bêyî lêkerê nîvçe dimîne. Yanî mebest û meqseda di nav hevokê de bi lêkerê encam digire û armanc tê cih. Ji ber wê ye ku di ziman de ji aliyê lêkerê ve, xurcîkê kê dewlemend be ew zêdetir û bi rahetî dikare hevokan saz bike û her wiha ziman bi vî şiklî asê namîne û rewantir dibe. Çimkî barê hemû hevokê dawîya dawî tê li piştê lêkerê siwar dibe. Samî Tan li ser lêkerê wiha dibêje:

“Lêker ew cureyê bêjeyê ye ku bi awayekî rêzimanî hêmana sereke ya pêveberê ye û bizavekê yan rewşekê nîşan dide. Di gelek zimanan de bi mebesta pêkanîna ahenga bi kirdeyê re li gorî dem, rawe, avanî û rewşê tê kişandin.”<sup>243</sup>

Di vê bareyê de Kadri Yıldırım jî ji bo lêkerê pênaseyêke bi vî rengî dike: “Ew peyvên watedar ên ku tevger û kirinan li gorî şexs û deman bi me didin zanîn, lêker in.”<sup>244</sup> Di dewama kitêbê de Yıldırım, lêkeran ji hêla binyadê ve dike çar beş ku me jî di vê xebata xwe de ev dabeşkirin referans girt. Li gorî wê me tabloyekê ji bo bikaranîna lêkeran di mamikan de amade kir. Ev dabeşkirin wek lêkerên xwerû, dariştî, hevedudanî û biwêjî dibe çar beş. Ji bilî lêkeran hin rengdêrên ku ji lêkeran hatine dariştin jî din av tabloyê de cih digirin. Wek mînak “maliştin” bûye “maliştî”, “mêtin” bûye “mêjandî” hwd.

<sup>243</sup> Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, çapa berfirehkirî, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2011, r. 205.

<sup>244</sup> Yıldırım, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi; Kurmancî Lehçesi*, r. 81.

Di mamikên kurdî de lêkerên ku me peyda kirin û her yek ji wan bi temamî çend caran hatine bikaranîn, bi vî awayî ne:

**Tablo 4: Bikaranîna Lêkeran di Mamikên Kurdî de û Rêjeya Bikaranîna Wan<sup>245</sup>**

LÊKER	CUREYÊ KÊŞANÊ	RÊJEYA BIKAR- ANÎNÊ	MÎNAK
<b>Lêkerên Xwerû</b>			
Avêtin	Avêt/havêt/avête/dih avêt/davêje/pavêje	43	Bazinê stîyê, xwe avêt deviyê? ( <b>Mar</b> ) <b>2.3/49</b>
Bihîstin	Nabihîze	1	Diçize lê nabihîze? ( <b>Hêk</b> ) <b>8/54</b>
Birin	Birin/bir/dibe/bibe/di beme/dibete	16	Hêstira qero, li bender/bêderê, ne gur dixwe, ne diz dibe. ( <b>Mêrî</b> ) <b>2.1/41</b>
Dan	Dan/da/dide/bide/	77	Çendî bideyê têr nabit. ( <b>Çav, meqes, nefis</b> ) <b>1.2/22</b>
Dîtin	Dît/dibîne/bibîne	53	Min ji dûr ve dît kevirek, çûm nêzik çar ling û seriyek? ( <b>Kûsî</b> ) <b>2.3/62</b>
Dotin	Dot/didoşe	3	Bizna kal e, li ser mal e, ne didoşin, ne difiroşin. ( <b>Mêşa hingiv</b> ) <b>2.1/33</b>
Firotin	Firof/firoş	6	Di zeviyê de nasekine, li bazarê nayê firotin, ji şeker şêrîntir e? ( <b>Xew</b> ) <b>1.1/108</b>
Gihaştin	Gihîj/gehişt/digehit	11	Çar bira berdî hev, tu carî nagihin hev? ( <b>Çirik-çirçirik- makîneya pêmbû</b> ) <b>2.8/56</b>
Girtin	Girt/girêday/digire/b igire	39	Mamikên min ê mamanî, leşkerê xala girt dora mala. ( <b>Sing</b> ) <b>1.1/211</b>
Gotin	Got/dibêje/bibêje	57	Sed mêr hatin bi rengêkî, sitran gotin bi dengêkî. ( <b>Mêşa hingiv</b> ) <b>2.1/34</b>
Guvaştin	Digivêşe	1	Eyar heye mû tune, xwe digvêşe gû tune. ( <b>Beq</b> ) <b>2.7/6</b>

<sup>245</sup> Me ev tablo li gor sê çavkaniyan amade kir. Lêkerên ku di van çavkaniyan de hatibûn rêzkirin me di formata pdfê de lêgerîna wan di mamikên senifandî de kirin. Ev çavkanî yek jê pirtûka Kadri Yıldırım a ku me di vir de daye nişan, ya duyem jî ya Çetîn Taş e ku dişa me da nişan, ya sêyem jî Hinkera Asta Duyemîn a ku Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê amade kiriye û di wir de tabloyeke lêkeran heye kum e referans girtiye.



Hatin	Hat/dihê/tê/bêt	192	Êrvist e, dar û bist e, heftê û heft zalim hatin neêxiste. ( <b>Tifeng</b> ) <b>9.1/39</b>
Hejmartin	Hijmartin/bijmêr	6	... Min pêpkên wê du du hijmartin êk di ma... <b>18/5</b>
Hiştin	Hêla/dihêle	7	Çav tune lê dimeşe, ling tune lê şop dihêle. ( <b>Derzîk/şûjin</b> ) <b>9.2/24</b>
Ketin	Ket/keft/dikeve/bike ve/kevit	102	Gurî ket nav firaqê, min berdayê bi şirmaqê? ( <b>Sabûn</b> ) <b>9.2/185</b>
Kirin	Kir/dike/bike/bikit/dikit/diket	262	Mamikê mino, mahîna boz, li meydanê kir toz. Çi ye? ( <b>Aş</b> ) <b>11/90</b>
Kolan	Dikole	5	Tiştêkî min heye, gora xwe bixwe dikole. ( <b>Dilopa avê</b> ) <b>12/15</b>
Kuştin	Kuş	7	Vira xişt li wira xişt, çû dera han kulê lê da kuşt. Ew çi ye? ( <b>Gêzî</b> ) <b>9.3/67</b>
Kutan	Kuta/dikutim	10	Dargê du ta, te li xwe kuta? ( <b>Pantor-şal</b> ) <b>9.4/38</b>
Lîstin	Dilîze	2	Marhulîsê di kurê da dilîze. ( <b>Dest conî</b> ) <b>9.3/40</b>
Malaştin	Maliştî	1	Mizgefta maliştî, du feqe tê d rûniştî? ( <b>Gûz</b> ) <b>6/33</b>
Man	Ma/dimîne/dimînit	35	Tiştêkî min heye, kaç û ma nok. Ev çi ye? ( <b>Ka çû ma nok</b> ) <b>19/7</b>
Mêtin	Mêjandî	2	Mamikê mino, seyê ne tajandî, berxê ne mêjandî, mêrga neçêrandî. Çi ye? ( <b>Hewa, Adem, Bihuşt</b> ) <b>10/19</b>
Mirin	Mir/mirî/mirît/dimirî t/ bimirî/miriye	36	Kalo miriye, dev vekiriye. ( <b>Kewar</b> ) <b>11/47</b>
Nivistin	Nivistî/nivistiye/dinivîvit/dinive	7	Mamikê mino, ga di kunê ve dinive, giya li mila digurze. Çi ye? ( <b>Amîretê cinsî</b> ) <b>1.1/104</b>
Parastin	Diparêze	1	Li jor disekine, mirov ji berf û baranê diparêze? ( <b>Sîwan</b> ) <b>9.3/200</b>
Pêçan	Pêça/dipêçe	3	Pirça pê pen, da nav reza, rez xwe pêça.

			Ew çi ye? ( <b>Kêlendî</b> ) 9.1/26
Rêtin	Dirêje/narije	4	Zerikek/tasek tijî morik e, çi qas tol/dol bike, narije. ( <b>Hinar</b> ) 3/10
Sotin	Disojit	1	Ka disojit, kadîn dimînit. ( <b>Sebîl/qelûn</b> ) 9.2/44
Şikestin	Şikest/dişikê/şikya/şikêt	13	Diavêjim tencerê(quçxanê) naşike, diavêjim pencerê dişikê? ( <b>Kutilk</b> ) 8/55
Şûştin	Şûşt/şûştî/dişo/dişû/bişû	27	Her ro diya min dest û gunnê Ereba dişo. ( <b>Kevçî</b> ) 9.2/71
Westan	Westa/diweste	4	Bi şev û roj diçe, lê naweste? ( <b>Av</b> ) 12/67
Xistin	Xist	4	Êrvist e, dar û bist e, heftê û heft zalim hatin neêxiste. ( <b>Tifeng</b> ) 9.1/39
Xwarin	Xwar/dixwe/bixwe	77	Mamikê mino, şnahiya wê nayê xwarin, koka wê tê xwarin. Çi ye? ( <b>Kartol</b> ) 4/25
Xwendin	Xwend/dixwîne	8	Mamikê mino, Qurana dimdimî, tete xwarinê, nehête xwendinê. Çi ye? ( <b>Kîvark</b> )5/97
Xwestin	Xwest/dixwaze	6	Ez hatim min tu xwestî, derketim bi dilek şikestî? ( <b>Cenaze</b> ) 1.1/111
Zan	Za/dizê	13	Kaniya kevezê, av tê dizê. ( <b>Poz</b> ) 1.2/80
Ajotin	Dajo/bajo/diajo	8	Gayê kejo, li hewa dajo. ( <b>Teyare</b> ) 13/3
Axiftin	Baxivit/baxive	4	Mamikê min e, dilivlive ezman nîne, pê baxive. Çi ye? ( <b>Tilî</b> )1.2/132
Jimartin	Bijmêrin	1	...heşt kesa bijmêrin yê nehê derxînin...18/19
Cûtin	Cût	2	Dûr li min nêzîk bûn, du bûne sê, sih û du ya ma ket û cût. ( <b>Pîrî: mirin nêzîk dibit, pêtvî gupalî dibit, 32 didan jî kit û mat dimînin</b> ) 7/10
Dirûn	Didirûn	1	Bi spî radiçînit, bi surî têdikin, bi keskî didirûn. ( <b>Kezan</b> ) 5/17
Dîtin	Dît/dibîne/bibînî	45	Min ecêbek dît di rê de, kê mak dîtiye di zikê bavê de? ( <b>Pembo</b> ) 5/132

Mîstin	Dimîze	5	Mêr e ji baranê dibizde, ji germê bi xwe de dimîze. <b>(Berfemêr) 12/8</b>
Xuyan	Xuyaye	5	Tiştêkî min heye, sar e bê deng e, ne xuya ye, nayê girtin bê reng e. Ev çi ye? <b>(Ba) 12/22</b>
Viyan	Viyan/divê	6	Şêrekê rahajote te, tu revî rûbarek, kete rêka te, tu biçî dê xendiqî, tu bizîvirî şêr dê te bixwe û divê tu xelas bibî. Tu çi bikî? <b>(Xewn) 1.1/91</b>
Patin/pehtin	Pat/peht	4	Teyrek hat, nanek pat, ne fitr e, ne zekat. <b>(Şana hingiv) 5/15</b>
Pîvan	Dipîve/bipîve	3	Ne kes dikare bixwe ne dikare bipîve? <b>(Agir) 12/86</b>
Bûn	Bû/hebû/tunebû/dibim/dibe/dibî/dibit/dibin	179	Barê gondura 30 bûn, her êkî 30 giheştinê. <b>(Rojîyên remezanê) 10/11</b>
Çûn	Çû/diçe/diçî/biçî	348	Anîkê manîkê, çû ber kanîkê, rê neda heywanekê. <b>(Cemed/qeşa) 17/6</b>
Herin	Dere/tere/dihere/terin/derin	16	Tiştî min hey emere dihere ber, mere dibe dudu. <b>(Neynik) 9.2/86</b>
Werin	Were/werin	7	Tiştî tiştî, li dûv min were, ne ker e ne maker e. Çi ye? <b>(Banger) 9.3/128</b>
<b>Lêkerên Dariştî/Pêkhatî (-î)</b>			
Barîn	Barî/dibare	17	Tiştî tiştî, bêvil xiştî, baran barî xwe guviştî çi ye? <b>(Jîjo) 2.2/48</b>
Anîn	anîn/ani/tîne/bîne	29	Em çûyin ber pezî, me anî tiştêk zêdeyî? <b>(Berx) 2.4/11</b>
Bezîn	Bezî/dibezit/dibeze	23	Stû rahêl bi bendala ra dibezit. <b>(Kew) 2.6/9</b>
Borîn	Diborî/dibore	2	Ga di ser ra diborî, çêl li çema avis dibî. <b>(Ba) 17/4</b>

Civîn	Dicivit	1	Ho dilivî, ho dicivî, ezman nîne pê baxivî. ( <b>Lanik</b> ) 9.3/56
Çinîn	Çinîn/diçinim/diçîni	3	Mamikê mino, diçînin kêçan, radibin wek rîman. Çi ye? ( <b>Kuncî</b> ) 5/82
Firîn	Difirî/firî/firya/difirî	31	Deve orya, pişkûl firya? ( <b>Tifeng</b> ) 9.1/4
Gerîn	Digerîne/geriya/digerî/digere/gerît	24	Du qulê roviya, du çirê neviya, aşek bêav di bin da geriya? ( <b>Poz/difin, çav, dev</b> ) 1.2/58
Herikîn	Dihêrike	2	Gava mû dibîne diherike, gava mû nebîne dihetike? ( <b>Çav</b> ) 1.2/183
Karîn	Karim/dikarim/nikarîm	5	Ne kes dikare bixwe ne dikare bipêve? ( <b>Agir</b> ) 12/86
Kelîn	Kelî/keliya	4	Mamikê mino, li vir keliya, li Stenbolê fûriya/firiya. Çi ye? ( <b>Name</b> ) 9.5/23
Kirîn	Kirî/bikire	14	Min li dikanê kirî hebek, anî malê bû hezar heb. ( <b>Hinar</b> ) 3/11
Meşîn	Meşî/dimeşe	11	Şûva reşî ew dimeşî, dil û cîger pê digeşî? ( <b>Trên</b> ) 13/22
Nêrîn	Nêrî/dinêre/dinêrim	10	Hatim hêt û hêt, min lê nêrî li min bî pê? ( <b>Çiya</b> ) 12/77
Revîn	Revî/reviya/direve	6	Roja navî, şeva navî, 7 bira li pey hev direvî. ( <b>Heft rojên heftiyê</b> ) 15/10
Şewitîn	Dişewitin	5	Li ser destan dişimite, dikeve çav dişewite. ( <b>Sabûn</b> ) 9.2/40
Weşîn	Weşî/weşiya	2	Tiştêkî min heye, xeftanşînê hejiya, tep û rep jê weşiya. Ev çi ye? ( <b>Dara hejîrê</b> ) 5/62
Xebitîn	Xebitî/dixebite	3	Ji min filitî, li te xebitî. ( <b>Kêç</b> ) 2.1/56
Zîvirîn	Zivirî/dizivirî/bizivirî/dîzivire	5	Mamikê mino, li dor te dîzivire, lê nagihîte te. Çi ye? ( <b>Doxîn</b> ) 9.4/27
Dizîn	Dizî/didize	2	Mamikê mino, nan dizî da kurê kumsor, kumsorî da rêza siwaran, siwaran kir kumêd

			dîwaran. Çi ye? ( <b>Ziman, didan, qirik</b> )1.2/152
Birîn	Birî/dibirin/dibire/bi birî	5	Hindî bibirî kata ji xwe didet. ( <b>Mû/pirç</b> ) 1.2/37
Girîn	Girî/digirî	10	Tiştikê mino tişteke e, mirov ser jê dike, pê ra digirî. Çi ye? ( <b>Pîvaz</b> )4/32
Kalîn	Dikale	1	Xwar e ne dar e, dikale ne kar e, dixuşe ne mar e. ( <b>Rûbar/çem</b> ) 12/29
Orîn	Orya	1	Deve orya, pişkula firya? ( <b>Tifeng</b> ) 9.1/4
Wêrîn	Newêrim	1	Şêr dixwim, newêrim herim cihê şer? ( <b>Nanê binê agir</b> ) 8/64
Zanîn	Nizanî/zane/dizanî/biznî/zanî	32	Mamikê mino, pir tiyan e, heçî nizanî, ew heywan e. Çi ye? ( <b>Pîr</b> ) 1.1/93
Zirîn	Zirî/ziriya/dizire	4	Ker zirî, tersel firî, kê keve dibe mirî. Ew çi ye? ( <b>Tiving</b> ) 9.1/34
Zûrîn	Dizûre	1	Li mirov dikeve dibore, xuya nake dizûre? ( <b>Mar</b> ) 2.3/61
Pirsîn	Pirsîn	1	Ji keçekê pirsîn: Diya te kê ve çûye?...18/21
Qefilîn	Qefilîm	1	Tiştêkî min heye, yek dibê ay pişt amin, yeka din dibê ez fetisîm, yek jî dibê ez qefilîm. Ev çi ye? ( <b>Mal, hundur û derve</b> ) 11/61
<b>Lêkerên Dariştî/Pêkhatî (-and)</b>			
Pêçandin	Pêçand/pêçandî	2	Rûçikandin, rêsandin, lê pêçandin? ( <b>Tajî</b> ) 2.4/14
Rêsandin	Rêsand	1	Rûçikandin, rêsandin, lê pêçandin? ( <b>Tajî</b> ) 2.4/14
Barandin	Dibarîne	2	Ezmanê darîn e, berfê dibarîne. ( <b>Muxil</b> ) 9.3/73
Bezandin	Dibezîne	1	Bê rûh e, rûha dibezîne? ( <b>Gû</b> ) 1.1/99

Kelandin	Kelîn	2	Tiştêkî min heye, mirov bi sedan kîlo xwê bikelîne jî dîsa bê xwê dimîne. <b>(Hêk) 8/38</b>
Hewandin	Dihewînî	2	Mamikê mino, sê mêvan tên bot e, yekî dihewînî, duwa nahewînî. Çi ye? <b>(Dendik) 6/23</b>
Lorandin	Dilorîne	1	Tiştêkî min heye, bi qirik e bê ziman e, bi dev e bê diran e, dilorîne ne însan e. Ev çi ye? <b>(Bilûr) 14/5</b>
Şandin	Şand/dişînim	2	Xwedayê mîhrîban, ji me ra donzdeh sêva şand, me yanzdeha xwarin yekê nexwar. <b>(Rojîya meha remezanê) 10/38</b>
Kişandin	Dikêşit/dikêşe	4	Hindî dikêşit, xilas nabit. <b>(Tizbî) 9.2/52</b>
Çikandin	Diçikînim	3	Çîz dikim diçikînim, li dîwêr dialiqînim? <b>(Derzîdank) 9.1/169</b>
Çandin	Çandin/çandî/diçîne	6	Me çandin wekî nuka, şîn bûn wekî sêveloka, pê ve hatin wekî gûzeloka. <b>(Pembû) 5/30</b>
Qulibandin	Diqulibî	1	Tiştêk min heye tiştanî, di heft kaş û newala diqulibî. Çi ye? <b>(Derzî) 9.2/154</b>
<b>Lêkerên Dariştî yên Bi Pêşgiran Çê dibin</b>			
Dadan	Dadayî/dade	4	Mamikê mino, ser bê zad e, her digire û pê dade, çi fayde nade. Çi ye? <b>(Mirovên neduhdar) 1.1/85</b>
Daketin	Dakevin	1	...15 kes jê dakevin da gemî niqum nebit... <b>18/19</b>
Daliqandin	Daliqandî/dadiliqînim	4	Tiştêkî min heye, çîz dikim diçikînim, li dîwêr dadiliqînim. Ev çi ye? <b>(Derzîdank) 9.2/92</b>
Hilanîn	Hilanî/hiltîne	11	Tiştê min ê tiştanî, paş kevira xiştanî, min kir û te hilanî. <b>(Gû) 1.1/60</b>

Rabûn	Rabû/radibe/rabe/nar abiteve	30	Helê melê, padşa rabû serê kelê, rû heye, simêl belê, Ew çi ye? ( <b>Pişîk</b> ) 2.4/4
Rahiştin	Rahêj	1	Hilûse wey ava pêlê, gava mû radihêjyê jê tê dengê têtê? ( <b>Saz</b> ) 13/15
Rakirin	Rakir/rake	7	Kêw kir xurexur, rûyê xwe şa kir, rabî, erdîkî rakir? ( <b>Mêhkew û kewikên wê</b> ) 2.6/61
Raxistin	Raxist	4	Weke kulavekî sûtî ye, ji vir heta Bexda raxistiye. ( <b>Ewir</b> ) 16/14
Rûniştin	Rûnişt/rûdine/dirûne	44	Hat wekî mîra, rûnişt wekî wezîra, çû wekî feqîra. ( <b>Befir/berf</b> ) 17/7
Vebûn	Vebûyî/vedibe	4	Mamikê mino, sêva nermbûyî, heştanê nevebûyî. Çi ye? ( <b>Memik</b> ) 1.2/122
Vegerîn	Vegerî/vedigerîne	2	Mamikê mino, heft gira gerî, li xwe vegerî. Çi ye? ( <b>Derzî</b> ) 9.2/147
Vekirin	Vekirî/vedike/veken	22	Çûme camiyê, min derî vekir tijî ayetê kursiyê? ( <b>Dev û diran</b> ) 1.2/166
Veçetandin	Veçetandî	1	Sebiyê nemêjandî, mêrga neçêrandî, kerê korê, jig arana veçetandî? ( <b>Melayîket, Cînet, Şeytan</b> ) 10/37
Vexwarin	Vexwar/vedixwe	11	Ser ve çayir e tê çînîn, ji bin ve kanî ye tê vexwarin? ( <b>Mih</b> ) 2.4/16
Raçînîn	Radiçînit	1	Bi spî radiçînit, bi surî têtîkin, bi keskî didirûn. ( <b>Kezan</b> ) 5/17
Vegerîn	Vegerî	1	Mamikê mino, heft gira gerî, li xwe vegerî. Çi ye? ( <b>Derzî</b> ) 9.2/147
Vegerandin	Vedigerîn	1	Dema mast didimê, bi reqasa xwe re nîvişk li min vedigerîne. ( <b>Meşk</b> ) 9.3/35
Raxistin	Raxistî/raxist	4	Weke kulavekî sûtî ye, ji vir heta Bexda raxistiye. ( <b>Ewir</b> ) 16/14
Rawestin	Rawest	3	Ez diçim, ew jî diçe, ez radiwestim, ew jî radiweste. ( <b>Sîber/sî</b> ) 1.1/33
Derxistin	Derdixe/derxe	7	Zûha dixime, şil derdixime? ( <b>Gema devê</b> )

			<b>hespa) 2.8/36</b>
Vekirin	Vekirî/vediket/veken	23	Tiştê min tişt e, qesra Xwedê çê kiriyê, beyna kun tê vekiriyê. Çi ye? ( <b>Kundir</b> ) 4/27
Vequetandin	Vequetandî	1	Sebiyê nemêjandî, mêrga neçêrandî, kerê korê, jig arana vequetandî? ( <b>Melayîket, Cinnet, Şeytan</b> ) 10/37
Razan	Ra za	6	Bi roj raza ye, bi şev şiyar e? ( <b>Şevşevok</b> ) 2.6/56
Raçandin	Radiçînit	1	Bi spî radiçînit, bi surî têdikin, bi keskî didirûn. ( <b>Kezan</b> ) 5/17
Werkirin	Werkirî/werdikit	4	Bavê mirî, di sê gilvilka werkirî, li nîva rêkan jibîrkirî. Çi ye? ( <b>Pîvok</b> ) 5/86
Werdan	Werdidit	1	Mamikê mino, hindî xwe kurê werdidet, her paqij e. Çi ye? ( <b>Gêsin</b> ) 9.1/73
Hildan	Hildidim/hildayî	5	Ho dibêm tevşo dibêm, nav hildidim nabêjim? ( <b>Tevşo</b> ) 9.1/94
Hilgirtin	Hildigirim/hilgirt	5	Mamikê mino, ê mirî yê sax hildigire. Çi ye? ( <b>Landik</b> ) 9.3/140
Hilçinîn	Hiçline	2	Dara çinçinê, pelê gozel çinê, kî mêr e hilçinê. ( <b>Quran</b> ) 10/12
Hilçûn	Hilçûm	1	Mamikê mino, qesra du derî, ji binî tê hilçûm, li serî min got: Ellah û Ekber. Çi ye? ( <b>Minare</b> ) 11/69
Hilkişîn	Hildikişim	1	Hildikişime ser zinarekî, lê dixim deng diçe hezarekî. Ew çi ye? ( <b>Ewr û ezman</b> ) 16/37
Hilavêtin	Hildavêje	1	Tiştikî min e ji tiştan e, çêl li vir dizê, golik li wir xwe hildavêje. Çi ye? ( <b>Kundir</b> ) 4/30
Vemirîn	Vedimire/vemirîne	2	Mamikê mino, şevê xemilîne, rojê vemirîne. Çi ye? ( <b>Stêrk</b> ) 16/71
Vedan	Vedidet	1	Helbet helbet, ava li bana şilqa vedidet,



			Şileymûnkê kata ji xwe didet. <b>(Bagurdan/pangor) 9.3/33</b>
Veman	Vemayî	2	Mamikê mino maman e, heft bizinêd rûtêt til diryayî, şax kopêd didan veweryayî, wê li dû barê barholê vemayî. Çi ye? <b>(Pîremêr û pîrejin) 1.1/95</b>
Vereşîn	Vedireşe	3	Kur tê ji dûr tê, gava vedireşe xwîn tê. <b>(Gule) 9.1/13</b>
<b>Lêkerên Hevedudanî</b>			
Avakirin	Ava kir/ava dike	5	Gava min dît min ava kir, pişt da min xwe winda kir? <b>(Ronahî)12/74</b>
Belavbûn	Belav bû/belav dibît	3	Mamikê mino, girêka mû, li serê çîyan belav bû. Çi ye? <b>(Mij) 17/26</b>
Çêkirin	Çê kir/çê dike	10	Tiştê min tişt e, qesra Xwedê çê kiriye, beyna kun tê vekiriye. Çi ye? <b>(Kundir) 4/27</b>
Derbasbûn Derbaskirin	Derbas dibe/derbas dikin	6	Tiştêkî min heye, her tişt di bin re derbas dibe. Ev çî ye? <b>(Pênûs) 9.5/18</b>
Dirêjbûn/kirin	Dirêj bit/ dirêj ke	3	Hindî bêjî, dê dirêj bit. <b>(Rûbar/çem) 12/28</b>
Germbûn	Germ nabe	2	Li nav agir germ nabe, li nav avê nerm nabe. <b>(Sîber/sî) 1.1/31</b>
Hûrkirin	Hûrkirin	1	Gayê beş, dindik reş, tam xweş, tê hûrkirin beş beş. <b>(Şitî/zebeş) 3/18</b>
Qulkirin	Qul kirî/qul dike	4	Spî spî, dibê şil dike, erdê jî tim qul dike. <b>(Dilopa avê) 12/16</b>
Reşkirin	Reş kir	1	Tiştêkî min heye, reş e ji reşan, keft nav mûyê diya te yê reş, reşa reş kir, dilê diya te xweş kir. Çi ye? <b>(Kil) 9.2/157</b>
Sorkirin	Sor kir/sor dikim	3	Kerê etaran, xwe sor kir, ji bendik û guharan. Çi ye? <b>(Helhelok) 3/60</b>
Windakirin/wi	Winda kir/winda	2	Gava min dît min ava kir, pişt da min xwe

ndabûn	bûye		winda kir? ( <b>Ronahî</b> ) 12/64
Berdan	Ber da/ber dide/ diberdin	19	Êr (ar) berdî kadînê ka dişewite, kadîn naşewite? ( <b>Qelûn</b> ) 9.3/183
Destdan	Dest Didim	6	Gava têr dixwe şa dibe, mû dest didiyê radibe? ( <b>Erebe-seyare</b> ) 13/12
Tevdan	Tev da	1	Lat û lat, min pê tev da evqas welat. ( <b>Pêlav</b> ) 9.4/7
Xerabkirin	Xerabî kir/xirab kir	2	Gava min danî ava kir, gava min rakir xirab kir? ( <b>Mehfûr-xalî</b> ) 9.6/10
Avisbûn	Avis dibî	1	Ga di ser ra diborî, çêl li çema avis dibî. ( <b>Ba</b> ) 17/4
Parvekirin	Parve kir	1	... Wan pezên xwe li xwe parve kirin... <b>18/11</b>
Pirsiyarkirin	Pirsiyar kir	1	Çûm dîwana mîr, min pirsiyar kir ji xelkê pîr, kê dîtiye teyr bi şîr. Ew çi ye? ( <b>Şevşevok- şevgerok</b> ) 2.6/80
Naskirin	Nas kir/ nas nake	1	Pelhûra pelxwê ye, heçî nas nake ne ji vê dinê ye? ( <b>Nokên şîn</b> ) 5/134
Siwarbûn	Siwar bû	11	Tiştikê mino, hel hele har bû, reşole siwar bû. Çi ye? ( <b>Kuçik-qazan</b> ) 9.3/139
Destavêtin	Dest diavêjmê/dest havêtê	3	Tiştêkî min heye, dev dirêj e, xwîn dirêj e, dest diavêjmê ber diavêje. ( <b>Tifeng</b> ) 9.1/8
Destpêkirin	Dest pê kir	1	Çûm ser diyarekî, min dest pê kir karekî, beqek di devê marekî? ( <b>Melhêb</b> ) 9.1/81
Hevîrkirin	Hevîr dike	2	Kewara agir, hevîr dike nanê hazir. ( <b>Tenûr</b> ) 11/17
Totbûn	Tot bû	1	Tiştêkî min heye, koffiya xezala, tot bû li çîya û newala. Ev çi ye? ( <b>Hîv</b> ) 16/60
Tijebûn	Tije bû	1	Tiştêkî min heye; Bi şev razam hewş tije bû, sibehê rabû yek tune bû. Ev çi ye? ( <b>Stêrik</b> ) 16/50
Şorbûn	Şor dibe	2	Ez dikelênim xwe teximê şor nabe, ez derdixim xwe têximê şor dibe. ( <b>Hêk</b> ) 8/68

Gêrbûn	Gêr bû	3	Kumê xezalê, gêr bû newalê. <b>(Hîv) 16/45</b>
Siyarbûn	Siyar bû/siyar dibim	6	Hudhud e har bû, reşwêlê lê siyar bû. <b>(Qazan, agir û hiskûk) 7/3</b>
Harbûn	Har bû	2	Tiştikê mino, hel hele har bû, reşole siwar bû. Çi ye? <b>(Kuçik-qazan) 9.3/139</b>
Babûn	Ba bû/ba dibe	3	Fêkiyên wê xelk dibe, pelên wê ba dibe? <b>(Dara fêkî) 5/112</b>
Şabûn	Şa bû/şa dibe	7	Zînê reşo siwar bû, kulfet pê şa bû? <b>(Sêl) 9.3/224</b>
Xûnbûn	Xûn bû	1	Ez çûm qurbanek mi dî, bê xûn bû, berîk hebû bê av bû. Ew çi ye? <b>(Nan, cinet, cenime) 10/39</b>
Werbûn	Wer bû	1	Guloka mû, li çiyê wer bû. <b>(Mij) 17/2</b>
Mezinbûn	Mezin dibe	5	Mamikê mino, gilvilkî av didin, golik mezin dibin. Çi ye? <b>(Kundir) 4/28</b>
Mexelbûn	Mixel dibe	1	Ga mexel dibe, gayê dorê zer dibe? <b>(Zilfet) 8/58</b>
Kalbûn/saxbûn	Kal dibe/sax dibe	4	Tiştêkî min heye, Ew kî ye ku mehê carekê kal dibe, dimire û dîsa sax dibe tê dinyayê? <b>(Hîv) 16/54</b>
Cîbûn	Cî dibe	1	Gomeke me heye, sed hezar pez dikeme têda cî dibe, lê qevşa gîha dikimê, naçe. Ew çiyê? <b>(Mûristang) 2.1/17</b>
Pehnbûn	Pehn dibe	2	Mamikê mino, ez ji serî dikim dirêj dibe, ez ji rexê dikim pehn dibe? <b>(Coya avê) 12/84</b>
<b>Lêkerên Biwêjî</b>			
Pêkhatin	Pêk tê	1	Li gor vê rewşê, refa çûkan ji çend çûkan pêk tê? <b>(Hejmara refê: 36 e) 18/38</b>
Jêkirin	Jê kir/ ser jê kir	2	Ga dakir, dûv jêkir. <b>(Cobir) 2.1/36</b>
Jihev bûn/jihev kirin	Ji hev vedibe/ji hev vedike	2	Dest dêxim qunê, dev ji hev vedibe? <b>(Meqes) 9.2/171</b>

Tevdan	Tev da	1	Lat û lat, min pê tev da evqas welat. <b>(Pêlav) 9.4/7</b>
Têrekirin	Tê re bike/tê re dike	3	Şil dike, rep dike, tê re dike. <b>(Derzî û ta) 9.2/82</b>
Jêhatin	Jê tê /jê têt	6	Hilûse wey ava pêlê, gava mû radihêjiyê jê tê dengê têtê? <b>(Saz) 14/15</b>
Lêdan	Lê da	2	Sê nigê sêdar, çar nigê tê da, du nigê lêda. <b>(Sêpêk, meşk, însan) 7/29</b>
Pêlêkirin	Pê lê dike	2	...dibîne û pê lê dike û derbas dibe... <b>7/66</b>
Lêxistin	Lê xist/lê dixim	3	Ez çûme serê banekî, min lêxist gopalekî, deng çû welatekî. <b>(Def) 14/7</b>
Pêgirtin	Pê digirim	2	Mamikê mino, pê digirim diçe axur, pê nagirim naçe axur. Çi ye? <b>(Kevçî) 9.2/116</b>
Pêketin	Pê ket	3	Çarnig bir ê ket, dunig bi pê ket, çîzo vîzo bi dorê ket. <b>(Çerçî) 1.1/50</b>
Lihevênêrîn	Li hev dinêrîn	1	Du xwêhikê (xwîşk) min henin, Îlleh (her dem) li hev dinêrîn? <b>(Her du milên tifikê) 9.3/178</b>
Lihevradan	Li hev rada	1	Ji Beda heya Bexda, çel kulavê li hev rada(pêçandî)? <b>(Ewr) 16/94</b>
Destpêkirin	Dest pê kir	1	Çûm ser diyarekî, min dest pê kir karekî, beqek di devê marekî? <b>(Melhêb) 9.3/81</b>
Tevgerîn	tevdigere	2	Ji cihê xwe tevnagere, piştî ketinê tevdigere? <b>(Pel) 5/121</b>
Lêxistin	lêxist	1	Ez çûme serê banekî, min lêxist gopalekî, deng çû welatekî. <b>(Def) 14/7</b>
Fêxistin	fêxistiye	1	Reş e pir tarî ye, du çilê Fatma nebiya, tê de fêxistiye. Çi ye? <b>(Çav) 1.2/212</b>
Serjêkirin	Ser jê dike	1	Tiştikê mino tişteke, mirov ser jê dike, pê ra digirî. Çi ye? <b>(Pîvaz) 4/32</b>
Bidûketin	Bi dû ket/bi dûv ket	4	Mamikê mino, du lingo bi rê ket, çîzo vîzo bi dû ket. Çi ye? <b>(Bangeran) 9.3/129</b>

**Tabloya 2.**

Li gorî vê tabloyê di mamikên kurdî de taybetmendiyên bikaranîna lêkeran bi vî awayî ne:

- 1) Bi temamî li ser hev 189 lêkerên ji hev cuda hatine bikaranîn.
- 2) Ji van lêkeran:
  - a) 52 lêkerên xwerû ne ku herî zêde lêkerên wek “çûn” 348 car, “kirin” 262 car, “hatin” 192 car, “bûn” 179 car dubare bûne.
  - b) 29 lêkerên dariştî yên bi paşgira “-î”yê çê dibin ku herî zêde lêkerên wek “zanîn” 32 car, “firîn” 31 car, “anîn” 29 car dubare bûne.
  - c) 13 lêkerên dariştî yên bi paşgira “-and”ê çê dibin ku herî zêde lêkerên wek “çandin” 6 car, “kişandin” 4 car dubare bûne.
  - d) 38 lêkerên dariştî yên bi pêşgiran çê dibin ku herî zêde lêkerên wek “rûniştin” 44 car, “rabûn” 30 car, “vekirin” 22 car dubare bûne.
  - e) 38 lêkerên hevedudanî ne ku herî zêde lêkerên wek “berdan” 19 car, “siwarbûn” 11 car, “çêkirin” 10 car dubare bûne.
  - f) 19 lêker jî yên biwêjî ne ku herî zêde lêkerên wek “jêhatin” 6 car, “bidûketin” 4 car dubare bûne.
- 3) Lêker bi giştî li gorî dem û raweyên curbicur hatine kişandin. Lê dîsa jî em dikarin bibêjin ku herî zêde lêker di demên borî de hatine kişandin.
- 4) Ev tablo careke din dide nîşan ku zimanê mamikên kurdî ji hêla lêkeran ve jî xwedî gencîneyeke gewre ye û di pêşketin û rewaniya ziman de roleke girîng dilîze.

### 1.10. Gihanek

Gihanek ew cure peyv in ku yan du peyvên cuda yan jî du hevokên cuda bi hev ve girê didin û dibin alîkar ku mebesta vegotinê rast derkeve holê. Derbarê vê de Tan wiha dibêje: “Her wekî ji navê wê jî diyar e, gihanek bi serê xwe ne xwediyê tu wateyê ne, lê bêjeyan, komek û hevokan bi hev ve girê didin, an jî peyvekê, komekekê bi hevokekê ve girê didin.”<sup>246</sup>

Bi serê xwe tu wateyê gihanekan tune. Lê belê ev nayê wê maneyê ku gihanek di zimanekî de cihekî girîng û erkeke mezin nagirin. Berevajî wê heke gihanek di zimanekî de tunebe dibe ku avakirana hevokan bibe pirsgirêk û di vegotinê de tevlihevî û şaşfêhmkrin derkeve holê. Her wisa her çiqas peywira wan girêdana hevok û peyvan be jî her gihanek nabe ku di cihê hev de bên bikaranîn. Li gor xwe her

<sup>246</sup> Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 195.

gihanekek xusûsiyeteke xwe heye. Ji ber wê ye ku dema em dêhna xwe didine mamikên kurdî, em dibînin ku tê de bikaranîneke gihanekan bi awayeke sirûştî ji zimanê gel heye ku ev jî rêbaza herî rast e. Çimkî bêyî ku bikevin nav hizran ka kîjan gihanekê li ku derê bi kar bînin, ger lazim be jixweber ew gihanek di zimanê gel de dikeve şûna xwe.

Gihanekên ku di mamikên kurdî de peyda bûne ev in:<sup>247</sup>

1. (**Û**): Xodanê pez **û** mêş e, bo ebdal **û** derwêş e. (**Şivan 1.1/23**)
2. (**Paşê**): Tiştêkî min heye tiştanî, ji diya xwe dibe, panzde ro disekine, **paşê** dest û ling çê dibe. Ew çi ye? (**Beq 2.7/8**)
3. (**Dîsa**): Tiştêkî min heye, mirov bi sedan kîlo xwê bikelîne jî **dîsa** bê xwê dimîne. (**Hêk 8/38**)
4. (**Lê**): Diçize **lê** nabihîze? (**Hêk 8/54**)
5. (**Çiqas**): Tiştêkî min heye **çiqas** bixwe, têr nabe. (**Agir 12/9**)
6. (**Lewra**): Mamikê mino, bîst mêtêr dirî, hatine barek tirî, neşiyar barken **lewra** berda girî. Çi ye? (**Mirovek tenê ye navê wî jî bîsto 7/54**)
7. (**Eger**): Mamikê mino, eger rabû hindî çiyayekî ye, eger raza hindî gayekî ye. Çi ye? (**Kon 11/87**)
8. (**Heke**): Tiştêkî min tiştan e, **heke** te dest havêtê dengê şeşa ne, **heke** te dest jê berda, mirî ye û ruh tê nîne. (**Tifeng 9.1/10**)
9. (**Jî**): Çar bira nin, her çar **jî** di xetekî de cot dikan? (**Şîşkên gora 9.2/170**)
10. (**Ne...**): Dirêj e **ne** mare e, kej û hît e **ne** kar e, serî hişk e ji dar e. (**Werîs 9.3/61**)
11. (**Nema**): Tiştêkî min heye, ku tere **nema** tê. Ev çi ye? (**Mirî 1.1/68**)
12. (**Ku...**): Tiştêkî min heye, yekî ji yekî re got: **ku** ez diherim kesik nikare min bisekinîne. Ê din tu ji min re jî dibêje? Got: kesî behsa te nekiriye. (**Av û Agir 7/37**)
13. (**Dema**): **Dema** jêhel diçit berê wî li jurda, **dema** jurda diçit berê wî li jêhel. (**Tifeng 9.1/1**)
14. (**Gava**): Kur tê ji dûr tê, gava vedireşe xwîn tê. (**Gule 9.1/13**)
15. (**Bila**): Eva deva hanê nakeve hundir, serê wê jê ke **bila** bikeve hundir? (**Sîwan 9.3/181**)
16. (**Hew**): Gava digere mû, dibêje yê dinyayê **hew** bikê, ji bo parîkî xwe diavêje şewkê? (**Masî 2.5/9**)
17. (**Ne...ne**): Tiştê min tiştanî, **ne** pê pê ve ne, **ne** panî, bixwe diçite ser banî. (**Dûkêl/kadî 12/2**)

<sup>247</sup> Gihanekên ku di vê xebatê de cih digirin, li gor pirtûkên Kadri Yıldırım û Çetîn Taş hatine kategorîzekirin û li ser mamikên di vê xebatê de di ber çavan re hatin derbaskirin.

18. (**Yan...**): Dûr va çêlekek ketiye ser lodê, gîhê dixwe, Çawa zanivî ga ye **yan** çêlek? (**Çêlek 19/2**)
19. (**Yek...yek**): Ji wê da tê, **yek** li til e **yek** li mil e, **yek** jî tê da vilevil e. (**Jina bihal 1.1/21**)
20. (**Hem ... hem**): Dernakeve ji mal e, **hem** ciwan e **hem** kal e, geh şûr e, geh mortal e, **hem** neyar e **hem** jî heval e, geh şîrîn e geh tahl e? (**Ziman 1.2/169**)
21. (**Hin...hin**): Tişteki min heye, **hin** ji hesin, **hin** ji bizin, du heb ji wan gayê mezin, tev bi hev re dibezin. Ev çi ye? (**Ga û cotkarî 2.8/34**)
22. (**Car... car**): Hêlîna şimşetorê, **car** li beroj e, **car** li nizar e. Çi ye? (**Dûngê beranî 2.8/42**)
23. (**Geh...geh**): Tişteki min heye, her tim li mal e, **geh** şîrîn e **geh** tal e. (**Ezman 1.2/1**)
24. (**Çawa...welê**): Ji hire û afirê, **çawa** deynê **welê** difirê? (**Heyv 16/92**)
25. (**Dema ku**): Tişteki min heye, digere digere, **dema ku** disekine devê xwe vedike. Ev çi ye? (**Şekal, pêlav 9.4/24**)
26. (**Heya**): Tişteki min heye, **heya** meriv goşt nedîyê nameşe. Ev çi ye? (**Şekal, sol 9.4/21**)

### 1.11. Daçek

Daçek hêmaneke hevokê ye ku bêyî wê mane kêr dimîne û tevilhevî pêk tê. Her çiqas di hin dever û devokên kurdî de hinek daçek wînda bibin jî bi temamî ji holê ranebûne û di wan devokan de jî li hin deran heke daçek neyê bikaranîn kêmasî xuya dibe. Em dikarin ziman bişibînin malekê û hêmanên wek gihanek, daçek û hwd. jî bişibînin ode û beşên vê malê. Ew mal ji devre ve her çiqas wek avahiyek bixuyê jî dema ku tu ketî navê û te beş û jûrên wê nedîtin tu yê wek avahiyekê vala bibînî. Ziman jî eynî wisa ye. Dema ku tê de kêmasiya van hêmanan hebe wek avahiyekê vala dê bixuyê. Ji ber vê yekê daçek jî ji bo zimanekî tekûz û ji bo pêşketina ramana wî zimanî hêmaneke girîng a ziman e.

Di mamikên kurdî de daçekên ku em li ser rawestiyên û bikaranîna wan bi mînakê nîşan dane ev in:<sup>248</sup>

1. (**Bi**): **Bi** şev **bi** roj mezin dibe, damarê wî heye, xwîna wî tune ye? (**Dara ku şîn dibe 5/101**)
2. (**Bê**): Qesra sipî bê derî. (**Hêk 8/5**)

<sup>248</sup> Daçek jî li gor heman çavkaniyên ku ji bo gihanekan referans hatiye girtin, çavkanî girtiye. Bnr: Yıldırım, *Temel Ağıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi; Kurmancî Lehçesi*, r.267-283. Taş, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, r. 144-149.

3. **(Di)**: Xalê min Emer e, sê kurtekên **di** ber e, du sipî ne êkê zer e. (**Hêk 8/2**)
4. **(Ji)**: Rûto **ji** pûrto dibit, pûrto **ji** rûto dibit. (**Hêk 8/16**)
5. **(Li)**: Tişteki min heye, şerîno **li** darîno. Ev çi ye? (**Hingiv 8/36**)
6. **(Bi...re/ra)**: Uşe keru, **bi** dû min **ra** weru. (**Bagurdan/pangor 9.3/27**)
7. **(Bi...ve/va)**: Ker **bi** bar **ve** çû di şkeftê ve. (**Kefçik 9.2/30**)
8. **(Bi...de/da)**: Kalê rû **bi** dar **de** çi ye? (**Derî 9.3/194**)
9. **(Di...de/da)**: Serî li derve, binî **di** erdê **de**? (**Sing 9.3/210**)
10. **(Di...re/ra)**: Serî yek e binî du, **di** qûna bab û bapîran **ra** çû. (**Şerwal 9.4/11**)
11. **(Ji...re/ra)**: Wekî pirpel e, nivîs lê bel e, bi bend û bal e, **ji** te **re** heval e. (**Pirtûk 9.5/10**)
12. **(Ji...ve/va)**: Belot belot, **ji** ser **ve** req e, **ji** bin **ve** pot. (**Berîk 11/20**)
13. **(Ji...de/da)**: **Ji** hire û wê **de**, sed mal û mezê, di nav sima ga da? (**Kunmêwî 11/115**)
14. **(Li ber...)**: Pişo pişo nêgiz, **li ber** ava dengiz, ne gur dixwe ne jî dibe diz? (**Pir 11/127**)
15. **(Di ser...re/ra)**: **Di ser** avê **ra** diçit sihê nakit. (**Deng 1.1/24**)  
**(Li ba/bal...)**: Çil mêvanê şuştî, **li ba** hev rûniştî? (**Neftik-kîbrît 9.2/166**)
16. **(Ji ber...)**: Hûr e wekî kirzin, reş e weku bizin, hakim **ji ber** dilerizin. (**Kêç 2.1/54**)
17. **(Bi ser...)**: Mamikê mino, guhbêlo bi rê ket, girovero **bi ser** ket, xeftanzero bi pey ket. Çi ye? (**Ker, barê tirî, moz 7/45**)
18. **(Bi wî/wê (Pê))**: Tişteki min heye, **pê** digirim tere axir, **pê** nagirim naçe axir. Ev çi ye? (**Kevçî 9.2/95**)
19. **(Ji bilî...)**: Mamikê mino mamanî, yê li bin mêwek sadanî, **ji bilî** Xwedê kes nizanî. Çi ye? (**Jina bihemle 1.1/76**)
20. **(Li bin...)**: Şiva ter e, **li bin** axê. (**Mar 2.3/17**)
21. **(Di bin...ve)**: Hizar mirovê **di bin** lihêfkekê **ve**. (**Hinar 3/5**)
22. **(Di bin...de)**: Minara sor e **di bin** erdê **de** çi ye? (**Gêzir-gizêr 4/49**)
23. **(Ji bin...)**: Mamikê mino, deng **ji bin** têt, ser diçemît. Çi ye? (**Tir û fis 1.1/94**)
24. **(Ji bin...ve)**: Ji ser **ve** hosî, **ji bin** **ve** pirasî. (**Belgê çolî 5/32**)
25. **(Ji bo...)**: Tişteki min heye, **ji bo** dinyayê hemiyê lazim e. Çi ye? (**Nav 1.1/98**)
26. **(...cem...)**: Ji hire û **cem** te, çip li qûna te? (**Kêç 2.1/44**)
27. **(li dor...)**: Mamikê mino, **li dor** te dîzivire, lê nagihîte te. Çi ye? (**Doxîn 9.4/27**)
28. **(bi dor...)**: Çarnig bi rê ket, dunig bi pê ket, çîzo vîzo **bi dorê** ket. (**Çerçî 1.1/50**)
29. **(Li dûv...)**: Gayê li nav govê nivistî, pezê li dûv qûnê **ve** damiştî. (**Dolab 9.3/49**)



30. (**Li hindav**): Behrek av, marek li nav, teyrek **li hindav**. (**Lempe/çira-momik-fanos-lox 9.2/12**)
31. (**Li jêr**): Teq û req li jor, li ban dixê **li jêr** û jor? (**Çeqçeqa aş 11/134**)
32. (**Li jor**): **Li jor** disekine, mirov ji berf û baranê diparêze? (**Sîwan 9.3/200**)
33. (**Li kêlek**): Cêwî ne **li kêlek** in, ne goşt in, lê nermik in, ev çi ye dê fêr bikin? (**Guh 1.2/16**)
34. (**Li mal**): Mamikê mino, min kirrî yek, **li mal** bû sed û yek. Çi ye? (**Hinar 3/63**)
35. (**Li nav**): Mamikê mino, firto fiyo, **li nav** deviyo. Çi ye? (**Qîvar 5/87**)
36. (**Li paş**): Tasa danya, **li paş** xanya. (**Kirmorî 2.1/65**)
37. (**Li pey**): Çûme çolê çolbeyarekî, heft dûv **li pey** beranekî. (**Şitî/zebeş 3/20**)
38. (**Li pêş**): Mamikê mino, aş e aşê çend xeraş e, du li paş du li pêş e. Çi ye? (**Guhan 2.8/44**)
39. (**Li pişt**): Xana **li pişt** malan e, dibe kinc bi însan e? (**Pembû 5/145**)
40. (**Li ser**): Tişteki min heye, sindoqa xilqandî, li ser darê daliqandî. Ev çi ye? (**Gûz 6/20**)
41. (**Mîna...**): Nav mîna navê tazî, toponî mîna topono xîştiro? (**Terazî 9.3/203**)
42. (**Nav**): Hade û made, korîka xo bade, here di nav zevîka bi qurad e. (**Coka avê 12/14**)
43. (**Ji nav**): Tebeqa li ser tebeqê, **ji nav** da marê gezekê, di ser da konên rûvîya, di ser da çirayên nebiya, di serda dehlên hûta. (**Lêv, ezman, difin/poz, çav, por 1.2/10**)
44. (**Di nav... de/da**): Wî lay pêjan, vî lay pêjan, **di nav da** morî û mercan. (**Çav 1.2/25**)
45. (**Nik**): Mamikê mino, şev têt şemal têt, gah têt gopal têt, **nik** padîşah û sultan têt. Çi ye? (**Heyv 16/75**)
46. (**Li pişt**): Du rêz giya, **li pişt** çiya. (**Kezî/gulî 1.2/43**)
47. (**Bi pişt**): Tişteki min heye, ji tiştan tişt e, bi parsî ye û **bi pişt** e, bê xwîn û bê goşt e? (**Pel 5/140**)
48. (**Pişt**): Xalkî xala, çû **pişt** mala, şingîn kete ezmana? (**Birûsk 16/108**)
49. (**Bi rex**): Tişteki min ê bêhnxeş e, dara qudretê, xizêmeke **bi rex** ketê. Çi ye? (**Nêrgiz 5/84**)
50. (**Rex**): Mamikê mino, vî **rexî** kaş wî **rexî** kaş, di nav da topek qumaş. Çi ye? (**Kitêb 9.5/22**)
51. (**Heya**): Pîrikek min heye, ji sibê **heyâ** êvarê pîna (pehînan) li xwe dixê. (**Sêla Nan 9.3/100**)

52. **(Heta):** Dirêj, dirêj, dirêj, ji vir **heta** serê dinê, nagêyê boça kerê. **(Rê 11/44)**

53. **(Hetanî):** Pîrê tê nava civatê, hetanî mîza xwe neke naçê? **(Çaydan 9.3/205)**

### 1.12. Bikaranîna Peyvên Sereke di Sêwirandin û Danasîna Têgehên de

Peyv ji bo zimanek her tişt nebe jî reng û rewş, xeml û bejna wî zimanî ye. Bi tenê ne qodên gramerê dikarin zimanekî biafirînin ne jî peyv bi serê xwe. Wextê ku ev qodên rêzimanê û peyv tîn li cem hev û wê çaxê dirûvek derdikeve holê û bi alîkariya aqil jî ew vediguhere hebûnekî ku navê wî jî ziman e. Ji ber vê yekê ye ku hin teorîsyenên ziman lêkolane ku gelo di hişê mirovî de manegirtina têgehên çawa çê dibe. Di vê bareyê de Vygotsky wiha dibêje:

“Mirov tenê peyvên ji ber bike û tîkiliyekê di navbera wan û heyberan de çê bike, ji bo ku têgehê derkeve holê tîrê nake. Ji ber vê berî ku meriv peyvên ji ber bike divê pîrgirêkek hebe ku mirov ji bo çareserkirina wê, serê xwe biêşîne û li gorî wê kontekstê li çareseriyekê bigere.”<sup>249</sup>

Dîsa di heman pirtûkê de Vygotsky ji Paulhan gotinekê neqil dibe û wiha dibêje: “Peyvek hesa xwe ji wê hevoka ku tê de derbas dibe, digire. Ew hevok ji paragrafê, paragraf ji pirtûkê, pirtûk ji nivîskar digire.”<sup>250</sup>

Yanî em dikarin bibêjin ku hem bê peyv nabe hem jî tenê bi peyvên çê nabe. Ji ber wê dema ku di mamikên kurdî de qala “keç, kiç, qîz”ê dibe di nav kîjan konseptê de çawa û bi kîjan têgehên danasîna wê tê kirin, ji bo fahmkirin û bidestxistina wê hêmayê rêbazeke pîr muhîm e. Em vê yekê bi tîra xwe di mamikên kurdî de dibînin ku ev yek di tabloya li jêr de hatine rêzkirin:

**Tablo 5: Hêmayên Sereke yên Mamikên Kurdî û Têgehên ji bo Sêwirandin û Şayesandina Wan**

Hêmaya Sereke	Peyvên ku di Sêwirandin û Danasîna Hêmayan de Hatine Bikaranîn
Keç, keçik, dot, qîzik, kiç	Tirî, bitam, xelk, helal, xwedan, heram, teyr, hêlîna xwe, firîn, hesp, danîn, delala dê, nêrî, gan, guhan, nehatî beran, morîka qul, belendîr, zayîn, çavê herkesî, qismet.
Jina bihemle, kulfeta hemle, jina bihal, hemle, jina bi ducana	Hêlîn, tav, sîya êvarê, qûtîka Silêmanî, Xwedê, zanîn, sindirûka Silêmanî, erd, esman, behr, mirin, vilevil, buxçik, kundir, daliqandî, çav, beliqandî, qûç, neh, mezel, sindoqa Silêman .

<sup>249</sup> L.S. Vygotsky, *Düşünce ve Dil*, r. 87

<sup>250</sup> H.b, r. 207

<b>Çav</b>	Du gol, reş û hişîn, pencere, bêderî, şev, girtî, roj, vekirî, spî, reş, tîj, tênebûn, odayek, cotek qazî, kanî, morî û mercan, dîtin, hêlîn, nîvek, beroj, nizar, stêrik, çirûsîn, derî, birûsk, birû û bisk, xuşkên cînar, bawer, gûlên geş, reqîsîn, çilmisîn, kulekêd bêderî, perçîn, kewa gogerçîn, çira, mû, diherike, dihetike, mijang, rondik, nîsk, tarî, çilê Fatma nebiya, fêxistî.
<b>Ziman, ezman</b>	Mal, şîrîn, tal, ciwan, kal, şûr, mertal, şîrîn, şekir, jehr, bilbilek, rûniştî, hingivîn, gayê sor, gelî, girêdayî, dost, dijmin, topek qumaş, şûrekî şîn, seyekî har, lawikê kumsor, tazî, nayê xwarin, sersork, ga, neyar, heval, serberdayî, qazikê qûnxwar, zilindar, bilûr.
<b>Mêşa hingiv/hingivîn</b>	Gû, derman, nexweş, teyr, totik, pahtin, bizna kal, doşandin, firotin, sed mêr, stran, mirîşk, kepir, zîrç, şekir, nizar, nalîn, deng, dangan, tewş û tirar, behr, bênder, vizeviz.
<b>Morî, gêrik, mûristang, mêrî, mûrî, mêwî</b>	Ker, hêstir, bar, qalib, mezin, navtengbestî, goşt, hestî, qulek, keriyekî pez, gom, sed hezar pez, rêz, fêz, ser, ûr, hêstira qero, gur, xwarin, diz, birin, pezê hemeşîn, keriyeke pez, lez.
<b>Mişk</b>	Bazdayîn, quncik, simbêl tîj, guh belîk, hel hel, bel bel, çindik, du dest, du pê, mal, kun, dûv rût.
<b>Kêvrîşk, kêroşk, kêwrûşk, kêroşk</b>	Lotik, qendêr, şaxêt bizina, guhêt kera, pêt gurga, çav, zîq, deşt, ber, hevraz, berjêr, tirs, tajî, razan, devî, terîsork.
<b>Kûsî, kîsel, kusî, şkevatûk, kosî, kêsûle, kûsele, kosele, kîso</b>	Çolî, xwarin, kar, mişk, mar, çulixur, text, kalekî bêbext, xiştanok, giya, çerm û çîqal, mû, dûv, pîr, goştê jar, çêrîn, dizelit, hêk, dep, dar, kun, xişik, çar çemil, sofîk, ferşik, pişt, hûs, qulûz, kevir, hişkîn, req, stûqaqîçk, çarçeng, kulav, tûtik.
<b>Mar, mer</b>	Qûn, nîvek, şiv, terr, guher, xar, bin, dîwar, zil, dîn, îman, ber, piştok, gilover, çerm, mû, qesas, bazin, nal, tizbî, asin, sar, devî, teşik, meşîn, bêling, xuyakirin, zûrîn, werîs, beyar.
<b>Pişîk, kitik, pişîng, pişîk</b>	Rih, simbêlbel, pişo, kela, taq, doşek, nir nir.
<b>Kûçîk, se</b>	Belek, beyar, av, vexwarin, çelp çelp, çar ling.
<b>Masî, mesî</b>	Sîng, şêr, çav, mar, dirinde, av, pêlewan, bajayî, bêcan, şimşedarî, bêdest, bêling, avjenî, şop, toz, qemçik, hesp, bask,

	teyr, reşahî, derya, dûv, çem.
<b>Mirîşk</b>	Dergoş, hundur, mal, xatûn, çilkezî, bezîn, rûto, pûrto, diçize, şîr, pizdan.
<b>Kew</b>	Lawik, çav, bikil, xatûn, kendal, bezîn, dengbêj, dengzelal, qewm, neyar, stran, pal, dezî, ling, hewar û gazî, nikul, dixwîne, mela, aşiq, gewende, dijmin, xelk û alem, çavkil, çem, fedî.
<b>Beq</b>	Îr, eyar, mû, guvaştin, çerm, çîqal, dûv, çar dest û pê, panzdeh ro, qulîpançî, zirçine, avjen, nameşe, kevil, pirç.
<b>Guhan, çiçik</b>	Çar, çêlek, heşt, dêlik, çeç, maçeç, fitefelek, xeraş, pêş, paş, tîr, avêtin, av.
<b>Hêstir, qantir</b>	Rez, bêber, dê, hîr hîr, bav, zirr zirr, kur, zir, mezintir, bilindtir.
<b>Hirç</b>	Beroj, tirs, nizar, birs, qewet, nawergere.
<b>Hinar</b>	Dîzik, dindik, riştin, simê ga, birincê qutay, kumê sorik, morik, hezar, lihêf, himban, dan, xwê, savar, quliya darê, sed, tolkirin, rêtin, dikan, hebek, hezar heb, qazan, qesreke bêderî, denû, gilorkirin, nexweş, ta girtin, serê darê, lib lib, sûk, mal, kûpik, mircan, taliqandî, gulok, sênî, guliya darê, buhar, girek, kirîn, kasik, çiçê darê, çil heb, melez, çil tax, çil ortax, çil miştax, gelek, tejî, garis, ode, rûniştin, bînder.
<b>Zebeş, şitî</b>	Kevz, av, zayîn, behr, şîn, masî, reş, sur, zingîr, beş, dindik, reş, hûrkirin, beş, tam, xweş, bajêr, dîwar, kilik, asin, dûv, terr, av, golik, kap, kesk, mifte, qesra şîn, bêderî, gov, mihên qer, kulîlk, kanî, fistankesk, kirassor, bijkojreş, bazin, newal, ber, pişt, xwîn.
<b>Pîvaz</b>	Spî, şîn, heftê, cilo, heft qat, şaşik, bin erdî, pat, gok, sor, çerm, spî, gilovero, eyar, zer, tas, sibe, xwarin, nîvro, heval, êvar, neyar, seyîd, mela, sofî, serjêkirin, girîn, çil çik, çil berçik, çil ode, çil kilîle, bayê qul, telîs.
<b>Kulind, kundir</b>	Qelew, kap, zexel, mexel, beyn, kun, Xwedê, avdayîn, çêl, golik, nivistin, veristin, helan, dûngên beranekî, kab, av, sing
<b>Genim, genimok</b>	Dar, şirîn, gulî, zêrîn, binî, ax, nav, şax, serî, zêr, deşt, kok, erd, ker, por, gijik, qirşik, kesk, tîrojok, spî, reş.
<b>Kîvark, karî,</b>	Quran, xwendin, xwarin, goşt, hêsk, kitêb, hûr, kon, stûn, ser,

<b>kifkarik, kidadik, karûk, feqîroşk, kavkelik, ,kalkevîk, kuvarek, karok</b>	spî, pê, pan, gelî, fotir, gom, lingê kewê, perê Quranê, kal, pal, dewsa qûnê, kaxiz.
<b>Gûz, gwîz, goz</b>	Tenûr, nan, genimî, du, kade, qesr, begzade, rûniştî, ode, feqe, kum, dîzik, tije, ard, kêrg, tendûra dadayî, nanê badayî, şûştî, sindoq, daliqandî, çantik, jehr, şekir, şîrîn, tahl, sêv, biçûk, dûvê mihan, birûn, kilor, mizgeft, maliştî, bêderî.
<b>Mewîj, mēwîj</b>	Kurî, jêkirin, şax, bab, şîrîn, kur, nevî, dîn, şîn, şîrîn, har û dîn, pîr, qermiçî, qirş, qûn, darik, boç.
<b>Hêk</b>	Kolav, dersok, sê kurtek, du spî, êk zer, du av, tîrar, qesra spî, bêderî, xanî, qube, bêkutek, law, zer, reng, av, şemitîn, gilovir, pencer, pêst, qutik, şilq, avkên bana, rûto, pûrto, pê, panî, cêr, zîv, cirm, aşkî bêderî, bêserî, bêberî, şikestin, kiras, teht, şil û şeht, sor, şil, zuha, ter, hişk, xwê, kelandin, mal, hundur, esmer, kulek, perde, bîr, çavbeloq, şor, bêqul, avis, sor.
<b>Hingiv, hingivîn</b>	Şêrîno, darîno, dermanê nexweşan, gûyê mêşan, xwarina axan, rêx, xwarina şêx.
<b>Tifeng, tiving, tiveng, tifing</b>	Jur, jêhêl, ber, dest, ketin, lingek, şer, orîn, pişkûl, firîn, zirrîn, marê mirî, qûn, dev, dirêj, xwîn, deng, bêrûh, mirî, dû, kûr, dûr, mirî, dar û bist, tir, serdirêj, qûnqelêş, beravêtin, marê mirî, kûrka tarî, agir, barîn, mist, bejna bûkan, hêka çûkan, bizmar, kutan, enirîn, fişqî, tilî, qul.
<b>Lempe, çira, momik, fanos, lox, lemp, lambe</b>	Tilî, tarî, xanî, ron, biçûk, tijî, ode, refîk, defîk, ser, zêr, behrek av, mar, teyr, pîr, birk, av, zayîn, marê mirî, teyrê zêrî, taca zêrî, av, kap, ro, betilîn, şev, xemilîn, nûr, gul, bîr, werîs, lem, kef, marezerk, steyr, mewîj, bûk, pepûk, ser, minare, nav, cehneme, carîye, xatûn, çalik, sorê qiyametê, elamet, agir, biriqîn, eywan, şûştî.
<b>Kefçik, kevçî, kevçik</b>	Reprepîsk, qefteka kîran, şûştin, bar, çûn, şkeft, hundir, gewde, derve, poçik, aş, dest û gunnê ereban, şemitîn, ketin, girtin, axir, dox, kurrî, qewd, şîşik, qulik, baxek çavik.
<b>Bagurdan, pangor,</b>	Dû, zivistan, bişol, havîn, betal, du qîno, pê, pan, ban, hevsar

<b>bangeran, bangur, loq, gindor, lox, banger</b>	zero, şilq, kat, çîzevîz, teqereq, guregur, bezîn, du kezî, kudîn, misîniko, sewt, ka, xiştexişt, ber, pişt, şimîn, darqûn, girovero, xanî, bêpê, tîj, didan, mela, du şaşik, atûr, ezab, axa, hawar û gazî.
<b>Cerîfk, sivnik, çîtik, gêzî, carût, melkez, gêzik, milkis</b>	Rih, dirêj, xişt, pişt, venekirin, simsimo, pišta derî, rûniştin, pişt, girêdayî, quncik, girêbest, tîjî dest, şev, xatûn, roj, qewraş, qefkî pûş, destmal, bûk, nava malê.
<b>Pêlav, sol, şekal, îkapet, qundire, qeqebik</b>	Kew, gerandin, bar, ker, lat, tevdan, welat, girêdan, çûn, vekirin, sekinîn, hul, dol, ro, êvar, dev, vekirî, goşt, dayîn, meşîn, pê, qul, asin, bezîn, qam, zincîr, barê gamêşê, razan.
<b>Pênûs, qelem</b>	Mele, aqilmend, ruh, bin, çûn, ximav û xar, lastîk, dar, tilî, kaxez, tîp, rêz, bidev, bêziman, bêfikr, bêraman, zanîn, nikil.
<b>Nivîn, mavling, cihnivîn, kulîn</b>	Şev, bûk, roj, pepûk, danîn, hilanîn, cêrî, xatûn, xemilîn, kemilîn, ûr, pehn.
<b>Quran</b>	Çil taq, çil bertaq, çil ode, sê derge, sê hucre, çil, derp, derpîç, xolam, xecîc, pel, dismal, şîr û şekir, zeviya spî, tovê reş.
<b>Aş</b>	Tîjî, têt, dirît, gîskê gorrî, tebeqe, kon, qûn, li ser, av, rûbar, diz, birin, gur, xwarin, sindorîk, kilîl, hespê boz, afirê quloz, sor, spî, li ber, çem, şev, bûk, roj, pepûk, xwelî, jêhatî, teqoreqo, devê avê, nirrî, maydan, toz, stûn, naşêkire.
<b>Kon, xîvet, kun</b>	Dûr, ga, nêzik, çiya, mûyê karan, dar, nivistin, rabûn, pêçandin, girêdan, werîs, mexilîn, reş, pirçik, xanî, bêdîwar, stûn, karîte, biban, bêax, çar, çepin.
<b>Av</b>	Werz, têt, korî, badan, bûrr bûrr, çûn, şûştin, dijmin, agir, dar, bizmar, ranegirtin, xar, kişîn, nasekine, spî, tazî, bêling, meşîn, şiyar, ranazê, şev û roj, westan, bezîn, gihiştin, zûwa.
<b>Gemî, keştî</b>	Erd, esman, hêlîn, betrewan, hefsar, dest, însan, zincîr, gol, çûn, rê, rêç, toz, bilez.
<b>Bilûr, bilûl</b>	Qevdek mû, keyf, dîwan, qirik, bêziman, bidev, bêdiran, lorandin, dar, hişkê gûz, deng, bandor, zîz.
<b>Def</b>	Serî, çerm, binî, dar, çirtik çilûrî, bizmar, kutan, deng, bêdev, bêdiran, bêkinc, eyar, dawet, ban, lêxistin, gopal, dizire.
<b>Sal</b>	Dozdeh ta, çar bira, çar diyar, germ, hênik, şilî, sar, dergih, 12

	kilîl, sêsid û şêst, reş, belek.
<b>Hîv, heyv, hîva nîvî</b>	Tas, mast, guhar, rast, bazin, şewq, hespê belek, xelek, meh, carek, kal dibe, dimire, dizê, kofî, newal, kerî, stêr, kum, gêrbûn, gol, teşt, totbûn, çîya, kezî, şev, şemal, zer, xwar, firîn, tûtî.
<b>Stêr, stêrk, stêrik, istêrek</b>	Gayên beş, mercan, helal û beybûn, sêvên sorgulî, sênîka mircanan, ban, êvar, çem, spêdê, tendûra zimzimî, roj, bûk, şev, pepûk, xemilîn, temirîn, dîzika daniya, qîzikên çavbikil, kofîya hişîn, hêkên neqşîn, vemirîn, vêketin, xûya, winda, çirîsk, agir, xwelî, hedimandin, ban, xiştan.
<b>Berf, befir</b>	Spî, şekir, difire, bêper, esman, ajotin, gayê kejo, şîr, barîn, deşt û banî, girt û danî, kulav, radan.

## ENCAM

Me di vê xebata xwe de xwest em nîşan bidin ku mamik gencîneyeke edebiyata kurdî ya gelêrî û ya zarokan e. Bi taybetî di fêrkariya ziman de ji hêla şêwaz, naverok, ziman ve mamik berhemên bi bandor in. Li gor tespîtan mamik bi du şêwazan hatine nivîsîn ku yek jê pexşankî ya din jî helbestkî ye. Lê zêdetir giraniya şêwaza helbestkî xwe dide nîşan ku ev yek jî di fêrkariyê de zûtêgihîştinê, jiberkirinê û guhdarîkirinê qewî dike. Ji aliyê naverokê ve jî mamik zêdetir bi jiyana rojane re têkildar in ku dewlemendiya jiyana rojane bi têra xwe tê dîtin. Di beşa duyem de bi awayekî berfireh ev yek hatiye nîşandan. Ji aliyê ziman ve di mamikan de serdanpê gencîneyeke veşartî heye ku ji her aliyê ziman ve ji bo geşedan û pêşxistinê minasîb in ku me di beşa sêyem de kêr û zêde nîşan daye. Bi awayekî giştî encamên ku em di vê xebatê de gihîştinê, li jêr wiha hatine rêzkirin:

- 1) Di fêrkariya ziman de mamik ji ber ku zêdetir berhemên gelêrî ne, berî çûyîna zarokan a xwendîgehê ji aliyê geşkirin û pêşxistina ziman ve xwedî tesîrên mezin in. Bi taybetî jî zarokên di navbera 3-6 salî de bala xwe zêde didin hunerên ku bi qafîye ne û xwedî rîtmêke mûsikî ne. Ev heyama stran, destan, çîrok, mamik, zûgotinok û berhemên hwd. in ku zarok dixwaze bi wan wextê xwe derbas bikin yan jê bîr pirsîn an jî ji wan re bîr xwendin.
- 2) Mamik ew berhem in ku bi komî tîr vegotin û pirsîn. Yanî her çî zarok be an jî mezin be dema ku bixwaze bi mamikan kar bike, mecbûr e ji xwe re muxatebekî din bibîne ku ev yek jî şermê dişkîne, bixwebaweriyê zêde dike û sosyalbûnê saz dike.
- 3) Di beşa yekem de me dît ku gelek zanyar û lêkolîneran gotine; di geşedana ziman de gelek pêkar hene ku xwedî tesîr in. Di nav van pêkaran de jî “bihîstin û guhdarîkirin”, “gotin û vajenasiya ilmê erûzê/helbestê” û “ilmê ravek û rêziman û teşenasiyê” di mamikan de herî zêde piştgiriya didin geşedan û fêrbûna ziman.
- 4) Ji aliyê vegotinê ve hat zanîn ku mamik li gor rêbazên pedagojîk hatine saz kirin. Di nav rêbazên fêrkariyê û di mamikan de herî zêde mînakên “divê zarok di navendê de be”, “ji nêzîk ber bi dûrî ve”, “ji şênber ber bi razber”, “têkiliya parçe û bitûnê”, “rêbaza bibîrxistinê”, “rêbaza beşdarbûnê”, rêbaza mûsikî/rîtmîk” hatin dîtin.
- 5) Hat dîtin ku ji bo mamikan di nav kurdan de gelek navên cuda tîr bikaranîn û di teşegirtin û çêbûna wan de jî dîsa gelek pêkarên muhîm hatine vegotin ku ev pêkar di fêrkariyê de jî xwedî rolên girîng in. Mînak “Meyla mirovî ya li ser



tiştên nepen/hesta meraqê, hewcedariya perwerdekirin û kêfkirinê” ku ev bixwe jî ji bo fêrkirinê rêbazek e. Mesela yek ji van pêkaran jî “devok û çanda devkî” ye ku zarok bi vê yekê di mamikan de hînê devoka xwe jî dibin. Ango zimanê xwe bi devkî hîn dibin.

- 6) Di mamikan de bikaranîna hunerên wek metafor û metonîmiyê, ji bo têgihîştina peyvan û bingehdanîna têgehan di hişê zarokan de, hat dîtin ku girîng in. Di mamikan de herî zêde ji bo afirandina metaforan hunera şibandinê hatiye bikaranîn ku ev jî ji bo zarokên di heyama kiryarên şênber de rêbazeke serkeftî ye. Metonîmî jî bitûnekê bi parçeyên wê ve dide nasîn ku ev yek jî di naskirina taybetiyên hebûnan de muhîm e ku di mamikên kurdî de ev huner bi têra xwe hatin dîtin.
- 7) Mamik bi tenê ne di geşedana ziman de her wiha di geşedana hizr, bîr û zêhnê de jî rolên sereke digire. Di beşa yekem de di têkiliya navbera mamik, ziman û hizrê de em li ser sê awayên fikirînê rawestan û bi mînakên me da nîşan ku mamik hêz û piştgiriyê didin fikirîna afirîner, rexneyî û qabiliyetên çareserkirina probleman.
- 8) Di edebiyata kurdî ya nivîskî de jî ev huner bi navê “muemma”yê hatine bikaranîn. Bi mînakên xwe di vê xebatê de hatine nîşandan.
- 9) Em dikarin bibêjin ku mamikên kurdî cara yekem ewqas berfireh hatine senifandin. Di bin 19 sernavan û 16 binsernavan de me nêzî 2500 mamikên kurdî di vê xebatê de senifandin. Ji aliyê naverok û mijarê ve dewlemendiya mamikên kurdî hatine vekolan. Di nav van sernavan de me dît ku mamikan qala ji mirov û xwezaya wan bigire heya ajel û xisûsiyetên ajelan, ji fêkî û sebzeyan bigire heya cur bi cur gîya û êmîşan, ji amûrên cur bi cur heya xweza, esmannasî, mûzîk, mantiq, dem, cih û waran kiriye. Di texayûla zarokan de çî tişt hebin, mirov dibîne ku di mamikan de têr û tijî hatine vegotin.
- 10) Di mamikên kurdî de navên taybet zêde xwe didin nîşan ku ev yek jî dîmena kultûra wî zimanî radixîne ber çav. Her wiha navên dînî, erdnîgarî, war û welatan jî vê dîmenê zelaltir dike. Bikaranîna navên taybet û tehera bikaranînê di wî zimanî de tesîrê li zarokan dike ku zarok jî bi heman şewazê bi kar bîne.
- 11) Navên rengan her çiqas rangên sereke bin jî bikaranîna wê ya zêde dide nîşan ku zimanê kurdî di teswîra hebûnan de piştî xwe gelekî dide rengan. Di vê xebatê de em gihîştin wê qinyatê ku herî zêde rengê reş, spî, sor û zer hatine bikaranîn.

Ev reng zêdetir di şayesandina xwezayê de hatine bikaranîn. Ev şewaz jî di danasîna xwezayê de ji bo zarokan bîr û hizrekê ava dike.

- 12) Xisûsiyetên devokên kurdî em di mamikan de zahf zêde dibînin. Peyvên devokî, ji aliyê ravek û pirjimariyê, daqurtandina pêşdaçekan, kişandina lêkeran û guherîna dengan ve bi têra xwe mînak têne dîtin.
- 13) Ji aliyê peyvên mustehcen û dijûnên kurdî ve, ji bo dariştina peyvan sûdwegirtina ji dengên û peyvên dubarekirî yên ku ziman dewlemend dîkin, dîsa ji gencîneyên veşartî yên mamikên kurdî ne.
- 14) Peyvên hemwate û diywate careke din di teswîrkirin û şayesandina hebûnan de rolên sereke girtine û di heman mamikê de bikaranîna van peyvan, xîmê ziman ê bêjeyan û mantiqa wî zimanî bi rahetî fêrî zarokan dîkin.
- 15) Bikaranîna lêkeran jî di mamikan de zahf xurt in, heta mirov dikare bibêje ku lêkêrên ku hatine bikaranîn ji kapasîteya zarokên di navbera 3-6 salî de zahf firehtir e. Çimkî di xebata me de hat zanîn ku 189 lêkêrên cuda hatine bikaranîn. Ji van lêkeran ên ku herî zêde hatine dubarekirin ew lêkêrên bingehîn in ku di her derê jiyanê de tên bikaranîn. Mînak: “çûn, kirin, hatin, bûn, zanîn, firîn, anîn, çandin, kişandin, rûniştin, rabûn, vekirin, berdan, siwarbûn, jêhatin, bidûketin” û hwd.
- 16) Perçeyên rêzimanê yên bingehîn wek daçek, gihanek, ravek di mamikan de bi berfirehî hatine bikaranîn. Ne bi awayekî çêkirî bi awayekî xwezayî û li gor rengê wî zimanî her bêjeyek li gor sentaksa wî zimanî di cî de hatine bikaranîn.
- 17) Xisûsiyeta herî girîng a ji bo zengînkirina xurcika peyvan teswîrkirin û şayesandina heyberan e. Di vê babetê de me tabloyek amade kir ku di encama vê xebatê de me zanî ku çi metaforîk çi rasteqînî bêjeyên ku hatine bikaranîn hem tezahureke mantiqa wî zimanî ye, hem jî di fêrbûn û geşekirina ziman de bêjeyên bingehîn ên wî zimanî ne.
- 18) Di fêrbûna ziman de herî dawî bi taybetî ji xuleka nehemîn bigire heya dawî em dibînin ku mamik berhem û hunerên zahf kêrhatî û resen in. Helbet di fêrbûn û geşedana ziman de mamik bi tenê serê xwe ne bes in. Lê bi taybetî di navbera salên 3-6 an de, heke bi awayekî tekûz ji zarokan re bê gotin û bi zarokan bidin bikaranîn dê feydeyê gelek mezin bigihîne wan.

## ÇAVKANÎ

Ahanov, Kaken: *Dil Bilimin Esasları*, vgz. Murat Ceritoğlu, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2008.

Akbaş, Emin: *Tiştonek I*, Weşanên Yekîtiya Mamosteyên Kurd/YMK, Bremen, 2006.

Akreyî, Mamoste Hacî Xalid: *Hezar Metelok bo Mirovên Jîr û Kok: Çapa Dûyê*, Çapxaneyê Şehab, Hewlêr, 2012.

Aksan, Doğan: *Her Yönüyle Dil; Ana Çizgileriyle Dilbilim*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2009.

Alkan, Abbas: *Çîrok û Jiyan*, Komal, Stenbol, 2004.

Alperen, Altan: “Folklor ve Edebiyatın Unutulan Unsuru: Bilmeceler”, *Millî Folklor Dergisi*, j. 31-32.

Aydın, Tahirhan: *Çoklu Zeka Kuramı ve Yabancılara Arapça Öğretimi*, Gazi Üniversitesi, Eğitim Bilimleri Enstitüsü, Teza Lîsansa Bilind a Neçapkirî, Ankara, 2005.

Azar, Birol: “Çocuk Eğitiminde Folklor/Halkbilimden Yararlanma Üzerine”, *Türk Xalkarı Edebiyatı (II): Beynelxalq Uşaq Edebiyatı Kongresi*, Qafqaz Üniversitesi, 2008.

Balta, Elif Emine: “Bilmecelerin Dil-Düşünme Bağlamında Eğitimdeki Yeri ve Önemi”, *Turkish Studies- International Periodical For The Languages, Literature and History of Turkish or Turkic*, Volume 8/1 Winter, 2013.

Baskın, Mehmet Şirin: *Pênas, Taybetî û Senifandina Mamikên Kurdî (Kurmancî)*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mardîn, 2013.

Başgöz, İlhan: “Türk Bilmecelerinin Fonksiyonları”, *Folklor Dođru*, j. 37, İstanbul, 1974.

Bayhan San Pınar – İsmihan Artan: *Çocuk Gelişimi ve Eğitimi*, Morpa Yayınları, İstanbul.

Bekki, Salahaddin: *Bilmeceler, Tabu ve Gizli Diller Üzerine*, Muzaffer Akkuş Armađanı, amd. Mücahit Akkuş ve Fatih Dinçer, Kömen Yayınları, Konya, 2013.

Berwarî, Mahir: *Metelokanê*, Berhevkarî, Elmanya-Dortmund, 2009.

Boratav, Pertev Naili – İlhan Başgöz: “Türk Halk Bilmeceleri”, *Folklor Dođru*, j. 37, İstanbul, 1974.

Boratav, Pertev Naili: *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*, Bilgesu Yayınları, Ankara, 2013.

Cankara, Murat: “Metafor Yaratma Eylemi Olarak Bilmece”, *Millî Folklor Dergisi*, j. 55.

Celîl, Ordîxanê - Celîl, Celîlê: *Kurdîsky Folklor*, b. II. Moskova, 1978.

Cücelođlu, Dođan: *İçimizdeki Çocuk*, ç. 44, Remzi Kitapevi, İstanbul, 2012.

Çevirme, Hülya: “Şiirsel Halk Edebiyatı Ürünlerinin Çocuđun Dil Eğitimi Katkıları”,

İnönü Üniversitesi, *İnönü Üniversitesi Eğitim Fakültesi Dergisi*, cilt: 5, j. 7., 2004.

Damarlı Oçak, Songül: *Dil Gelişimi ile Okuma ve Yazma Arasındaki İlişki*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, 2007.

Ebûbekr, Sedreddîn Nûreddîn: *Berkotêkî Metellî Folklorî Kurdî*, Wezaretê Rewşenbîrî Hikûmetî Herêmî Kurdistan, Hewlêr, 2005.

Eren, Muhsin: *Mamikên Gundê Şêxê Reş ê Girêdayê Şirnex*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zinadî, Mardîn, 2013.

Ergin, Muharrem: *Türk Dil Bilgisi*, Bayrak Basım Yayım ve Dağıtım, İstanbul, 2007.

Foulqie, Paul: *Pedagojî Sözlüğü*, Sosyal Yayınları, İstanbul, 1994.

Gardner, Howard: *Zihin Çerçevesleri Çoklu Zeka Kuramı* (Frames of Mind The Theory of Multiple Intelligences 1983), wer. Ebru Kılıç, Alfa Yayınları, İstanbul, 2004.

Gazî, Mustafa: *Gurzek Ji Zargotina Zarokan; Dîsko Dîsko Danîno*, Enstîtûya Kelepura Kurdî /Weşanxaneyê Aras, Silêmanî, 2006.

Gorges, Robert A. - Alan Dundes: “Bilmecenin Yapısal Bir Tanımına Doğru”, *Folklorî Doğru*, j. 37, İstanbul, 1974.

Güneş, Kenan: *Mamikên Me*, Evrensel Basım Yayın, Stembol, 2013.

Kan, Şerif: *Berhevîkirin û Tesnîfa Mamikên Kurdî*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mardîn, 2013.

Karademir, Fevzi: “Halk Bilmecelerinin Oluşum ve Biçimlenmesindeki Etkenler Üzerine”, *Akdaemik Bakış Dergisi*, j. 14, Celabat-Kirgizîstan, Nîsan, 2008.

Karademir, Fevzi: “Kalıp Kullanımları Bakımından Türk Halk Bilmeceleri”, *Türk Dünyası İncelemeleri Dergisi*, cilt:VII, j. 2, İzmir, 2007.

Karademir, Fevzi: *Türk Halk Bilmecelerinin Yapı, Dil ve Üslup Özellikleri*, Teza Doktorayê ya Çapnebûyî, Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Diyarbakır, 2007.

Karakaş, Ayhan: “Ortak Anonim Türk Halk Edebiyatı Ürünlerinden Bilmecenin Çocuk Edebiyatına Katkıları”, *Türk Xalkarı Edebiyatı (II): Beynelxalq Uşaq Edebiyatı Kongresi*, Qafqaz Üniversitesi, 2008.

Kelhor, Newzad: *Geşekirdinî Mindal*, Dezgehê Mukriyan, Hewlêr, 2010.

Kızıllan, İlhan: *Fêrbûn – Pirtûkek Ji Bo Zarok û Ciwanan*, wer. Hüseyin Kartal, Rûpel, Stenbol, 2014.

Kızıldaş, Emine: *Okul Öncesi Eğitimde Uygulanan Aile Katılım Çalışmalarının 5-6 Yaş Grubu Çocukların Dil Becerilerinin Gelişimine Etkisi*, Atatürk Üniversitesi-Sosyal Bilimler Enstitüsü, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Erzurum, 2009.

Köktürk, Şahin: “Çocuklara Şiirin Felsefenin ve İmgesel Dünyanın Kapılarını Açan Türk Bilmeceler”, *HECE Dergisi*, Yıl. 9, j. 104-105, Ankara, 2005.

Nas, Recep: *Örneklerle Çocuk Edebiyatı*, Ezgi Kitapevi, Bursa, 2002.

Onen, Ronayî – Samî Tan: *Hînker/Asta Duyemîn*, Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, İstanbul, 2009.

- Önür, Aysun: “Türkçe Öğretiminde Bilmecenin Yeri ve Önemi”, *Gazi Üniversitesi Türkçe Araştırmaları Akademik Öğrenci Dergisi*, j.2.
- Özmen, Rukiye: *Nîşana Hebûna Me Ziman; li Botanê Peyvên Sînonîm*, amd. Grûba Zimanperwer, Pêrî, Stenbol, 2012.
- Pertev, Ramazan: *Mîrsadu'l-Etfal (Şahrahê Kûdekan) Ferhenga Menzûn A Kurdî-Farisî*, Zanîngeha Mardin Artuklu Enstituya Zimanên Zindî, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Mardîn, 2012.
- Pertev, Ramazan: *Zarok û Çîrok – Destpêka Pedagojiya Kurdî*, Doz, Stenbol, 2009.
- Porzig, Walter: *Dil Denen Mucize I*, wer. Vural Ülkü, Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara, 1990.
- Sadinî, M. Xalid: *Mamikên Kurmancî*, Nûbihar, Stenbol, 2011.
- Sadinî, M. Xalid: *Mela Huseynê Bateyî/Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, ç. 2., Nûbihar, İstanbul, 2011.
- Saygılı, Sefa: *Çocuk Psikolojisi (0-7 yaş)*, Nesil Yayınları, ç. 25, İstanbul, 2011.
- Sedewallah, Nîhad: *Dê Çewa Serederî Li Gel Zarokê Xo Key..??*, Zana, Duhok, 2010.
- Sedewallah, Nîhad: *Dê Çewa Zimanê Zarokê Pêş Êxîn?*, Pirtûkxaneya Bedirxanî, Duhok, 2011.
- Sedewallah, Nîhad: *Perwerde û Zarok û Dayîk û Bab*, Zana, Duhok, 2010.
- Sever, Sedat: *Çocuk ve Edebiyat*, Kök Yayıncılık, Ankara, 2003.

Sheridan - Mary Dorothy: *Ruşdê Kudek*, wer. Tîbe Refî-Efsane Selmanî Gîvî, Kîtabî Çetr, Qûm, H. 1388, M. 2009.

Sünbül, Ali Murat: *Öğretim İlke Ve Yöntemleri*, ç.5, Eğitim Akademi Yayınları, Konya, 2011.

Şahin, Çat Arife: *Okul Öncesi Eğitim Kurumuna Devam Eden 5-6 Yaş Gurubu Çocukların Dil Gelişimi İle Annelerin Okuma İlgisi ve Alışkanlıkları Arasındaki İlişkinin Çeşitli Değişkenler Açısından İncelenmesi*, Abant İzzet Baysal Üniversitesi- Sosyal Bilimler Enstitüsü, Teza Lisansa Bilind a Çapnebûyî, 2009.

Şahîn, İsmâîl Taha: *Mamikê Mino Mamanî*, Spîrêz, Duhok, 2011.

Şaul, Mahir: “Dünyada Bilmece Araştırmaları”, *Folkloru Doğru*, j. 37, İstanbul, 1974.

Tan, Samî: *Rîzimana Kurmancî*, (çapa berfirehkirî), Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2011.

Taş, Çetîn: *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, Dîwan, Stenbol, 2013.

Temiz, Gülay: *Okul Öncesi Eğitiminin Çocuğun Dil Gelişimine Olan Etkisi*, Selçuk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, 2002.

Toprak, Ömer: *Ji Aliyê Naverok û Teşeyê ve Nirxandina Mamikên Kurmancî*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî, Mardîn, 2013.

Vygotsky, L.S.: *Düşünce ve Dil*, wer. S. Koray, Toplumsal Dönüşüm Yayınları, İstanbul, 1998.



Xanî, Ehmedê: *Mem û Zîn*, amd. Huseyn Şemrexî, ç.2., Nûbihar, İstanbul, 2011.

Yavuzer, Haluk: *Çocuğunuzun İlk 6 Yılı*, Remzi Kitabevi, ç. 28, İstanbul, 2012.

Yavuzer, Haluk: *Çocuk Psikolojisi*, ç. 34, Remzi Kitabevi, İstanbul, 2012.

Yıldırım, Kadri: *Nûbehara Biçûkan- Ehmedê Xanî Külliyyatı (I)*, Avesta, İstanbul, 2008.

Yıldırım, Kadri: *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi; Kurmancî Lehçesi*,

Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Mardin, 2012.

Yıldırım Kadri, Ramazan Pertev, Mustafa Aslan: *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê*

*Kurdî*, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Mêrdîn, 2013.

## ÇAVKANIYÊN JI ÎNTERNETÊ

- *Birleşmiş Milletler Çocuk Haklarına Dair Sözleşme, r. 15*,  
[http://www.kdkcocuk.gov.tr/contents/files/YasalDuzenlemeler/BM\\_cocuk\\_Haklari\\_Sozlesmesi-Turkiye\\_Ilerleme\\_Raporu\\_\(2.\\_ve\\_3.\\_Donem\).pdf](http://www.kdkcocuk.gov.tr/contents/files/YasalDuzenlemeler/BM_cocuk_Haklari_Sozlesmesi-Turkiye_Ilerleme_Raporu_(2._ve_3._Donem).pdf) (25.09.2014 / 09: 24)
- *Öğretim İlkeleri, Kuram-Model ve Yaklaşımları*,  
<http://it.ibu.edu.ba/assets/userfiles/tll/undergraduate/EDU%20440%20%C3%96%C4%99%20WWW.pdf> (30.09.2014 / 16: 57)
- Artun, Erman: *Ortak Türk Kültürü Ürünlerinin Çocuk Edebiyatına Katkıları*,  
[http://turkoloji.cu.edu.tr/HALKBILIM/erman\\_artun\\_ortak\\_turk\\_kulturu\\_cocuk\\_edebiyatina\\_katkilari.pdf](http://turkoloji.cu.edu.tr/HALKBILIM/erman_artun_ortak_turk_kulturu_cocuk_edebiyatina_katkilari.pdf) (15.09.2014).

- Elî, Mihemed: *Çîvanok û Tiştonek*, Kovara Tûrik, <http://www.dengemamoste.com/modules.php?name=News&file=article&sid=29> (15.09.2014).
- Denîz, Hasan Huseyîn: *Sazbûn û Bikaranîna Peyvên Kurdî*, <http://www.pen-kurd.org/kurdi/hesen-deniz/sazbun-u-bikaranina-peyven-kurdi.html> (13.07.2014).
- <http://tr.wikipedia.org/wiki/Jargon> (30.09.2014).

**T.C.**  
**Mardin Artuklu Üniversitesi**  
**Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü**  
**Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı**

**Yüksek Lisans Tezi**

**ÇOCUKLARA KÜRTÇE ÖĞRETİMİNDE**  
**BİLMECELERİN ROLÜ**  
**(İnceleme-Sınıflandırma)**

**Kenan SUBAŞI**  
**11711006**

**Tez Danışmanı**  
**Öğr. Gör. Ramazan PERTEV**

**Mardin 2014**